# KEVIRÊ KRÎPTON BIŞKÊNIN

WÎ TIŞTÎ BIŞKÊNIN
ÇI KU QEWATA TE JÎ TE DISTÎNE

CON
BÎVÊR

Hevalê Giranbiha,

Ev kitêb pêşkêşa bo we ye, û ez dua dikim, wekî banga ku nava van rûpelada hatîye nivîsarê jîyana we heta-hetayê biguhêre.

Ez bawar im, wekî em rojên dawî li dinîyake usa dijîn, li kîderê kevirê krîptonî ruhanîyî rast heye, yê ku her roj dicêribîne qewata me mesîhîya ji me bistîne.

Bêhesab mesîhî aciz dibin û bêtaqet dibin, wextê ku dicêribînin ji wî hemû tiştî azad bin, çi ku wana paş xweyî dike. Xwedê program nekirîye, ku jîyan wî cûreyî be. Ewî têra dîtîye, wekî hûnê nava her govekeke jîyana xweda serkeftî bin, û hela serbara serda jî, Ew qewatê dide we, ku hûn wî hemû tiştî alt bikin, çi ku miqabilî we ye.

Ezê wera derheqa serhatîya xweye şexsîda pareve bibim, ya ku guhartin kire nava jîyana min, û ezê hinek rastîyên Încîlêye kilît nîşanî we bidim, yên ku jîyana min heta-hetayê guhartin. Hûn jî dikarin tevî Xwedê bikevine nava eleqetên nêzîk û six. Bawarîya weye sax û qewat dikare hebe, ya ku hukumî li ser merivên dor-bera dike. Feqet, berê ewlin gerekê hûn kevirê xweyî ruhanîyî krîpton altkin.

Hûn dikarin aza bi vê bangê û usa jî matêrîyalên mayînva nava malpera CloudLibrary.org - êda tevî wana pareve bibin, kîjana hûn nas dikin.

Birayê weyî nava Mesîhda:



Con Bîvêr
JohnBevere@ymail.com

MESSENGER INTERNATIONAL
MessengerInternational.org

# KEVIRÊ
## KRÎPTON BIŞKÊNIN

“Con Bîvêr pêxemberê rojên îroyîn e, yê ku xwudiyê nêzîkbûna praktîk e. Ew, bi kerema ku me dide zorkirinê, ku gunehê alt bikin, hîn dike. Kitêba xweye nûda, sernavê kîjanê ev e: “Kevirê krîpton bişkênin”, ew dide kifşê wekî nava jîyana meda kevirê krîpton heye, kîjanî meriv dikare tenê bi hizkirina Xwedê alt bike. Razîbûn ji Xwedêra, wekî ev eyantî daye Con”.

ROBÊRT MORÎS
Hîmdarê civîna “Gêytwêy Çrç”-ê, serwêrê mezin /Dallas-Ford Vort, TêxasXudanê kitêbên eyan e bi sernavê “*Jîyana duakirî*”, “*Xwedê, Yê ku min nas ne dikir*”, “*Bi rastî aza*” û *“Herdemî”*

“Ev berbirîbûn bona bedena Mesîh bangeke lez e, ku tiştê hindikva razî nebin, lê berbi wî hemû tiştî bicedînin, çi ku Xwedê bona wan çê kirîye. Ez bawar im, wekî kûraya Cone Încîlê û meremê wî, yê ku dixweze bi rastî alî bawarmenda bike ku bona Xwedê bijîn, wê wan meriva bide guhartinê, yên ku bi dil evê bangê qebûl bikin.

COYS MAYÊR
Dersdara Încîlê û xudana nivîsarên eyan

Kitêba “Kevirê krîpton bişkênin” da Con Bîvêr zelal wan qewînbûna dide kifşê, yên ku dikarin dijwarîya pêşda bînin, ku nava Mesîhda em temamîya qewata xwe bidine xebatê. Ev kitêb gelekî hukumdar e û wê alî me hemû xwendevana bike, ku ew rû bi rû li ber kevirê jîyana xweyî krîpton bisekinin”.

CÊNTÊZÊN FRANKLÎN
Serwêrê civîna “Frî Çêypl”-ê
Anegorî kovara “Nyû York Tayms”-ê, xudanê bi nav û deng

“Eyantîyên Con Bîvêre derheqa prînsîpên Încîlêda, hînkirinên wî û hizkirina hindava merivada, bi deha sala ser hev jîyanên şexsaye cuda-cuda, û usa jî padişatîya Xwedê, çê kirine. Kitêbên wî dighîjine hemû quliçên dinîyayê, û hukumdarîya wî gelekî mezin e. Ez bona hevaltîya wî razîme, bona qulixa wî û şikestîbûna wî, razîme, bi kîjanê ew bangên xwe dinivîse.

BRAYAN HYÛSTON
Hîmdarê civîna hemdinîyayêye “Hîlson Çrç”-ê û serwêrê sereke

“Bi ruhva tijî, hukumdar, bi xeberên berdildahatinêva, kitêba “Kevirê krîpton bişkênin” xeleqa gunehê ye, ku hêdî-hêdî dişide, ya ku îdî bûye tiştekî sade, bi keremê û rastîyêva gurbûyî, xirab dike. Ez gumanim, wekî ev kitêba wê alî bike, ku rêberîyê li nisiletekê bikin, bona kîjanê rastî tiştekî ne qewîne, lê şikestîbûn tiştê guhdarkirî nîne, berbi şabûnê, berbi wî Xwedêyî, Yê ku dicedîne tiştên herî baş bide me. Û tiştê Wî, yê herî baş bona me heyîna azaya nava Wî da ye û xwepêşkêşkirina li Wî ye”.

LÛÎ GÎGLÎO
Serwêrê civîna “Pêşin Sîtî Çrç”-ê, hîmdarê hemcivînên “Pêşin”-ê
Xudanê kitêba “*Gogîyat gerekê binkeve*”

Bi çiqasîva jî kitêbên Con Bîvêr yên başin, ev kitêba wê bona geleka bibe syûrprayz, lê ne ku bi wê menîyê, wekî ew ji karebûna xweye ku ew derheqa pirsgirêkên serekeda dibêje, dûr ketîye. Ew kerema wî, bi kîjanê ew bi kûrayî nava kitêbên xweda rastîyê eşkere dike, diha gelekî berbiçev e. Bona geleka ewê tiştekî nişkêva be, çimkî ew tiştekî usa eşkere dike, çi ku li rex me ye, lê bona me kifş nîne. Eger bêjin, wekî ev kitêb bona me pêwîst e, wî çaxî wê usa bibe ku tiştek nayê gotinê. Kitêba “Kevirê krîpton bişkênin” gerekê nava navnîşa xwendina bawarmendên roja îroyînda cîyê xwe bigre.

BÎLL CONSON
Civîna “Bêtêl Çrç”-ê, Rêddîng, Kalîfornîya
Xudanê kitêba “*Xwedê qenc e*

# KEVIRÊ KRÎPTON BIŞKÊNIN

WÎ TIŞTÎ BIŞKÊNIN
ÇI KU QEWATA TE JÎ TE DISTÎNE

CON BÎVÊR

Killing Kryptonite by John Bevere, Kurdish Latin
© 2019 Messenger International
www.MessengerInternational.org
Originally published in English as Killing Kryptonite
Additional resources in Kurdish Latin by John Bevere are available
for free download at: www.CloudLibrary.org
To contact the author: JohnBevere@ymail.com

“Kevirê krîpton bişkênin”, Con Bîvêr, Kurdiya Latînî
© 2019 Messenger International
www.MessengerInternational.org
Pêşda bi zimanê înglîzî hatîye çapkirinê, bi sernavê «Killing Kryptonite».
Matêriyalên Con Bîvêre mayîne bi Kurdiya Latînî hûn
dikarin nava vê malperêda www.CloudLibrary.org-da bibînin:
Bona pêwendîyên tevî xudanê kitêbê JohnBevere@ymail.com

Vê kitêbê ez pêşkêşî endamên koma

“Mêsîncêr întêrnêyşinil”-ê dikim.

Bi kerema Xwedê, me bi hevra Mizgînîya Îsa Mesîh gîhandîye

mîlyona meriva. Bêyî bawarîya we, bêyî merîfeta we,

bêyî xwepêşkêşkirina û xebata mezin, ev yek wê tiştê

bûyînê nîbûya. Ez û Lîza qedirê we digrin, bi kêfxweşî tevî we dixebitin û em hîvîya wê Rojê ne wextê ku Îsa

wê heqê qulixdarîya weye amin bide.

*“Çimkî kî ye gumana me, yan jî şabûna me, yan jî taca firnaxbûnê, eger hûn nînin nava Xudanda, li ber Xudanê me Îsa Mesîh, wextê hatina Wî?*

*“Çimkî hûn in rûmet û şabûna me”.*

– A Têsalonîkî 2:19,2O

Ez razalixîyê didime we, Koma “Mêsîncêrê”-ye sala 2O19-a

# SERECEM

Naverok...13

**BEŞA YEKÊ: Zoraya Yekî**

1. Pirsa ku jê direvin...19
2. Kevirê krîpton çi ye?...27
3. Yek...35
4. Kevirê krîptonî înfêksîyon...41
5. Guhartinê bînin...49
6. Menîya me...57
7. Zoraya Yekî...65

**BEŞA DUDA: Kevirê krîpton bibînin**

8. Peymana zewacê...75
9. Bêesilîya dijî Xwedê...83
10. Li piş pûtparistîyê çihe veşartî?...91
11. Pûtparistiya bawarmend...101
12. Hukum bidine sivikkirinê...109
13. Kevirê krîpton...117
14. Guneh...123

**BEŞA SISÎYA: Hukumdarîya kevirê krîpton**

15. Qewata gunehê /Beş yek/....................................................133
16. Qewata gunehê /Beş dudu/....................................................141
17. Şaşbûyî....................................................................149
18. Îsayê feşkirî..............................................................157
19. Xala destpêkê..............................................................165
20. Tobekirin .................................................................175
21. Sê padişa .................................................................185

**BEŞA ÇARA: Kevirê krîpton bişkênin**

22. Rûbirûkirin................................................................195
23. Qebûlkirin.................................................................205
24. Hizkirin û rastî...........................................................213
25. Kevirê krîpton bişkênin...................................................221
26. Gunehê ku ne guneh e......................................................229
27. Dergehê şahîyê.............................................................237
28. Bilind bibin...............................................................245

Pirsên bona gotûbêjkirinê.....................................................253
Zêdekirî......................................................................261

# DERHEQA VÊ KITÊBÊDA

Kitêba “*Kevirê krîpton bişkênin*” meriv dikare ji destpêkê hetanî dawîyê mînanî her kitêbeke mayîn bixwîne. Çawa jî hebe, min ew jî pareveyî li ser beşên kurt kirine, bona xwendina kîjana ji deha hetanî panzdeh deqa zêdetir lazim nayê. Nava her serîkî kitêbêda hûnê beşa bi navê “Gava praktîk” bibînin, ya ku wê alî we bike, ku rastîyên nava wêda raberkirî hûn bidine xebatê. Ez hîvî dikim, ku hûn gavên praktîk bernedin, çimkî ew beşên kitêbêye girîng in. Ev e menî, wekî ez pêşniyar dikim, ku hûn rojê tenê serîkî bixwînin. Bi vî cûreyî hûnê bikaribin gava pêwîst biavêjin, hetanî ku hûn derbazî serê kitêbêyî mayîn bibin.

Dawîya kitêbêda jî hûnê pirsên bona gotûbêjkirinê, yên bona wan meriva bibînin, yên ku wê nava komên biçûkda kitêba “*Kevirê krîpton bişkênin*” lêkolîn bikin.

Eger hûn vê kitêbê çawa beşa dersa “*Kevirê krîpton bişkênin*” dixwînin, ez pêşniyar dikim, ku hûn nava koma xweye biçûkda wan dersên vîdêoyê, yan jî aûdîyoyê temaşe bikin, yan jî guhdar bikin, kîjana hûn dikarin dawîya kitêbêda li ser DVD-yê nivîsar bibînin, yan jî nava malpera CloudLibrary.org-da bibînin, usa jî caba pirsên gotbêjkirinê, yên dawîya kitêbêda, bidin. Paşê hûn dikarin hîvî ji her endamekî komê bikin, ku serên kitêbêye anegor hetanî hevdîtina mayîn bixwînin.

Ev hemû tişt bo we ye.



Con

# NAVEROK

Diqewime hûn ecêbmayî bin, gelek cara min xwestîye vê kitêbê nexilazbûyî bihêlim, lê ne ku kitêbeke min a mayîn, û zûtirekê ezê şirove bikim, ku bona çi usa ye. Hetanî wî çaxî ezê şirove bikim, ku kitêba bi sernavê "*Kevirê krîpton bişkênin*" çi cûreyî peyîhatîyên Meshîva girêdayî ye? Îzinê bidin ez bi kurtayî şirove bikim.

Ji me gelek meriv xebera "kevirê krîpton"-r'a ji serpêhatîya li ber xwe derxistî, ya derqeqa Sûpêrmênda, nas in. Ev serhatî, ya ku bû hikyata Amêrîkayê ya miletîyê, ji alîyê hevalên mektebên Cêrî Sîgêl û Co Şûstêrda hatibû nivîsarê, û cara ewlin ew bi cûrê komîksa hezîrana sala 1938-a hatibû çapkirinê. Hêna dîktatorîya nasîstîyê eva mecaleke dijî wê yekê bû, kîjanêda cêrga serhatîya ya derheqa xêrkirê super da ye, qewatên kîjanî ji hemû tiştî zêdetir in. Serhatîya Sûpêrmên lez bela bû û navekî mezin dest anî, û bi wê yekêva tevayî, ne tenê bi rîya çapxana hate gilîkirinê, lê usa jî bi radîoyê, têlêvîzyonê û bi rîya fîlma belav bû, û ew jî gihîştine açixîke mezin.

Piştî hinek wede, ji van serpêhatîya hinek acizayî pêşda hat. Menî ew bû, wekî tu tiştî nikarbû ziyan bida Sûpêrmên. Dêmek salên 194O-î, xudanên wan serpêhatîya kevirê krîptonî êdî eyanbûyî, matêrîyalê ji galaktîka Sûpêrmên, li ber xwe derxistin, yê ku dikaribû qewatên wî yên zor bidana hêçkirinê. Bin hukumê kevirê krîptonda Sûpêrmên zeyîf dibû û werguhêzî merivê sade dibû.

Nava jîyana me mesîhîya da "kevirê krîpton" heye, yê ku wê qewatê û wî xeysetî dide hildanê, yên ku Xwedê dane me. Ew çî ye? Çi cûreyî wê yekê eşkere bikin? Ew yek çi cûreyî hukumî li ser me dike, bi şexsî, yan bi tomerî hildayî? Bi çiqasîva ew dijwarîya bona kardarîya me û karebûna gihîştina undabûyîya pêşda tîne? Rûyê wê yekêda em ji çi miqûf dimînin? Bo çi ew yek usa bi hêsanî tê veşartinê? Ev kitêba hema bersiva van pirsa dide.

Eva kitêba 2O-ye, ku min bi alîkarî û rêberîya Ruhê Pîroz nivîsîye. Çawa ku min îdî da dîyarkirinê, min pênc yan şeş cara xwestîye vê kitêbê nîvcî bihêlim. Menî ew bû, wekî wextê nivîsara kitêbê ez rû bi rû li ber

pirsgirêkên jîyana xweye niha disekinîm, yên ku min nikaribûn hesab hilnedana. Min gerekê ji xwe bipirsîya: "*Gelo ez ji jîyana diha nimiz razî me, lê ne ku bona çi ez hatime çêkirinê? Gelo em çawa civîn, bi rastî hazirî* û zoraya Xwedê dibînin, bi kîjanê e*m dikarin cîyê xweyî jîyînê biguhêrin?*". Bi rastî, çend cara ez ji xwe bi van xeberava hişyar bûme: "Bavo, ez guman nînim, wekî ev kitêb li min xweş tê. Ez naxwezim vê kitêbê berdewam bikim".

Û her car min ji Ruhê Pîroz xebera "na" texmîn dikir. Wextê ku cara dawî dîsa usa qewimî, Ewî ez dame bawarkirinê, wekî ev banga wê eyantîyên mezin bide, bi saya kîjana merivên cuda, malbet û civîn wê li temamîya dinîyayê çê bibin, û prînsîbên vê kitêbê dikarin bajarên tam biguhêrin. Piştî vî sozî, min destpê kir bi bawarîyê nivîsara xwe berdewam bikim. Wextê ku ez gihîştime beşa vê kitêbêye dawî, heft serên dawî, bona min zelal bû, wekî ew bi çiqasîva karadar e. Min ne tenê fem kir, ku nava vê bangê da çiqas aqilmendî heye, lê min usa jî dît ku ew çiqasî lez e. Roja îroyîn ez hesab dikim, wekî eva bangeke ji bangên girîng e, ya ku bi xudîtîya min ronayî dîtîye.

Niha, bi zanebûna wê yekê, wekî derheqa kardarîya vê bangêda dawîya kitêbêda nivîsar e, diqewime ji beşa dawî destpê bikin bixwînin. Îzinê bidin, ku ez eşaretîyê bidime we, bona ku hûn wê yekê nekin. Eger hûn sê beşên ewlin berdin, wî çaxî hukumê beşa çara wê zeyîf be. Bînin ber çavê xwe, ku hûn dikevine sera sînêmayê, wextê ku hetanî dawîya fîlmê bîst deqe maye. Hukumê kadirên dawî wê bona we diha zeyîf be, eger hûn fîlmê ji destpêkê temaşe bikin. Ewên ku li serayê rûniştî bûn û fîlmê ji destpêkê temaşe dikin, yan digrîn, yan dikine qîrîn, yan jî şa dibin. Lê li cem we pirs pêşda tê, gelo hêja bû ku min ev fîlm temaşe bikira?

Ev kitêba ji bîstheyşt serîya ye, yên ku dikevine nava çar beşa, ji kîjana her yek ji hevt beşa ye. Bi parevekirina vî cûreyî, min xwestiye alî xwendevanên mijûl bikim. Hûn dikarin her roj ji deha hetanî panzdeh deqa serîkî kitêbê nava çar hevtîyada bixwînin, yan jî dikarin serîkî nava hevtêkêda bixwînin û kitêbê nava şeş mehada xilaz bikin. Hûn usa jî dikarin bi cûrê xwe bixwînin. Meremê me ew e, ku hûn vê bangê anegorî wedê xwendina xwe bikin.

Bi kutasî, vê bangê hûn usa jî dikarin çawa şuxulkarî lê binihêrin, ya ku we ji kevirê krîpton diparêze û we hîn dike ku hûn hukumê xwe li ser merivên dor-berên xwe bihêlin. Hetanî destpêkirinê werin em dua bikin û

hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku Ew çavên me veke, bona ku em wê serwaxtîya ezmana bibînin, ya ku qewatê dide me, ku em li ser vê dinîyayê şuxulkarîya xwe mîyaser bikin.

*"Bavo, bi navê Îsa, çavên min, guh û dilê min veke, bona ku ez xwestina Te nava jîyana xweda bibînim, guhdar bikim û fem bikim. Ruhê Pîroz, rêyên Îsa Mesîh hîn bike, wextê ku ez vê bangê dixwînim. Ez, çawa Dersdarê xwe, li Te dinihêrim. Derheqa her cumleke vê kitêbêda min ra bêje. Û bila jîyana min heta-hetayê bê guhartinê. Amîn".*

ZORAYA YEKÎ

# BEŞA YEKÊ

# 1

# PIRSA KU JÊ DIREVIN

*Kifşkirina mexsûs ji alîyê xudanê kitêbêda*

*Xwendevanên hizkirî, eger we hela hê beşa "Naverok" nexwendîye, ez pêşniyar dikim ku hûn ese w*ê yekê bikin. *Ewê alî we bike, ku bona vê bangê xwe hazir bikin. Ez bo we pêşdaçûyîna xweş dixwezim.*

"*Kevir*ê krîpton biş*kênin*?". Gelo ev kitêb derheqa Sûpêrmên da ye? Na xêr, feqet di navbera serpêhatîya wî û jîyana meye bawarîyêda tiştên ecêbe mînanî hev hene.

Sûpêrmên ji vê dinîyayê nîne: lawên Xwedê ji vê dinîyayê nînin.

Qewata wîye nebînayî heye, ya ku li cem merivên sade tune: qewata meye nebînayî heye, ya ku li cem merivên vê dinîyayê tune.

Ew dijî xirabîyê şerkarîyê dike: em dijî xirabîyê şerkarîyê dikin.

Ew bindestiya diparêze û wana ji xirabkara aza dike: em derheqa zeyîfada difikirin û yên girêdayî aza dikin.

Ew ji royê qewatê distîne: em ji Kurê Xwedê distînin.

Tenê tiştek heye, yê ku dikare Sûpêrmên bide sekinandinê: kevirê krîpton, matêrîyalê radîoaktîve li ber xwe derxistî, yê ji galaktîka Sûpêrmêne. Hema wî cûreyî jî "kevirê krîpton" heye, yê ku li cîyê meyî jîyînêyî dûr pêşda hatîye û dikare lawên Xwedê bêtaqet bike. Belê, ew li ser vê dinîyayê pêşda nehatîye, lê ew li wir çê bûye, li kîderê mala meye li ezmana ye. Kevirê krîpton ne tenê qewatên Sûpêrmêne nebînayî didane tunekirinê, lê serbara serda jî ji merivên sade zeyîftir dikir. Kevirê meyî krîpton jî wê yekê dike.

Gelo kevirê meyî krîpton kîjan e? Hetanî eşkerekirina wî, ez gerekê we ha-

zir bikim. Zêdaya kevirê krîptone mezin, ya hindava Sûpêrmênda ew bû, wekî ew matêrîyal bi hêsanî dihate naskirinê. Ev yek dide kifşê, wekî ewî dikaribû pêşîya eyankirina kevirê krîpton biketa bin hukumê wî. Hema bi wî cûreyî kevirê bawarmendî krîpton him şexsa, him jî bedena Mesîh zeyîf dike, û bona geleka ew hela hê nenas e. Meremê vê kitêbê ew e, ku kevirê krîpton bidine eyankirinê, bidine kifşê ku çawa meriv dikare kevirê krîpton bişkêne û hukumê wî ji xwe dûr bixe, him bi fikira şexsî, him jî bi fikira tomerî. Dêmek, em ji vê pirsê destpê bikin.

## Xwestina here mezin

*Xwestina meye here mezin k*îjan *e?* Ez dibêjim "me", çimkî eger em bêqelp bin, ji me her kes berbi tiştên mînanî hev dicedîne. Em dixwezin açix bin, nava goveka xweda bibine yê herî baş, bi nav û deng bin, zewaca meye baş û hevalên baş hebin, li cîyê jîyînêyî gulvedayî bijîn, sehet û qewat bin û hemû mecalên me hebin, bona ku em wî hemû tiştî bikin, çi ku fikira mera derbaz dibe.

Ev hemû meremên dîyarkirî balkêşin, û piranîya wana pêwîst e, feqet gelo em ji hemû tiştî zêdetir hema wan tişta dixwezin? Gelo em merivên wî cûreyî nizanin, tiştên kîjanaye wî cûreyî hene, feqet ew valayê texmîn dikin? Gelo em serpêhatîyên derheqa artîstên Holîvûdê, serkarên hevaltîyên mezin, sportsmênên profêsyonal, nevsên dewletêye fermî û merivên mayînda guhdar nakin, yên ku gihîştine wî tiştî, çi ku civak nava vê jîyanêda hesab dike çawa bilindaya açixîyê, feqet ew meriv texmîn dikin, ku ji tiştekî miqûf mane.Rûyê valaya wanda hinek destpê dikin narkotîka yan jî alkoholê bidine xebatê, bi hêsabûna êkzotîkva mijûl dibin, yan jî romansa destpê dikin.Yên mayîn berbirî ayîna dîn, bawarîyên sedsala nû, yan jî okûltîzmê dibin, bi wê gumanê ku dewsa wê valayê tijî bikin, ya ku hundurê wan dikuje.

Eger em bêqelp bin, di kûraya dilê xweda em hemû kes jî zanin, wekî tiştê hê zêde heye. Razîbûna rast, berbi kîjanê her kes dicedîne, him jin, him mêr, meriv dikare tenê bi heyîna pêwendîyên tevî Efrandarê me bibîne. Nenihêrî wê yekê, ku fikira we ya derheqa Xwedê da çî ye, dilê we bi kûrayî berbi Wî dicedîne. Wê razîbûnê û wê şabûnê, berbi kîjanê meriv dicedînin, dikarin tenê careke mayîn bi gihîştina Efrandarê me bibînin.

Rastî ew e, wekî Xwedê "heta-hetayî kirîye dilê mêriv" /Zanebûn 3:11, NLT/. Eger xapandin dilên meda serwêrtîyê nake, em wî çaxî berbi "Padişê heta-hetayê" dicedînin /binihêr'e A Tîmotêyo 1:17/. Xebera Xwedê derheqa her merivekîda dibêje:

> “Ew rastîyê derheqa Xwedêda zanin, çimkî Xwedê wanva eyan kirîye…Bi rîya wî hemû tiştî, çi ku Xwedê efirandiye, ew dikarin zelal cudatiyên Wî yên ku nayêne dîtinê, qudreta Wî ya heta-hetayê û tebyeta Wî ya xwedêtîyê bibînin” /Romayî 1:19,2O, NLT/.

Xwedê bona tu kesî neeyan nîne. Eger meriv bi temamî bêqelp bin, ewê xwe mikur bên, wekî nava wedekî jîyana xweda wana cedandîye ku bi kûrayî Xwedê nas bikin. Em, hemû kes jî, zanin, wekî Ew Yê herî zane ye, Yê ku hemû tiştî dikare bike û Yê ku li her dera ye.

Ewên ku destpê dikin tevî Wî bikevine nava pêwendîya, fem dikin, wekî hazirî, zorayî, rûmet û mezinaya Wî ji femdarîya mêriv der in û yên mînanî Wî tunene. Ew awqasî qewat e, wekî çend binelîyên ezmîne here qewat, yên ku her dem li Ezmîn nava hazirîya Wî da nin, bi xofê û dengê bilind deng didine hevdu û derheqa mezinaya Wî ya ecêbda elam dikin. Ew wê yekê bi qewat û cedandina usa dikin, wekî dengên wana sitûnên dergehên sera li Ezmîne mezin dilerizînin, li kîderê bawar bikî ji mîlyardekî zêdetir ruhberên wî cûreyî dikarin cî û war bibin.

Serwaxtî, femdarî, efrandarî, merîfet û zanebûna Xwedê awqasî berfireh ne, wekî ew ji femdarîya mêriv der in. Bi sedsala ser hev, ulmdarên here aqil surên efrandarîya Wî gerîyane û lêkolîn kirine, feqet wana usa jî dijwarî û hijmekarîya wê yekê fem nekirine.

Tu merivek hetanî niha bi temamî, bi kûrayî neketîye nava hizkirin, qencî û rehma Wî û bi temamî ew yek texmîn nekirîye. Hizkirina Wî bêsînor e.

Eva îdî serê çil sala ye, wekî ez ji mecala bona heleqetîyên tevî Wî lezetê dibînim, feqet van axirîya ez ketibûme nava halekî usa û derheqa wê yekêda difikirîm, wekî Efrandarê me em ji wê gunehkarîyê xilaz kirine, ya ku me bi xwe anîbû ser xwe. Ewî temamîya serwêrtîya li ser vê dinîyayê da merivatîyê, lê me xwe da dijminê Wî yê herî xirab, mîrêcin, û eskerên wî yên here xirab. Pêşda, bi zanebûna derheqa xayîntîya meda, Xwedê bi hazirî qirar kir, ku wî bahê ku nayê gotinê bide, yê ku pêwîst bû, ku me ji koletîyê û girtinê aza bikira. Me xwe bi xwe gunehkar kir, lê Ewî Xwe qurban kir, ku me aza bide berdanê. Ewî ew yek bêyî teribandina Xebera Xwe kir, çi ku tenê wî çaxî wê tiştê bûyînê bûya, eger Ew bibûya meriv.

Çawa ku Xwedê dinîya dabû mêriv, Ewî nikaribû çawa Xwedê paşda bistenda: lazim bû, wekî Kurê mêriv dewsa paşdahildanê bikira. Hema ev bû serwaxtîya bûyîna Îsa ya ji kulfeta qîz. Ew bû merivê sed selefî, lê çawa ku Bavê Wî Ruhê Xwedê bû, Ew ji tebyeta bindestîyê aza bû, nava kîjanêda temamîya merivatîyê pêşda hatibû. Îsa Xwedêyê bi bedenêva eyanbûyî bû. Ewî derheqa wan zêrandinên xirabda zanibû, yên ku gerekê li ser Xwe bidîtana, bona ku meriv xi-

laz bikirana, lê hizkirina Wî, ya hindava meda awqasî mezin û kamil bû, wekî Ewî bi rezedilî qirar kir, ku bahê azaya me bide.

Vê kitêbê bi temamî hildayî û gelek kitêbên mayîne bêhesab, meriv dikare tenê pêşkêşî qencî, huba ecêb, zorayî û mezinaya Wî bike. Feqet, pirsek heye, ya ku bûye menîya nivîsara vê kitêbê.

## Pirsa ku jê direvin

Çawa ku em qulixî Xwedêyekî wî cûreyî ecêb dikin, fikirdarîya zelal hesab dike, wekî jîyana me gerekê ya nebînayî be. Xêncî wê fikirdarîyê, Încîl jî piştgirîya vê fikirê dike. Ev hemû tişt bona me hatine sozdayînê.

- Tebyeta Wî ya xwedêtîyê,
- xeysetê xwepêşkêşkirinê,
- hizkirin û baxşandina bêqewil,
- şabûn û edilaya ku nayê gotinê,
- zoraya nebînayî,
- gulvedayî,
- zindîbûn,
- saxlemî,
- çareserî û qewînbûn.

Û ev hemû tişt bes nîne: hela hê zêde heye. Încîl usa jî soz dide me:

- serwaxtîya xwedêtîyê,
- zanebûn,
- femdarî,
- merîfet,
- fikirdarîya kûr û efrandarî.

Meremê vî hemû tiştî ew e, ku me bike rezdar û açix. Bi kurtayî gotî, bona me tiştên ezmîn hatine sozdayînê. Bîr bînin, wekî Îsa elam kir, wekî padişatîya Wî di nava me da ye, û merem ew e, wekî xwestina Wî li ser dinîyayê usa bê mîyaserkirinê, çawa ku ew yek li Ezmîn e.

Feqet, tê bêjî ev tiştana ne li ser dereca tomerî, ne jî li ser ya şexsî tên kifşê. Eger, bi bêqelpî, em halê niha qîmet bikin, gelo em dikarin bêjin, wekî em firqîyê di navbera cimeta Xwedê û merivên vê dinîyayê da dibînin? Gelo em, peyîhatîyên Îsa, merivên berbiçav in? Gelo em nava vê nisileta tarîda ronahîyê didin? Derheqa hesabên cihêbûna mêr û jinada bifikirin: gelo firqîya berbiçav di navbera civînê û vê dinîyayêda heye? Yan em jî ji hevsûdîyê, buxdanbêjîyê, xirabxeberdanê û bêtifaqîyê dizêrin, feydayên kîjana heleqetîyên teribî ne. Gelo

em xeyset, bêqelpî û normên moralîye usa didine kifşê, yên ku ji heramtîya evê dinîya me cuda dibin? Gelo ji alîyê saxlemîyê û gulvedanêda di navbera bawarmenda û bêbawarada firqî heye? Gelo em dikarin hewcetîyên meriva çareser bikin û bona her merivekî ku li dinîyayê dijî, Mizgînîya Mesîh dannasîn bikin?

Ev hemû tişt gelekî bilind nayêne ber çava? Derheqa wê yekêda bifikirin, wekî hêna peymana Kevin, wedekî usa hebû, wextê ku zîv mînanî kevir tiştekî sade bû û qîmetê wî tunebû, çimkî dereca jîyînê gelekî bilind bû /binihêre G Padişatî 1O:21,27/. Niha, hêna peymana Nû, ez rastî gelek rêbera têm, yên ku rûyê mecalên sînorkirîda dijwarîya dibînin, û serwêra dibînim, yên ku dixwezin arîkarîyê bidine wan cîyên jîyanê, li kîderê dijîn, lê rûyê tunebûna qewata merivatîyê, fînansa û mecalên mayînda nikarin wê yekê bikin. Gelo herdu alîyada jî, çi ku min got, meriv dikare nav bike çawa “li ser dinîyayê, çawa ku li Ezmîn e”?

Îsa soz da me, wekî wextê ku em padişatî û heqîtîya Wî bigerin, wî çaxî ew hemû tişt, hewcê çi ne em, wê bona me bên dayînê. Tiştê usa qet nebibû, wekî rûyê kêmasîya mecalada Îsayê nikaribûya ew yek bikira, çi ku gerekê bikira. Mixabin, civînêda derheqa hebûnê û gulvedanêda hînkirinên gelekî berk hebûne. Rûyê wan hînkirinên nebalanskirîda, meriva destpê kirine bawar bikin, wekî zêdayî tiştekî xirab e. Feqet em çi dikarin bidin, eger tu tişt tune?

Wextê ku em îzinê didin, ku cedandina hindava padişatîya Xwedêda me bikişîne nava xwe, Ew mecalên pêwîst dide me, bona ku li ser vê dinîyayê em xwestina Wî belav bikin. Xwedê rêberê xirab nîne: Ew hîvî ji peyîhatîyên xwe nake, ku xwestina Wî bêyî dayîna mecalên pêwîst bê belavkirinê. Û serbara serda tiştekî hê zêde, Xwedê Bavê qenc e. Ew dixweze lawên Xwe dua bike, lê naxweze, wekî hebûk serwêrtîyê li me bike. Koka her xirabîkê ne ku pere ye, lê hizkirina hindava pera da ye.

Li Îsraêla kevinar hebû wede, wextê ku li welêt merivekî kesîb jî tunebû. Nivîsar e: “Û cihûda û Îsraêl bi jîyana çareserkirî dijîyan, her merivek bin çiqilê xweye tirîya û dara hêjîrada bûn, ji Danê hetanî Bêrsabê, nava hemû rojên Silêmanda” /G Padişatî 4:25/. Dan bajarê Îsraêlêyî herî bakûr bû, lê Bêrsabê yê herî başûr bû, û Încîl eyan dike, wekî nava temamîya miletada merivekî usa tunebû, yê ku hewcê xweykirinê bû: tu şexsek yan komek hewcê piştgirîya dewletê nîbûn. Gelo menîya dewlemendtîya li wî welatî çi bû?

Bi rastî, eva qewimandineke cuda nîne. Eger em dîroka cimeta Xwedê nava peymana Kevinda lêkolîn bikin, gelek nisilet bi cûrê ecêb gulvedidan, ji alîyê êkonomîkî, sosyalî û leşkerîda pêşda diçûn. Li cem wan rêsûrs, xurek û hebûn gelek bûn. Wextê êrîşa dijmina ew bin nediketin, serbara serda, ew her car ser diketin. Dereca jîyana wana welatên cînar zendegirtî dihiştin. Bîra xweda xweykin, wekî ew yek wextê peymana Kevin diqewimî, ya ku ji peymana Nû nimiztir bû.

Îsa Navçîgarê peymaneke hê qence, çimkî ew peyman li ser sozên hê qenc hîmgirtî ye /binihêre Îbranî 8:6/. Bi lênihêrandina jîyana Wî, em dibînin, wekî serkar, nevsên dewletêye resmî /bacberevkir/, bedenfiroş, torin, diz, kesîb û dewletî, bi zelal gotî, hemû jî berbi wî dicedandin. Îsa diçû kîderê guhartin dibire li wir. Kêmasîya Wî tu cara tunebû û Ewî dikaribû her hewcetîk bida tijîkirinê. Wextê ku koma wî rastî êrîşa dihat, tu kes zyanê nediket, û gelek cara halên pêşdahatî werguhêzî açixîyên bi ecêb dibûn.

Endamên civîna ewlin çawa “yên ku dinîya weldigerandin” nav dikirin /Karên şandîya 17:6, NKJV/. Hewcetîyên wana jî tunebûn, çimkî nivîsar bû: “Duayê Xwedê li ser hemûya bû. Di nava wanda merivên ku hewcê tiştekî bûn, tunebûn” /Karên şandîya 4:33, 34, NLT/. Ew usa cuda bûn, wekî gelek cara ew gerekê ofîsêrên leşkerî û serkarên dor-bera bianîyana li ser wê qirarê, wekî ew xwedê nîbûn û gerekê ew nehebandana. Merivên dor-berên wana ew cuda dikirin û çawa merivên başqe hesab dikirin. Wana nexweşî dûr dixistin û ji jîyana zêrandîya zeyîfî dûr dixistin. Nava nisilata tarîda ew îşiqa zelal bûn.

Îzinê bidin, ku ez careke mayîn bipirsim, ku gelo jîyana me gelekî ji civaka me cuda dibe? Gelo îşiqa me awqasî qewat e, wekî meriv me hesab dikin çawa cimeta Xwedê ye cuda? Yan me xwesofîkirin raber kirine û me xwedêzanîya xwe guhartiye, ji hînkirina kitêba Pîroz a zelal dûrketine, bona ku şirove bikin, ku bona çi ew soz, yên ku bona wedê peymana Nû têra hatine dîtinê, îdî mîyaser nabin?  Bersivên wan pirsa li cem xudanên peymana Nû hene, lê em ji dayîna bersivên van pirsên dijwar direvin.

Gelo wê çi biqewime, eger em bi rastî guhdar bikin, ku Încîl çi dibêje?

Meremê min dijîderketin nîne: ez tenê hîvî dikim, ku hûn vê pirsê bidine xwe: gelo ew yek, çi ku roja îroyîn diqewime, mîyaserbûna van xebera ye?: “Bila padişatîya Te bê, bila xwestina Te bibe, çawa ku li Ezmîn, usa jî li ser dinîyayê”. Em nikarin xeberên Îsa hesab hilnedin: “Padişatîya Xwedê hema di nava we da ye” /Lûqa 17:21/. Padişatîya Wî li vir e, di nava bedena Mesîh da. Gelo em nava nisileta xweda usa dijîn, çawa ku Îsa nava nisileta Xwe da? Gelo Xeber me hîn nake?: “Ewên ku dibêjin, ku nava Xwedê da dijîn, gerekê usa bijîn, çawa ku Îsa dijît” /A Yûhenna 2:6, NLT/.

Gelo em usa kardar in, çawa ku Civîna ewlin bû, nava pirsa belavkirina Mizgînîyê da? Gelo em dibine şedê wê yekê, wekî hemû herêm besa Mizgînîyê nava du salada dibihên /binihêre Karên şandîya 19:1O/? Bîr bînin, wekî întêrnêta wan, fêysbûk, yan jî torên sosîyalî, têlêvîzyon û radîyo jî tunebûn. Feqet her kesek ne ku li bajarekî, yan jî welatekîda, lê li temamîya herêmekê Mizgînî guhdar kir.

Gelo roja îroyîn ew yek dibe? Werin em bi bêqelpî hal qîmet bikin.

Em pirsgirêka kifş hesab hilnadin û dibêjin:

> "Xwedê îdî naşuxule". Em Mizgînîyê usa raber dikin, ku ew anegorî halê me be. Tê bêjî em paşda vedikişin, lê carina em her tiştî hesab hilnadin, çi ku serkarî yê, qewatê, açixîyê, zêdayê û saxlemîyêva girêdayî ye. Em dibêjin, wekî banga wî cûreyî balanaskirî nîne û ew tenê bona kara mêriv e. Bi kirina vî cûreyî, em xwe diparêzin, bona ku mecbûr nîbin, bersiva cêrge pirsên giran bidin û em xwe bona wê yekê sofî dikin, wekî em bi destî Mizgînîyê hukum li ser merivên dor û berên xwe nehêlin.

Dêmek, pirsa min a pêşdakişandî, ya derheqa kardarîya meda ew e, dora kîjanê meriv difikirin. Lê bona çi em vê pirsê nadin? Bona çi em bersiva wê nagerin? Diqewime em disekinin, paşda vedikişin, çimkî bilindkirina vê pirsê dikare pirsgirêkên usa bide eyankirinê, kîjanava em naxwezin mijûl bin? Feqet, eger em vê pirsê nedin û li ser hîmê bersivên wê nekin, wî çaxî emê li ser dereca diha nimiz bimînin, ji wê yekê nimiztir, çi ku mera hatibû sozdayînê û bona çi em hatine gazîkirinê.

Ez ji sîûpênc sala zêdetir nava qulixê da me û şêstsalîya min nêzîk dibe. Ez hazir im û dixwezim derheqa vê pirsêda xeberdim. Bi rastî ev pirsa gelekî girîng e. Ez bawar dikim, ku eger em bi bêqelpî bersiva vê pirsê nava Xebera Wî da bigerin, wî çaxî zêdaya wê jîyanê, bona kîjanê em hatine gazîkirinê, wê eyan be.

Eger hûn mînanî min dixwezin bersiva bistînin, werin em tevayî derbazî şuxulkarîya Încîlê bibin. Ewê lez pêşda neçe û carina jî wê bi êşandin be, hema wî cûreyî, çawa ku wextê doxtirê profêsyonal emelyeta dijwar dike. Doxtir derheqa nexweşê xweda difikire û hemû tiştên pêwîst dike, ku emirê wî xilaz bike.

Ruhê Pîroz diha gelekî derheqa meda difikire, ne ku her doxtirek, yan jî şexsek, yan jî bi tomerî hildayî. Vê yekê bîra xweda xweyî bikin, wextê ku hûn bighîjine serên kitêbêye diha giran. Nava encamê vê yekêda hûnê qewatê, jîyanê, saxlemîyê, hizkirinê û aktîvîyê bistînin. Ez bawar dikim, wekî ev bersiv dikarin jîyana me, şuxulkarîya cîyên jîyana me û ya vê nisiletê biguhêrin.

Eger hûn tevî min in, usa ye em pêşda bilivin!

## gava praktîk

Nava Aqûb 2:12-da Xwedê eşaretîyê dide me: "Xeberê mîyaser bikin, lê ne tenê guhdar bikin û şexsên xwe bixapînin". Ev yek dide kifşê, ku eger em gotinê ji Xwedê /Încîlê, Ruhê Pîroz, yan ji merivekî ku hînkirina rast terîf dike/ dibihên, lê em nakin, wî çaxî usa dertê ku me xwe xapandîye.

Şedetîya bawarîya me ne ku qayîlbûna hînkirinêra ye, lê kirina wê ye.

Dêmek, gavên praktîke dawîya her serîkî kitêbê bêhesab girîng in. Ji wana her yek arîkarî ye, ya ku alî dike, ku carekêra wan rastîya bidine xebatê, wextê ku hûn serê kitêbêyî bi sirê dixwînin. Pêşniyarên raberkirî mezin nînin û bona kirinê wedê dirêj lazim nîne.

Eger em bona kirina her yekî wede başqe bikin, hûnê diha zêde ji vê kitêbê bistînin û jîyana we wê bi kûrayî bê guhartinê.

III

Hene pirs, ji kîjana hemû kes direvin, û dayîna wan pirsa tê bêjî mînanî çûyîna li cem doxtirê dirana ye, wextê doxtir dixweze diranê xirabbûyî çê bike. Feqet, em gerekê qirar bikin, netirsin, û rastî wan pirsa bên, ku ew yek bona me kardar be.

Jîyana we, ya himberî vê dinîyayê, bi çiva berbiçav e? Meriv dikarin bêjin, ku hûn mînanî Îsa dijîn? Ji vê pirsê netirsin: ese bersiva vê pirsê bidin. Bi çiqasîva jîyana we wê bihata guhartinê, eger we mînanî Îsa jîyana xwe derbaz bikira? Xeysetên çi cûreyî weyê bihişta? Pêwendîyên weye tevî wan meriva, tevî kîjana hûn her dem nava pêwendîya da nin, wê çawa bihatana guhartinê? Kirinên weye li malbetê wê çawa bihatana guhartinê?

Wede başqe bikin, ku hûn fikirên xweye derheqa van pirsada binivîsin. Xebera Xwedê çawa rênîş bidine xebatê. Ewê nîşan bide, ku hûn gerekê berbi çi bicedînin. Hema hûn hinek fikira binivîsin, li ser hîmê wana dua bikin. Hîvî ji Ruhê Pîroz bikin, ku tiştekî ji bersivên we nîşan bide, dora kîjanê Ew hema niha nava jîyana weda xebatê dike. Hîvî ji Wî bikin, ku ew wê yekê usa bike, ku hûn qewata guhartinê bistînin.

2

# KEVIRÊ KRÎPTON Çİ YE?

Serê kitêbêyî ewlinda me *cêriband* derheqa mezinaya Xwedê da xeberdin. Ez xebera "cêribandin" didime xebatê, çimkî em çiqasî jî xeberên baş bidine xebatê, emê qet nêzîkî şirovekirina mezinaya Wî nebin. Li ser Wî ra tu tişt tune. Tu kes nikare xwe himberî Wî bike: kesekî mînanî Xwedê tune û Ew ji heta-hetaya derbazbûyî, hetanî heta-hetaya pêşerojê serwêrîyê dike. Ew gelekî ecêb e! Çawa zarokên Wî, nêzîkî aqila ye, wekî jîyana me gerekê Wî bide kifşê, û Încîl zelal derheqa wê yekêda dibêje. Xebera Xwedê derheqa kur û keçên Wî da eyan dike: "Çawa ew e, usa jî em in li vê dinîyayê" /A Yûhenna 4:17/. Yûhennayê şandî negot: "Çawa Ew e, usa jî emê nava heta-hetayêda usa bin". Na xêr, ew dibêje, wekî çawa Ew e, usa jî em in *niha li vê dinîyay*ê. Eva ji fikirê bilindtir e.

Careke mayîn, nivîsar e:

> "Bi saya rûmet û mezinaya Wî, Ewî sozên here mezin û qîmetlû dane me. Evana ew sozin, yên ku karebûnê didine me, bona ku *tebyeta Wî ye xwedêtîyê* pareve bikin" /B Petrûs 1:4, NLT/.

Derheqa wê yekêda bifikirin. *Tebyeta Wî ye xwedêtîyê* mera hatîye dayînê. Gilî ne derheqa tebyeta mêrivê li ser vê dinîyayê da ne, lê derheqa *tebyeta Xwedê da ne*. Petrûs bona wê yekê, ku şaş neyê femkirinê, xebera "xwedêtîyîê" zêde dike. Nava zimanê yûnanîda ew xebera "*t*êîos"-e, ya ku çawa "ew çi ku Xwedêva girêdayî ye û ji Wî dikişe" tê şirovekirinê /"*Ferhenga tomerî, ya lêkolînên xeberên peymana Nû*"/. "Xebera "tebyet" nava zimanê yûnanîda xebera "*fûsîs*"-e, ya ku çawa "pêşdanîn, heyîn, xeyset û cudatîyên mexsûse heyînêva girêdayî"/ tê şirovekirinê /"*Ferhenga tomerî, ya lêkolînên xeberên peymana Nû*"/. Eger van

herdu xebera bighînine hev, emê vê yekê bistînin: “Evana ew sozin, yên ku karebûnê didine we, ku hûn *wî hemû tiştî, çi ku tek-tenê Xwedêva girêday*î *ye*, pareve bikin.

Em bi rastî ji Xwedê xuliqîne.

Gelek cara ez xemgîn dibim, wextê ku qulixçî vê yekê dibêjin: “Bi rastî, di navbera mesîhî û gunehkar da tu firqî tune, mesîhî awqasî baxşandîne”. Eva pûtparistî ye, ya ku dikare du tiştên xirab pêşda bîne. Ya ewlin, ew xebata Xwedê bêqîmet dike, ya ku Ewî bi destî Îsa bona me kir û ya duda, ew sozê Xwedê dike yê nekardar û zarokên Wî dîsa çawa bin destê heramtîya li ser vê dinîyayê pêşdahatî dimînin.

Tebyet jî dijî vê yekê ye. Gelo we qet bihîstîye, wekî ji şêr kêwrîşk bibe, yan jî ji hespê bi xwîna paqij heywanekî başqe bibe. Nivîsar e: “Delalno, niha [ne ku *paş*ê, wextê ku herine Ezmana] em zarên Xwedê ne” /A Yûhenna 3:2/.

Çawa delalîyên Wî, em gerekê xeysetê xwepêşkêşkirinê, hizkirina bêqewil û qirar, şabûna mezin, edilayê nîşan bidin, ya ku ji fikirê bilindtir e: qewata nebînayî, gulvedan, efrandarî, jîyana aktîv, serwaxtîya xwedêtîyê, fikirdarîya kûr, zanebûnên bilind û femdarîya mezin, û vê navnîşê meriv dikare berdewam bike. Încîl cudatîyên vî cûreyî nava govekên başqe-başqe da soz dide: dêmek, careke mayîn pirsa min ev e: “Em bo çi vê yekê ne li ser dereca şexsî, ne jî li ser dereca civînê ya tomerî nabînin?”.

Hetanî xeberdana derheqa vê pirsê û pirsên vî cûreyî da, ez dixwezim wera derheqa sîstêma vê kitêbêda gilî bikim. Diqewime çend serên kitêbêye pêşîya we bona we çawa yên xirab û hişk bêne texmînkirinê, lê ez soz didim, wekî peyî wanra bersivên razîkirinê wê bên.

Bînin ber çevê xwe, wekî doxtir dîagnoza rast, ya derheqa heyîna mêlanomayê /penceşêra çerm/ dide, û pêşniyar dike bi cûrê emelyeta wedekurt qenckirinê mîyaser bikin, çimkî ew yek hema destpêkêda jî çawa nexweşîya xirab tê kifşê. Nexwaş dikare bifikire: “Gelo çiqas xirab e, li cem min penceşêr heye. Ez naxwezim derheqa vê yekêda guhdar bikim, ne jî dixwezim bi mecalên başqe ji vê nexweşîyê azad bibim. Feqet ezê wê yekê bikim, bona ku emirê xwe xilaz bikim”. Feqet, mîneke başqe bînin ber çevê xwe: eger doxtir pirsgirêka nexweş hesab hilnede û tenê jêra bêje ku çawa gerekê rast bijî, hîn bike, ku çawa buxwe, fîzkûltûrayêva mijûl bibe, nêzîkbûna baş bide kifşê û ji stresa dûr bimîne, nexweşî wê dîsa zêde bibe, bighîje wê derecê, wekî îdî nikaribin emelyetê bikin û nexwaşê wî çaxî wefat bibe.

Xwedê gelekî me hiz dike û bo wê yekê jî ew dîyagnozê dide, ku em gerekê xwe paşda xweykin û çi dikare bibe menîya mirina me. Ew zane, wekî ew çi ku me dide sînorkirinê, wê bi rîya jîyana baş paşda venekişe. Dewsa wê yekê em

gerekê dijî wê yekê derbikevin û wê ji jîyana xwe bidine dûrxistinê. Ew Bav e, Yê ku bi kûrayî bona saxlemî û pêşkeftina me xemgîn e.

Dêmek, wextê ku hûn serên kitêbêye peyîra dixwînin, bîra xweda xweykin, wekî dîyagnoz pêwîst e, bona ku mecal hebe emelyetê bikin. Feydayê dawî wê rastîya nebînayî be, ya ku nava Xebera Xwedê da hatîye kifşkirinê.

## Derheqa pirsa min da

Eger padişatîya Wî nava meda ye, wî çaxî bona çi xwestina Wî li ser dinîyayê usa mîyaser nabe, çawa ku ew li ezmana ye? Bona çi hinek bawarmendên peymana Kevin, yên ku nava peymanêda li ser dereca “ji başîyê kêmtir” bûn, li ser sozên diha “nimiz” hatibûne hîmdanînê, jîyana wan diha baş bû, ne ku ew yek çi ku roja îroyîn em li ber çevê xwe dibînin? Încîl her dem bersiva vê pirsê dide. Ji wan bersiva yek nava nema Pawlose bona korintîya nivîsar e:

> “Lema bila meriv pêşîyê dilê xwe binihêre û paşê ji wî nanî buxwe û ji wê kasê vexwe. Çimkî eger hûn vî nanî dixun û vê kasê vedixun, bêyî qedirgirtina bedena Mesîh, hûn dîwana Xudan li ser xwe dixun û vedixun. *Lema jî nava we da gelek nexweş û zeyîf hene û hinek jî îdî mirine.* Lê eger me dîwana xwe bikira, dîwana meyê ji alîyê Xwedê da nehata kirinê. Feqet, wextê ku dîwana me ji alîyê Xudan da tê kirinê, em tên şîretkirinê, wekî dîwana me tevî dinîyayê nebe” /A Korintî 11:28-32, NLT/.

Em, wextê şîva Xudan, nêzîkbûna korintîyaye bêxof dibînin, encamên kîjanê diha gelekî kûrtir bûn, ne ku çawa wana fem dikir. Bi rastî, wana şîva Xudan bi cûrê nanxwerina tam, dora sivirê dikirin, lê ew yek ji nêzîkbûna meye wedê niha gelekî cuda dibû. Wextê lêkolîna me, emê bibînin, wekî pirsgirêka hîmlî, rûyê çida nava jîyana wanda dîwan hatibû, ev bû: wana fem dikir, wekî ew gura Xwedê da nîbûn, lê dîsa ew yek berdewam dikirin.

Nava vê beşêda sê encamên kirinên wan hatine rêzkirinê: zeyîfî, nexweşî û mirina fîzîkî. Fikira her du xeberên dawî zelal e, lê hûn derheqa xebera ewlin da çi dikarin bêjin? Du şirovekirinên xebera “zeyîfî” ev in: “tunebûna qewatê, yan jî aktîvîyê” û “yekî ku nikare tu tiştî bike”. Vê xeberê meriv dikare nava gelek govekên jîyanêda bide xebatê. Bi tomerî hildayî, ew dide kifşê, wekî em nikarin usa bin, çawa ku em hatine çêkirinê.

Em paşda vegerine li ser Sûpêrmên.tKevirê krîpton bo wî qezîya raber dikir: wî kevirî qewat ji wî distendin û ew bêçare dikir. Karebûnên Sûpêrmên yên ji vê

dinîyayê nîbûn. Ewî dikaribû tiştên ji qewatê der bikirana û zanebûnên wîye ji merivatîyê bilindtir, qewata nebînayî û xeysetê qewîn hebûn. Feqet, bin hukumê kevirê krîpton Sûpêrmên zeyîf dibû, ji merivê sade zeyîftir dibû. Eger hukumê wî kevirî nava jîyana wîda gelekî bima, ew dikaribû bimira.

Tê kifşê, wekî Pawlosê Şandî kevirê civînêyî krîpton eşkere dike. Ew kevir me dide zeyîfkirinê, îzinê nade ku bi wê qewatê bijîn, ya ku anegorî tebyeta xwedêtîyê ye.

Dawidê padişa bi kesereke kûr derheqa qewimandineke ji jîyana xwe xwe mikur hat, wextê ku ewî tobe nekiribû û derheqa gunehê xweda xwe mikur nehatibû:“Qewata min bû hulm-gulim, mînanî ava havîna germ” /Zebûr 32:4, NLT/. Tercima “Bang”-ê, ya ku têksta Încîlê bi xeberên başqe şirove dike, /bona ku meriv li ber çavê xwe diha zelal bibîne/, xeberên wê vî cûreyî raber dike: “Hemû xuşavên jîyana min hişk bûn”.Gotineke mayînda nivîsar e: “Gunehê qewata min  zîya kir:ez ji hundurva unda dibim” /Zebûr 31:1O, NLT/.

Aqûb awa dinivîse: “Guneh, wextê ku mîyaser dibe, mirin jê dibe. Nexapin, xwîşk-birayên mine delal” /Aqûb 1:15,16/. Aqûb tevî bawarmenda zelal xeber dide û eşaretîyê dide wana, ku ew gunehêva nexapin. Eger guneh neyê dûrxistinê, wî çaxî ewê hindava bawarmendda dîsa wê yekê bike, çi ku kevirê krîpton hindava Sûpêrmên da kir, hetanî gîhandina mirinê jî. Bi vî cûreyî jî Pawlos, çawa bavê ruhanîyî ku hiz dike, derheqa hukumê kevirê ruhanîyî krypton da çawa eşaretîyê dide civîna Korintîyê, usa jî dide me.

## Eşaretîya berk

Tiştê ewlin, çi ku derheqa van parên nivîsarên pîrozda gerekê bidine dîyarkirinê, ev eşaretî ye. Pawlos nabêje: “Eva menîya *tek-tenê ye*, wekî ji we gelek meriv zeyîf û nexweş in û hinek jî serbara-serda mirine”. Bi gilîkî mayîn gotî, ew nabêje, wekî hemû tengavî, nexweşî û mirin rûyê gunehê da nin. Gelek cara, em, bawarmend, halê dijwar ra şerkarîyê dikin, çimkî em dinîya ketîda dijîn, û qewatên tebyetê û ji wê der hene, dijî kîjana em gerekê derbikevin.

Mînak, carekê Îsa û şagirta merivek dîtin, yê ku ji roja bûyîna xweda destpêkirî kor bû. Şagirta pirsîn: “Kê guneh kirîye, eva gunehê dê û bavê wî ye, ku kor ji dîya xwe bûye?” /Yûhenna 9:2/. Bi gotina wana ev meriv tenê dikaribû rûyê gunehê da nava vî halîda bûya.

Îsa carekêra bersiv da: “Ne ewî guneh kirîye, ne jî dê û bavê wî”. Îsa lez ev fikirdarîya şaş înkar kir. Hemû nexweşî, zeyîfî û mirinên ji wede zûtir tenê encamên gunehê nînin.

Hema rûyê vê fikirdarîyêda bû, wekî Yêlîpas, Begdad û Sopar Hob rexne

dikirin. Anegorî gunehkarkirinên wana, menîya zêrandinên Hob gunehên wî bûn /binihêre Hob 5:17, 8:4-6,11:13-15, 22:1-11/. Feqet pêşîya tengavîyên Hob Xwedê got: "Yê mînanî Wî li ser vê dinîyayê tune, merivekî kamil û rast, yê ku ji Xwedê ditirse û ji xirabîyê dûre" /Hob 1:8/. Zêrandinên Hob gunehê yan jî qelpyîêva girêdayî nîbûn. Xwedê hinek wede deng nekir, lê paşê Yêlîpasra got: "Ez li ser te û li ser her du hevalên te hêrsketî me, çimkî we derheqa Min da rast xeber neda /Hob 42:7, NLT/. Wextê ku Xwedê usa raber dikin, ku tê bêjî Ew bona gunehê kesekî wî ceza dike /ew yek bi rastî usa nîne/, ew tişt gunehkarkirina dijî xeysetê Wî ye.

Çend sal pêşda, wextê ku ez ji nûva bibûme bawarmend, nava doranên gelek civînada gelek meriv gunehkar hesab dikirin, eger wana tengavî didîtin. Ev fikirdarî hela hê heye, feqet ew hela hê awqasî belavbûyî nîne, çawa ku berê bû. Hînbûna nivîsarên pîroz û usa jî rêberên baş bi piranî ev şaşî ji civînê dane dûrxistinê. Rûyê fikirdarîya vî cûreyî da hinek meriv bi cûrê xeyid nêzîkî me dibûn, yên ku bi gunehkarkirinê û hiznekirinêva tijîbûyî bûn. Bixabin, vê hînkirinê hinek meriv ji bawarîyê dûrxistin.

Ji alîkî mayînva jî, em usa jî gerekê xeberên Îsa bîr bînin, yên derheqa wî merivî da, yê ku ji zeyîfîya 38-sala qenc bû: "Binihêre, tu qenc bûyî! Îdî guneha neke, wekî tiştekî hê xirab neyê serê te" /Yûhenna 5:14/. Em wê yekê înkar nakin, wekî bi xeberên Îsa, guneh derî bona encamên giran û tengavîya vedike. Îsa awqasî ew meriv hiz kir, wekî emirê Xwe bona wî da. Û Ewî bi hizkirina Xwe ya mezin eşaretî da wî.

Hizkirina meye rast tune, eger em ji eşaretîya direvin. Bi qedexekirina her tiştî, yê ku dikare çawa tiştê xirab, yê gunehkarkirinê bê hesabê, em gelek cara dikevine nava halekî giran, qet eşaretîyê nadine meriva. Feqet, em hela hê nava halekî usa da nin, derheqa kîjanîda Pawlos anî ber çava: gelek bêqewat in, nexweş in û ji wede zûtir dimirin. Gelo ev e hizkirin? Gelo fikirdarîya rast ev e?

Bersivên me bona meriva hene, lê em wana nadine kifşê, çimkî em naxwezin şaş bêne femkirinê. Werin em bêqelp bin. Hizkirina me berbi çi ye? Gelo hizkirina me berbi civînê ye? Gelo em rastîyê bona meriva terîf dikin, çawa ku ew yek Îsa û Pawlos dikirin, yan em li ser şexsê xwe û navê xwe merkez bûne û ditirsin piştgirên xwe unda bikin, yan ji alîyê wan da şaş bêne femkirinê?

## Şuxulkarîya min

Nava salên qulixêye ewlin da min her dem piştgirîya hemûya dikir. Min gelekî nêzîkbûna baş hindava merivên dor-bera dida kifşê. Ez ji rû bi rû sekinandinê direvîm, çawa ku ji nexweşîya xirab meriv bireve. Carna bona wê yekê min

derew dikirin, û dewsa wê yekê min dest pişta wan dixist. Hemûya derheqa Con Bîvêr da digotin: “Ew awqasî qenc e. Ew nava temamîya civînêda şexsê herî hizkirî ye”. Xeberên wana dighîştine min û şabûneke mezin didane min.

Carekê, wextê duakirinê, Xwedê minra got: “Meriv dibêjin, wekî tu li civînê ew şexsî, yê ku ji hemûya zêdetir hiz dike, rast e?”.

“Belê”,- min bersiv da. Ez difikirîm, wekî ew yek li Xwedê xweş dihat, lê ew yek, çawa ku Ruhê Pîroz ew pirs da min, dida kifşê, wekî Ewê tiştekî lap başqe bigota min.

Ew çi ku min bihîst, xemgînîya min îzbat kir. Ewî got: “Kurê min, tu merivên vê civînê hiz nakî”.

Min zendegirtî bersiv da: “Çi? Ez wana hiz dikim û hema ew jî derheqa wê yekêda dibêjin”.

Ewî berdewam kir: “Tu zanî, ku tu tenê bona çi gotinên baş dibêjî wan meriva?”.

“Bona çi?”,- min fesal pirsî.

“Çimkî tu ditirsî, wekî ewê te înkar bikin”,- Ewî got.

Ez nişkêva şidîyam. Ez tevî hev bûm û xeberên min tune bûn, ku min bigota.

> “Eger te bi rastî meriv hiz bikirana,- Ewî berdewam kir,-teyê rastî bigota wana, eger te  bizanibûya jî, wekî diqewime ewê gotina te, yan jî hema te înkar bikirana”.

Ew dem bona min hema yê welgerandinê bû. Ez carekêra hatime guhartinê, lê ez derbazî tiştekî mayîne xirab bûm. Niha jî min rastî digot, lê ew yek bêyî nermayê û rehmê dikir, çimkî dilê min da tiştê herî sereke tune bû, *hizkirina rast*. Wî çaxî ez digerîyam û min terîf dikir. Min li civînên biçûk qulix dikir, lê mixabin, min berxa dixist. Wextê ku min paşda dinihêrî, ez bona wan meriva û serwêrên wan xemgîn dibûm, yên ku mecbûr dibûn bêterbyetîyên min bidana rastkirinê, çimkî ez berk bûm û min piştgirîya wan nedikir.

Sala 2OO1-ê, min hemcivîneke mezin da qulix dikir, ya ku civîneke Avropaêye mezinda derbaz dibû. Piştî çend meha, ji merivên ji sê parçên dinîyayê ez pê hesîyam, wekî serwêrê wê civînê gotibû rêberên hukumdar, wekî ez gelekî berk bûm û min berxa dixist. Ew yek rast bû.

Wê behsê li cem min gumanbirî pêşda anî û ez dame li ser çoka. Min dua dikir, diha zêde min dikire qîrîn, bona ku Xwedê dilê min bi hizkirina Xwe û rehma Xwe ya hindava cimeta Xwe da tijî bikira. Û Ewî bersiv da min. Cara ewlin nava jîyana xweda min fem kir, ku hizkirina wan merivaye rast kîjane, bona kîjana min qulix dikir.

## Ne ku hinek meriv, lê gelek

Vê yekê bîra xweda xweyî bikin: Pawlos civîna Korintiyê hiz dikir. Derheqa vê yekêda xeberên wî şedetiyê didin: “Bona çi?. Çimkî ez we hiz nakim? Xwedê zane [wekî ez hiz dikim]” /B Korintî 11:11/.

Nava beşeke hema wê namêda, ew dinivîse: “Çimkî min bi gelek hêsira, bi gelek keder û kesera dilê xwe wera nivîsî, wekî hûn ne ku li ber xwe bikevin, lê wekî wê kûraya hizkirina min ya hindava xweda fem bikin” /B Korintî 2:4/. Vê civînê ew fem nedikir. Bi fikira wana, rastkirin û eşaretîyên wana nîşana tunebûna hizkirinê bûn û bêyî şikberî diqewime qewimandinên wî cûreyî him li civînê û him jî li cîhên başqe hebin. Gelek mînanî min berk, hişk û sert in, bêyî hizkirinê û rehmbûnê ne. Diqewime merivên wî cûreyî hukumdar in û elametîyên berk belav dikin, feqet ew yek ji xwestina rastbûyînê pêşda tên. Gelek meriv bûne qurbanîyên serwêrtîya wî cûreyî. Feqet ev yek nade kifşê, wekî her rastkirin û eşaretîk wî cûreyî ye. Gotinên Pawlos carina hukum dihiştin, didane rastkirinê û berk bûn, feqet ew ji dilê bi hizkirinêva tijî dihatin.

Diha dereng, hema wê name da Pawlos dinivîse: “Ezê bi şabûn xwe û temamîya hebûna xwe bona we xerc bikim, nenihêrî wê yekê, wekî tê texmînkirinê ku çiqasî zêde ez we hiz dikim, hûn awqasî hindik min hiz dikin” /B Korintî 12:15, NLT/. Acizîya wî ber çeva bû. Hizkirina wî, xemgînîya wî ya kûr, bi pêşkeftina wana, şaş dihate femkirinê, û wana destpê kiribû çawa rêberê berk wî qebûl bikin, yê ku wa gotî, dixwest wana dorana qanûna da xweyî bikira.

Dêmek, ez hîvî dikim, ku hûn fem bikin, wekî nenihêrî wê yekê, ku gotinên Pawlose giranbiha yên derheqa menîya bona zeyîfîya, tengavîya, pirsgirêkên saxlemîyê û  mirinên ji wede zûtir gelekî berk bûn, lê ew ji hizkirina hindava wan meriva da dikişîyan.

Gotina wî wê diha hêsa bihata qebûlkirinê, eger ewî binivîsîya “hinek”, lê ewî mexsûs da kifşê “gelek”. Em çawa dikarin vê rastîyê hesab hilnedin, kîjanê ew mera eyan dike? Eger ew yek derheqa wan da bû, gelo ew yek usa jî derheqa meda nîne? Gelo Ruhê Xwedê wê derheqa wê yekêda Kitêba Pîroz da binivîsîya, eger ew awqasî qewimandineke cuda bûya? Ew xeber roja îroyîn derheqa me da nin? Caba vê pirsê, bêyî şikberî, belê ye.

Û ya dawî, nava vê beşê da Pawlos derheqa qebûlkirina tevgirêdana li civînê da xeber nade. Nava vê beşê da hela hê tiştên zêde hene, û ji me geleka /usa jî ez, bi sala ser hev/ bi temamî ew yek fem nekirine. Emê fikira xeberên wî, diha bi kûrayî, nava serê kitêbêyî mayîn da lêkolîn bikin.

## gava praktîk

Careke mayîn destpêka vî serê kitêbê bixwînin, bona ku hûn potênsîyala xwe bîr bînin. Wê elametîyê bîr bînin, ya ku navê we dide tomerîkirinê: "Çawa ku Ew e, usa jî em in li vê dinîyayê" /A Yûhenna 4:17/. Hûn ji Xwedê hatine gazîkirinê, bo ku roja îroyîn mînanî Îsa bijîn, lê ne ku jîyana mayîn da.

Ev yek fikirdarîya we ye derheqa jîyana roja îroyîn da çawa diguhêre? Diqewime berê, wextê ku we hela hê qewata xweye nava Xwedê da fem nedikir, hûnê nefikirîyana ku hûn zeyîf in. Feqet, niha, wextê ku hûn wê yekê fem dikin, hûn xwe hesab dikin zeyîf, yan qewat? Eger bersiva we "zeyîf e", usa ye we qîmetekî aqil daye xwe. Çimkî Xwedê dibêje, wekî zoraya Wî nava zeyîfîya me da dişuxule /binihêre B Korintî 12:9/.

Xwedê wê zeyîfîyên me werguhêzî qewatê bike, tenê wî çaxî, eger em li ber Wî ta bin /binihêre A Petrûs 5:5/. Hîvî ji Xwedê bikin, ku Ew derheqa menîyên zeyîfîya weda bêje we. Wan menîya binivîsin û hîvî ji Wî bikin, ku Ew nîşanî we bide ku hûn çawa ji wana azad bibin. Wede başqe bikin û gotinên Xwedê yên derheqa guhartina  her zeyîfîkê da binivîsin.

3

# YEK

Careke mayîn xeberên Pawlose bona civîna wî ya hizkirî bixwînin:

> "Lema, bila meriv pêşîyê dilê xwe binihêre û paşê ji wî nanî buxwe û ji wê kasê vexwe. Çimkî eger hûn vî nanî dixun û vê kasê vedixun, *bêyî qedirgirtina bedena Mesîh*, hûn dîwana Xudan li ser xwe dixun û vedixun. Lema jî nava we da gelek nexweş û zeyîf hene û hinek jî îdî mirine. Lê eger me dîwana xwe bikira, dîwana meyê ji alîyê Xwedê da nehata kirinê. Feqet, wextê ku dîwana me ji alîyê Xudan da tê kirinê, em tên şîretkirinê, wekî dîwana me tevî dinîyayê nebe" /A Korintî 11:28-32, NLT/.

Nava vî serê kitêbê da emê guhdarîyê bidine ser xeberên "bêyî qedirgirtina bedena Mesîh'". Nava vê beşê da du tişt hene, yên ku hewaskarîya raste-rast raber dikin, kîjana ez dixwezim bidime kifşê. Ya ewlin ew e, wekî gotinên wî bona merivên başqe nîbûn. Li wê civînê ew berbirî hemûya dibû, dêmek gotina wî bona hemû bawarmendên bajarê Korintîyê bû.

Nava çend dehsalîyên derbazbûyî da me guhdarîke mezin danîye li ser heleqetîyên şexsîye tevî Îsa Mesîh. Bêyî şikberî, eva alîkî mesîhîtîyêyî gelekî girîng û rast e. Feqet, me hema awqasî jî guhdarî nedaye li ser rastîya derheqa bedeneke tomerî, wê yekê, wekî em hemû jî nava Mesîh da yek in. Tiştekî girîng e, wekî herdu rastîya jî gerekê bêyî hesabhilnedana yekê, yan jî ya mayîn hesb hildin.

Ya duda, nava tercima Încîlê ya "Nor Kîng Cêymsê"-da ev gotin hinekî bi cûrekî mayîn hatîye nivîsarê. Li wir nivîsar e, wekî menîya zeyîfîya, nexweşîya û wefatbûna gelekaye ji wede zûtir ew e, wekî ew "bedena Xudan" tê dernaxin"

/Xeber 29, NKJV/. Wextê ku her du tercima tevayî lê dinihêrin, wî çaxî gotina Pawlos diha zelal dibe.

Bona femkirina vê beşê, em gerekê nava kitêba A Korintîya da serîkî paşda herin û gotina Pawlose derheqa Îsraêl da, ku çawa ji Misirê azad bûn û nava qûmistanêda bûn, bixwînin. Nîvê serpêhatîya xwe da ew dinivîse, ku bona çi derheqa vê yekê da tîne bîra korintîya: "Ew tişt hatine serê wan û bona me bûne mesele. Ew hatine nivîsarê, ku *eşaretîyê bidine me*, yê ku dawîya sedsala dijîn" /A Korintî 1O:11, NLT/. Pawlos dersa dîrokê nade: ew eşaretîya wedê niha dide, bona ku me ji dîwana jorin biparêze.

Şandî derheqa cêribandina Îsraêl da, ya li qûmistanê gilî dike. Berê ewlin derheqa wî hemû tiştîda tîne ber çava, çi ku Xwedê li ser hîmê peymana Xwe bona wana dikir. Ew dibêje, wekî *hemû* jî bi Ruhê Xwedê va dihatine rêberkirinê, *hemû* ji Misirê xilaz bûn /ya ku sîmvola dinîyaê ye/, *hemû* hatine nixumandinê /em nava bedenekêda hatine nixumandinê/, *hemû* dîsa xwerina ruhanî xwerin, û *hemû* ew ava ruhanî /Xebera Xwedê/ vexwerin: vê beşê da xebera "hemû" ekşere tê dîyarkirinê. Peyî wê yekêra ew dide tomerîkirinê, dibêje, wekî ew hîmê ku tevî wan diçû Mesîh bû. Gotina wî ber çeva ye: ew bedenek bûn û yên Xwedêkî bûn, Yê ku tevî wan peyman mor kiribû û ew peyman xweyî dikir. Li vir em mînakên eşkere tevî bedena Mesîh dibînin.

Paşê Pawlos bi berxweketin dinivîse: "Xwedê ji wana gelek begem nekirin, û bedenên wan nava qûmistanêda belavbûyî bûn" /1O:5, NLT/. Xwedê bi kûrayî me diha zêde hiz dike, ne ku em dikarin wê yekê bînine ber çavê xwe. Rastî ew e, wekî emê tu cara nikaribin tu tiştî bikin, eger em Wî mecbûr bikin, ku Ew me diha zêde, yan jî diha kêm hiz bike. Bi zanebûna vê yekê, gelekî girîng e bidine kifşê, wekî em bona wî tiştî cabdar in, ku bi çiqasîva Ew me begem dike, yan bi çiqasîva em li Wî xweş tên. Awa ev e menî, wekî Pawlos nava xebereke mayînda dibêje, wekî "meremê me razîkirina Wî ye" /B Korintî 5:9, NLT/. Eva gerekê bibe meremê sereke, yê we, min û her bawarmendekî.

Bona çi ew merivên ku hêna peymana Kevin dijîtin, mirin, neketine nava wan soza, yên ku Xwedê dabûne wana. Pawlos pênc guneha dide dîyarkirinê, yên ku bûne menîya ketina wana. Xwestina xirabîyê /ew xwestin, çi ku ji Xwedê nîne, yan jî nakeve nava dayîna Wî/, pûtparistî, zinêkarî, cêribandina Xwedê û nerazîbûn. Piştî çend gotina Pawlos dinivîse:

> "Hûn merivne serwaxt in. Hûn bi xwe bidine ber hesaba, ku gelo ew tiştê ku ez dibêjim rast e? Wextê ku em kasa sivira Xudan dua dikin, gelo em xwîna Mesîh pareve nakin? Û wextê ku em nan ker dikin, gelo em bedena Mesîh pareve nakin? Û nenihêrî wê yekê,

> ku *em gelek in*, em hemû jî ji nanekî dixun, didine kifşê, wekî *em bedenek in*. Dîna xwe bidine cimeta Îsraêlê. Ne axir ew *yek*bûn, wextê ku wana dora sivira qurbanê qurbanî dixwerin" /A Korintî 1O:15-18, NLT/.

Nava vê beşê da Pawlos careke mayîn derheqa Şîva Xudan, yan jî heleqetîyê da xeber dide û diha bi cûrê tomerî wê pirsê dide kifşê, derheqa kîjanêda nava serê 11-da, ya A Korintîya da tê gotinê, derheqa ji *hevderxistina bedena Xudan.* Ew qebûl dike, wekî civîn ji gelek şexsa ye, û her kes bi destî Îsa Mesîh tevî Xwedê nava heleqetîyada ye. Feqet, bi gilîkî mayîn, bona Xwedê em *yek in*. Eva gotina Pawlose sereke ye. Em *bedena* Mesîh in: *em yek in*, mînanî Îsraêl.

Dêmek, em gerekê pirsê bidin: "Gelo dîwana zeyîfîyê, nexweşîyê û mirina ji wede zûtir derheqa her bawarmendekî da ye, yê ku guneh kirîye, yan encamên wê rûyê kirinên çend endamên wêda li ser hemû bedena Mesîhe li Korintîyê bûn? Hûn min şaş fem nekin: ez dixwezim zelal bidime kifşê, wekî bona gunehê bi zanebûn kirî encamên şexsîye giran hene. Feqet, niha em gerekê guhdarîyê bidine ser wê rastîyê, ya ku Pawlos eyan dike. Ew çawa beden, çawa civîn, çawa cimetek, berbirî wana dibe.

Li vir, gilî derheqa bedena Mesîh ya li bajarê Korintîyê da ye.

## Kirina ji timaya merivekî pêşdahatî

Em paşda vegerine li ser îsraêlîya, yên ku bona me mînak in. Feqet em nisiletekê pêşda herin û derheqa wê cimetê da, ya ku ji alîyê Yêşû da dihate rêberkirinê, xeberdin. Ev bedena bawarmenda bi mêrxasî çemê Ûrdunêra derbaz bû û çû berbi welatê bona wan sozdayî. Wana pêşîyê gerekê bajarê Erîhayêyî mezin tune bikirana. Tê bêjî ew yek tiştê bûyînê nîbû, lê Xwedê careke mayîn qewata Xwe da kifşê. Xwedê teslîmkirinên zelal da Yêşû, ji kîjana yek jî ev bû:

> "Erîha, û di nava wêda çi heye, gerekê bi temamî çawa qurbana Xudan bê tunekirinê…Tu tiştî ji wir hilnedin, çi ku bona tunekirinê hatîye başqekirinê…Ew hemû tiştên, ku ji zîv, zêr, sifir û hesin çêkirîne, gerekê bona Xudan pîrozbin, gerekê wana bibine xizna Wî" /Yêşû 6:17-19, NLT/.

Talanê Erîhayê gerekê bi temamî pêşkêşî xizna Xudan bikirana. Ew bi temamî yên Wî bûn, û tu beşeke wan tişta gerekê bona kara tu kesî qulix nekira.

Êrîşkirin destpê bû, û îsraêlî neditewîyan. Wana hemû kesên li wî bajarî şûrra derbaz kirin, jin û mêr, cahil, kal û pîr, heywanên li wir. Paşê wana bajar bi

temamî şewitand û hemû tiştên li wir, xêncî eşîyayên ji zêr, zîv, bronzê û hesin çêkirî, yên ku bona xizna Xudan hatine xweykirinê. Tiştê ecêbmayînê ye, wekî ji Îsraêlya tu kes nehate kuştinê, ne jî birîndar bû.

Em gerekê bîr bînin, wekî Erîha ji wan bajara bû, li kîderê nisileta pêşîyê cesûsî kiribû, û derheqa kîjanîda wana gotibû Mûsa: “Ew cimeta, ku li wî welatî dijî, gelekî qewat e û dora bajara sûr in û gelekî mezin in” /Jimar 13:29/. Zarokên wê nisiletê, yên ku îdî mezin bibûn, êrîş birine li ser bajarê sûrkirî û bi temamî ew wêran kirin, qet merivekî ji eskerê Îsrayêlê jî nehate kuştinê. Îsrayêl bi qewata nebînayîva bû. Paşê nivîsar e: “Feqet Îsraêlê gotinên Xudane derheqa eşîyaên cudakirî da teribandin. Merivekî bi navê Ekar ji wan eşîya çend heb dizîn û Xudan li ser îsraêlîya gelekî hers ket” /Yêşû 7:1, NLT/.

Guhdarîyê bidine ser, wekî nivîsar nîne: “Feqet *merivekî bi navê Ekar* gotin teribandin”. Na xêr, lê nivîsar e: “Îsraêlê gotin teribandin”. Lê tiştekî hewaskar e, wekî careke mayîn nivîsar e: “Xudan li ser îsraêlîyagelekî hêrs ket”. Nivîsar nîne: “Xudan gelekî li ser *Ekar* hêrs ket”. Îsraêl yek bû, û wextê ku endamekî guneh kir, rûyê timayêda gotinên Xudan teribandin, cabdarî kete li ser temamîya Îsraêlê.

Encamê wê kirina tragîk zûtirekê zelal hate kifşê. Bajarê bi sirê, yê ku gerekê bihata dagirkirinê, bajarê Ayê bû. Ew diha gelekî biçûk bû û rêbera gotin: “Temamîya cimetê bila neçe: tenê qasî du, yan sê hezar meriv bila herin, û derbê bighînine Ayê: temamîya cimetê nebine li wir û nedine xebatê, çimkî ew hindik in. Û ji cimetê nêzîkî sê hezar merivî çûne li wir” /Yêşû 7:3,4/.

Nava şerê Erîhayêda nêzîkî şêst hezar leşker hebûn. Ev yek dide kifşê, ku bajarê Ayê himberî Erîhayê çiqasî biçûk bû. Feqet, nivîsar e:

> “Feqet, merivên Ayê li pêşîya wan derketin. Û merivên Ayê 36 merivên wan xistin, dane peyî wan hetanî Sêbarîmê û li ser pêberjêr wana xistin” /Yêşû 7:4,5/.

Gelo hema eva ew cimet nîbû, ya ku nava wedekî kurtda bajarê diha hukumdar û diha girîng, Erîha, wêran kir û tu kesekî wan jî nehate kuştinê? Feqet, leşkerên îsraêlî zeyîf bûn, paşda vekişîyan û bin ketin. Ew ketibûne bin hukumê kevirê krpîton.

Mixabin, 36 meriv hatibûne kuştinê, lê li Erîhayê ew zeyîf nîbûn, tu kes paşda venedikişîya û tu kes birîndar nebû û nehate kuştinê.

Werin em derheqa vê yekêda bifikirin. Ekar guneh kir, lê zyan negihîştîye ne li wî, ne jî li malbeta wî. Feqet, piştî şerê bajarê Ayê kurên hevtêdû dê û bava paşda venegerîyane malê, 36 jin bê mêr man û gelek zarok bêbav man. Ew

yek rûyê kur, mêr û bavada qewimî: wana guneh nekiribûn, ew yek rûyê kirina mêrekî malbeteke mayîn da qewimî.

Îsraêl ji tirsê zirav lê qetîyabû. Yêşû û hemû rêberên mayîn deverû ketine ber Xwedê. Hûn dikarin bînine ber çavê xwe. Ew şaşbûyî bûn, tevîhev bibûn û kirine qîrîn: "Bona çi te ev cimet derbazî vî alîyê

Ûrdunê kir, ku me teslîmî destê Amorîya bikî, û me unda bikî?" /Yêşû 7:7/.

Niha bibihên bersiva Xwedê: "Rabe! Bo çi tu deverû ketî. Îsraêl guneh kir, û peymana Min teriband" /Yêşû 7:1O,11/.

Xwedê nabêje: "Nava weda merivek heye, yê ku guneh kirîye". Na xêr, Ew careke mayîn elam dike: "Îsraêl guneh kir". Tu kesî nizanibû, wekî Ekar guneh kiribû. Tu kes tevî timaya wî nebibû. Feqet, temamîya cimetê çawa bedenek, ji kevirê krypton, yê Ekarî ruhanî, zyanê ket. Yêşû ewê ku guneh kir dît û dijî wî derket. Ekar got:

> "Bi rastî, min li ber Xudan Xwedêyê Îsraêlê guneh kir, min wa û usa kir, dêmek, nava wî talanîda min potekî Sênaarêyî baş û dusid şêkêl zîv û zimanê zêrekî giranîya pêncî şêkêlî dît û bi xwestin hilda" /Yêşû 7:2O,21/.

Yêşû û rêbera kirina Ekar lez ceza kirin û peyî wê yekêra hatîye nivîsarê: "Û Xudan bi hêrsa xweye mezin sekinî" /Yêşû 7:26/.

## Mînakek

Ev qewimandina peymana Kevin banga Pawlose bona civîna Korintîyê şirove dike. Ew dinivîse: "Awa, ku bona çi ji we gelek zeyîf û nexeweş in û hinek jî mirine". Nava serê kitêbêyî bi sirêda emê bibînin, wekî gunehê ji alîyê çend merivada kirî hukumî li ser temamîya civînê dikir, ne tenê li ser gunehkara.

Gelo li cem we pirs pêşda hatîye derheqa wê yekêda, ku bona çi gelek bawarmendên nava civînên meda zeyîf in, bona çi her dem ji nexweşîya û zeyîfîya dizêrin? Ew merivên giranbiha ji gunehên xwe nikarin qenc bin, lê hinek jî ji wede zûtir dimirin. Gelo menî çi ye, wekî nava olên civînên meda awqas gelek dayîkên tenê hene, yên ku bi çêkên xurek dijîn û bi dijwarî dikarin hewcetîyên xwe çareser bikin? Bona çi awqas gelek bawarmend bêxebat in, bona çi ew bi mecalên hindik dijîn û bona çi ew alîkarîya hukumatêva girêdayîne? Navnîşa van tengavîya meriv nikare bide tomerîkirinê, çimkî ew bêhesab in.

Hêna Silêmanda qet merivek jî tune bû, yê ku alîkarîya bêçarîyê distend, yan jî bêxebat bû. Kitêba Karên şandîya da tu hewcetîk tune bû û meriv lez ji nex-

weşîya û zeyîfîya qenc dibûn. Bona çi roja îroyîn ew yek naqewime? Diqewime gunehên çend meriva hukumî li ser geleka dikin? Diqewime, ku ew çi ku li bajarê Ayê qewimî, niha jî ew yek diqewime?

Girîng e ku careke mayîn bidine kifşê, wekî gunehê bi zanebûn kirî encama pêşda tîne. Bi kutasî, Ekar li ber dîwanê sekinî, lê rûyê gunehên wîda temamîya Îsraêlê kevirê ruhanîyî krîpton ket. Ez gumanim, wekî hetanî ku em berdewam dikin vê yekê bidine eşkerekirinê, femdarîya derheqa wê yekêda, wekî hûn endamê bedenêne, wê zêde bibe û wê diha qewat bibe, çiqasî femdarîya derheqa wê yekêda, wekî heleqetîyên weye şexsî tevî Îsa hene, û hûnê fem bikin, wekî kirinên we, çawa endamên bedenê, yan dikarin duakirina bînin, yan jî dikarin encamên xirab bona endamên bedenêye mayîn bînin.

Hetanî xilazkirinê, ez dixwezim careke mayîn bidime kifşê, wekî rastîyên ku aza dikin, dikarin gelek cara xirab bêne texmîkirinê, û pirsek dikare bi hêsanî bikeve nava fikira me: “Gelo hêja ye ku derbazî vê têmayê bibin?”. Lê wextê ku rastî eyan dibe, ew aza dike û azayê tîne li wir, li kîderê berê dijwarî hebû.

Çawa ku Îsa got: “Û rastîyê nas bikin, û rastî wê we aza bike” /Yûhenna 8:32/.

## gava praktîk

Diqewime we fîlma “Gladîyator” temaşe kirîye û tê bîra we, ku çawa gênêral Maksîmûs kire gazî: “bi hevra bin, mînanî merivekî”, û we serkeftinên stratêgîyayê dîtin. Tiştê veşartinê nîne,wekî stratêgîya leşkerî ya here kardar “parçekirin û dagirkirin e”. Îsa eva baş zanibû: Ewî hîn dikir, wekî mala parçebûyî wê sekinî nemîne /binihêre Metta 12:25/. Wextê ku bedena Mesîh rûyê tunebûna xwepêşkêşkirinêda parçebûyî ye, ew çawa yektîke tam zeyîf dibe. Usa ye, tiştê herî mezin, kîjanî hûn dikarin bi masştaba hemdinîyayê hukumî li ser civînê bikin ew e, ku hûn xwe bi temamî pêşkêşî karên Îsa bikin, çi jî dide kifşê ku hûn karên xweye herroje çawa hebandin pêşkêşî Xwedê bikin.

Xwedê temamîya emirê we dixweze, lê ne ku tenê şebeqên roja yekşemê. Eger hûn temamîya jîyana xwe najîn /xebat, malbet, kirinên weye hizkirî û tiştên weye mayîn/ çawa hebandina Xwedê, usa ye îro tobe bikin. Ji Îsa hîvî bikin, ku Ew nîşanî we bide, ku jîyana bawarmend bona we dikare çi cûreyî bibe. Wî hemû tiştî binivîsin, çi ku Ew nîşanî we dide, yan jî dibêje we. Hîvî ji Ruhê Xwedê bikin, ku ji nûva we tijî bike û bi temamî jîyana xwe pêşkêşî Wî bikin.

# 4

# KEVIRÊ KRÎPTONÎ ÎNFÊKSİYON

> “Ew yek, ku çawa Xwedê bedenên me çêkirine, meseley e, bi kîjanê em dikarin jîyana xweye tevayî, çawa civîn, fem bikin” /A Korintî 12:25 MSG/.

Derheqa bedena xweda bifikirin: hemû parçên bedenê hevva girêdayîne, usa jî wî çaxî, eger ew parçe li rex hev nînin. Pêçîya nigê we pozê weva girêdayî ye, cegera we mezmezkê piştêva girêdayî ye û tiştên mayîn. Parçekî bedenêyî usa tune, yê ku dikare bêyî yên mayîn bijî. Bi cûrekî mayîn gotî, ewê parçê bedena we nîbûya.

Wextê ku parçekî bedena we diêşe, gelo endamên mayîn tevî wî nazêrin? Eger meriv persimê yan jî vîrûseke başqe dikeve, wî çaxî nexwaşî hukumî li ser temamîya bedenê dike, medê mêriv tune, qewat kêm dibe, fikir tevî hev dibin. Lê eger parçekî bedenê tê qedirgirtinê, yên mayîn şa dibin. Wextê ku pişta mêriv, yan jî serî miz didin, beden bi temamî sivikayê û razîbûnê dest tîne: ew yek li temamîya bedenê xweş tê.

Çawa civîn em yek in. Îsrayêl bona me çawa mesele ye, ew yek bû û gunehê Ekarî bi zanebûn mîyaserkirî ne tenê hukumî li ser wî, lê usa jî li ser temamîya milet kir. Eskerê Îsraêlê wextê şerê dijî Erîhayê ser ket, lê piştî çend roja hema ew esker zeyîf bû, bin ket, paşda vekişîya û zyanê ket. Bi fikireke mayîn, milet kete bin hukumê kevirê krîptonî ruhanî. Gelo hema ew yek li civîna Korintîyê jî nîbû? Lêkolîna diha bi hûrgilî bersiva wê yekê eyan dike.

Çawa ku min îdî da dîyarkirinê, li civîna ewlin şîva Xudan bi cûrekî mayîn derbaz dibû, ne ku roja îroyîn. Hêna wanda ew diha gelekî mînanî nanxwerinê bû, lê roja îroyîn ew mînanî edet e. Dêmek, ew kirin, derheqa kîjanîda Pawlos

xeber dide, ji edetên niha gelekî cuda dibe. Feqet, tiştê herî girîng hema koka wê kirinê ye.

Pirs ew bû, wekî hinek meriv li civîna Korintîyê hîvîya hatina hemû endama nedisekinîn. Yên hatî dixwerin û vedixwerin, serxweş dibûn, xurekê herî baş dixwerin û şerab vedixwerin, lê bona yên dereng hatî bermayî diman. Ji dersdarên Încîlê û xwedêzana gelek meriv li ser wê fikirê ne, wekî wî çaxî diha zêde merivên kesîb û yên dereca nimiz nedihatine hesabhildanê. Lê niha xeberên Pawlos bixwînin:

> "Çimkî ji we *hinek* lez dikevin, xwerinê bêyî nîvîkirina tevî yên mayîn dixun. Nava encamên wê yekêda hinek birçî dimînin, nenihêrî wê yekê, wekî yên mayîn serxweş dibin…Çimkî eger hûn vî nanî dixun, yan jî vê kasê vedixun, bêyî qedirgirtina bedena Mesîh, hûn dîwana xwe dixun û vedixun. Lema jî nava weda *gelek* nexwaş û xweyîzede hene û hinek jî mirine" /A Korintî 11:21,29,3O, NLT/.

Nava gotina li jorê kifşkirîda min du xeber dane dîyarkirinê, *hinek* û *gelek*. Tiştekî kifş e, wekî Pawlos derheqa gunehê *hinekada* dibêje /xeber 21/, encamê kîjanê ew bû, wekî *gelek*nexwaş, xweyîzede bûn û ji wede zûtir dimirin /xeber 3O/. Ev yek dîsa mînanî wî halî bû, çi ku Ekar kiribû: merivên ku bi zanebûn gura gotinên xwedêtîyê nedikirin, ew ceza dîtin, yê ku rûyê gurênekirina merivekîda qewimî.

"*Stûn" Şirovekirina peymana Nû* dide kifşê:

> "Nelazim e bifikirin, wekî nexwaş û ewên ku dimirin, bi xwe guneh kiribûn, lê diqewime, wekî mînanî piranîya qezîyayên peymana Kevin, yên ku nava encamên dîwana xwedêtîyêda dihatin, ev qezîya jî, bêyî firqîdanîn hatîye li ser temamîya olê.

## Qewimandina hema wî cûreyî

Hela hê diha pêşda, nava nama bona Korintîya da, Pawlos derheqa gunehekî mayînda dibêje, yê ku dîsa hukumî li ser temamîya civînê dike. Ew dibêje: "Ez li wê besê bawar nakim, wekî di navbera weda bênamûsî heye" /A Korintî 5:1, NLT/. Ew yek vî cûreyî bû: merivekî yê ku diheband, wekî ew peyîhatîyê Îsa Mesîh bû, kurê Xwedê, nava Mesîhda bira bû û endamê bedena Mesîh bû, nava gunehê bênamûsîyêda dijît.

Lêhilatina Pawlos tenê bona wî merivê ku guneh kiribû nîbû. Temamîya ola

civînê ew hesab dikir çawa bira û endamê civînê, lê rêbera dengê xwe wîra nedikirin, lê diha rast ew yek hesab hilnedidan.

Bona çi wana kirina wî merivî hesab hilnedida? Bi texmîn, wana nedixwest ew meriv bida bêhurmetkirinê, xeydandinê. Diqewime ew meriv şexsekî hukumdar bû, nevsê dewletêyî resmî bû, sportsmênekî eyan bû, yan jî ewî pêşkêşê fînansî yên mezin didan. Bajarê Korintîyê bajarekî mezin û hukumdar bû û ew usa jî merkeza pêşekarîyêye mezin bû. Diqewime ew li “Holîwûda” wan artîstekî hizkirî bû, dengbêjekî bi nav û deng bû, sitranên kîjanî cîhên ewlin da bûn, yan jî endamekî koma civînêyî sitranê bû. Nava vê gotinêda tiştên usa nivîsar nînin, lê em dikarin texmîn bikin, wekî dûrketina wî dikaribû xirab hukumî li ser civînê bikira.

Diqewime menîyên başqe hebûn. Diqewime ew difikirîn, ku eger ew dûr biketa, ewê îdî Xebera Xwedê guhdar nekira. Diqewime ew wa difikirîn: “Diha baş e, ku ew tevî me bimîne û Mizgînîyê guhdar bike, ne ku here dinîyayê û tu tiştî guhdar neke”. Diqewime meremê wanî sereke ew bû, ku reqema merivên ku dihatine civînê kêm nebûya, feqet lêhilatin dikaribû meremê wan biteribanda. Menîke başqe jî dikaribû hebûya: “Ew mesîhîkî nû ye. Werin em wede bidine wî”. Ez gumanim, wekî gumana wan hebû, wekî ewê hemû tişt “fem bikira” û wê gunehê xwe berda.

Pawlos berbirî rêberên civîna Korintîyê dibe, ku wî merivî dûr bixin. Îzinê bidin, ku ez gotinên wî bidime rêzê:

- Hûn gerekê wî ji nava xwe dûr bixin /A Korintî 5:2, NLT/.
- Hûn gerekê wî der bixin /A Korintî 5:5, NLT/.
- Ev hevîrê kevin wêda biavêjin, vî merivê xirab ji nava xwe der bixin /A Korintî 5:7, NLT/.
- Hûn gerekê vî merivê xirab ji nava xwe der bixin /A Korintî 5:13, NLT/.

Pawlos çar cara nava vî serê biçûk da derheha vê pirsêda qedexeya berk diatîne. Derheqa vê yekêda bifikirin: nava serê pêncada, yê A Korintîyada şandî çar cara berbirî bawarmenda dibe, ku wî merivî ji civînê dûr bixin û carekê bi cûrê berk dibêje: “Wî ji nava xwe der bixin”. Gelo xebereke çiqasî berk e! Bîr bînin, wekî Pawlos ew civîn hiz dikir, lê ew meriv jî hiz dikir.

Diqewime em wê yekê bidine zelalkirinê: “Gelo ewî ew meriv hiz dikir? Ez usa nafikirim”. Feqet em zanin, wekî ewî ew meriv hiz dikir, çimkî Încîlêda tu tişt nikare bêyî menîya hizkirinê bê nivîsarê. Xwedê temamîya kitêba Pîroz daye ruhdarkirinê û Xwedê hizkirine /binihêre B Tîmotêyo 3:16 û A Yûhenna 4:8/.

Ez hîvî dikim ku bîr bînin, wekî ev emirkirin, gotin, tenê bona rêberên civîna Korintîyê nîbû, lê bona temamîya civînê bû. Pawlos bi guhdarî temî didan, wekî namên wî bona temamîya civînê bihatana xwendinê. Gelo Pawlos bona çi nava

wê pirsêda usa berk bû? Bersiv nava gotinê da ye: “Hûn fem nakin, wekî guneh mînanî hevîrtirşkekî biçûk e, yê ku nava temamîya hevîrda bela dibe” /A Korintî 5:6, NLT/. Em careke mayîn dibînin, wekî encamê wî gunehî wê li ser temamîya olê hukum bikira, lê ne tenê li ser wî merivî. Gotinên peyî wê yekêra bixwînin:

> “Ji “hevîrtirşkê” kevin azad bibin, vî merivê xirab ji nava xwe der bixin. Wî çaxî hûnê bibine mînanî hevîrê nû, yê ku bêyî hevîrtirşk hatîye çêkirinê, hûnê bibine wî cûreyî çawa ku hûn hene. Mesîh, Berxê meyî *Cejina Derbazbûnê*, bona me hate serjêkirinê. Dêmek, werin em vê cejinê ne ku bi nanê neheqîyê û xirabîyê, lê bi nanê helalîyê û rastîyê derbaz bikin” /A Korintî 5:7,8, NLT/.

Pawlos careke mayîn derheqa eleqetêda dibêje, ya ku têma wîye sereke bû. Cejina Îsraêlêye Derbazbûnê dora berxa qurbanê dihate çêkirinê, lê Berxê meyî qurbanêyî paqij Îsa bû. Çawa ku cejina Derbazbûnêye ewlin azaya Îsraêlê ya ji bindestîya Misirê dida kifşê, usa jî mirina Mesîh, ya ku fikira Şîva Xudane, azadya meye ji bindestîya guneh dide kifşê.

Cejinên mayîn jî hebûn. Cejina derbazbûnê, cejina pîrozkirina paristgehê, cejina holikçêkirinê, cejina nanê şikeva. Feqet, ev cejin sîmvolên govekên jîyana mesîhîtîyêye diha gihîştî ne.Bi cûrê zelal gotî, Cejina Derbazbûnê cejina xilazbûnê ye. Pawlos derheqa wê yekêda nivîsîye û fikira wî derheqa ketina nava padişatîya Xwedê da ye. Ew dide kifşê, wekî îzin tune Cejina Derbazbûnê “bi nanê xirab û ne bi qanûnî” derbaz bikin. Usa dertê, wekî gotina “zarokê mesîhî” şaş bû him bona wî, him jî bona me. Gelek cara bi vê fikirdarîyê ye, wekî em wî merivî, yê “ku xwe daye gunehê” em hesab hilnadin. Ev menî tiştê xapandinê û şaşbûnê ye, çimkî nava civînêda bona gunehê ku bi zanebûn tê kirinê, cîh tune /nava serîkî kitêbêyî mayînda ezê firqîya di navbera “gunehê ku bi zanebûn tê kirinê” û “ketina nava guneh” şirove bikim/.

Ya duda, guhdarîyê bidine li ser vê yekê: Pawlos dibêje, wekî gunehê vî merivî mînanî hevîrtirşk e. Hevîrtirşk tiştekî usa ye, wekî nava temamîya hevîrda bela dibe û hevîr bilind dike. Girêdayî cejina Derbazbûnêra, eşaretîya berk bona Îsraêlê hatîye dayînê: “Roja cejinêye ewlin, her tiştekî ku hevîrtirşk pêra ye ji malên xwe derxin. Her merivekî ku nanê bi hevîrtirşk çêkirî nava van hevt rojên cejinêda duxwe wê ji civaka Îsraêlê bê *raqetandinê*” /Derketin 12:15, NLT/. Xebera “raqetandin” mînanî emirkirina Pawlos zelal e. Xwedê ev yek kir, ku bide kifşê, ku him Îsraêl û him jî em, wextê ku em tevî Wî dikevine nava peymanê, tu kesekî nava ola meda nikare “li gunehê teslîmbûyî be”. Ew meriv, nava jîyana kîjanada gurênekirina hindava Xebera Xwedê da, ya ku bi zanebûn e û berdewam dibe heye, gerekê tobe bikin. Eger usa nebe, ewê hevîrtirşkê gunehê û

encamên wê tevî xwe bînine civîna olên xwe.

*"Stûn" Şirovekirina peymana Nû* dide kifşê:

> "Pawlos dibêje /bi rêya peyîhevhatina fikirên xeberên yûnanî/, wekî eger xirabî neyê sekinandinê, ewê hêdî, lê bi cûrê qewîn, bi destî beşeke civînêye "biçûk û diqewime bi destî merivekî nava temamîya ola civînêda belav bibe. Mesela bi zanebûn gunehkirin dikare encamên mezin nava civînêda pêşda bîne. Mînanî hevîrtirşkê nava nanda, gunehê ku nehatîye sekinandinê, nava temamîya civînêda belav dibe û civînê dide guhartinê".

Nava vê şirovekirinêda ezê tenê tiştekîra qayîl nîbûma. Bi lêkolînkirina hevîrtirşk, min dît, wekî ew *hêdî-hêdî* belav nabe: ew *lez* belav dibe. Feqet, bêyî şikberî, ev şirovekirin bi rastî dide kifşê, wekî ew bi *cûr*ê qewîn nava temamîya ola civînêda belav dibe.

Gelo ev yek dide kifşê, ku her merivekî ku bi zanebûn gunehê dike, em gerekê qedexe bikin ku ew tevî berevbûnên me nebe? Bêguman, na. Wextê berevbûnên me gerekê gelek merivên bêbawar hazir bin, lê ew gerekê endamên civînê nîbin, û ne jî gerekê bifikirin, wekî ew *endam in*, çimkî wana hela hê bona gunehên bi zanebûn kirî tobe nekirine û jîyana xwe bi temamî nedane Îsa Mesîh. Pawlos zelal derheqa vê yekêda dinivîse:

> "Min pêşda wera nivîsî, min temî dabû we, ku hûn tevî wan meriva nekevine nava pêwendiya, yên ku xwe didine gunehê bênamûsîyê. Feqet min derheqa *bêbawarada* nedigot, yên ku xwe didine gunehê bênamûsîyê, yan tima ne, yan meriva dixapînin, yan jî pûtparist in. Hûnê mecbûr bûna ji vê dinîyayê dûr biketana, bona ku ji merivên wî cûreyî birevîyana" /A Korintî 5:9,1O, NLT/.

Bona me, peyîhatîyên Mesîhra, hatîye gotinê ku nava dinîyayêda bigerin, bighîjine merivên vê dinîyayê û wana teglîfî berevbûnên me bikin, bona ku ew guhdarîya Xebera Xwedê bikin, lê ne ku derheqa rastîya halê wanî ruhanî, yan jî berdaxustîda, guhdar bikin. Em gerekê bighîjine bêbawara, tevî wan hevaltîyê bikin û nan tevî wana nîvî bikin, wana hiz bikin û qulixî wana bikin, çawa ku Îsa ew yek dikir.

Feqet, Pawlos derheqa wî merivîda temîyê dide, yê ku dihebîne, yê ku bawarmend e:

> "Fikira min ew bû, wekî hûn tevî wî merivî bikevine nava pêwendîya, yê ku dibêje ku ew *bawarmend e*, lê xwe dide gune-

> hê bênamûsîyê, yan tima ye, yan pûtparist e, yan şerûd e, yan îçikexur e, yan jî meriva dixapîne. Tevî merivên usa qet nan jî nexun" /A Korintî 5:11, NLT/.

Ber çava ye, wekî Pawlos derheqa wî bawarmendîda nabêje, yê ku "ketîye nava gunehê", lê derheqa wîda dibêje, yê ku xwe çawa bawarmend hesab dike, "lê xwe daye gunehê". Bona çi bavê vê civînê awqasî berk vê yekê dide kifşê. Menî ew e, wekî ew bi rastî civînê hiz dike. Ew naxweze, wekî temamîya civînê zyanê bikeve, *hesab dike,* wekî ew wî "bawarmendî" *diparêze*, yê ku dîsa nava gunehêda dimîne.

Vî cûreyî bifikirin: eger li cem kesekî nexwaşîya înfêksiyon heye, ya usa, ya ku dikare nava hewêra derbazî kesekî mayîn bibe, wî çaxî merivên ku li wir dijîn, çi dikin? Ew wî nexwaşî başqe dikin, û wî cûreyî temamîya binelîya ji nexwaşîyê diparêzin. Eger usa nebe, nexwaşî wê mînanî agirê nava mêşeda belav bibe: temamîya binelîya wê ji ewê nexwaşîyê bizêrin û ewê encamên wê li ser xwe bibînin. Encamên wê nexweşîyê wê çi cûreyî bin?: cîhên xebatêye vala, undabûna kardarîyê, teribandina qulixdarîyên bona olê û pirsgirêkên êkonomîkî, evana çend encamên wê yekê ne.

Pawlos xeberdana xweye derheqa merivê ku xwe daye gunehê dibêje:

> "Û hûn gerekê vî merivî ji nava xwe der bixin û teslîmî mîrêcin bikin bona ku qalibê wî unda bibe, lê ruhê wî xilazbe roja Xudanda" /A Korintî 5:5/.

Ew bira wê rastî qezîya undabûna heta-hetayê bihata, eger nehata guhartinê. Ev e menî, wekî hinekî pêşda min gotina "hesab dike, wekî diparêze" da xebatê. Rastî ew e, wekî merivê ku bi xwe gunehê dike, nava qezîya diha mezindane, eger îzina wî bidin, ku ew nava ola civînêda bimîne, çimkî ewê hesab bike, wekî tabîya wî ya li ber Xwedê rast e, û wê halê xweyî undabûyî tenê roja dîwanê eşkere bike, lê wî çaxî wê îdî dereng be.

Wan cefa ewê wî çaxî bikişîne, dema ku ew ji parastina Xwedê miqûf bimîne, lê diqewime wî bînine ser hişê wî û ew bi temamîya dilê Îsa û şexsê Wî paşda vegere, çawa ku ew yek hate serê wî merivî /derheqa wê yekêda nava nama duda da, ya bona Korintîya nivîsar, hatîye nivîsarê/. Tê bêjî tengavî me didine hişyarkirinê. Em vê yekê nava serpêhatîya kurê bênamûsda dibînin. Wextê ku ewî encamê rîya xweye gunehkar dît, ew paşda vegerîya malê. Eger bavê begemîya xwe bida wî û dîsa mecal bişandana, kurê tu cara kirina xwe fem nekira.

## Çawa ku li Ezmîn e…

Em paşda vegerine li ser têma meye bingehîn. Nava her du serên kitêbêye dawîda me zelal dît, wekî em tevayî bedena Mesîh in, û çawa beden, em hemû jî ji emekê her endamekî karê distînin, lê ji bi zanebûn gunehkirina her endamekî em zyanê dikevin.

Em nikarin vê rastîyê hesab hilnedin. Mixabin, encamên hesabhilnedanê îdî wedekî dirêj e ku nava bedena Mesîh da tên kifşê. Û ev encam wê dûr nekevin, eger em tu tiştî nekin.

Werin em, bêyî tirs, rû bi rû, dijî wana derbikevin. Temamîya Ezmîn piştgirîyê dide me, eger em gava wî cûreyî biavêjin. Em çawa civîna serkeftî hatine gazîkirinê, ya ku bedena Mesîh e, kîjanê mînanî Îsa nikarin bidine sekinandinê. Nexweşî, zeyîfî, kesîbî, kêmasîya mecalên matêrîyalî û hemû karên dijmine mayîn gerekê li ber civîna Xudan ta bibin.

Bona me hatîye dayînê, ku em padişatîyê bikin û bi qewata nebînayî tijîbûyî bin, bona ku em dijminên ezmana dayînine ber nigên xwe. Û ev yek tenê wî çaxî dikare bibe, eger em netirsin dijî wan pirsgirêkên dijwar derbikevin, yên ku îdî zyaneke mezin gîhandine me.

Em gerekê li ser xwe guman bawar bikin, wekî em dikarin çawa ku li Ezmîn e, wê yekê li ser dinîyayê jî bikin.

## gava praktîk

Ev pirs gelekî girîng e, feqet, mixabin, hindik cara meriv dikare civîna wedê nihaye usa bibîne, ya ku van rastîya dide kifşê. Derheqa vê yekêda bifikirin: berê ewlin, Xwedê gazî we dike, wekî hûn bêyî gunehê bijîn û bi temamî xwe pêşkêşî Wî bikin. Ya duda, wextê ku bawarmend usa nakin, ew wî çaxî zyanê dighînine ne tenê xwe, lê temamîya bedena Mesîh.

Wede başqe bikin, ku dora vî hemû tiştî bifikirin. Îzinê bidin, wekî ev rastî çawa fikirên baş bimînin, lê hûn jîyana xweye herroje berdewam bikin. Dora van rastîya şêwirdarîyê bikin. Li ser hîmê van rastîya dua bikin û derheqa vê yekêda hûn bi xwe ji Xwedê bipirsin. Îzinê bidin, wekî ev rastî bikevine dilê we û bona we bibine yên girîng, çawa ku ew bona Pawlos bûn.

# 5

# GUHARTINÊ BÎNIN

Ez wekîlekî nisileteke usa me, ya ku diha gelekî derheqa şuxulkarîya meye şexsî ya tevî Îsa hîn kirine, ne ku wekî em bawarmend in, bedenek in.

Tenê van axirîya ev yek bona min diha zelal bû. Ez naxwezim, wekî hûn derheqa wê yekêda şaş bifikirin. Bêyî şikberî, pêşda min ev rastî bi cûrekî fem dikir, lê ne awqasî, çiqasî ez niha fem dikim.

Wî çaxî, wextê ku Ruhê Pîroz ev yek bona min eşkere dikir, ez gelek cara derheqa wan komên eskerê behrêda difikirîm, yên ku bi navê "pişîkên behrê" * eyan in.

Hevalekî min heye, yê ku îdî eva serê panzdeh sala ye, ku nava wan eskerên mexsûsda qulix dike, û niha jî çawa emirkir dixebite. Hinek wede ez derheqa van rastîyada û derheqa bedena Mesîh da fikirîm, lê paşê min qirar kir ku derheqa vê yekêda tevî wî qise bikim. Min zanibû, wekî nava wan eskerada pêwendîyên biratîyê hene û min qirar kir derheqa wê yekêda diha zêde bizanibim. Min wîra têlefon kir û destpê kir pirsa bidime wî: "Pişîkên behrê çi cûreyî bi hevra nava heleqetîyada nin? Ew çi cûreyî komên wî cûreyî yên six û yekbûyî saz dikin? Û çi dikeve nava hînbûna wana?".

Ewî berê ewlin got:

-Merivê dawîyê, derheqa kîjanîda pişîkê behrê difikire, ew bi xwe ye.

Ev gotina wî ya zelal gelekî li min xweş hat. Min zanibû, wekî nava encamên wê têlefonkirinêda minê gelek tişt fem bikirana: bona wê yekê jî min xwe ker kir û îzin da ku ew berdewam bike.

---

* nava eskerê amêrîkîye behrêda komên mexsûs, şirovekirina navê kîjana (SEAL) mînanî xebera înglîzî ya "pişîk" e.

- Em birayê li rex xwe diha zêde qîmet dikin, ne ku xwe. Hewce nîne em bifikirin, ku gelo pişta me parastî ye, çimkî birayên me me diparêzin.

Wî çaxî ewî destpê kir min “terîf bike”:

- Eger tu serê Efesîyayî şeşa bixwînî, tê bibînî wekî cebirxana Xwedê bi temamî bona parçê bedenêyî pêşin e, û tu tişt li ser pişta me tune. Menî ew e, wekî Xwedê bona me her yekî ew tişt têra dîtîye, çi ku pişîkên behrê dikin, ku em piştên hev bigrin û çawa parçek, çawa bedenek bifikirin. Eger em usa nîbin, wî çaxî tenê merivekê pişta min bigre û ew jî ez im. Lê eger em hemû kes mînanî komekê bişuxulin, wî çaxî temamîya komê wê pişta min bigre.

Ewî berdewam kir:

- Çawa pişîkê behrê, ez hemû tiştî bona birayê li rex xwe dikim. Em ji kûraya dilê xwe bawarîya xwe li wê yekê tînin. Em hîn kirine, ku em derheqa hevda çawa hindava şexsa da nefikirin, lê em çawa bedenek wê yekê bikin. Nenihêrî wê yekê, wekî em profêsîyonalên nava govekên cuda-cuda ne, hinek nîşangir in, hinek doxtir in, hinek pilot in, hinek şerkarên bi desta in, pêşekkarên sîlihên suda-cuda ne, lê em dîsa çawa bedenek dişuxulin. Em tu cara bi vê fikirdarîyê naçine mîsîyayê: “*Diqewime ji me hinek paşda venegerin*”, yan jî “*Tenê çil selefê paşda vegere*”. Na xêr, em difikirin: “*Em bi sed selefîva diçin û emê bi sed selefîva paşda vegerin*”. Min bi guhdarîke mezin guhdarîya wî dikir. Paşê min jê pirsî:

- Hûn vê nêzîkbûnê nava leşkerên tezehatîda çawa çê dikin?

- Wê yekê meriv nikare çê bike,- ewî got.-Telîmkirina pişîkên behrê nava telîmên leşkerîda çawa yên here giran û yên here dijwar tên hesabê. Nêzîkî nod selefê wan meriva, yên ku dixwezin bibine pişîkên behrê, yan telîma berdidin, yan jî wana derdixin. Wî çaxî tenê komeke merivaye usa dimîne, ya ku qewat e û li ser dereca hazirîyê ya bilind e. Ji wana her kes yê li rex xwe ji xwe zêdetir qîmet dike û hazir e bona karekî bimire, yê ku diha zêde ye, ne ku ew.

Paşê ewî got:

- Con, xwezî civîn jî usa bûya. Wî çaxî wê çi biqewimîya?

Mixabin, ez wîra qayîl bûm. Feqet bi rastî potênsîyala me heye, ku em wî cûreyî bin. Ev yek ew beşa *tebyeta xwedêtiyê ye*, ya ku mera hate dayînê, wextê ku em careke mayîn bûn. Ew terîf û hînkirin, kîjana em distînin, dêmek *telîma me*, gerekê vê yekê eşkere bikin û berfireh bikin. Feqet, eger em Mizgînîyê cûrekî mayîn guhdar bikin, nava meda ew tiştê mezin bibe, çi ku nelazime pêşda here. Bo wê yekê jî civîna wedê niha nava halekî usa da ye. Ji me gelek meriv tenê dixwezin bêne piştgirtinê, lê ne ku dijî dijwarîya derbikevin. Em awqas tiştî tê berdidin!

Hevalê min leşker e, lê ew jî zeyîfîya civîna wedê niha fem dike. Ew zane, wekî eger leşkerekî koma pişîkên behrê zeyîf be, ber daxwe, yan jî tabîya xwe

bihêle, wî çaxî hemû endamên komê wê zyanê bikevn, yan jî bimirin, rûyê xweranedîtin, yan jî nekarebûna merivekîda. Çawa endamên bedena Mesîh, em gerekê nava femdarîya xweda vê yekê zêde bikin, ya ku nava wîda cîhê xwe girtîye.

## Guhartinê bînin

Gelo nava vî hemû tiştîda alîyê baş heye? Bêguman: tevî Xwedê her dem alîyê baş heye.

Ez fem dikim, wekî hûn dikarin rastîyên serê kitêbêyî derbazbûyîda bi cûrê xirab binihêrin û gumanbir bin. Fikira derheqa wê yekêda, wekî kirinên merivên başqe dikarin hukumê nekardar li ser jîyana we bihêlin, dikare gumana mêriv bide birînê. Feqet, ez derheqa vê rastîyêda dibêjim, bona ku em tevayî pêşda bilivin û mezinayî û qewata Wî awqasî bibînin, bi kîjanê ew nava nisileta meda eyan nebûne. Tu guhartin wê nebin, çimkî em hela hê cûrekî mayîn bawar nakin û cûrekî mayîn nakin. Fikira wê yekê ev e: *wê guhartinê hûn dikarin bînin*. Eger ew ji we û ji min destpê nebe, wî çaxî ewê çawa destpê bibe? Xwedê bona anîna guhartinê gazî me kirîye.

We tu cara nedîtîye, ku çi diqewime, wextê ku şexsê ku îsafa wîye kifş heye, kirinên kîjanî hinekî ji kontrolê der in, nişkêva cabdarîyê bona merivên başqe hildide li ser xwe. Gelek cara alîyên xeysetê wîyî baş eşkere dibin. Mînak, keçeke cahil bînin ber çavê xwe, ya ku bûye dayîk. Ewê pêşîya mêrkirinê xwe sivik xweyî dikir, hinekî xwe zeft nedikir û hinekî jî kêmaqil bû.Kirinên wê tenê li ser jîyana wê hukum dikirin.Feqet ew bengî dibe, mêr dike û dibe dayîk.Û ev keça ku wextekê ji kontrolê der bû, jîyana xwe dide qeydekirinê. Ew zane, ku eger ew dîsa bi cûrê bêaqilî, ji kontrolê der û bi qezîya berdewam bike, ew yek wê ne tenê li ser jîyana wê, lê usa jî li ser jîyana hizkirîyê wê û zaroka wê hukum bike.

Bo wê yekê jî gerekê ji me her kes vî cûreyî nêzîkî civînê bibe. Em gerekê bi kûrayî hev hiz bikin. Em gerekê fem bikin, wekî ne tenê emê zyanê bikevin, eger em gura Xebera Xwedê nekin. Em parçekî bedenekê ne. Diqewime ev e menî, wekî Pawlos, bi gotûbêjkirina şîva Xudan tevî civîna Korintîyê, vê temîyê dinivîse:

> "Hûnê bêjin: "Bo min îzina hemû tiştî heye", lê hemû tişt nîne, ku bona min kardar e. Derheqa kara xweda nefikirin, lê derheqa kara yên mayînda bifikirin" /A Korintî 1O:23,24, NLT/.

Pawlos careke mayîn civîna Fîlîpîyêra dinivîse:

> "Bila her kes yên mayîn ji xwe baştir û ji xwe zêdetir hesabke [derheqa kesekî mayînda zêdetir bifikirin, ne ku derheqa xweda]…

> Bila nêzîkbûn û fikirdarîya wî cûreyî û fikira [şikestî] di nava we da be, ya ku nava Mesîh Îsa da bû" /Fîlîpî 2:3,5, AMPC/.

Eva ew cûrê fikirdarîyê bû, yê ku li cem Îsa hebû, ew nêzîkbûna dil bû, ya ku Ewî anî li vê dinîyayê û emirê xwe bona me qurban kir. Ewî dikaribû şexsê Xwe xilaz bikira. Ewî dikaribû gazî komeke milyaketa bikira, kîjana wê ew ji celata xilaz bikirana, feqet Ew derheqa meda difikirî. Ew diha zêde derheqa başîya meda difikirî, ne ku ya Xwe da.

Ev e mizgînî. Eger em gura Xebera Xwedê da bin, wî çaxî emê duakirî bin. Diqewime nava jîyana meda wedê nebaş û giran hebin, rûyê gurênekirina bawarmendên mayîne nava bedenêda, lê emê bi kutasî pêşda herin.

Îlyas hema ew mesele ye, yê ku rûyê kirinên merivên başqeda tengavî dîtine. Rûyê gunehê Akab û Hêzabêlda, û usa jî rûyê bêdengîya Îsraêlê da, sê sala li welêt baran nedihatin. Îlyas usa têr nan nedixwer, çawa ku merivên hêna Dawid û Silêmanê padişa dijîtin. Çend sala ser hev ewî nan û goştê ku qarqarka dianîn, dixwer. Ew xwerin hema usa mînanî hev bûn, nava kîjanada tiştên başqeye xweş tunebûn, yên ku wextê zêdayê hene. Ewî rûyê kirinên merivên başqeda tengasî didîtin. Feqet Îlyas parçekî miletekî, cimetekê û bedenekê bû. Şikestîbûna wî guhartin anîn û baran hatin. Şikestîbûna wî miletê wî dua kir û ew bi xwe jî bû duakirî.

## Peymana aşîtîyê

Em qewimandineke mayîn bînin ber çava, ya ku gelek sal pêşda, pêşîya rojên Îlyas qewimîye, wextê ku *gelek* rûyê kirinên çendên mayînda zyanê ketin. Îsraêl li qûmistanê û li Şîtîmê sekinîbû. Nivîsar e:

> "Ji wana çend mêr*a* bêesilî kirin, tevî jinên mowabî ketine nava heleqetîyên bedenî. Wan jina ew teglîf kirin, ku ew tevî qurbanîyên xwedêyên wana bibin, û îsraêlî tevî wana tevî kêfkirinên wana bûn û xwedêyên Mowab hebandin. Bi vî cûreyî Îsraêl gihîşte hebandina Bahel Pîhor û hêrsa Xudan dijî cimeta wî rabû" /Jimar 25:1-3, NLT/.

Careke mayîn guhdarîyê bidine ser xebera "çend mêr". Xwedê temî da cimeta xwe, ku xwedêyên başqe nehebînin, nêzîkî jinên miletên başqe nebin û tevî wana bênamûsîyê nekin. Feqet, gurênekirina çend meriva temamîya cimetê anî ber dîwanê, û em careke mayîn dibînin, wekî rûyê dîwanêda ne ku çend *meriv*, lê gelek zyanê ketin.

> “Xudan emirî ser Mûsa kir: “Wana bigre, yên ku ew yek destpê kirine û wana li ber Xudan roj nava rojêda ceza bike, bona ku hêrsa Wî ya berk ji cimeta Îsraêlê dûr bikeve”” /Jimar 25:4, NLT/.

Em dibînin, wekî ev hemû meriv /çend meriva/ hêrsa Xudane bi kumreşîyê dijî temamîya Îsraêlê pêşda anîn. Ew miletek, cimetek û bedenek bûn.

Hema wî çaxî jî, wextê ku Mûsa emir kir, ku wan meriva ceza bikin, îsrayêlîkî bi navê Zembrî, jineke bi navê Kazbî li ber çavê Mûsa û temamîya cimetê anî li konê xwe. Eva gurênekirina bi zanebûn û qebûlnekirinê bû hindava Xebera Xwedê da. Pînhasê kurê Êlazar û nebîyê Harûnê kahîn çawa ku ev yek dît, carekêra rimek hilda destê xwe û lez berbi konê wî merivî çû, û bi wî rimî ne tenê wî, lê Kazbîyê jî xist, herdu jî bi derbehekê kuştin. Nivîsar e: “Û derba dijî Îsraêlîya seqirî, lê tenê peyî mirina bîstçar hezar merivîra” /Jimar 25:8,9, NLT/. Em dîsa dibînin, wekî gelek meriv mirin: gelek zyanê ketin: gelek rûyê kirinên çend merivada zyanê ketin. Bona Xwedê temamîya milet *yek* bû.

Peyî wê yekêra Xwedê got: “Pînhasê kurê Êlazarê kurê Harûnê kahîn hêrsa Min ji zarên Îsraêlê vegerand, çimkî ewî bi xîreta Min nav wanda xîret kir û Min zarên Îsraêlê ji kumreşîya Xwe qir nekir” /Jimar 25:1O,11, NKJV/. Pînhas guhartin anî nava temamîya milet. Bona wê yekê gelek meriv nelazim bûn, tenê merivek lazim bû.

Pawlos ew yek usa jî bona civîna Korintîyê dixwest, çawa ku Xwedê dixwest. Ewî guhartin anîn nava wê civînê, û netirsîya, bi rastîyê dijî wana derket. Ewî Xebera Xwedê, şûrê Ruh, hilda û karê merivekî “xist”, yê ku nava bênamûsîyêda dijît. Peymana Kevin da “rim” bi matêrîyalî hate xebitandinê: peymana Nûda û roja îroyîn “rim” wî çaxî pêşda tê, wextê ku em radibine li ser pîya û rastîyê dibêjin, hema wî çaxî jî, wextê ku yên mayîn guh û çavên xwe digrin, wextê ku merivek, yan jî çend merivên li civînê bi zanebûn guneha dikin.

Merivê dawîyê, derheqa kîjanîda Pawlos difikirî, ew bi xwe bû. Ewî mînanî hevalê minî leşker dikir. Ewî başîya yên mayîn ji nav û xweşîya xwe bilindtir digirt. Ewî bona xwe qezîya pêşda dianî, çimkî civîna Korintîyê dikaribû ew înkar bikira. Ew hindava wanda kumreş bû, wextê ku eyan dibû, wekî Pawlos ew diha zêde hiz dikirin, ne ku Pawlos ew hiz dikirin.

Pînhas derheqa xweda nedifikirî: ewî zanibû, wekî dikaribûn ew gelekî berk, bêîsafî gunehkar bikirana, bona paşdamayînê û fikirên êkstrêmîstîyê. Ew yê tektenê bû, yê ku gav avît: kesekî mayîn ew yek nedikir. Gelo merivê çi bifikirîyana, çi bigotana, yan jî wê çi bikirana? Ew hemû tişt îdî girîng nîbû. Zebûr dinivîse: “Tirsa Pînhas tunebû, ku tevî wê bû” /Zebûr 1O6:3O, NLT/. Ew hindava Xwedê û hindava wê yekêda kumreş bû, çi ku Ewî bona cimeta Xwe girîng hesab dikir.

Ewî ola xwe hiz dikir û guhartin mîyaser kir.

Em bixwînin ku Xwedê derheqa wîda çi dibêje:

> “Lema bêjî wî: va ye ez *peymana xweye edilayê* tevî wî girê didim, ewê bona wî û bona zureta wî peyîra bibe peymana kahîntîya heta-hetayê. Çimkî ewî bona Xwedêyê xwe kire xîret û bona zarên Îsraêlê kewandin kir”” /Jimar 25:12,13/.

Bi sala ser hev, evê gotinê wextê lêkolînkirina Încîlê bala min kişandibû li ser xwe. Derheqa wê yekêda ne tenê Mûsa, lê paşê Zebûra jî nivîsî û derheqa heqdayîna wîda da kivşê:

> “Wî çaxî Pînhas rabû û dîwan kir, û mirin hate qedexekirinê. Ev yek wîra çawa heqîtî hate hesabê, ji milet hetanî milet, heta-hetayê” /Zebûr 1O6:3O,31/.

Tê bîra min, ku min xofeke çawa texmîn kir, wextê ku min heqê vî cahilî dît, yê ku netirsîya, rabû ser pîya û ew yek parast, çi ku li Xwedê xweş dihat. Ewî ne ku heqê wedelû, lê yê heta-hetayê sitend, yê ku bi peymanêva hate morkirinê. Bîra xweda xweykin, wekî Xwedê tu cara peymanên xwe nateribîne. Ew heq ewqasî mezin bû, wekî ne tenê li ser wî, lê li ser temamîya zarên wî, zarên zarên wî û hemû zuretên pêşerojê hukum kir, heta *roja îroyîn jî*. Hemû zuretên wî gerekê heq bistendana, çimkî ew hazir bû wî hemû tiştî biparêze, çi ku Xwedê rast hesab dikir.

Bi dîtina mînaka Pînhas, min qirar kir, wekî ezê her dem rastîyê bêjim, eger nava encamên wê yekêda jî ez hizkirina meriva unda bikim, çawa Pawlos bû. Min ew heqê mezin didît, ne tenê bona xwe, bona Lîzayê û bona zarên me, lê bona temamîya nisiletên pêşerojê. Minê peymana aşîtîyê bistenda, ya ku wê tu cara nesekinîya û minê dua bistenda, yê ku wê heta-hetayê bima.

Roja îroyîn ez zendegirtî me, wextê ku dibînim, ku zarên me bi cedandinên çawa qulixî Xwedê dikin. Wextê ku ew mezin dibûn, ez piranîya salê nava rêwîtîyada bûm û min Mizgînî terîf dikir, lê tê bêjî peymana Xwedêye aşîtîyê, ya ku bona wana tê dayînê, yên ku guhartinê tînin, usa jî bona zarokên me xweykirî ye. Ez gumanim, wekî duayê wî cûreyî wê usa jî bona nebîyên me hebe.

Gelo duayê usa heye ku rastîyê xweyî bike, ya ku me hela hê eyan nekirîye? Belê! Ew dua *peymana aşîtîyê ye*, ya ku ne tenê bona me hatîye sozdayînê, lê usa jî bona zuretên we, eger hûn dengê xwe bona anîna guhartinê bilind dikin, û eger hûn bona rêyên Xwedê xîret in, eger yên mayîn usa nînin.

Gelo em destpê dikin fem bikin, wekî diha baş e dengê xwe bilind bikin, û

ew yek ji hizkirinê ye, û bi xebitandina cûrê Ruh, ne ku bi bêdengî lê binihêrin, çawa guneh zêde dibe û nava ola civîna meda belav dibe?

Bona min ev bersiv li ber cava ye, lê ezê îzinê bidim, ku hûn bi xwe qirarê qebûl bikin.

## gava praktîk

Ev e ew behsa qenc, hîvîya kîjanê bûn hûn. Eger hûn bêyî sekinandin bona rastîyê bisekinin û wê yekê bona hizkirina Xwedê û cimeta Wî bikin, hûnê bighîjine wan meriva, yên ku li ser peymana heta-hetayê hîm danîn, ji Xwedê sozê dua sitendin, yê ku ne tenê pêşeroja wana, lê usa jî ya zuretên wana qirar kir.

Gelo hûn dikarin tiştên diha mezin bona zuretên xwe bikin? Sozê tu tiştekî li vê dinîyayê û mîrata matêrîyalî tune. Pere dikare hêna zuretekê, yan du zuretada xerc bibe. Tu zanebûnek, yan jî serwaxtîk nikare derbazî awqas nisileta bibe. Hukumê wî cûreyîye dirêj dikare tenê mîrata li ser sozê Xwedê hîmdayî bibe, çimkî Xwedê amin e.

Hûn mîrateke çawa dixwezin derbazî nisiletên pêşerojê bikin? Hûn çawa dixwezin, wekî we li ser vê dinîyayê bîr bînin, û li Ezmîn naskin? Kilîta mezin, ya bona mîyaserkirina van xwestina ew e, ku hûn nava salên vê dinîyaêye kurtda bi çiqasîva qewîn li ser rîya hizkirinê û rastîyê sekinîne.

# 6

# MENÎYA ME

Van axirîya ez rastî tiştekî hatim. Min nikaribû têksta xweye nivîsar bi têlefona xwe bişanda. Min bi hemû cûreyî dicêriband, ku wê pirsê hel bikim: min progiramên têlefonê digirtin, têlefon careke mayîn dida xebatê û carina jî ew program bi mecbûrî ditemirandin, xebata kîjana disekinî. Paşê ez derbazî gavên diha dijwar dibûm, lê ez nikaribûm ji vê pirsgirêka ku ez aciz dikirim aza bûma.

Vê yekê îzbat kir, wekî em çiqasî smartfonên xweva girêdayî ne û ew roja îroyîn bona me çiqasî girîng in. Kurê meyî biçûk, wextê hemcivîneke li Hindistanê terîf dikir û kitêb bona serwêra belav dikirin. Ew rastî hinek dijwarîya hatibû û minra derheqa wê yekêda bi têlefonê elametî şandibû, lê bi seheta ser hev, min nikaribû rûyê nesazîya têlefona xweda bersivên pirsên wî bida. Wî çaxî ji panzdeh deqa zêdetir lazim dihat, ku ez cumlekê yan jî duda binivîsim, lê paşê jî têlefona min nişkêva program ditemirand û nivîsara min nedihate xweykirinê û ez mecbûr dibûm careke mayîn destpê bikim. Nava çar sehetada min karibû tenê elametîyên gelekî kurt bişînim. Min dixwest diha zêde bigota wî, lê min nikaribû. Tiştekî femdarî ye, wekî ez gelekî aciz bibûm. Paşê min têlefon bire li cem pêşekzana, yên ku diha baş zanibûn ku ew çawa dixebite. Min çend roja dicêriband wê pirsê hel bikim, lê panzdeh deqe jî derbaz nebûn, û wana menîya nesazîya wê dît. Piştî çend seheta min îdî bêyî problêm elametî dişandin. Zelal bû, wekî min bi nezanî tiştekî usa kiribû, kîjanê sîstêma opêrasîyonên têlefonê dabû girankirinê.

Gelo wê çi bûya, eger min dest bi gera helkirina pirsgirêkê nekira? Wê çi bûya, eger min wede başqe nekira bona çûyîna li cem pêşekzana? Minê têlefona xwe bi dereca diha nimiz, ya ji mecalên têlefonê nimiztir ew bida xebatê û mixabin minê gelek wede unda bikira û nikaribûya malbeta xwe, endamên koma

xwe û hevalên xweva bihatama girêdanê.

Em gavekê pêşda herin. Wê çi bûya, eger min derheqa elametîyên nivîsarda, yên bi telephone, nizanibûya? Sî sal pêşda ez derheqa elametîyên wî cûreyîda, yên têlefonê haj pê tunebûm. Sed sal pêşda jî pêwendîyên bi têlefonêye di navbera parçên dinîyaêda tune bûn. Wî çaxî ezê şa bûma, ku nava çar sehetada min elametî carekêra kurê xwera bişanda, yê ku li Hindistanê bû. Wî çaxî hemû tevgirêdan wê diha baş bûna, ne ku lap tune bûna.

Bêyî zanebûna wê yekê, ku li cem min çi hebû, ezê bi cedandina wî cûreyî helkirina pirsê negerîyama û ezê wan hemû dijwarîyara derbaz nebûma, yên ku li ser rîya min pêşda hatin. Feqet ez derheqa mecalên têlefona xweda zanim, û hema ew zanebûn bû, ya ku acizîya mezin li cem min pêşda anî.

Wextê ku em haj potênsîyala xwe tunene, wî çaxî nava meda xwestina bona gihîştina tiştekî tune. Ji me gelek meriv nizanin, ku qewata komeke leşkeraye yekbûyî çiqas e, çawa ku hevalê min zane, yê ku pişîkê behrê ye. Bînin ber çava, ku eger nava koma wîda pirsgirêkek pêşda bihata, ya ku dikaribû bibûya menîya binketinê. Wê yekê wê ew aciz nekira, çimkî ewî dikaribû emirê xwe unda bikira.

Bi bîranîna serhatîya meye ji peymana Kevin, hûn dikarin bînin ber çava, ku temamîya Îsrayêlê çi cûreyî dijî Ekar hêrsketî bû? Wextê şerê dijî Erîhayê ew gihîştine açixîyê, lê piştî şerê Ayê wana 36 hevalên xweye nêzîk unda kirin û pêra jî ew gerekê li ber dilên malbetên leşkerên mirîda bihatana.

Hûn acizîya Pawlos tînin ber çevê xwe, wextê ku ewî didît, ku korintîyên wîye hizkirî encamên kevirê ruhanîyî krîpton li ser xwe didîtin, zeyîfî, nexweşî û mirinên ji wede zûtir? Derheqa qewata wan merivada ew haj pê hebû, lê wana ew yek fem nedikir. Bona wana pirsên wan diha girîng bûn, ne ku pêşdaçûyîna ola civînê.

Hûnê derheqa xweda çi bêjin? Hûnê derheqa ola xweye mesîhîtîyêda çi bêjin? Bi fikira min hûn vê bangê dixwînin, çimkî hûn kûraya dilê xweda zanin, wekî jîyana mesîhîtîyê diha *zêde ye*. Xwedê ev xwestin danîye nava dilê we. Hûn diha hewaskar in, wekî jîyana weye tam nava hazirîya Wî da hebe û nava civîna xweda hûn bibine şedê guhartina ruhanî, lê ne ku hûn ji acizîyên wedelû birevin, yên ku rûyê rastîyêda wê pêşda bên.

## Ronahiya we hatîye

Bi lêkolînkirina vê kitêbê, hûnê du tiştên mezin bistînin. Ya ewlin, ola civîna we wê bi kardarî bişuxule, û ya duda, jîyana weye şexsî wê berfireh bibe, hûnê diha kardar bin û diha nêzîkî Xwedê bibin /hetanî niha we guhdarîya xwe dabû li ser ola civînê, lê emê derheqa weda, çawa şexsek xeberdin/.

Dîtinoka meye derheqa ola meda gerekê çi cûreyî be? Usa jî mînanî mesela têlefona min, bersiva vê pirsê wê xwestina me gur bike û wê usa bike, ku em berdewam bikin û wî hemû tiştî rast bikin, çi ku îzinê dide ku em bi qewata yek-bûyî bişuxulin.

Îşaya pêxembertîyê dike:

> "Rabe, ronahî be, çimkî ronahiya te hatîye,
> Û rûmeta Xudan hatîye li ser te.
> Çimkî, awa tarîstanê dinîya nuxamtîye, lê mijê milet: lê rûmeta Xudan ji tera hat, û rûmeta Wî li ser te tê kifşê" /Îşaya 6O:1,2/.

Tiştê ewlin, çi ku ez dixwezim bidime kifşê ew e, wekî Îşaya derheqa Ezmîn da nabêje. Ew usa jî derheqa padişatîya Mesîhe hezarsalîda nabêje, derheqa wî wedeyîda, wextê ku Îsayê hezar sala li ser vê dinîyayê padişatîyê bike, çawa ku ew yek kitêba Eyantîda hatîye nivîsarê. Pêxember usa jî derheqa ezmanê nûda û dinîya nûda nabêje, derheqa kîjanada ji alîyê Petrûs û xudanên peymana Nûye mayînda pêşda hatibû gotinê. Na xêr, ew wî wedeyî tîne ber çava, wextê ku tarîstanê temamîya dinîyayê binixême. Bêguman, ev pêxembertî dikare derheqa rojên meda be, û ez bawar im, wekî usa ye.

Bi gotina pêxember, tarîstanê mileta ne ku li çend parêçên gêografî binixême, lê li temamîya dinîyayê. Em nava wedekî usada dijîn, wextê ku tarîstan diha tîr dibe. Em diha zêde û zêde ji dilê Efrandarê xwe dûr dikevin. Ez tenê derheqa atêîsta, agnostîka û sêktantada nabêjim, lê derheqa gelekada, yên ku dihebînin, wekî mesîhî ne. Eva ew wede ye, derheqa kîjanîda Pawlos dinivîse: "Merivê îdî guh nedine hînkirina saxlem. Ewê peyî xwestinên xwe herin û wê dersdarên usa bigerin, yên ku wê ewê yekê bêjine wan, çi ku guhên wane ku dixurun dixwezin bibihên" /B Tîmotêyo 4:3, NLT/. Paşê ew bi axînekê dinivîse: "Wê guhên xwe ji rastîyê dagerînin û peyî çilovîska bikevin"/xeber 4/.

Îşaya dinivîse, wekî nava vî wedeyîda bawarmendên rast wê ronahî bikin, yan jî berbiçav bin. Wê yekê vî cûreyî bînine ber çava: "Eger hûn bikevine odeke tarî û ronahiyê vêxin, tarîstanê carekêra belav bibe". Tarîstan nikare ronahiyê alt bike:we qet derheqa îşiqa ku tarîstanê belav dike bihîstîye? Na xêr, îşiq tenê ronahiyê bela dike, bi çiqasî jî tarî be, ronahî alt dike û tarîstanê belav dike.

Îsa got, wekî em ronahiya vê dinîyayê ne. Em gerekê ronahiyê bikin, em gerekê diha qewat bin, ne ku tarîstan, lê ev yek çawa gerekê bibe? Bi gotina Îşaya, em gerekê usa ronahî bikin, wekî bêbawar *r*ûmeta Wî bibînin.

Xebera "rûmet" bi zimanê cuhîya xebera "kavod"-e, ya ku "mezinayê, dewlemendtîyê, karebûnê, zêdayê, qedir, bilindayê û giranîyê" dide kifşê. Qasekê der-

heqa van xeberada bifikirin.Wextê ku Încîl derheqa rûmeta Xwedêda dibêje, wî çaxî ew dixweze bêje mezinaya Xwedê, dewlmendtîya Xwedê, karebûna Xwedê, merdanîya Xwedê, qedirê Xwedê, bilindaya Xwedê. Ev xebera bêsînor, "giranî" dide kifşê, wekî cudatîyên mayîn ne ku sînorkirî ne, lê bi dereca here bilind tên raberkirinê. Zelal gotî, gilî derheqa giranîya mezinaya Wî da ye.

Pawlos dinivîse, wekî zanebûna derheqa vê yekêda Xwedê danîye "nava dilên me, bona ku em rûmeta Xwedê nas bikin" /B Korintî 4:6, NLT/. Ew didomîne:

> "Ev ronahiya dilên meda diçûrise, lê em bi xwe mînanî derdanên nerme ji herîyê çêkirî ne, yên ku vê xiznê nava xweda xweyî dikin. Bi vî cûreyî zelal dibe, wekî *zoraya meye mezin* ji Xwedê ye, ne ku ji me" /B Korintî 4:7, NLT/.

Guhdarîyê bidine li ser xeberên "zoraya meye mezin". Mezinaîya, dewlemendtîya, karebûna, merdanîya, hurmet û bilindaya Xwedê dilên meda bi temamîya qewatê diçûrisin. Awa ew çi dibêje: "*zoraya meye mezin* ji Xwedê ye, ne ku ji me". Ew zoraya ku derheqa wêda em dibêjin, dikare derbazî nava her tarîstanekê bibe, ya ku wê bicêribîne li ser mîsîya me bisekine.

Wextê ku koma pişîkên behrê /navê koma leşkera/ diçe mîsîyakê mîyaser bike, ew têra nabînin, wekî wê bi binketinê paşda vegerin û bi tomerî ew yek naqewime. Sozê me diha qewîn e, ne ku ew.Û ew soz bi qewata diha mezin çareserkirî ye, yê ku wê îzinê bide me ku em bighîjine açixîyê.

Hetanî xilazbûna vê kitêbê ezê gelek cara gotina "rûmeta Wî" bidime xebatê, bi fikira "mezinaya Wî" /feqet usa jî xeberên mayîne bêsînore li jorê gotî, bîra xweda xweyî bikin/. Îşaya dibêje, wekî mezinaya wî wê *li ser meda bê*, lê ne ku li ser meda *peya bibe*. Ji kîderê ewê bê? Ji dilê me. Bîra xweda xweykin: "ev xizne nava derdanên herîyêda ne" /xeber 7/.

Bi vî cûreyî pirsa min ev e: "Bona çi zoraya Wî ya mezin bi destî me civaka meva eyan nabe? Menî çi ye, wekî ji me gelek meriv zeyîf in, nexweş in û serbara serda jî ji wede zûtir dimirin? Gelo menî ew e, wekî em kevirê krîptonî ruhanî qebûl dikin?".

## Qewata olê

Qewata olê dikare çi cûreyî bibe? Derheqa zemanê wî çaxîda bifikirin, dema ku civînê teze destpê kir. Roja pêncîye hesab, şagirta, reqema kîjana dighîşte 12O-î, li cîhekî xwe veşartibûn. Nivîsar e, wekî ew yekbûyî bûn. Menîya yekbûna wan kîjan bû? Dema ku Îsa ji nava mirîya rabû, gote here kêm pênsid bawar-

menda ku herine mala jorin û hîvîya sozê Bavê bin /binihêre A Korintî 15,6 û Lûqa 24:33-54/. Bona çi piştî deh roja li wir 12O meriv man? Bona çi ew hîvîyê nesekinîn, û çi hate serê 38O merivên mayîn? Derheqa wanda îdî tu tişt nayê bîranînê, xêncî wê yekê, wekî ji wana çend meriv hela hê sala 56-a, ya zemanê me, sax bûn, dema ku Pawlos nama xweye bona Korintîya dinivîsî. Em tiştekî bi îzbatî zanin, wekî ew anegorî temîya Îsa li Orşelîmê hîvîya sozê Bavê nîbûn /binihêre Karêd şandîya 1:1-15/.

Diqewime, wekî wan 38O meriva hesab kirin, ku eseyî nîne gotina Wî bikin, yan ew ewqasî pêşnîyareke baş bû? Yan ew meriv fikirîn, wekî mîyaserkirina hîvîkirina wî gelekî dijwar bû? Diqewime wana bawar dikir, wekî dikaribûn bi cûrê xwestina xwe qulixî Wî bikirana. Ez guman im, wekî piştî çûyîna li mala jorin, hinek ji wana derheqa rabûna Wî ya ji nava mirîya dannasîn dikirin.

Feqet, Ruhê Xwedê, Yê ku usa jî çawa Ruhê Rûmetê tê navkirinê /binihêre A Petrûs 4:14/, ew tijî nekirin. Ew 12O merivên mayî bi Ruhê Xwedêye mezinva hatine nixumandinê. Çi ew kirine yek? Ew anegorî fikirên xwe pêşda neçûn, mînanî 38O merivên mayîn. Ez bawar im, wekî menî ew bû, wekî wana gura Xebera Xwedê kir, kîjanê bi fikira wan gerekê rast mîyaser bikin.

Rûmeta Xwedê /dikeve nava kîjanê usa jî zoraya Wî/ ew tijî kirin, û hema wê rojê jî ji sê hezara zêdetir meriv pêşda hatin. Wana belavok bela nedikirin, rêklam nava rojnemên cuhyada cîwar nedikirin, stratêgîya prêssayê nava torên sosîyalîda nedidane xebatê û bi rêklamên xweva êrîş nedibirine ser weşanên radîyoyê.Wana qet berevbûna xwe jî program nekiribû. Feqet, mezinaya Xwedê li temamîya bajêr eyan bû.

Piştî wedekî kurt, dîsa pênc hezar meriv, xêncî jin û zaroka, peyî wê yekêra pêşda hatin, wextê ku merivekî ji niga seqet ji cîhê xwe banzda û revî û kete paristgehê. Ev yek tiştê ecêbmayînê bû, çimkî Petrûs û Yûhenna pêra negîhandin banga xilazbûnê bikin, çimkî ew hatine girtinê.

Temamîya bajarê Orşelîmê rûyê van qewimandinada tevîhev bibû. Hemû kesî dengê bayê qalim dibihîst. Binelîyên bajêr dibihîstin, ku çawa şagirta bi dengê bedew, bi zimanên başqe û bi zaravên başqe derheqa karên Xwedêda belav dikirin, yên ku ew pêşda hîn nebibûn. Hemû kesî ecêbên ber çava dîtin, yên ku bi navê Îsa hatine kirinê.

Piştî çend roja, hemûya bi hevra yekbûyî, dua dikirin, û ew avahiyê ku li wir ew berev bibûn, lerizî. Încîl tişta zêde nake. Eger nivîsar e, wekî avahî lerizî, guman bin,wekî ew usa jî bûye. Ji van bawarmenda zorayî, zêdayî û qenckirin dibarî.

Nivîsar e: “Nava wanda tu kes hewcê tu tiştekî nîbû” /Karên şandîya 4:34/. Nivîsar e, wekî Petrûs soqaqada digerîya, ne ku soqaqêda, lê soqaqada û hemû merivên nexweş û zedelû derdixstine li serê rîya, wekî gava Petrûs derbaz bibe,

tenê sîya wî bikeve ser ji wan hineka, û nivîsar e: “Hemû jî qenc dibûn” /Karên şandîya 5:16/. Ev e mezinaya Xwedê. Bînin ber çavê xwe, wekî bawarmendek sivdera nexweşxanekêda digere û hemû nexweşa qenc dike.

Încîl usa jî eyan dike, wekî merivek tevî jina xwe, wextê berevbûnekê, bêyî xof serwêr xapandin û her du jî mirin. Behsa derheqa mirina wanda li temamîya bajêr belav bû û nava hemû guhdarada “tirseke mezin” pêşda anî, lê fikira merivaye derheqa bawarmendada li ser dereca bilind bû /binihêre Karên şandîya 5:1-13/. Ev xofa saxlem meriv dûrnedixistin: serbara serda diha zêde meriv dighîştine wana: “Lê dîsa elaleta jina û mêra hê zêde dibû, yên ku bawarîya xwe li Xudan dianîn” /Karên şandîya 5:14/.

Ev yek bi Orşelîmêva ser hevda nayê. Peyîhatîyên Îsa li ser xwe guman şedetî didan, û bajarên tam xilaz dibûn û qenc dibûn. Fîlîpo, yê ku li cîhê nanxwerinê qulixdarî jinebîyara dikir, çû bajarê Samerîyayê. Nivîsar e: “Ji gelek cinaketîya ruhên heram bi dengê bilind dikirine qîrîn, derdiketin. Û gelek şil û şet, nigada seqet, qenc dibûn. Hingê şabûneke mezin kete wî bajarî” /Karên şandîya 8:7-9/. Sêrbazekî gelekî eyan “bi wan nîşana û keremetên mezin ecêbmayî bû, yên ku Fîlîpo dikirin” /xeber 13, NLT/. Temamîya bajêr yan derheqa Îsada pê hesîya, yan jî ew qebûl kir û xilaz bû.

Em usa jî derheqa qewimandinekêda dixwînin, wekî çawa Petrûs carekêra merivekî seqet qenc kir, yê ku heyşt sala nava nivînada bû. Încîl dibêje, wekî “Hemû binelîyên Lîdayê û deşta Şaronê dîtin, ku Ênêan digerîya û ew berbi Xudan vegerîyan”/Karên şandîya 9:35, NLT/. Ne ku bajarek, lê dudu, û bi taybetî nivîsar e, wekî “temamîya binelîya” xilaz bûn.

Yafayêda jineke bi navê Tabîta ji nava mirîya rabû û behsa derheqa wê yekêda li temamîya bajêr bela bû: bajarek jî bi temamî hukumê Mizgînîyê li ser xwe dît.

Petrûs hate girtinê, lê nîvê şevê milyaketek hat û ji hebsê ew aza kir.

Axayek mir, û kurma destpê kirin wî bixun, bona wê yekê, ku ewî rûmet neda Xwedê. Mezinaya Xwedê tarîstana temamîya milet dida eşkerekirinê. Meriv nikaribû ji wê ronahiyê birevîya. Ew tiştên ecêb, zoraya mezin û merivên xilazbûyî destpê kirin li hemû gund û bajara belav bibin. Derheqa qewimandinekêda nivîsar e, wextê ku “hemû binelîyên Asîyayê, cihû û yûnan, guhdarîya Xebera Xudan kirin” /Karên şandîya 19:1O/. Gilî derheqa çend gund û bajarada nîne, lê derheqa temamîya rêgîonekêda ne. Û *hemûy*a guhdar kirin. Torên wane sosîyalî “Fêysbûk”, “Înstagram” û “Twîttêr” tunebûn. Torên întêrnêtê, tevgirêdnên spûtnîkê, têlêvîzyon û radîyo tunebûn. Avtomaşîne û çerxesîyar tunebûn, bona ku meriv bikaribûna hêsa berev bûna. Feqet, hemû binelîyên rêgîonê Xebera Xudan guhdar kirin. Awa bi vî cûreyî diqewime, wextê ku civîn dibe yek, û wextê ku Xebera Xwedê li olên meye mesîhîtîyê ji alîyê hemûyada ji her tiştî bilindtir tê hesabê.

Mezinaya xwedêtîyê li civîna ewlin eyan bû. Feqet, nava serê kitêbêyî mayînda emê bibînin, wekî progirama Xwedê bona nisileta me zêdetir e. Ew çi ku civîna ewlin dît, qet nêzîkî mezinayî û zoraya xwedêtîyê jî nîne, ya ku wê pêşîya vegera Xudan û Padişa Îsa Mesîh eyan bibe.

## gava praktîk

Peymana Nûda, bi dîtina keremetên vî cûreyî, em dikarin bi hêsanî bifikirin: "*Ew gelek baş* bû, *wekî wana ev yek dikirin, lê merivê mînanî min wê tu cara nikaribe tişt*ên vî cûr*eyî bike*". Bo vê yekê jî ev serê kitêbê girîng e: ev ecêb û nîşan rûyê wê yekêda nedibûn, wekî meriv cuda bûn. Ev hemû tişt diqewimî,çimkî ew merivên sade bawar dikirin û gurêda bûn, nava wê yekêda jî mezinaya Xwedê ji wana derdiket.

Eger mezinaya Xwedê dikare nava wanda bilind bibe, ji alîyê merivên nexwendî, cahil, necêribandîda, yên ku xebatên sade dikirin, wî çaxî em dikarin guman bin, wekî tu normeke usa tune, ya ku me qîmet dike, ku em mezinaya ezmîn li ser xwe bibin. Pirs nava wê yekêdane, wekî gelo emê bi aminayî bawar bikin û peyî Xebera Xwedê herin?

Hûn bawar dikin, wekî ew yek tiştê bûyînê ye, ku careke mayîn wan keremeta bibînin. Eger civîna we destpê bike tiştên wî cûreyî bibîne, hûnê carekra bighîjine wê? Hûn dixwezin wê yekê bistînin, çi ku Xwedê dixweze bide we? Bersivên van pirsa bi duayê berbirî Xwedê bikin. Paşê tobe bikin, wekî we bona jîyana wî cûreyî xwe çawa merivê neangor û bêqîmet hesab kirîye. Xemên xwe teslîmî Xwedê bikin û xwe pêşkêşî Wî bikin, bona ku Ew nava jîyîna weda wî hemû tiştî bike, çi ku qirar kirîye.

7

# ZORAYA YEKÎ

Pêşîya xaçbûnê, mecala Îsa hebû ku cara xilazîyê ne tenê bona koma Xwe, lê bona me hemûya dua bikira. Ew hîvîkirina Xwe bi van xebera destpê dike: “Ez ne tenê bona van şagirta dua dikim, lê bona wan jî, yên ku bi gotina wan wê bawarîya xwe li Min bînin” /Yûhenna 17:2O, NLT/. Tiştê înkarkirinê nîne, wekî Ewî derheqa we û minda digot. Me Îsa bi bangên wan, yan jî bi xwendina wana, yan jî bi guhdarkirina keskî nas kir.

Îsa Kurê însêne: usa ye, serwêrtîya Wî heye hîvî bike, wekî li ser vê dinîyayê xwestina Bavê mîyaser bibe çawa ku ew yek li Ezmîn e. Awa Ew çi dua dike:

> “[Ez dua dikim…] Wekî hemû jî bibine *yek*. Bavo, çawa tu nava Min da yî û Ez nava Te da me, usa jî bila ew nava Me da bin, bibine *yek*, bi vî awayî dinîyayê bawar bike ku Te Ez şandime. Ew *r*ûmeta ku Te da Min, Min da wan, wekî ew bibin *yek*, çawa Ez û Tu *yek in*” /Yûhenna 17:21,22/.

Ewî dua dikir, wekî em bibine *yek*, bona ku dinîya bawar bike, wekî Îsa Mesîh Xilazkirê temamîya merivatîyê ye. Gelo çi wê vê bangê bighîne merivên dor-bera. Tenê bersivek heye: *r*ûmeta Wî. Ev rastî bona mîsîya me ya qirarkir e. Ewî rûmeta Xwe /Mezinaya Wî ya eyanbûyî/ bona wan meriva xweyî kiriye, yên ku *yek in*, lê awa vî cûreyî: yek nava Wî da, çawa ku *Ew tevî Bavê yek e*.

Gelo yekbûna Wî ya tevî Bavê çi cûreyî dîyar dibe /tê kifşê/? Ew her dem dibêje: “Ez…ne ku xwestina Xwe digerim, lê xwestina Yê ku Ez şandime” /Yûhenna 5:3O/, “Ez ji Ezmîn hatime xwerê ne ku xwestina Xwe bikim, lê xwestina Wî, Yê ku Ez şandime” /Yûhenna 6:38/, û careke mayîn: “Ez li vir im, ku hemû tiştî bi

cûrê Te bikim, Xwedê, çawa ku Kitêba Te da nivîsar e” /Îbranî 11O:7, MSG/.

Ew tevî Bavê yek bû, çimkî Ewî ew yek digerîya û mîyaser dikir, çi ku Bavê Wî dixwest, usa jî wî çaxî, wextê ku ew yek qebûlkirî nîbû û bêfesal bû.

Wê yekê meriv usa jî dikare derheqa şagirtada bêje. Hemû şagirt wê rojê *yek* bûn, dema ku Xwedê bi destî wan bona temamîya dinîya eyan mezinaya Xwe eyan kir.Gilî derheqa wan 12O peyhatîyên Wî da ye, lê ne ku derheqa wan bi deha hezarada ye, yên ku nava sê salên qulixa Îsa da Ew guhdar dikirin.Usa jî gilî derheqa wan 38O şagirtada nîne, yên ku dîtin ku Ew çawa bi bedena xwe ji nava mirîya rabû, lê hesab kirin,wekî eseyî nîne ku peyî gotinên Wî herin:gilî derheqa merivên yekbûyîda ne.

Pawlos hîvî dike, û usa jî reca dike: “Bicedînin, wekî nava Ruh da yekbûyî bin” /Efesî 4:3, NLT/. Paşê ew derheqa wan pêşkêşada dinivîse, yên ku Îsa bi xwe dane civînê: şandî, pêxember, mizgîndar, serwêr û dersdar. Borcdarîya wan ew e, ku civîna bi mîsîya zelal çê bikin.

> Evê bidomîne, hetanî ku em hemû bighîjine yektîke usa, ya nava bawarîyê û naskirina Kurê Xwedê, bibine merivên gihîştî nava Xudanda û anegorî bejin-bala Mesîh bin” /Efesî 4:13, NLT/.

Mîsîya me, yan jî meremê me yek e, çawa ku ew yek li civîna ewlin bû: bibin yek û nava encamê wê yekêda bibin eyankirê mezinaya /rûmeta/ Xwedê. Mecaleke başqe tune. Nisileta me gerekê bibe yek, bi bawarî û zanebûna yekbûyî. Rîya tek-tenê, ya berbi yekbûna rast, dîsa ew e, çawa ku ew yek li cem Îsa û şagirta bû: gurêkirina Xebera Xwedê.

Derheqa vê yekêda bifikirin: wextê ku Îsraêl yekbûyî bû, ew bi tamamî bajarê Erîhayê alt kir. Bin padişatîya Silêmanda Îsrayêl yekbûyî bû, ew çawa milet nedihate altkirinê, û jîyana her kesî açix bû û her kes razî bû, usa bû û ew yek tenê çend nisileta dîtibûn. Mînakên başqe jî hene, lê fikira wê femdarî ye.

Niha em wekî mayîn binihêrin. Eger em derheqa kevirê krîptonî ruhanîyî li Korintîyê xeberdin, em dibînin, wekî Pawlos banga xwe bi van xebera destpêkir: “Berî her tiştî, ez dibihêm, wekî di navbera weda hevraqayîlnebûn hene, wextê ku hûn çawa civîn berev dibin” /A Korintî 11:18, NLT/. Ber cava ye, wekî ew *yekbûyî* nîbûn. Pirs pêşda tê: gelo çi îzin nedida ku ew bibine yek? Menî lîstikên wane tevî kevirê krîpton bû, gurênekirina Xebera Xwedê. Hema wî cûreyî jî, rûyê gurênekirina Ekarda Îsraêl îdî yek nîbû û mîna berê altindar nîbû, wextê ku ewî êrîş bire ser Ayê.

Nişkêva Pawlos ji alîkî mayînva nêzîkî vî halî dibe û tiştekî usa dibêje, wekî tê bêjî ew yek ne nêzîkî aqila ye:

> "… û kêm-zêde ez bawarîya xwe liwê yekê tînim. Lê eseyî di nava weda dutîretî wê bikeve nava we, bona ku yên nava weda yên jibare kifş bin" /A Korintî 11:18,19, NLT/.

Gelo bona çi ew yek girîng e, wekî ew merivên ku begemîya Xwedê distînin bêne naskirinê? Çimkî bi vî cûreyî rîya berbi yektîya nava naskirina Kurê Xwedê û bawarîyêda vedibe. Eva wî cûreyî girîng e, çawa ku eşkerekirina piranîya gurêkirinê û gurênekirina Ekar e, ya bo cimeta Îsraêlê û mîsîya wê. Ew yek bêhesab girîng bû, wekî 12O şagirtên şikestî ji wan 38O-yî başqe bûn, yên ku bi xwestina xwe kirin. Hema ew jî gerekê li civîna Korintîyê biqewimîya. *Piranîya* merivên şikestî û çend merivênneşikestî gerekê bihatana cudakirinê: eger usa nebûya, rîya berbi yekbûnê wê bihata girtinê û rûmeta Xwedê wê li Korintîyê eyan nebûya. Ew yek jî girîng bû, bona anîna qenckirina wan merivên bêsûc, yên ku hindava Şîva Xudan bêxof nîbûn, lê rûyê çend merivada dizêrîyan /ew zedelû bûn, nexweş bûn û ji wede zûtir dimirin/, nêzîkbûna kîjana ya bêqedir bû.

Pawlos baş zanibû, wekî çiqasî girîng bû ku yekbûnê bikin pirsa here pêşin. Ewî zanibû, ku li Orşelîmê, Samerîyayê, Entakîyayê û li bajarên mayîn çi qewimî, kîjana hukumê mezinaya Xwedê li ser xwe dîtin. Bo wê yekê jî, bona yekbûnê ewî ne tenê hîvî ji civîna Korintîyê, lê usa jî bawarmendên li Efesîyê, Fîlîpîyê û Kolosîyê dikir, çawa ku roja îroyîn hîvî me dike. Bi mînaka Îsa em zanin, wekî rîya yekbûnêye tek-tenê ew e, ku em gura Xebera Xwedê bikin.

## Diha mezin

Feqet, derheqa rojên meda meriv dikare çi bêje? Gelo yekbûna nava bawarîyêda meremê me ye? Îzinê bidin ku ez bi cêribandina wextê duakirinekê tevî we nîvî bim, kîjanê ezê tu cara bîr nekim. Min zelal ev gotin bihîstin: "Kurê min, himberî wî tiştî çi ku Ez hazir dibim li civînê û bi rîya civînê, hetanî paşdahatina Kurê Min, bikim, kitêba Karên Şandîya wê li ber çava çawa lîstika zaroka bê texmînkirinê".

Ez zendegirtî bûm. Bi rastî, min bawarîya xwe li wê yekê neanî, çi ku min bihîst. Ez li ber wê gotinêda hatim û min got: "Bavo, bona ku ez bawarîya xwe li vê gotinê bînim bona min lazime ku gotinên ji Încîlê binihêrim. Tiştekî hewaskar e, wekî min acizbûn texmîn nekir,wextê ku min derheqa wê yekêda hîvî kir. Em gerekê *hemû tiştî bicêribînin* /binihêre A Têsalonîkî 5:21/. Xêncî wê yekê nivîsar e: "Bi devê du yan jî sê şeda hemû tiştê îzbat bibe" /B Korintî 13:1/.

Awa ji wan gotina yek, ya ku Ewî nîşanî min da:

> "Çimkî Xudanê Esker awa dibêje: "Dîsa carekê /piştî hinek wede/, Ezê ezman û dinîyayê, behrê û erdê ji cî bihejînim, û Ezê hemû mileta bihejînim, û ewê bên li cem Xwestina Hemû Mileta û Ezê vê paristgehê bi rûmetêva tijî bikim",- Xudanê esker dibêje.– "Rûmeta vê paristgeha dawî wê diha mezin be, ne ku ya pêşda"-, Xudanê Esker dibêje" /Hagay 2:6,7,9, NKJV/.

Înformasîyake biçûke ji dîrokê: bi sala ser hev Îsrayêl nava dîltîyêda bû, ew pêşda bin desthilatdarîya babîlonîya, lê paşê jî farisada bû. Xwedê kire dilê padişê Farizistanê Kyûros, ku wan cuhîya aza berde, yên ku dixwestin paşda vegerîyana welatê xwe û ew paristgeh bidana daçêkirinê, ya ku eskerê babîlonîya wêran kiribû. Gelek paşda vegerîyan û bi şabûn destpê kirin çê bikin, lê piştî hinek wede hewaskarîya wana rûyê berjewandîyên kara şexsî û dijîderketina binelîyên cîda unda kirin. Hagay û Zakarîyayê pêxember û usa jî pêxembertîyên rêberên mayîn careke mayîn xwestina nava cimetêda, ya bona bi yekbûyî çêkirina mala Xwedê, dane gurkirinê.

Feqet, pirsa here girîng ev e: gelo pêxember derheqa wê paristgehêda xeber dida, ya ku wana bi kutasî xilaz kir, yan ewî derheqa paristgeheke mayînda digot? Paşê Îsa got: "Wê paristgehê xirab bikin û ezê sê rojada ewê bidime sekinandinê" /Yûhenna 2:19/. Nenihêrî wê yekê, wekî Ew wî çaxî paristgehêda sekinî bû, lê derheqa wêda nedigot, derheqa paristgeha bedena Xweda digot. Gelo meriv dikare derheqa pêxembertîya Hagayda jî usa bêje?

Şiroçîyên Încîlê û dîrokzan dibêjin, wekî paristgeha daçêkirî, ya piştî 7O-salîya dîltîya Îsrayêl, bi mezinaya xwe, bi cûrê xwe, bi hazirîya Xwedêye eyanbûyî, ji paristgeha Silêman zêdetir nîbû. Çi ku derheqa cûrê paristgehêyî ji derva ye, piştî sed sala jî, wextê ku Hêrodês paristgeh bedew kir, yek e ew ji ya Silêman zêdetir nedihate hesabê. Çi ku derheqa hazirîya Xwedê da ye, wextê ku Silêman paristgeha xweye çêkirî pêşkêş kir, rûmeta Xwedê ewqasî mezin bû, wekî ewirekî qalin temamîya avayî tijî kir û kahîna nikaribûn qulixa xwe berdewam bikirana. Tarîq derheqa hazirîya Xwedê ya wî cûreyîye balkêşda, ya li paristgeha daçêkirî, tu tiştî nabêje.

Fêrisîyan gotinên Îsa yên derheqa wêrankirina paristgehêda û derheqa daçêkirina nava sê rojada, şaş fem kirin, çimkî ew difikrîn, wekî gilî derheqa paristgeha çêkirîdane. Hema bi wî cûreyî, eger em gotinên Hagay bidine sînorkirinê û hesab kin, wekî ew derheqa paristgeha çêkirîdanin, wî çaxî emê fikira wana şaş fem bikin.

Derheqa çi paristgehê û kîjan wedeyîda ew dibêje? Pawlos dibêje: "Gelo hûn fem nakin, wekî hûn *hemû bi hevra* paristgeha Xwedê da nin û wekî Ruhê Xwedê nava weda dijî" /A Korintî 3:16, NLT/. Hema ew Ruh jî, Yê ku paristge-

ha Silêman tijî kir, bi zêdaya Xwe, bi cûrê yekbûyî nava meda dijî. Ez guman im, wekî Hagay hema derheqa vê paristgehêda dinivîse û paristgeha dawî civîn e. Rûmeta wê yekê /hazirîya Xwedê û mezinaya zorayê/ ji rûmeta paristgeha pêşda çêkirî zêdetir e. Pawlos dinivîse: “Eger ew qanûna ku unda bû, bi rûmetê hatibû, wî çaxî ev rîya nû… diha zêde bi rûmet e” /B Korintî 3:11, NCV/.

Derheqa wê rûmetêda /mezinayê, zorayê/ bifikirin, ya ku peymana Kevin da eyan bû. Sifetê Mûsa bi saya rûmeta Xwedêye mezin usa dibriqî, wekî ewî gerekê xêlî biavîta ser sifetê xwe, bona ku ew yek bihata nixamdinê. Wextê ku paristgeha kevin hate çêkirinê, hazirîya Xwedê bi cûrê usa zor eyan bû,wekî tu kes nikaribû nêzîk bûya.Wextê ku Silêman ew çêkir û pêşkêş kir, hazirîya Xwedêye eyanbûyî careke mayîn ewqasî mezin bû,wekî kahîna nikaribûn qulixa xwe berdewam bikirana. Hazirîya Wî ya bi rûmet gelekî bi qedir bû û meriv zendegirtî dima. Feqet, bi gotinên Pawlos, “Ew rûmeta ewlin bi tomerî hildayî himberî mezinaya rûmeta rîya nû, rûmet nîbû” /B Korintî 3:1O, NLT/.

Lê gilî derheqa kîjan wedeyî da ne? Gelo Hagay derheqa temamîya şuxulkarîya civînêda dibêje, ji destpêkê hetanî dawîyê, ji wî çaxîda, wextê ku Îsa çû ezmana û hetanî hatina Wî ya cara duda?

Careke mayîn wan xeberên Xwedê bixwînin, yên ku Hagayê pêxember nivîsîne:

> “Dîsa carekê /piştî hinek wede/, Ezê ezman û dinîyayê, behrê û erdê ji cîh bihejînim, û Ezê hemû mileta bihejînim, û ewê bên li cem Xwestina Hemû Mileta û Ezê vê paristgehê bi rûmetêva tijî bikim” /Hagay 2:6,7,9, NKJV/.

Ew rûmet, derheqa kîjanêda Ew dibêje, hema wî çaxî wê eyan bibe, wextê ku Ew hemû tiştî bihejîne. Xudanê kaxeza Îbranîya vê yekê îzbat dike: “Ew carekê jî soz dide: “Ezê carekê jî ne tenê dinîyayê, lê ezman jî bihejînim”. Ev yek dide kifşê, wekî efrandarî wê bi temamî bê hejandinê û dûrxistinê, bona ku tenê tiştên ku nahejin, bimînin” /Îbranî 12:26,27, NLT/.

Kaxeza Îbranîya sala 68-ê zemanê me hatibû nivîsarê, ji wan qewimandina diha derengtir, derheqa kîjanada min serê kitêbêyî derbazbûyîda anî ber çava, dêmek ew yek, wekî nexweş dianîn li ser rêyên Orşelîmê, bajarên tam dihatin Xudan bibînin, temamîya rêgîona Xebera Xwedê guhdar dikirin, û tiştên mayîn. Ev yek dide kifşê, wekî sozê nava kaxeza Îbranîyada nivîsar derheqa zemanê kitêba Karên Şandîya da nîne: ew derheqa pêşerojêdane, derheqa wedê xilazbûnêdane, wextê ku efrandarî wê bi temamî biheje. Gilî derheqa nisileta dawîda ne, ya ku wê paşdahatina Xudan Îsa Mesîh bibîne.

Tiştekî îzbatbûyî heye, kîjanî meriv dikare nava temamîya Încîlêda bibîne: *Xwedê her dem tiştê herî baş bona dawîy*ê *xweyî dike*. Nivîsar e: “Dawîbûna tiştekî ji destpêka wî baştir e” /Zanebûn 7:8/. Îsa vê yekê wextê şahya li Kanayê nîşan dide û şeraba here baş bona dawîyê xweyî dike. Ew diha dereng dibêje: “Ewê ku bawarîya xwe li Min bîne, ew kirên ku Ez dikim, ewê bi xwe jî bike, û ji van kira mezintir jî wê bike” /Yûhenna 14:12/. Bona çi “yê diha mestir” gerekê peyî wê yekêra biqewimîya, wextê ku Îsa biçûya Ezmîn? Çimkî Ewî her dem tiştê herî baş bona dawîyê xweyî dikir.

Ev yek nava pirsa civînêda jî rast e: dawî wê diha baş be, ne ku destpêk. Kitêba Karên Şandîya destpêka berbiçav dide kifşê: gelo em gerekê bawar bikin, wekî xilazbûna zemanê civînêye li ser dinîyayê wê kêm rûmet be, kêm zor û kêm hukumdar be, ne ku destpêk? Bizanibin, wekî Pawlos wê yekê bi guman îzbat dike: “Bona ku bawarîya we bi serwaxtîya meriva nîbe, lê bi zoraya Xwedê”, û careke mayîn, “Çimkî padişatîya Xwedê ne bi gotinê ye, lê bi zorayê ye” /A Korintî 2:5 û 4:2O/. Zoraya li ser vê dinîyayê eyanbûyî cudatîke padişatîya Xwedêye here girîng e.

## Dasekinandin

Ruhê Pîroz diha zêde parçên Încîlê nîşanî min dan, feqet anegorî wan çend parça, bi kîjana ez tevî we pareve bûm, li ber çava ye, wekî dîtinoka me, bawarmenda, gerekê berfireh be, û serbara serda ji wê yekê zêdetir be, çi ku em kitêba Karên Şandîyada dixwînin. Tiştekî hewaskar e, ku em bidine kifşê, wekî Petrûsê şandî, bi Ruhê Pîrozva tijîbûyî, got:

> “Ewê careke mayîn Îsa bişîne, wî Mesîhîyê ku berêda bona we kifş kirîye. Çimkî lazim e ew li Ezmîn bimîne hetanî zemanê dasekinandinêye dawî, çawa ku Xwedê berê bi destî pêxemberên Xweye pîroz soz dabû” /Karên Şandîya 3:2O,21, NLT/.

Van gotina bi guhdarî lê binihêrin. Ya ewlin, Îsa gerekê li Ezmîn bimîne, hetanî ku tiştek biqewime.Usa ye, ew nikare paşda vegere, çimkî hela hê sozê Bavê  neqedîyaîye. Ew soz kîjane, derheqa kîjanîda pêxember jî dibêjin? Ew dasekinandina paristgehê ye. Bi gilîkî mayîn gotî, li ser vê dinîyayê, mezinaya, dewlemendtîya, karebûna, zêdaya, hurmet û bilindaya Xwedê îdî wê kêm nîbin, lê wê bi cûrê tomerî eyan bin, li paristgeha Wî û bi rîya paristgeha Wî.

Gelo ev yek nava rojên meda diqewime? Gelo civîn awqasî qewat e, wekî em dibine dîtindarên xilazbûna bajar û rêgîonên tam? Gelo nexweşxane vala

dibin? Gelo çavên kor vedibin, seqetên dinêketî banz didin û pesinê rûmeta Xwedê didin? Gelo avahî ji qewata duayên me dihejin? Gelo zêdaya meye usa heye, wekî qulixdarî û civînên me bêyî dijwarî dikarin bighîjine undabûyên her welatekî? Gelo hewcetîyên merivên civînê hene? Diqewime hema ev e menî, wekî Hagayê pêxember dipirse:

> "Tê bîra kesekî, ku ev Paristgeh bi bedewetîya xweye berê ye? Ew bona we niha himberî ya berê çi cûreyî ye? Diqewime ew mînanî *tu tiştî*li we tê kifşê" /Hagay 2:3, NLT/.

Hagay vê pirsê dide merivên ku li ber wî sekinîne, lê roja îroyîn Xwedê wê pirsê dide me. Werin em bêqelp bin: himberî kitêba Karên Şandîya hazirîya Wî ya eyanbûyî, bi kîjanê em îro dijîn, tê bêjî mînanî *tu tiştî nine*.Eger em vê ras-tîyê fem nekin, emê bi germayî necedînin, ku zoraya Wî ya mezin li civînê bê dasekinandnê. Dewsa wê yekê emê çawa civîna bêqewat razî bin.

Gelo em dikarin îzinê bidine xwe, ku tunebûna yekîtîyêra qayîlbin, menîya kîjanê kevirê krypton e, yê ku cefê dide me. Ez hîvî dikim, hîvî dikim, min guhdar bikin: em gerekê bicedînin ku nava Wî da yek bin, û ew yek dikare biqewime, eger em gura Xebera Wî bikin û bawarîya xwe lê bînin.

Niha, wextê ku me meremê xwe zelal dît, em paşda vegerine li ser eyankirina kevirê krîpton, yê ku bona pêşkeftina me dijwarîya çê dike, him bi şexsî, him jî çawa ola bawarmenda.

## gava praktîk

Çawa ku em hela hê nizanin ku bona me çi dikare bibe, emê rûyê wê kêmasîyêda nerazî nîbin, kîjanê em çawa tiştê sade hesab dikin. Feqet niha, piştî xwendina evî serê kitêbê, hûn zanin ku çi tiştê me dikarin hebin. Dêmek, hûn gerekê qirara qewîn qebûl bikin: yan gerekê jîyana zeyîf, bêqewat û ji hukum der qebûl bikin, ya ku bona piranîya civînê nas e, yan jî gerekê hûn her dem berbi ewê jîyana qewat bicedînin, ya ku mezinaya Îsa Mesîh ya yekbûyî û ber çava eyan dike.

Çawa ku hela hê guman nînin, wekî ev hemû tişt dikare biqewime, hûnê tu tiştî nekin. Feqet, eger hûn tu tiştî nekin, hûnê nava bêqewatbûnêda bijîn. Usa ye, gava ewline berbi vê yekê ew e, wekî hûn qirar bikin gumana xwe bidine li ser Xebera Xwedê û wê dîtinokê, ya ku Ewî daye we.

Nava kaxeza Efesîyada nivîsar e, wekî Îsa bi Xebera Xwe me paqij dike. Em dikarin gotinên xwe bidine xebatê, bona ku tevî Wî nava şuxulkarîya paqijbû-

na meda hevkarîyê bikin. Derheqa ewê jîyana zorda binivîsin, bona kîjanê hûn hatine gazîkirinê, mînak “Îsa bi ruhê zoraya Xwe ez tijî kirim, bona guhartina merivên dor-berên min”, yan jî, “Xwedê mezinaya Xwe ji nava minda bilind dike, bona ku bighîjine undabûya”, yan jî, “Ez rûnkirî me, bona ku hukum li ser xebatkarên xwe bihêlim û cîhê xebata xwe biguhêrim”. Destpê bikin her roj van rastîya nava jîyana xweda belav bikin. Hûnê bibînin, wekî nava weda roj bi roj aminaya şuxulkarîyê wê diha zêde bibe.

# BEŞA DUDA

# 8

# PEYMANA ZEWACÊ

Nava çend serên kitêbêye bi sire da meriv dikare bifikire, ku em ji têma xwe dûr dikevin, lê ez didime bawarkirinê, wekî peyî wê yekêra, wextê ku em çend rastîyên girîng îzbat bikin, emê berdewam bikin derheqa wî kevirê krîptonî ruhanîda xeber bidin, yê ku civînê dizêrîne.

## Zewaca sade?

Werin em dîna xwe bidine serpêhatîkê, u ez gumanim, wekî ew heleqetîyên me yên pîroz û cuda yên tevî Xwedê diha baş tîne ber çava, lê ne ku meseleke başqe, kîjanê ez dikarim bînime bîra xwe.

Cahilekî bi navê Castîn îdî serê salekêye ku rastî keçeke bi navê Ancêla tê. Bi fikira Castîn ew keç şexseke bedew û baş e. Ew bengî bûye û bi dil dixweze temamîya jîyana xwe tevî wê derbaz bike.

Castîn êvarîke mexsûs teglîf dike. Wextê ku ew dema qirarkir tê, ew çok dide erdê û gustîlka bi kevirê dur ji qutîke biçûk derdixe.

Ancêla bi hijmekarî mêze dike. Ew sifetê xwe digre û hêsirên şabûnê li ser sûretê wêra dikişin. Ew nikare xwe zeft bike û bêyî deng, lê bi şabûn, serê xwe dihejîne, dide kifşê ku ew qayîl e. Hinekî şûnda ew rihet dibe û bi şabûn dibêje: “Belê, belê, belê, ezê te bistînim”.

Şahîya mînanî nava çîrokada piştî çend meha tê derbazkirinê. Peyî wê yekêra ew diçine seferê, bi hizkirin, bi ken û bi xiyalên derheqa pêşerojêda. Hemû tiştên wan hene, derheqa çida du cahil dikarin bixwezin û hela tiştek jî zêde.

Wede derbaz dibe û Castîn dibîne, wekî Ancêla şexseke diha zêde hewaskar

e, lê ne ku çawa ewî derheqa wêda difkirî. Ewê henek hiz dikirin, hiz dikir şa bûya. Heleqetîyên wêye tevî malbeta Castîn başin û tevî hemûya jî hemû tişt edil e. Ew aqil e û tê bêjî ew her dem gavekê ji Castîn pester e. Ew efrandar e û fikirdarîya wê gur e. Castîn bi wan guhartinên bedewva zendegirtî maye, kîjana ew li mala wan dike. Ancêla diha baştir xwerina çê dike, ne ku ew. Ew usa jî teşkîldar e. Zêdeye bê gotinê, wekî Castîn emekê wêyî nava yekîtîya nû da sazkirîda bi xweşî qebûl dike. Pêşeroja wana gelekî baş tê kifşê.

Meh derbaz dibin. Jîyana wane zewacê îdî ketîye nava rîtima qewîn. Rojekê, êvarê, Castîn ji xebatê vedigere malê û hîvîyê ye, wekî ewê Ancêlayê bibîne û ewê hevdu hembêz bikin û ewê ji Ancêlayê ramûsanê bistîne. Ew nava malêda Ancêlayê digere, pêşîyê diçe oda mêvana, paşê aspêjxanê, diçe hewşa malêye piştêva, û bi kutasî diçe oda razanê û li wir wê dibîne.

Usa tê ber çava, ku tê bêjî ew hazir dibe ji malê here. Odêda dengê miqamê romantîk belav bûye û pêra jî bêhna rûnê xweşî nas tê texmînkirinê. Castîn şaşmayî dinihêre, wekî Ancêlayê xwe hazir kirîye û kinceke xweye bedew xwe dike, ya ku ewê tek carekê xwe kiribû, wextê ku Castîn ew teglîfî rêstoraneke wane hizkirî kiribû.

*Ancêla sekinîye û hela hê mêrê xwe nedîtîye, wekî ew ketîye odê. Castîn tevî hev bûye: "Gelo me qirar kiribû vê êvarê tevayî şîvê bixun, lê min bîr kirîye? Ez gerekê biçûma dikana kulîlka û baqeke gula bona wê bikirîya".*

Ew wê bêdengîyê diteribîne.

-Selam, delala min.

Ancêla nişkêva dibihê û tevhevbûyî dibêje:

-Selam, delalê min.

Ew bi xwemikurhatin destpê dike:

-Diqewime min tiştek bîr kirîye. Progiramên meye vê êvarê hebûn?

-Na, delalê min,- ew dibêje.

Castîn, hinekî tevîhevbûyî, dicêribîne hal qîmet bike. Ew difikire, wekî Ancêlayê bona wî syûrprîz hazir kirîye. Ew difikire: *"Diqewime* şîva meye *mexsûs wê li malê hebe, yan jî êvarîke syûrprîz, ya ji bajêr der"*. Wî çaxî îdî Ancêlayê xwekirina kinca xilaz kirîye û hazirîyên mayîn dike.

-Vê êvarê tu gelekî bedewî,-Castîn pesinê wê dide.

-Sipas, delalê min,- ew dibêje.

Castîn hela hê fem nake ku çi diqewime, û jê dipirse:

-Tu dixwezî ku ez jî wî cûreyî kinca xwe bikim?

Ancêla, hinekî şaşbûyî, dibêje:

-Tu dikarî, eger dixwezî.

-Castîn dicêribîne fem bike ku çi diqewime û dibêje:

-Ez jî gerekê wî cûreyî bême kifşê, çawa tu. Ez naxwezim bi kincê xweye xebatêva bim, wextê ku te awqasî bedew kinc xwe kirine.

Bi kutasî, Ancêla, bona dûrxistina vê xeberdana nefesal, dibêje:

-Delalê min, ez vê êvarê pevketîme.

-Ez zanim û bo wê yekê jî dixwezim bona te kincê nû xwe bikim,- Castîn îdî bi temamî şaşbûyî ye.

Bi cêribandina zelalkirina hal, Ancêla dibêje:

-Na, delalê min, ez Tonîra pevketîme. Emê tevayî şîvê bixun, herine sînêmayê û şev li hotêlê bimînin. Ezê hetanî sibeh nîvro paşda vegerim.

-Tonî kîye?,- Castîn bilind dibêje.

-Ew li mektebê hevalê min bûye,- Ancêla bi stîleke praktîk bersivê dide.

-Çi? Tu nikarî herî û rastî wî bêyî.

-Bo çi nikarim?

-Çimkî em zewicîne: me xwe pêşkêşî hevdu kirîye û em nikarin tevî merivên mayîn pevbikevin.

-Tu bi dilê xwe dibêjî?,- Ancêla dibêje,- gelek xort hene, tevî kîjana ez hela hê nêzîk im. Bi fikira te, ez gerekê heleqetîyên xweye tevî wana bihêlim, tenê bo wê yekê ku em zewicîne?

-Belê, merivên zewicî hema usa jî dikin. Ew xwe pêşkêşî tenê wî merivî dikin, tevî kîjanî zewicîne,- Castîn bi xeyîd û bi dengê hêrsketî dibêje.

-Bisekine, delalê min,- Ancêla dibêje, dicêribîne him bide zelalkirinê û him jî hevraqayîlnebûna xweye ewlin bide milahîmkirinê. -Tu nava jîyana minda yê ewlinî. Ez piranîya wedê xwe tevî te derbaz dikim. Ez te diha zêde hiz dikim, ne ku hevalên xweye kevin. Feqet tu nikarî guman bibî, wekî ezê îdî rastî wana neyêm. Bi sala ser hev ez wanra nêzîk bûme, ez hela hê wana hiz dikim û ez dixwezim tevî wana wede derbaz bikim. Gelo eva şaş e?

Diqewime we fem kir, wekî ev serpêhatî baş ser hevda nehat.

## Himberîhevkirin

Ez zanim, wekî ev serhatî tê bêjî bêfikir e, lê çawa parastina Ancêlayê, îzinê bidin ez çend pirsa bidim. Castîn nava jîyana wêda yê ewlin e, ne usa ye? Ew Castîn diha zêde hiz dike, ne ku hevalên xweye mayîn, ne usa ye? Gelo ew heleqetîyên xwe diha bilind qîmet nake? Gelo ew piranîya wedê xwe tevî wî derbaz nake? Gelo ew bi gelek alîyava jineke baş nîne?

Bi vî cûreyî bifikirin: Castîn dikaribû keçeke ji rîya xwe derketî bistenda, ya

ku wê derheqa wanda nefikirîya û xwerina malê jî nikaribûya çê bikira. Keçeke usa, ya ku jîyana xweda wê tu tişt nekira û emekê wê jî nava yekîtîya wanda tune bûya. Gelo ew guman bû, wekî Ancêla gerekê nava hemû tiştîda kamil bûya? Ew gerekê nava wededa Ancêla tevî mêrên başqe nîvî bikira? Ewê nod selefê wedê Ancêlayê bistenda. Bona çi ew ewqasî hêrs diket?

Bêguman, bona piranîya meriva ev pirs yên vala ne.

Usa tê texmînkirinê, wekî tu kesî derheqa prînsîpên zewacêye hîmlîda Ancêlayêra şirove nekiribû. Ewê nizanibû, wekî zewac peymana di navbera mêr û jinêda ye û fikira wê yekê ew e, ku ew xwe pêşkêşî hevdu bikin. Ewê mêr kir û fikirên wê cûrekî mayîn bûn, yên ku ji fikirên Castîn cuda dibûn. Ancêlayê texmîn dikir ku qirara wê baş, kardar û praktîk bû. Jîyana wê wê li mala wê baş bûya û ewê heleqetîyên xweye mayîn çawa tiştekî zêde xweyî bikirana. Feqet, qirara wê peymana zewacêye pîroz diteriband.

Em vê rastîyê diha zêde bidine zelalkirinê. Wextê ku jin kincê şahîyêyî bedew xwe dike û bi cêrga kursîyara digere, yan li civînê, yan jî li cîhekî mayîn, li kîderê ew tradîsîya zewacê derbaz dibe, bi wê yekê ew tiştekî girîng dibêje: ew xwetirê xwe ji heleqetîyên nêzîk yên mayîne tevî her mêrekî dixweze. Ew terika hemû heleqetîyên berêye tevî hevala dide, usa jî wê rojê elam dike, wekî ji wê rojêda destpêkirî heleqetîyên wêye nû wê tunebin. Ew mêrê ku hîvîya wê ye, dîsa wî cûreyî wê yekê dibêje.

Mînakeke wî cûreyî em nava jîyana xweda bidine xebatê. Weyê çawa bikira, eger hûn biketana nava halê wî cûreyî, nava kîjanîda bû Castîn? Yan jî, eger merivê ku hûn hazir dibin bistînin, pêşda bigota we, wextê ku hûn hela hê nîşankirîne, wekî piştî gihîştina hevdu ewê wî cûreyî bike, weyê ew bistenda?

Ez nafikirm.Weyê bigota: "Tu car".

Menîya bersiva we kîjane? Ew e, wekî weyê nexwesta bi qewilên mayîn biketana nava peymanê. Weyê nexwesta jîyana xwe bi temamî pêşkêşî heleqetîke usa bikira, nava kîjanêda merivê li rex we wê bi temamî xwe pêşkêşî we nekira.

Bi vî cûreyî, hûnê bi qewilên wî cûreyî nezewicîyana û ne jî weyê piştî zewacê ew kirina qebûlnekirinê hesab hilda. Werin em bêqelp bin û vê pirsê bidin: "Gelo em dikarin bawar bikin, wekî Îsayê bona bûka mînanî Ancêlayê paşda vegere?". Êmekî bisekinin û derheqa vê yekêda bifikirin: heleqetîyên Îsa û me tevî heleqetîyên mêr û jinê tên himberîhevkirinê.

> "Çawa ku kitêba Pîroz dibêje: "Mêr dê û bavê xwe dihêle û dighîje jina xwe, û herdu dighîjine hev, dibin yek". Eva tiştê şirovekirinê nîne, lê eva mînakek e, ya ku dide kifşê, wekî Mesîh û civîn yekbyî ne" /Efesî 5:31,32, NLT/.

Xwedê, berî her tiştî, peymana zewacê îzbat kir, bona ku heleqetîyên meye tevî Xwe bide çêkirinê. Peymana Nû da Îsa çawa zava ye, lê civîn çawa bûka Mesîh e. Wî çaxî menî kîjane, wekî em ne tenê kirina Ancêlayê afû dikin, ya hindava Zavayê me da, lê carina jî piştgirîyê didine wê yekê? Aqûbê şandî derheqa vê yekêda dinivîse. Nava van çend xeberada ew tenê berbirî wana dibe, yên ku dihebînin wekî ew mesîhî ne.

> “Menîyên we bi temamî şaş in: hûn tenê tiştên usa dixwezin, yên ku we razî dikin. *Bêesilno*! Hûn fem nakin, wekî hevaltîya tevî vê dinîyayê we dike neyarê Xwedê. Ez diwekilînim: eger hûn dixwezin bibine hevalê vê dinîyayê, hûn xwe dikine neyarên Xwedê. Hûn difikirin, ku kitêbên Pîroz bêfikir in? Wana da nivîsar e, wekî Xwedê kumreş e, wekî ew Ruhê ku Ewî danîye nava me li Wî amin be. Xwe li Xwedê bigrin, û Xwedê wê nêzîkî we bibe. Destên xwe bişon, gunekarno: dilên xwe paqij bikin, çimkî xwepêşkêşkirina we di navbera Xwedê û vê dinîyayêda pareve bûye. Bila bona kirina we hêsir hebin. Bila kenê we bibe şîn û eşqa we jî keder” /Aqûb 4:3-5,8,9, NLT/.

Ev xeber gelekî berk in. Nava rojên me da, wextê ku bêaminayî nava heleqetîyada bi berfirehî belavbûyî ye, tê texmînkirnê, wekî ew gelekî berk in û serbara serda zêdekirî ne. Wextê ku ez hela hê negihîştî bûm, xeysetekî minî xirab hebû, ku ez tişta serda zêdek biim. Nava xeberdana xwe da min li ser xebera hemû tişt zêde dikir. Nava encamê wê yekê da endamên malbeta min û hevala ez çawa merivekî giran hesab nedikirim.

Bi fikira min, nava vê yekê da, em hemû jî gunehkar bûne, lê her kes anegorî xwe. Dê û bav gelek cara dibêjine zarokên xweye biçûk: “Eger tu careke mayîn vî cûreyî bikî, tê bêyî cezakirinê”. Diqewime ev yek cara ewlin yan duda hukumê xwe bihêle, lê paşê zarok gurênekirinê berdewam dike û eyan dibe, wekî ew guhdarîya wan xebera nake. Nava encamê wê yekê da zarok gotinên dê û bavê xwe bi dil qebûl nake.Ew yek usa jî li mektebê, li cîhê xebatê, nava hukumatêda, nava hevala û malbetêda, diqewime. Gelek cara em bi sivikayî nêzîkî wan eşaretîya dibin, meremê kîjana parastina me ye.

Mixabin, em nêzîkbûna wî cûreyî usa jî hindava eşaretîyên Încîlêda didine kifşê. Em gerekê bîr bînin, wekî Xwedê wê yekê dibêje, çi ku meremê Wî ye, û meremê Wî çi ye Ew wê yekê dibêje. Gelekî girîng e bîra xweda xweyî bikin, wekî temamîya kitêba Pîroz ji bêna ber Xwedê ye /binihêre B Tîmotêyo 3:16/. Bi xwendina nivîsara Aqûb, em gerekê hesab hildin, wekî ew Xebera Xwedê ye.

Eger em rast nêzîkî vê beşê bibin, ewê xofeke saxlem di nava meda pêşda

bîne. Ew mesîhî, xwepêşkêşkirina kîjanî di navbera Xwedê û vê dinîyayêda parevekirî ye, ew *bêesile.* Eva xebereke berk e. Gelek gunehên cûre-cûre hene, kîjana yek dikare hindava yê mayîn da bike: buxdanbêjî, derewkirin, dizî, qîrîn, nêzîkbûna sert û gelekên mayîn. Ji wana her yek hukumê xirabkirinê li ser heleqetîya dihêle û îzin tune bi sivikayî nêzîkî van yeka bibin, lê ji bêesilîyê girantir guneh tune. Awa ev e menî, ku bona çi Castîn ewqasî li ser jina xwe hêrsketî bû. Ancêlayê dijî wî gunehê herî giran kiribû û pêra jî kirina xwe çawa ya şaş hesab nedikir.

Aqûbê şandî gotina xwe berdewam dike û dibêje, wekî wextê kirina bêesilîya ruhanî em xwe dikine dijminê Xwedê. Eva halekî gelekî xirab e, û hema em vê yekê pêşda tînin. Xwedê naxweze, wekî em dijminê Wî  bin, çimkî Ew bi kûrayî me hiz dike. Feqet, wextê ku em hizkirin û xwepêşkêşkirinê dibine berbi rêyên vê dinîyayê û tştên vê dinîyayê, em bi rezedilî nava cêrga dijminên Wî da disekinin.

Gelo îzin heye bi cûrê sivik nêzîkî van gotina bibin? Gelo îzin heye ku em bidine kifşê, ku giva ev para kaxeza Aqûb nava peymana Nûda nîne û ewê hesab hilnedin? Aqûb yê tek-tenê nîbû, yê ku derheqa vê yekêda dinivîsî. Emê bibînin, wekî derheqa vê yekêda Pawlos dinivîsî, eyantîya kîjanî ya derheqa keremêda zêdetir bû, ne ku yên xudanên peymana Nûye mayîn. Derheqa vê yekêda usa jî Yûhennayê şandî dinivîsî. Petrûs û Cihûda jî derheqa vê yekêda dinivîsîn. Feqet, tiştê herî girîng ew e, wekî piştî rabûna ji nava mirîya, Îsa hema ew yek civînên Asîyayêra digot.

Nava serên kitêbêye mayînda emê bi hûrgilî bidine kifşê, ku çawa bêesilîya ruhanî me dike neyarê Xwedê. Emê bibînin, wekî ev nêzîkbûn û kirin hema ew kevirê krypton e, derheqa kîjanîda em xeber didin.

## gava praktîk

Xwedê kumreş e. Ji me gelek meriv zanin, wekî Încîl derheqa vê yekêda hîn dike. Feqet, gelek mesîhîya wede başqe nekirine ku derheqa vê yekêda bifikirin, yan jî bawar dikin, wekî ev rastî tenê ya peymana Kevin e. Eva derewa eşkere ye. Lê eva berovajî ye, hema qurbanîya Îsa gelekî baş dide kifşê, wekî hizkirina Wî, ya hindava meda, mînanî zavayê amin e.

Bêyî şikberî, em bi xwe dixwezin wekî Xwedê me bi cûrê kumreşîyê hiz bike, lê ne ku sera-bera, û em gerekê hîvî ji Wî bikin, ku Ew keremê bide me, ku em bi cedandina wî cûreyî Wî hiz bikin. Tenê vî cûreyî dikare nêzîkayî hebe.

Îro, dilê xwe gotûbêj bikin. Gelo hûn bi cedandina germ Îsa hiz dikin? Hîvî

ji Ruhê Pîroz bikin, ku Ew her cedandineke nava jîyana weda nîşan bide, ya ku dijî bêesilîya miqabilî Xwedê ye. Eger Ew tiştekî li we eyan dike, lazim e ku hûn guhartina bikin. Ji nûva dora heleqetîyên xwe û Îsa bifikirin û careke mayîn xwe pêşkêşî Wî bikin, çawa ku hûn sozên zewaca xwe çê dikin.

9

# BÊESILÎYA DIJÎ XWEDÊ

Xeberên Aqûbê şandî /“*Bêesilno*! Hûn fem nakin, wekî hevaltîya tevî vê dinîyayê we dike neyarê Xwedê?”/ bi wê derecê berk in, wekî hûn hindik cara wextê berevbûnên civînê û hemcivîna, usa jî wextê hevdîtinên tevî bawarmenda, wan xebera dibihên. Feqet em çawa dikarin wê yekê hesab hilnedin? Usa nine wekî ev gotin nava kitêba Pîrozda cuda ye: na xêr, ev têma gelek cara nava Încîlêda rastî me tê.

Eger em gotinên Aqûb lêkolîn bikin û eşaretîya nava wanda guhdar bikin, emê her şaşîkê û tirsa girêdayî wê yekêra bidine dûrxistinê. Werin em careke mayîn vê beşê bixwînin: “*Bêesilno*! Hûn fem nakin, wekî hevaltîya tevî vê dinîyayê we dike neyarê Xwedê. Ez diwekilînim: eger hûn dixwezin bibine hevalê vê dinîyayê, hûn xwe dikine neyarên Xwedê” /Aqûb 4:4, NLT/.

> Ya ewlin, Xwedê nabe dijminê me: em dibine dijminê Wî. Her dû mesele jî, bi cûrê nerm gotî, yên xemgînî ne, lê nava wanda firqî heye.

Me hemûya jî konflîkt dîtine, yên ku rûyê alîkîda pêşda hatine. Bi gilîkî mayîn gotî, ji her dû alîya yek konflîktê destpê dike, yê mayîn dikeve nav, nenihêrî wê yekê, wekî ewê nexwesta ku usa bibûya. Mînak, sala 1941-ê Yaponîyayê qirar kir Fîrl Harborê bide ber bomba û bi wê yekê ewê Ştatên Yekbûyî xwera kire dijmin. Amêrîkayê qirar nekiribû û nedixwest bikeve nava konflîktê. Feqet, rûyê provokasîya xweda Yaponîyayê hêrsa dewleta diha mezin li ser xwe dît.

Aqûb hema derheqa wê yekêda dibêje. Xwedê naxweze derkeve dijî meriva, ew jî zarokên Xwe, lê Ewê ji konflîktê dûr nemîne, eger em bibine mînanî vê

dinîyayê. Nava vê beşêda xebera “dijmin” du cara tê xebitandinê. Nava zimanê yûnanîda ew xeber vî cûreyî ne, “êxtra” û “êxtros”. Fikira wana yek e: firqîya tek-tenê di navbera wanda dîsa wî cûreyî ye.

Diqewime, wekî wergervanên zimanê înglîzî xebera gelekî berk dane xebatê? Diqewime orîgînalêda xebera “dijmin” bi fikira diha nerm e? Bi rastî usa nîne. Ferhengeke zimanê yûnanî van xebera vî cûreyî şirove dike, “dijmin û neyartî” /“*Ferhenga lêkolînkirina xeberên Încîlê*”/. Ferhengeke mayînda nivîsar e: “jîyana neyartîye tevî kesekî” /“*Ferhenga yûnanîya Încîlêye kevinar*”/, û şirovekirineke mayîn jî: “halê dijminatîyê tevî kesekî” /“*Ferhenga Lûv-Naydaêye yûnanî-înglîzî*”/. Ez ji sê ferhengên eyan şirovekirina didim, bona ku wê yekê îzbat bikim, wekî dewsa vê xebera Încîlêye “dijmin” hêja nîne xebereke mayîn daynin. Tiştekî gelekî girîng e, wekî em fikira vê xeberêye rast fem bikin.

Feqet tiştekî mayîn jî heye, ya ku guhdarîya mezin tîne ser vê beşê. Ew yek, wekî Aqûb vê eşaretîyê dinivîse, lê paşê diwekilîne, dide kifşê, wekî gotina wî gelekî girîng e. Wekilandina wîye carekê jî li cem cuhîyên berê, bi cûrê nivîsarêyî qebûlkirî bû. Nenihêrî wê yekê, wekî me piranîya destnivîsarên peymana Nû ji zimanê yûnanî tercime kirine, lê şandîyên ku ew nivîsîne cihû bûn.

Nava zimanên wedê nihada çend mecal hene, ku em xeberê yan jî gotinê bidine cudakirinê, ku guhdarîya mezin li ser wan be. Em dikarin têkstê bi herfê cûrekî mayîn binivîsin, yan jî herfa xwer bikin, yan jî xetê binda bikişînin, yan jî herfên mezin bidine xebatê, yan jî nîşanên gramatîkîye cûre- cûre serda zêde bikin.Van hemû mecala em didine xebatê, bona ku guhdarîya meriva bikişînine li ser wan xebera, yan gotina. Xudanên nivîsaraye cihû ew xeber, yan jî ew gotin, dubare dikirin û wana her dem xeberên xwe fesal didane xebatê, bona ku tu tişt serda zêde nebûya.

Bi vî cûreyî, xêncî wê yekê, wekî eşaretîya Aqûb gelekî kifş û berk e, ew usa jî dîyarkirî ye, bona ku em wê xeberê, yan jî gotinê, girîng hesab bikin. Bi gilîkî mayîn gotî, em nikarin eşaretîya wî hesab hilnedin.

## Jinên bêesil

Bi vî cûreyî meremê Aqûb çi ye, wextê ku xebera “bêesil” dide xebatê? Ya ewlin ew e, wekî nava vê beşêda ew derheqa temamîya merivatîyêda nabêje, lê tenê derheqa bawarmenda da. Em vê yekê zanin, çimkî ewî her dem nama xweda dida kifşê: “Birayên û xwîşkên hizkirî”. Ya duda, merivê bêbawer tu cara nikare dijî Xwedê bêesilîyê bike, çimkî ew tevî Xwedê neketîye nava peymanê.

Mînak, em tevî Lîza Bîvêrê zewicîne û nikarim hindava Cêyn Smîtêda bêamin bim, çimkî min tevî wê peymana zewacê mor nekiriye.

Tenê ew meriv dikarin dijî Xwedê bêesilîyê bikin, yên ku Îsa Mesîh çawa Xudan û Xilazkirê xwe qebûl kirine. Yên mayîn bona Xwedê xerîb in, ji Wî dûr in û tevî Wî peymana wan tune.

Nava zimanê yûnanîda xebera "bêesil" xebera "moyxos"-e. Nava zimanê yûnanîda ev xeber bona qismê jinê hatîye xebitandinê, lê çawa qanûn, ew bi qismê mêriva tê tercimekirinê. Ewê diha rast bûya, ku ew çawa "jinên bêesil" tercime bikirana. Nava hinek tercimên Încîlêda /"KJV", "NKJV"/ cêribandin hatîye kirinê, ku vê yekê bidine nermkirinê û tercime bikin çawa "jin û mêrên ku bêesilîyê dikin/. Wergervanên tercimên "Tercima saxe nû" /"NLT"/ û yên mayîne eyan, û tê bêjî fikira vê xeberêye alîyê qismê jinêda bona wan dijwar bûye: diqewime wana nexwestîye, wekî xwendevan bifikirin, wekî Aqûb tenê derheqa jinada digot. Feqet, wextê ku em têksta namê bi temamî dixwînin, zelal dibe, wekî Aqûb berbirî hemû bawarmenda dibe. Şiroçîyên Încîlê qayîl in, wekî Aqûb tenê derheqa jinada nabêje, lê bona çi ev xeber bi qismê jinêva nehatîye tercimekirinê, û ne tenê bona min, lê bona temamîya şiroçîyên Încîlê eyan nîne.

Eva rûyê wê yekêda usa ye, wekî gotina "jinên ku bêesilîyê" dikin diha gelekî anegorî hemtêksta Încîlêye tomerî ye". Xwedê gelek cara cimeta xwera mesela zewacê dide xebatê û Xwe çawa malxê me, lê me jî çawa jina Xwe nav dike.

Pêxemberên peymana Kevin gelek cara ev yek didane xebatê. Îşaya dinivîse: "Çimkî Efrandarê te mêrê te ye: navê Wî Xudanê eskerê Ezmîn e" /Îşaya 54:5, NLT/. Dêmek, wextê ku aminaya Îsraêl hindava Xwedêda rûyê pûtparistîyêda unda dibû, ew nava bêesilîyêda dihate gunehkarkirinê. Hezeqêl dinivîse: "Ezê te bona bêesilîya te…te ceza bikim" /Hezeqêl 16:38, NLT/. Xwedê bi destî Yêremîya dibêje: "Tu hindava Min da bêamin bûyî, cimeta Îsraêl, tu mînanî jineke bêamin bûyî, ya ku mêrê xwe dihêle. Ez, Xudanê Xwe, Min got" /Yêremîya 3:2O/.

Qulixa Hoseya pêxember bi temamî bêaminaya jinêye hindava mêrda tîne ber çava. Ewî emir kir ku jina xwefiroş bistîne. Nava wê bangêda, ya ku Hoseya bi jîyana xwe terîf kir, ew çawa sembola Xudan bû, lê jina wî Gomêr cimeta Xwedê. Merem ew bû, wekî Îsrayêl bidîta, ku bêesilîya wî ji kirina wê jinê cuda nedibû, ya ku hindava mêrê xweda bêamin bû, lê ew jî ne tenê tevî merivekî, lê tevî çend meriva. Îsraêl "*jina bêesil*" bû.

Yûhennayê Nuxumdar jî heleqetîya zewacê dide xebatê û dibêje: "Bûk bona kê bibe, zava ew bi xwe ye, lê çawa destebirakê zavê sekinî, bona wî dibihê û bi dengê wî şa dibe, usa jî niha dilê min şabûnêva tijî bû" /Yûhenna 3:29/. Careke mayîn bêjim, Îsa Zava ye, lê bûk cimeta Xwedê ye.

Îsa hema wê yekê jî dike, wextê ku cimeta Xwedê çawa "nisilê xirab û xalifî" nav dike /binihêre Metta 12:39,16:4/. Xebera "xalifî", kîjanê Ew dide xebatê, careke mayîn bi fikira qismê jinê dibêje, lê ne ku yê mêr.

Pawlosê şandî vê heleqetîyê dîsa dide xebatê û dibêje, wekî em bûk in, lê Îsa Zava ye /Efesî 5:31,32/. Bi vî cûreyî, em nava Încîlêda dibînin, wekî him nava peymana Kevin da, him jî ya Nû da, em, cimeta Xwedê, çawa jin nava heleqetîyên xweye tevî Xwedê tên dîyarkirinê. Ev e menî, wekî Aqûb xebera "xalifî" bi fikira qismê jinê dide xebatê, çi ku anegorî nivîsara Încîlê îzbat dibe.

## Pûtparistî xalifandin e

Nivîsarên peymana Kevin, yên derheqa wê yekêda, wekî Cihûda û Îsrayêl dijî Xwedê bêesilî dikirin, her dem derheqa pûtparistîyêda bûn. Bi zelal gotî, meriv hindava Xwedê da amin nîbûn. Bi fikirmîşbûna derheqa pûtparistîyêda, em bona xwedêyên cûre-cûre heykela, cîhên qurbanîya û çawa paristgeha çê dikin, tînin ber çavê xwe. Feqet, wextê ku Îsa meriv çawa yên xalifî nav kirin, merem ew nîbû, wekî wana şikilên xwedêyê çêkirî dihebandin. Ewî ew yek got, wextê ku meriva hîvî kirin, ku nîşanekê bide kifşê û bide zelalkirinê, wekî Ew Mesîh e.

Nenihêrî wê yekê, wekî Aqûb cimeta Xwedê çawa jinên xalifî nav kir, lê em dîsa nabînin, wekî wana heykel, cîhên qurbanîya û paristgeh çê kirin.

Tiştekî hewaskar e, wekî Aqûb hema derheqa wê yekêda digot, derheqa çida Pawlos digote civîna Korintîya: firqîya di navbera xwîşk û birayên li civînê /Aqûb 2:1-13/, xeberdana xirabe derheqa merivada /Aqûb 3:1-12/, kifşbûna hevsûdîyê, kumreşîyê û xwehizîyê /Aqûb 3:13-18/ û cedandina berbi xwestinên şexsî /Aqûb 4:1-3/. Ev hemû kirin nîşanên bêesilîya ruhanî ne.

Gelo peyîhevhatina Încîlê tê teribandinê? Gelo cimeta Xwedê nava karên bêesilîyêda tê gunehkarkirinê, rûyê tiştekî usa da, çi ku pûtparistî nîne? Bersiva vê pirsê yek e: "Na xêr". Ev hemû tişt bi hevva girêdayîne.

Hema ev e menî, wekî civîna wedê niha tê bêjî eşaretîyên Îsa, Pawlos, Aqûb û yên xudanên peymana Nûye mayîn hesab hilnade. Em pûtparistîyê didine sînorkirinê û wê yekê tenê heykelên pêşkêşî xwedêyên başqe, cîhên qurbanîya û paristgehava didine girêdanê. Rastî ew e, wekî pûtparistî usa jî derheqa civîna Rojavayêye wedê nihada ye. Û diqewime, wekî pûtparistî li cem me diha belavbûyî ye, ne ku li wan welata li kîderê heykela, cîhên qurbanîya û paristgeha çê dikin.

Meremê min ew e, ku ez bidime kifşê, wekî pûtparistî ne tenê bi berfirehî nava kûltûra rojên meda belavbûyî ye, lê ew usa jî ew kevirê krîpton e, yê ku îzin nedida Cihûdayê û Îsrayêlê, ku ew bighîştana açixîyê: dîsa ew kevirê krîptone, derheqa kîjanîda Pawlos civîna Korintiyra dinivîsî: dîsa ew kevirê krîptone, derheqa kîjanîda Aqûb û xudanên peymana Nûye mayîn digotin. Roja îroyîn hema ew kevirê krîpton îzinê nade, wekî bawarmendên cuda û civîn bighîjine açixîyê û bona dinîya meye undabûyî û ya ku dimire, mezinaya Xwedê bidine eyankirinê.

## Menîya vê dinîyayê

Hetanî xeberdana derheqa pûtparistîyêda, em elametîya Aqûb lêkolîn bikin. Ew li ser xwe guman dibêje: "Hûn tenê tiştên usa dixwezn, yên ku tenê lezetê didine we",- lê paşê wê menîyê "vê dinîyayêva" dide girêdanê. Ew prînsîbeke usa dide kifşê, ya ku peymana Nûda hatîye raberkirinê: menîya vê dinîyayê xwestinên xwehiz in. Yûhennayê şandî vê yekê vî cûreyî şirove dike:

> "Çimkî ev dinîya tenê cedandina berbi razîkirinên bedenê pêşniyar dike, berbi wî hemû tiştî dicedîne, çi ku em dibînin, û kubar-babaxî, rûyê destanînên me û hebûna meda. Ev hemû tişt ne ji Bavêne, lê ji vê dinîyayê ne" /A Yûhenna 2:16, NLT/.

Nava vê beşêda gotinên Yûhenna derheqa *hemû tiştên* vê dinîyaêdanin. Gelek tiştên pûtparistîyê hene, lê ew hemû jî tenê derheqa qeydekî nava vê xeberêda kifşkirî da nin. Kirina bêesilîya tevî vê dinîyayê dide kifşê, ku *bi xwestina gelekî zor bêne r*êberkirinê, hindava tiştên usa da, yên ku lezetê didine bedena we, yan jî bêyî Xwedê xweqîmetkirina we çê dikin, dêmek *kubarîya we*.

Nava gotina Încîlêye bi xebereke mayîn, ya "Bang" -da nivîsar e: "Hûn dixwezin hemû tişt bi xwestina we bibe, dixwezin hemû tişt bona we bibe û dixwezn, ku hûn girîng bêne kifşê". Ev e ew qewata vê dinîyayê. Ew bi vî cûreyî dîyar dibe: "Ez zanim, bona min tiştê herî baş çi ye, û ez wê dixwezim".

Tiştekî ecêb e, wekî Xwedê bi Xwe dixweze û dicedîne, ku tiştê herî baş bide me. Ji me her kes gerekê bi dil vê rastîyê bawar bike. Eva bêhesab girîng e, çimkî ev dinîya mînanî hizkirîyekî ye, yê ku meriva berbi xwe dikişîne û wê yekê dike, meremê kîjanê ew e, ku me ji Xwedê bide dûrxistinê. Ev dinîya temê me xirab dike, me tîne li ser wê rê, wekî bide kifşê ku cûrê pêşniyara wê diha gelekî baş e, ne ku ya Xwedê. Awa bo wê yekê jî Aqûb li ser xwe guman dibêje:

> "Dêmek, xwîşk û birayên min, nexapin. Ew hemû tiştê ku qenc e û kamil e, ew pêşkêş e, yê ku ji Bav Xwedê peyayî li cem me dibe" /Aqûb 1:16,17, NLT/.

Aqûb destpê dike, temîyê dide me, bona ku em nexapin, şaş nebin, yan jî berbi tiştên vê dinîyayê neçin. Gotina wî ev e: "*Bona we tu tiştekî qenc bêyî Xwedê tune*". Eger em bi dil bawarîya xwe li vê rastîyê bînin, hûnê nikaribin Xwedê ji xwe dûr bixin. Ew yek girîng nîne, ku tiştek bi çiqasîva li ber çavê me baş tê kifşê, çiqasî kardar hûn dikarin wê yekê hesab bikin, çiqasî jî ew yek we dide şakirinê, çiqasî we dide kenandinê, ew yek bona civaka me bi çiqasîva tiştê

qebûlkirinê ye, çiqasî bi cûrê aqilmendîyê ye, yan jî çiqasî ewê we bike yekî eyan, yan jî dewlemend bike. Eger ew dijî Xebera Xwedêye nivîsar e, usa ye ew yek bona we qenc nîne. Bi kutasî, ewê we bibe li wir, li kîderê hûnê nexwezin: hûnê fem bikin, wekî hûn ketine li ser rîya mirinê. "Heye rê, ya ku li mêrivra çawa ya rast tê *texmînkirinê* û li ber wî rast tê *kifş*ê, lê dawîya wê rêya mirinê ye" /Gotinên Silêman 14:12, AMPC/.

Li ber her merivekî dikarin rêyên cûre-cûre hebin, yên ku dibine berbi bêesilîya tevî vê dinîyayê, lê ew hemû jî tomerî ne. Ew *rast* tên texmînkirinê, çawa yên *qenc*, çawa yên kardar, qebûlkirinê û serwaxt tên texmînkirinê. Feqet, eger ew rê dijî Xebera Xwedê ne, ewê bi mirinêva ser hevda bên.

Ez guman im, wekî bi vê menîyê Xwedê eşaretîyê dide me:

> "Û niha, zarokên Min, guhdarîyê li Min bikin, û guhdarîya xeberên devê Min bikin. Bila dilê te berbi rêyên *vê dinîyay*ê nexalife, û nava rêyên *vê dinîyay*êda şaş nebe. Çimkî vê dinîyayê geleka xistîye û avîtîye erdê, û hemû kuştîyên *vê dinîyay*ê zor bûn. Mala *vê dinîyay*ê rêya dojê ye, ya ku peyayî li odên mirinê dibe" /Gotinên Silêman 7:24-27, min xeberên "ew" û "wê" bi gotina "ev dinîya" pevguhartine/.

Silêman van xebera çawa eşaretîya dûrbûna ji bêesilîya bedenî dinivîse, lê nava vê beşêda banga pêxembertîyêye diha kûr heye: ji tiştên vê dinîyayê dûr bimînin, yên ku temê mêriv xirab dikin. Ew yek çawa ye, wekî awqas milet, tevî Îsrayêl û Cihûda, bi hêsanî peyayî li odên vê dinîyayê yên mirinê dibin? Gelo em dikarin awqasî bêaqil bin, ku em bifikirin, wekî ew qewat îdî tunene? Ji serê kitêbêyî mayînda destpêkirî, emê bidine eşkerekirinê ku ew çiqasî rast û hukumdar in.

## gava praktîk

Tu kes bi wê programê nazewice, wekî wê bêesilîyê bike. Nenihêrî wê yekê, wekî sondên zewacê dikarin hinekî mêriv bidine tirsandinê, lê merivên zewicî cedandina nahêvşînin, bona ku wana xweyî bikin. Wî çaxî, bona çi awqas zewac tên teribandinê, nava wanda usa jî rûyê bêaminîyêda? Bersiv cûre-cûre ne, lê nava hîmê vî hemû tiştîda ew e, wekî meriv îdî xwe ji qewatên ku heleqetîyên wan xirab dikin, naparêzin.

Heleqetîya weye tevî Xwedê hema jîyana we ye. Bêyî Xwedê jîyan tune. Feqet, ev dinîya dicêribîne temê we xirab bike, ku hûn bêesilîyê dijî Wî bikin. Mecala here baş, ya kontrolkirina jîyana we, bi dil cedandina berbi Xwedê ye.

Hûn çi dikarin bikin, ku hûn bi temamî bizanibin, wekî we bi temamî xwe pêşkêşî Xwedê kiriye?

Hûn jîyana xwe çawa program dikin? Hûn wedê xweyî tevî Xwedê xweyî dikin, wedê xweyî bona xwendina Xeberê, duakirinê û girtina rojîya? Hûn li civîna xwe, cîhê xebatê, yan jî nava jîyanêda bi tomerî hildayî, mecala digerin, bona ku qulixî Xwedê bikin? Hûn xebata xwe mînanî hebandina Xwedê mîyaser dikin? Qirar bikin ku hûnê çawa heleqetîyên xweye tevî Xwedê ji bêesilîyê biparêzin. Progirama xwe çê bikin, wê progiramê binivîsin û destpê bikin mîyaser bikin.

# 10

# LI PIŞ PÛTPARISTÎYÊ ÇIHE VEŞARTÎ?

Em gerekê tiştê tarî, yê derheqa pûtparistîyêda bidine eşkerekirinê. Ewê ne zû, ne jî hêsa bê kirinê, lê eşkerekirina pûtparistîyê wê eyantîyî û kara mezin nava govekên cuda-cudada bide me.Tiştê herî mezin ew e, wekî emê hîn bin nava jîyana xweda wan tişta bidine eşkerekirinê, çi jî wê bi hêsanî îzinê bide me, ku em kevirê krîptonî ruhanî nas bikin. Werin em destpê bikin derheqa koka pûtparistîyêda xeberdin.

Nava serê kitêbêyî ewlinda me da dîyarkirinê wekî Xwedê "heta-hetayî daniye nava dilê mêriv" /Zanebûn 3:11, NLT/. Pawlos vê rastîyê bi nivîsar îzbat dike: "Heta merivên ne cihû /bêbawar/ jî, qanûna kîjanaye ku Xwedê nivîsîye tune, didine kifşê wekî ew qanûna Wî zanin, wextê ku ew bi xwe, bêyî guhdarkirinê jî gura qanûnê dikin. Ew didine kifşê, wekî qanûna Xwedê hema dilên wanda nivîsar e, çimkî fikir û wijdanê wan yan wana gunehkar dikin, yan jî dibêjin, wekî ew rast dikin" /Romayî 2:14,15, NLT/.

Eva rastî ye: her merivek bi xwe rêyên Xwedê zane, çimkî ew li ser wijdanê me, ji roja bûyîna me, nivîsar in. Min û Lîzayê, me ev yek fem kiriye, wextê ku me çar kurên xwe terbyet dikirin. Zarotîyêda, wextê ku wana birayekî xwe dixist, xurek kewkî dikirin, li ser dê û bavê xwe hêrs diketin, yan jî tiştên xirab dikirin, nihêrandina wana texmînkirina gunehê dida kifşê, nenihêrî wê yekê, wekî ew hela hê nehatibûne hînkirinê, wekî kirina wî cûreyî şaş e.

Xêncî wê yekê, wekî zanebûna derheqa Xwedêda dilê her merivekîda ye, ew yek usa jî bi rêya efrandarîyê eşkere tê kifşê:

> "Ew rastîya derheqa Xwedê da zanin, çimkî Ewî ew yek wanva *eyan* kirîye…Bi rêya wî hemû tiştî, çi ku Xwedê efirandiye,

> ew dikarin hunurên Wîye nexuya, qudreta Wîye heta-hetayê û xwedêtîya Wî *zelal bibînin*. Dêmek, bona nasnekirina Xwedê *afûkirina* wana *tune*" /Romayî 1:19,2O, NLT/.

Nava vê beşêda derheqa xeberên kifşkirîda bifikirin: *afûkirina* wan meriva nava encamê *eyan kirî ye* û *dîtina zelalda tune.* Rastî ev e: ew merivê ku derheqa Xwedê da nizane, afûkirina wî tune. Feqet Xwedê Xwe hemû kesîva daye eyankirinê, yê ku bêqelp e û dixweze rastîyê bizanibe.

Gelo we qet pirsên vî cûreyî bihîstîne?: "Gelo wê çi bê serê merivê ku li topraxên Afrîkayêye dûr dijî, yê ku derheqa Xwedê da tu cara nebihîstîye? Ew çawa dikare xilaz bibe? Û Xwedê çawa dikare wî gunehkar bike?".

Pirsên vî cûreyî, yên ku gelek cara mînanî şikyata nin, afûkirinên li ser hîmê wan rastîya ne, yên ku meriv îdî zanin, yan jî kîjana ew naxwezin bizanibin. Çawa ku wijdanê wan heye, ew zanin, wekî Xwedê rastî ye, lê ew wê rastîyê înkar dikin. Ew naxwezin vê yekê xwe mikur bên: zanebûna derheqa Xwedê da bona her kesî vekirî ye, yê ku rastîyê digere. Eger em bi temamî bêqelp bin, merivên ku pirsên vî cûreyî didin, gerekê xwe mikur bên, wekî Wî înkar dikin. Zebûr careke mayîn îzbat dike, wekî dengê efrandarîyê derheqa Xwedê da elam dike:

> "Ezman rûmeta Xwedê elam dikin.
> Ezman hostatîya Wî nîşan didin.
> Roj bi roj ew xeber didin,
> Şev bi şev ew Wî eyan dikin.
> Ew bê deng û bêyî xebera xeber didin,
> Dengê wana qet nayê bihîstinê.
> Feqet banga wana li temamîya dinîyayê belav bûye,
> û xeberên wana li temamîya cîhanê" /Zebûr 19:1-4, NLT/.

Zanebûna derheqa mezinaya Xwedêye bêsînorda her dem li temamîya dinîyayê, her sal, her roj, her sehet û her deqe belav dibe. Gelo ew usa jî nagihîje li wî merivê ku li Afrîkayê dijî, yê ku "haj pê tune". Meriv dikare li ser tabîke usa bisekine, ku tê bêjî ew ji heyîna Xwedê haj pê tune, lê rastî ne tenê dilê wîda hatîye danînê, lê usa jî her roj û her şev wîra her dem xeber dide. Hetanî ku meriv bi menîyên cûre-cûre ew yek înkar nekirîye, xwe neanîye li ser wê fikira wî cûreyî û wijdanê xwe neşewitandîye, ew nikare wê rastyê înkar bike ku Xwedê heye.

## Dema guhartinê

Dema guhartinê wî çaxî diqewime, wextê ku meriv yan qirar dike ku Xwedêyê sax bigere, yan jî vê xwestinê bi wê yekêva “razî dike”, berbirî *xwedêkî* yan jî *xwedêya* dibe, bona ku wijdanê xwe sivik bike. Diqewime hûn bifikirin: “*Ez li Rojavayê dij*îm û nava kûltûra meda xwedê tunene. Heykel, ş*ikilên* pîroz, paristgeh û tiştên meye wî cûreyî tu*nene*”. Ez hîvî dikim, ku hûn sebirkin, û ezê nîşan bidim, wekî li Rojavayê, mînanî her kûltûreke mayîn, gelek xwedê hene.

Ev *xwedê* çi cûreyî pêşda tên? Em gerekê bîra xweda xweyî bikin, wekî hemû *xwedê*, yan jî heykelên vî cûreyî meriva çê kirine. Meriv dicedîne femdarîya xweye derheqa heyîna Xwedê da bide razîkirinê, lê usa jî dixweze ku tabîya wî li ber Wî rast be.Wextê ku cûrê xwedêtîyêyî başqe çê dibe, wî çaxî ewê ku wê yekê çê dike, qirar dike ku çi lazime wî xwedêyî bide razîkirinê. Xêncî wê yekê, xwedêyê ku ewî çê kirîye, îzina wê yekê dide, yan jî wî tîne ser wê fikirê ku ewî çê kirîye, çi dixweze û xwestina wî merivîye hundurda bide razîkirinê. Lê niha dûmayîka xeberên Pawlos bixwînin:

> “Belê, wana Xwedê nas kir, lê nexwestin pesinê Wî çawa Xwedê bidin, yan jî ji Wî razî bin. Wana destpê kir fikirên pûçe derheqa wê yekêda li ber xwe derxin, ku Xwedê çi cûreyî ye. Nava encamê wê yekêda fikirên wan bûne yên tarî û şaşbûyî. Wana digot, wekî ew serwaxtin, lê dewsa wê yekê bûne bêfem. Û dewsa dayîna pesinê rûmeta Xwedêyê nemirî, pesinê şikilê merivê pûç-mirî dan” /Romayî 1:21-23, NLT/.

Çêkirina şikilên vî cûreyî nava vê beşa kitêbêda pirsa sereke nîne: ew diha zêde feydayê pirsgirêka mezin e, *Wî çawa Xwedê nahebînin*. Niha diha gelekî girîng e bidine kifşê, ku “hebandina” rast çi ye. Eger em wê yekê çawa *stirana hêdî* bînin ber çavê xwe, ya ku koma civînêye pesindayînê distirê, emê wî çaxî gotina vê beşê şaş fem bikin. Şirovekirina pesindayîna rast miqam û stiran nîne, lê *gur*êkirin *e*.

Çawa xudanê cêrge kitêba, ez hîn bûme, wekî wextê ku xeber yan jî gotineke gelekî nenas kitêbekêda raber dikim, gerekê carekêra şirovekirina wêye hîmlî bidim, yan jî carekêra şirove dikim, yan jî wê xeberê didime xebatê, bona ku fikira wê femdarî bibe. Hemû xudanên nivîsara usa dikin, û Xwedê jî usa ye.

Nava tercimên Încîlêye bi berfirehî belavbûyîda xebera “hebandin” cara ewlin Destpêbûn 22:5-da rastî me tê. Birahîm berbirî xulamên xwe dibe, dibêje ku ewê tevî Îshaq li ser çîyê çi bikirana. Ev in gotinên wî: “Ez û kurikva heta dera han herin û *hebandina* xwe bikin”. Ewê li wir çi bikira? Gelo ewê stirana

hêdî bona Xwedê bistira, yan wê sazbend û stiranbêjên civînê tevî xwe bibirana? Na xêr. Ew diçû li wir, ku gura wê gotinê bikira, ya ku Xwedê sê roj pêşda gotibû wî, wekî kurê xweyî tayê tenê bikira qurban.

Kaxeza Romaya ya 1:21-da, tercimên cûre-cûreda, xeberên "hebandin", "rûmetkirin" û "qedirgirtin" didine xebatê. Ev xeber hevva girêdayî ne. Em Xwedê dihebînin û qedirê Wî digrin, wextê ku em gurê dikin. Wextê ku em hesab hilnadin û bêhurmet dikin, wî çaxî em gurêda nînin. Em dikarin qulixa bi devkî raberî Xwedê bikin, pesinê Wî bidin, derheqa Wî da stirana bistirên, lê eger em wê yekê nakin, çi ku Xwedê dixweze, wî çaxî em Wî bêhurmet dikin û ew hemû tişt dijî hebandinê û qedirgirtinê ye.

Carekê Xwedê gote cimeta Xwe: "Ez temamîya nîşandayîn û qelpîya we nefiret dikim…wan stiranên xweye pesindayînêye bi qalme-qalmê dûr bixin. Ezê miqamê sazên we guhdar nekim. Dewsa wê yekê ez dixwezim lêya heqîtîyêye mezin, çemê jîyana heqe bêdawî bibînim" /Amovs 5:21,23,24, NLT/. Jîyana heq gurêdabûna nava serwêrtîya Wî da ye, lê ne ku ew e, çi ku em çawa xwedêparêzî nav dikin.

Bi rîya peymana Kevin, Xwedê derheqa qurbanîyên bona Xwe qebûlkirî temî dane Mûsa. Qurbanîyên cûre-cûre hebûn, yên ku cimeta Wî dikaribû bida Wî çawa hebandin: qurbanîya berxê /binihêre Derketin 29:39-41/, qurbanîya canega /binihêre Derketin 29:1O-14/, dîyarîya nanîyê /binihêre Derketin 29:41/ û gelek tiştên başqe.Wana usa jî dikaribûn tiştên bînxweşe pîroz li paristgehê yan jî li gorîgehê bişewitandana, çawa cûrê hebandinê /binihêre Qanûna Kahîntîyê 2:2/. Feqet rojekê Xwedê got:

> "Ezê bona wana dua bikim, dilên kîjanaye şikestî û dilsoz hene, yên ku ji Xebera Min dilerizin. Feqet ewên ku rêyên xwe dibijêrin…qurbanîyên wan wê neyêne qebûlkirinê. Wextê ku merivên wî cûreyî *canega* dikine qurban, ew wî cûreyî tiştê qebûlkirinê nîne, çawa ku qurbanîya mêriv e. Wextê ku ew berxê dikine qurban, usa ye tê bêjî se kirine qurban. Wextê ku ew dîyarîya nanîyê didin, dîsa wî cûreyî dikaribûn xwîna beraz bidana.Wextê ku ew tiştên bînxweş dişewitînin, usa ye tê bêjî ew duayî heykela, şikila dikin" /Îşaya 66:2,3, NLT/.

Ew destpê dike nîşan bide, ku kî duayên Wî distînin: ew distînin, yên ku *ji Xebera Wî dilerizin*. Bona merivên wî cûreyî gurêdabûn tiştekî gelekî girîng e. Merivên wî cûreyî li cem Xwedê merkeza guhdarîyêda nin.

Peyî wê yekêra, Ew derheqa wan merivada dibêje, yên ku bi cûrê xwestina xwe Wî dihebînin. Hebandina wana ne tenê tiştê qebûlkirinê nîne, lê weke kuştina meriva ye, weke qurbankirina se ye, dayîna xwîna beraz e û duakirina li şikilê

pûç e. Tiştên vî cûreyî bona Xwedê tiştên qebûlkirinê nînin. Eger kesek bi rastî tiştên wî cûreyî bikirana, qurbanên wî cûreyî bidana û meriv bikuştana, wê ew cimeta Îsrayêlê dûrbixistana, yan jî bikuştana. Ev elametî gelekî berk e. Tiştekî ber cava ye, wekî hebandina wana ne hebandin bû, nenihêrî wê yekê, wekî ew anegorî nivîsarên kitêbên Derketin û Qanûna Kahîntîyê bûn.

Nava şirovekirina "banga" Încîlêda wa nivîsar e:

> "Karên hebandina we kirinên bi gunehava tijî ne". Bîra xweda xweyî bikin, wekî ew gotin derheqa wê cimetêda bûn, ya ku tevî Xwedê ketibû nava peymanê û sozên Wî stendibûn. Bona çi wana eşaretîyên wî cûreyî guhdar dikirin? Çimkî wana bi cûrê xwestina xwe Xwedê dihebandin û gura Wî nedikirin. Ew yek usa jî derheqa meda ye. Em dikarin bona Xwedê stirana bistirên, wextê berevbûnên pesindayînê hazir bin, bihebînin, wekî hindava Wî da amin in, û anegorî mecalên peymana Nûda pêşdakişandî bin. Feqet, eger hîmê me gurêdabûn nîne, wî çaxî hebandina me bêfeyda ye. Ne axir nivîsar e?: "Hûn gerekê çawa zarokên Xwedêye şikestî bijîn" /A Petrûs 1:14, NLT/.

Pirsa bingehîne mayîn, derheqa kîjanêda Pawlosê şandî dibêje, ew e, wextê ku meriv ji Xwedê razî nîne. Eger em li ser wê fikirê ne, wekî dereca meye cuda gerekê hebe, wekî em layîqî hinek eşîyayên matêrîyalî ne, yan jî berbi tabîke cuda dicedînin, emê bibine xwehiz û pêra jî nerazî. Ne axir em gelekî xebitîne, me jîyana xwe progiram krîye, merem qirar kirine û derheqa wî hemû tiştîda nava xiyalada bûne, çi ku me mîyaser kirîye, yan jî çê kirîye, û em bi karên xweva firnax dibin.

## Menîya kirinê

Wextê ku xwestina gurêkirinê, qedirgirtinê û razîbûnê diçe berbi tiştên mayîn, xêncî Xwedê, li cem şexsên cuda nava olekê, yan miletekîda, pûtparistî pêşda tê. Pawlos berdewam dike:

> "Lema jî ew bi xwestina dilê wan dane destê wan hemû tiştên eyb. Kutasîyê wana tiştên xirab û nuxsankirinê hindava bedenên hevduda kirin. *Rastîya derheqa Xwedê da derewêra guhartin*. Serê xwe li ber efirîna danîn, ew hebandin, ne ku li ber Efrandarê heta-hetayê, Yê ku hêjayî şikirîyê ye. Amîn" /Romayî 1:24,25, NLT/.

Bizanibin, wekî nava hîmê vî hemû tiştîda ew e, ku gura Xwedê nakin û ji wî

razî nînin. Niha em xwestinên tebyeta ketî dihebînin. Em gura tiştên ku me çê kirine dikin, yên ku niha herambûyî ne û nifirkirî ne. Alîyê meyî moralî xalifîye û *rastî derewêva hatîye guhartinê*. Tiştên ku îro çawa serwaxtî tên texmînkirinê, bi rastî yên bêaqilî ne. Ew çi ku ji alîyê vê dinîyayêda çawa yê tebyetî tê hesabê, bi rastî ne tebyetî ye. Bi kutasî, ew çi ku bi rastî *qenc e* niha çawa *xirab* tê hesabê, û ew çi ku bi rastî *xirab e*, çawa *qenc* tê navkirinê. Em dîsa xwendinê berdewam dikin:

> "Bona vê yekê Xwedê ew dane bênamûsîyê…" /Romayî 1:26, NLT/.

Nava çend gotinên ku vê yekê îzbat dikin /nava tercima "NLT"-êda 137 xeberên înglîzî/ Pawlos 22 xirabkarîyên dijî Xwedê nav dike. Çawa tomerîkirin, dikevine nava wana, rexnekirin, hiznekirin, timayî, gurênekirina hindava dê û bavada û homosêksûalîzm. Tiştekî kifş e, wekî Pawlos ji wan 137 xebera tenê 59-a dide xebatê /nêzîkî 4O selefî/, wextê ku derheqa homosêksûalîzmêda xeber dide, feqet, bi xeberekê, yan duda derheqa  bîstyek xirabkarîyên mayînda dibêje. Menîya wê yekê kîjane? Gelo Xwedê homosêksûalîzmê cuda dike û îzinê dide, ku çawa gunehkarên diha mezin nêzîkî wan bibin, ne ku bîstyek xirabkarên mayîn? Na xêr. Dewsa wê yekê, ew zelal dide kifşê, wekî nêzîkbûna hindava homosêksûalîzmêda hesabkirinên here rast in, ku civak diha zû dikeve nava pûtparistîyê. Em paşda vegerine berbi gotinên Pawlos:

> "Bona vê yekê Xwedê ew dane bênamûsîyê. Heta jinên wan jî hewcetîya xweye edetîye dinyayê hewcetîya eksîedetîyêra guhêrîn, û dewsa wê yekê nava hevda ketine nava heleqetîyên bedenî. Usa jî mêra dewsa heleqetîyên tevî jina, hindava hevda li ser hev germ bûn. Mêra tevî mêrên mayîn robetî dikirin, û nava encamê gunehê xweda ew ceza stendin, layîqî kîjanî bûn ew" /Romayî 1:26,27, NLT/.

Ew civaka ku naxweze heyîna Xwedê qebûl bike, ji Wî razî be, û gura Wî bike, wê nêzîkî wê yekê bibe ku  bênamûsîyê, bi taybetî homosêksûalîzmê îzbat ke, qebûl ke, destê xwe bona wê li hev bixe, yan jî piştgirîyê bide.Pawlos vê kirinê çawa tiştekî eyb û netebyetî nav dike.

Rastî derewêva tê guhartinê, û bi wê yekêva hal werguhêzî tevlîhevbûnê dibe.

Meha çileya sala 2O17-a, kovara "*Nêşinil Cêografîk*"-ê hejmara xweye mehane pêşkêşî têmayekê kir, ya ku çawa "Şorişa cinsî" nav kir. Rêdaktora komeke mêra berev kiribû, ya ku alîyên cinsî, yan jî qismên cûre- cûre raber dikirin, yên ku mêriv çê kirine.Vê kovarê ji wan pêşekzana, yên ku jîyana cinsî lêkolîn dikin û yên ku wekîlên zankoyên  cûre- cûre bûn,  şêwir stendibûn. Hinek têrmînên wan emê raberî we bikin, yên ku wana dane xebatê, ku wê yekê şirove bikin: bêqism,

yekqism, duqism, transgêndêr, qismê bi xwe û gelek têrmînên mayîn. Diqewime ev têrmîn bi cûrekî mayîn bêne kifşê, lê ev hemû tişt bêaqilî ye û derew e.

Merivên ku têrmînên vî cûreyî didine xebatê, çawa merivên aqilmend, pêşekzanên xwendî û yên wedê niha hesab dikin. Gelo wê çi bê serê civaka me, eger ew bi vê fikirdarîyê bê rêberkirinê? Lêkolîn didine kifşê, wekî hukumata Ştatên Amêrîkaêye Yekbûyî ji 2OO mîlîard dolara zêdetir pere xerc kirîye bona heyîna cinsî û bona pirsên homosêksûalîzmê*. Hûn dikarin bînin ber çavê xwe, wekî bi van mecala tiştên çawa dikaribûn bihatana kirinê? Ew pere dikaribûn bona başkirina avayên mekteba, qewînkirina qewatên polîsyayê, çêkirina firegeha û avayên civakîye mayîn, usa jî alîkirina merivên bêmal, dayîkên tenê û seqeta xerc bikirana. Feqet ev perên mezin bona pirsên wî cûreyî hatine xerckirinê, yên ku dijî wê yekêne ku çawa Xwedê meriv çê kirîye. Hema ji destpêkê Încîl dibêje: “Xwedê meriv çê kir… qismê nêr û mê xuliqandin” /Destpêbûn 1:27/. Ew qismê me qirar dike: Ew zane, ku tiştê herî baş çiîye, çimkî Ew me hiz dike.

Ev hemû tişt bin xêlîya serwaxtîyêda tê kirinê, lê bi rastî meriv bi bêaqilî mecala xerc dikin. Tiştê herî xirab ew e, wekî ew yek piştgirîyê dide kirina şaş û meriva bin dîltîya cûrê jîyanêyî usada xweyî dike, bona kîjanê ew nehatine xuliqandinê.

Çawa civak, em hatine xapandinê, wekî eva wa gotî pirsa “mafên mêriv e” û bi wê yekê em îzinê didine meriva ku vê pirsê werguhêzî selefekî biçûk bikin, û bikine çawa rasîzm, yan jî dîskrîmînasîya qismî. Em gerekê bona mafê mêriv şerkarîyê bikin, lê ew yek ne derheqa wan merivada ne, yên ku dijî wê yekê ne, bi çiva ew xuliqîne.

Eva kirineke bêaqil e, ya ku anegorî pêxembertîya Pawlos wê belav bibe, eger em terika hebandina Xwedê û razîbûna ji Wî bidin.

Dêmek, bona çi bawarmend ev fikir û cedandinên şaşbûyî bilind nakin û eşkere nakin? Me destpê kirîye ji rastîyê bitirsin û me derew û xapandin qebûl kirine. Em ketine nava pûtparistiyê, û ew yek li dinîya me îzbat bûye.

Diqewime civak vê yekê çawa pêşkeftin nav bike, lê bi rastî eva paşkeftina berbi bêaqilîyê ye. Xeberên Pawlose zûva nivîsî eşkere dikin, wekî hîmê bênamûsîya cinsî pûtparistî ye. Ew dîsa encamên başqe nav dike:

> “Û çawa wana qebûlkirina heyîna Xwedê çawa bêfemî hesab kirin, Xwedê jî ew dane fikirên bêtewşe, ku ewana tiştên usaye necayîz bikin, yên ku tu cara gerekê nehatana kirinê. Jîyanên wana

* Mêt Stêyvêr: “Homosêksûalîzm bi deha mîlîyarda dolara ji hukumatê distîne”, Brayan Têman, / nîsan 16, 2O15s, s. 12:4O, http://www.rightwingwatch.org/post/mat-staver-homosexuality-costs-the-government-tens-of-billions-of-dollars/.

> bi hemû cûreyî xirabîyava tijî bûn, bi gunehê, timayê, hiznekirinê, hevsûdîyê, kuştinê, hevraqayîlnebûnê, xapandinê, kirinên xirab û buxdanbêjîyê. Ew rexnekir in, Xwedê hiz nakin, kubar û babax in. Ew cûrên tobekirinêye nû li ber xwe derdixin û gura dê û bavên xwe nakin. Ew naxwezin fem bikin, sozên xwe diteribînin, bêdil û bêrehm in" /Romayî 1:28-31, NLT/.

Hewce nîne ku bi guhdarî lê binihêrin, lêkolîna têmatîk teşkîl bikin, yan jî lêkolîna sosyolocî derbaz bikin, ku nava civaka meda van tişta eşkere bikin. Ew bi berfirehî û bêyî kontrol belavbûyîne û pêra jî şexsa, malbeta û mileta unda dikin. Ev kirinên xirab û qebûlkirina wana menîya kirîzîsên civakî, teribandina heleqetîya û şerên hemû cureyî ye.

Eger ev hemû tişt hela hê çawa tiştê tiragîk nayê texmînkirinê, tomerîkirina Pawlos bixwînin:

> "Ew zanin, wekî anegorî heqîtîya Xwedê, merivên ku van tişta dikin, layîqî mirinêne, feqet ew dîsa wê yekê dikin. Tiştê hê xirab ew e, wekî ew usa jî piştgirîyê didine merivên başqe, ku wan yeka bikin" /Romayî 1:32, NLT/.

Hukumat, prêssa înformasyon, têlêîzyon, prodyûsêrên fîlma, xebatkarên sosîyalî, nevsên resmî, merivên hukumdar û temamîya civakê, baş zanin, wekî kirinên vî cûreyî dijî Efrandarên me ne, lê ew wê yekê hesab hilnadin, çi ku wijdanê wan dibêje û temamîya efrandarîyê elam dike. Û bona sivikkirina wijdanê xwe, ew piştgirîyê didine merivên başqe ku wê yekê bikin, bi wê gumanê, wekî ew yek wê dilên wanda rastîyê bide kerkirinê.

Ev cudatîyên xirabe li jorê navkirî encamê pirsa hîmê pûtparistîyê ye: meriv wê hebandinê /qedir û gurêdabûnê/ û razîbûnê nadine Xwedê, layîqî kîjana ye Ew. Em gerekê bi kirinên xweva heyîna Xwedê qebûl bikin, lê ne ku bi qulixa xweye devikîva. Eva bona temamîya merivatiyê ye: feqet, em guhdarîyê bidine li ser wê yekê, ku çawa pûtparistî nava jîyana wî merivîda tê kifşê, yê ku îdî tevî Xwedê nava heleqetîyada ye.

## gava praktîk

Hebandin ew e, ku gura Xwedê da bin, qedirê Wî bigrin û ji Wî razî bibin. Wextê ku em ji van alîyên hebandina rast alîkî hesab hilnadin, wî çaxî em bona wê xapandinê dibine nîşangeh, ya ku me berbi pûtparistîyê dibe. Ev yek him

bona şexsîtîyê, him jî bona kûltûrayê rast e.

Qewimandina hebandinêye ewlin Încîlêda ew bû, wextê ku Birahîm gura Xwedê kir û çû ku Îshaq bike qurban. Xwedê çi temî daye we? Diqewime Ruhê Pîroz temî daye we, wextê ku we Încîl xwendiye, yan jî diqewime Ewî xebateke mexsûs daye we.

Ev serê kitêbê derheqa wê xebatêda fikira we çi cûreyî guhart? Ji Xwedê bipirsin, ku we gavên çawa îro avîtine, bona ku wê yekê bikin, û ese ji Wî razî bin, wekî Ewî hûn bijartin bona kirina vê xebatê, wekî Ewî wera xeberda, û wekî Ewê tevî we be, wextê ku hûn gava xweye hebandinê biavêjin, gura Wî bikin.

11

# PÛTPARISTİYA BAWARMEND

Nava jîyana merivê vê dinîyayêda pûtparistî tiştekî xirab e, lê nava jîyana merivên ku tevî Xwedêyê sax nava peymanêda nin, tiştekî gelekî bi tirs e.

Aqûb pûtparistîyê çawa bêesilî nav dike. Menî ew e, wekî peymana me tevî Xwedê heye û çawa hevalkarê bêamin em xwe didine pûtparistîyê û em li ber Malxwê xwe, Xudan Îsa Mesîh, bêamin dibin.

## Şaûlê padişa û amalekî

Em ji peymana Kevin destpê bikin û derbazî ya Nû bin. Peymana cimeta Îsrayêlê tevî Xwedê hebû, ya ku ji bavê wan Birahîm destpê bibû. Bi destî Samûêlê pêxember, Xwedê ev teslîmkirin dabû Şaûlê padişa: "Û niha dengê Xeberên Xudan guhdar bike!" /A Padişatî 15:1/. Bêyî şikberî, eva xwestina Xwedê bû.Ew zelal û qirarkirî bû. Padişê emir stend, ku amalekîya bi temamî bide tunekirinê, her mêrekî, her jinekê, her zarokekî û her heywanekî. Ew yek heyfhildana Xwedê bû, çimkî Amalek êrîş biribû li ser Îsrayêlê, wextê ku cimet ji Misirê direvî û nedihate parastinê. Şaûlê padişa carekêra leşker berev kirin ku here ser Amalekê. Feqet, nivîsar e:

> "Û Şaûl derb gîhande Amalekê, ji Evîlayê hetanî Sûra pêşberî Misirê. Û ewî padişê Amelekê Agag girt û gelê Amalekê da ber devê şûr û ew bi tevayî qir kirin. Feqet Şaûl û cimetê Agag nekuştin û ji pez û dewara yên qenc û qelew nekuştin, tenê tiştên lawaz û bêqîmet qir kirin" /A Padişatî 15:7-9/.

Gelekê li Îsraêlê bifikirîyana, wekî Şaûl gura Xebera Xwedê kiribû, lê peyî wê yekêra carekêra nivîsar e: “Xebera Xudan Samûêlra hat û Xwedê jêra got: “Ez poşman im, ku min Şaûl kire padişa, çimkî ew ji Min dûr ket û gotinên Min nekirin.”” /A Padişatî 15:1O,11/. Şaûl ew hebandin neda Xudan, ew milûktî, layîqî kîjanê bû Ew. Ew li Xwedê amin nîbû.

Ez bavekî şaşbûyî tînim bîra xwe, yê ku ez didame bawarkirinê, wekî dijwarîya wîye here mezin, ya tevî kurê wîyî negihîştî ew bû, wekî ewî hemû emirên wîye dayî par-parî dikirin, lê paşê diçû xwestina xwe bike û xwestina wî jî çûyîna cem hevala bû. Wextê ku bav serda hêrs diket, kur her dem digot: “Bavo, bes e tu awqasî berk bî. Min 9O selefê gotina te kirîye. Bona çi tu awqasî berkî? Bona çi tu dîna xwe nadî 9O selefê ku min kirîye, lê wî deh selefî dibînî, yê ku *min nekirîye*?”. Ew meriv bêhnteng bibû.

Min usa gote wî: “Xwedê jî usa berk e”. Min ev serhatîya derheqa amalekîyada bîr anî. Min gotê, wekî Şaûl diqewime here kêm sed hezar mêr, jin û zarok kuştibûn. Ez guman im, wekî ewî diha zêde pez, bizin û heywanên mezin kuştibûn, lê ne ku ewî nekuştibûn. Dêmek em dikarin bi guman bêjin, wekî Şaûl ji 9O selefî zêdetir gotinên Xwedê kiribûn, lê Xwedê got, wekî Şaûl gura Wî nekiribû, lê paşê derheqa Şaûlda xeberda û xebera “serhildan” da xebatê /xeber 23/.

Ev mesela Încîlê alî wî merivî kir, ku ewî fem bikira, wekî ewî rast texmîn dikir ku kirina kurê wî şaş bû.

Bi rastî, ez gumanim, wekî Şaûlê Padişa nêzîkî mîyaserkirina 99 selefên emirkirinên Xwedê bû. Bona çi Xwedê dîna xwe neda hemû kirên Şaûl, lê tenê ew selef dît, yê ku ewî nekiribû. Bi fikira geleka eva berkbûneke zor e, lê bona Xwedê gurêdabûna par-parî, û diqewime gurêdabûna nêzîkî tambûnê dîsa gurêdabûn nîne, lê serhildan e. Ew yek dide kifşê, ku wî cûreyî meriv ewê tabîya qedir û hebandinê nade Xwedê, layîqî kîjanîye Ew.

Samûêl ber gilîyê Şaûlda hat, yê ku rûyê xapandina xweda gunehkarkirina wî înkar kir, lê Samûêl heywanên ku dihatine qurbankirinê nîşan dan. Şaûl cêriband wî gunehî biavêje ser cimetê, lê Samûêl ew yek rast kir: “Na xêr, tuyî rêberê wan, û tu gura Xwedê da nîbûyî” /şirovekirina bi xeberên başqe/. Wextê ku Şaûl bi mecbûrî dijîderketina pêxember qebûl kir, Samûêl rastîke ecêb derheqa pûtparistîyêda eyan kir:

> “Çimkî serhildan wek sêrbaziyê ye û serhişkî *mînanî* pûtparistiyê ye. Çimkî te Xebera Xwedê înkar kir, Ewî jî te înkar kir, ku tu îdî nikarî çawa padişa bimînî” /A Padişatî 15:23/.

Niha ezê derheqa gotina duda da bêjim: “Serhişkî…*mînanî* pûtparistiyê ye”. Xebera “serhişkî” nava vê gotinêda dide kifşê “dûr bixe”, yan jî “hukum bike”.

Şaûl rastî û gurêdabûna tam ji xwe def dida û dûr dixist.

Xebera “mînanî” hatîye kifşkirinê, çimkî ew dide kifşê, ku ew nava nivîsara orîcînalda tune. Nava zimanê îbranîda ev xeber tune, û tercimeçî ew zêde kirine, bo ku têkst diha baş bê xwendinê. Wê diha baş be, ku vê beşê vî cûreyî tercime bikin: “Serhişkî…pûtparistî ye”.

Bi rastî, wextê ku kesek rastîyê zane, xwestina Xwedê zane, zane ku Xwedê çi gotîye, lê wê yekê ji xwe dûr dixe û gurê nake, ew yek pûtparistî ye. Bona çi meriv usa dikin? Çimkî xwestinên wan û xiyalên wan bona wan diha girîng in, ne ku yên Xwedê. Ew hemû tişt nava jîyanên wanda pirsên diha mezinin, ne ku Ew, lê pûtparistî ew e, çi ku em ji Xwedê girîngtitr hesab dikin.

Şaûl bawar dikir û diheband jî: “Min gura Xwedê kir”, lê ew bi temamî gura Xwedêda nîbû, lê qirar kiribû xwestinên cimetê, çawa yên girîng hesab bike /diha rast xwestinên xwe/ ne ku Xebera Xwedê, û ew yek pûtparistî bû. Wê yekê ew kor kir û îzin neda ku ew hesabhilnedana hindava Xwedê da bibîne.

Ew çi ku nava kaxeza Romayada derheqa temamîya merivatîyêdane, usa jî hêna Şaûlda, rast e. Nava hîmê pûtparistîya Şaûlda heykel, cîhên qurbanîya û paristgeh nîbûn.Pirs ew bû, wekî ewî hebandina tam nedida Xwedê, gura wê yekê nedikir, çi ku Xwedê elamî wî kiribû.Rûyê kirina vî cûreyîda meriv bi nezanî rastîyê derewêra diguhêre.Nava encamê wê yekêda Şaûl xwe teslîmî xapandinê kir. Xapandinê ew berbi “bêfikirîyê” def da û ewî destpêkir “tiştên usa bike, yên ku gerekê nehatana kirinê”. Pûtparistîya Şaûl gihîşte encamê tiragîk: jîyana wî diha zêde û zêde xirabiyêva tijî bû. Ew bû hevsûd, berk û bêfikir: ew hêrsêva tijî bû, despêkir êrîşî ser xulamên Xwedê bike, merivên bêsûc û guneh kuştin û serbara serda jî dewsa berbirîbûna berbi Xwedê, ew berbirî sêrbaziyê bû. Awa çend cudatîyên xeysetê Şaûl, yên ku rûyê pûtparistîyêda pêşda hatin.

Gelek cara, merivên ku tevî Xwedê nava heleqetîyadanin, xwestinên xwe ji wê yekê bilindtir digrin çi ku Ewî zelal Încîlêda daye eyankirinê, ew gurênekirina xwe nabînin. Çawa ku mesela Şaûl e, pûtparistî bona dîtina rastîyê me kor dike. Em rastîyê derewêra diguhêrin û bawar dikin, wekî Xwedê li alîyê me ye. Em difikirin, wekî Ew dilê me fem dike, û rûyê wê yekêda kirina mera qayîl dibe û begemîyê dide jîyana me, lê em dijî Xwedê ne û bûne dijminê Wî.

## Razîbûn

Ezê alîyê pûtparistiyêye mayîn raber bikim û du xeberên kilît şirove bikim. Ya ewlin xebera “razî”-ye /“razîbûn”/. Ferhenga “Mêrîyam-Wêbstêr” vê xeberê şirove dike çawa “bi hebûna xwe, tabîya xwe, yan jî halê xwe, razîbûnê texmîn dikin, yan jî didine kifşê”. Nava peymana Nûda xebera ku gelek cara tê xebi-

tandinê, xebera yûnanîye “*arkêo*”-ye, şirovekirina kîjanê ev e: “razî kin, razîbin û usa jî bi fikira alêgorîk, qewat bin û bikaribin alî yekî bikin” /“*Ferhenga tam, ya lêkolînkirina xeberên peymana Nû*”/.

Em nikarin bi cûrê tam qulix bikin, eger em razî nînin. Eger ev tişt li cem me tune, emê halê vî cûreyî ji alîyê *berjewandîya xweye şexsî da* lê binihêrin. Kirinên me û gotinên me diqewime ji derva çawa yên ne xwehiz û serbara serda çawa yê xwepêşkêşkirinê bêne kifşê, lê eger ew li ser razîbûnê nehatine hîmdanînê, wî çaxî ewê bona berjewandîya me pêşda bên.

Pawlos civînekêra dinivîse: “Ne ku ez derheqa hewcetîyêda dibêjim, çimkî ez hîn bûme ku hemû alîda razî bim” /Fîlîpî 4:11, NKJV/. Rast e, hewcetîyên wî hebûn: feqet, pêşîya van gotina ewî gote wan meriva, qulixî kîjana ewî dikir, wekî pêşkêşa wana ewî bona kara xwe nedixwest, lê bona kara wana dixwest. Ewî nikaribû derew bikira, yan gilî zêde bikirana, wextê ku ewî kitêba Pîroz dinivîsî: dêmek, em zanin, wekî hema ew bû menîya rast, û ew gotina “bi cûrê sîyasî rast” nîbû. Menîyên wî dikaribûn bi dereceke usa yên xwepêşkêşkirinê bûna: eger ew bi temamî razî bûya, eger hewcetîyên wî jî hebûna.

Ev e menî, wekî Încîl dibêje me, bawarmenda: “Xwedêparêzî tevî *razîbûnê* berjewandîya mezin e. Bi heyîna xwerinê û kinca em gerekê *razî* bin” /A Tîmotêyo 6:6,8, NKJV/. Nava razîbûnêda “berjewandîya mezin” heye, lê berjewandî her dem nîne, wekî nava jîyana meda tê kifşê. Razîbûn alî me dike, ku em qewîn bin û teslîm nebin, hetanî stendina bersiva duayê xwe.

Carekê nava duayêda min ji Xudan pirsî, ku *Ew* çawa razîbûnê şirove dike. Min dilê xweda bihîst: “*Razîbûna tam nava xwestina Min da*”. Jîyana Xudan Îsayê me mînaka razîbûnêye here baş e. Em nava xeberên Wî da her dem dibihên: “Xwerina Min ew e, ku Ez xwestina Yê ku Ez şandime bikim û şuxulên Wî bînime sêrî” /Yûhenna 4:34/. Razîbûna Wî ya bi xwestina Xwedê û xwepêşkêşkirina xwestina Xwedê nava Zebûrekîda kifş e: “Bi kirina xwestina Te, Ez razîbûnê texmîn dikim, Xwedêyê Min, û qanûna Te dilê Min da ye” /Zebûr 4O:8, NKJV/. Bona Wî tu xwestinek tunebû, ku ji xwestina Xwedê der bûya. Ewî dicedand ku xwestinên Bavê Xwe mîyaser bikirana.

Meriv gerekê razîbûnê xwerazîbûnêra şaş neke, çimkî alîyê fikirêda ew ji hev cuda dibin. Hûnê bibînin, wekî Îsa “Dua û recakirin bi deng û hêsirên zor” didan” /Îbranî 5:7/. Ewî sivirên wan meriva, yên ku pere diguhartin, wergerandin, û şeva pêşîya zêrandinên Xwe gelekî dixwest ku tevî şandîya şîv bixwera. Ew razî nîbû, ku merivên girêdayî, nexweş û zeyîf didîtin. Ewî bona bindesta şerkarî dikir. Feqet, wextê ku sirê dighîşte hewcetî û xwestinên Wî, Ew razî bû. Ewî hîvî ji Bavê xwe dikir û bawar dikir, wekî Ewê bide.

Ji razîbûnê ev xeber xuliqîn: “Ez bona Bavê sax im”. Evê gumanê ça-

reserî û qewînbûneke usa pêşda anî, wekî Ewî li ser xwe guman got: "Ez zanim, ku kîderê têm û kuda diçim" /Yûhenna 6:57 û 8:14, NLT/. Ev e menî, wekî nikaribûn wî bidine sekinandinê, yan jî şaşkirinê û wekî Ew Xulamê Xwedêyî kamil bû.

## Timayî

Xebera kilîte duda, ya ku girêdayîye şirovekirina pûtparistîyêra, xebera "tima" /"timayî"/-ye, ya ku bi fikira xweva dijî xebera "razî"-ye. Em vê xeberê şirove bikin, bona ku diha baş ewê nava Xebera Xwedêda fem bikin.

Em ji şirovekirina ferhenga destpê bikin. Şirovekirineke "*Ferhenga Wêbstêr*"-ê ev e: "xwestina zor bona destanîn û heyîna hebûnê". Şirovekirina vê xeberêye zimanê yûnanîye anegor diha gelekî ya şirovekirinê ye. Feqet hetanî raberkirina wê, emê xeberên Pawlose nava kaxeza Kolosîyada bixwînin. Ev xeber pêşîya beşekê ne, kîjanêda ew usa jî derheqa *timayêda* bîr tîne.

> "Dêmek, eger hûn tevî Mesîh ji mirinê rabûne, wan tişta *bigerin*, yên ku li jorêne, li kîderê Mesîh li milê Xwedêyî rastê rûniştî ye. Fikira xwe *bidine* alîyê wan tişta, yên ku li jorêne, ne ku li ser tiştên vê dinîyayê.Çimkî hûn mirin, û emirê we tevî Mesîh li cem Xwedê veşartî ye. Gava Mesîh, *Yê* ku emirê me ye, xuya be, hûnê jî tevî Wî bi rûmeta Wî xuya bin" /Kolosî 3:1-4, NKJV/.

Pawlos kilîta mayîna nava halê *razîda* dide me. Wextê ku em bi temamî fem dikin, wekî bi destî Îsa Mesîh em tevî Xwedê nava peymanêda nin, em fem dikin, wekî kêmasîya meye tu tiştî tune. Îsa dibêje,wekî "Padişatî ya me ye", û eger em padişatîya Wî sirîya ewlin digerin, lê ne ku sirîya duda, yan jî sisîya, ew hemû tiştê, ku em hewcê wan in, wê bona me bêne dayînê.

Êrîşa dijmine ewline mezin, ya dijî Îsa, hema berbi vê yekê bû.Wextê cêribandina li qûmistanê, mîrêcin cêriband usa bike ku Îsa ji Bavê Xwe cuda tişt bigeryana. Qewilên li wir, yên nebaş bûn: piştî girtina rojiyaye çil rojî, Îsa gelekî birçî bû. Gumana dijmin hebû, wekî Îsa bianîya ser wê fikirê, ku Ew ji razîbûnê berbi timayê biçûya, lê Îsa ew yek înkar kir. Piştî hinek wede, milyaket hatin û bi xurekê Ezmîn Îsa têr kirin. Progirama dijmin wî çaxî teribî, lê ew yek nade kifşê, wekî ewê hema wê stratêgîyayê dijî me nede xebatê. Meremê wî ew e, ku em ji dayîna padişatîya Xwedê razî nîbin û em bi xwe bona xwe tişta bigerin. Pawlos dibêje, wekî ewên ku Xwedê *digerin,* lê ne ku Xwedê didine xebatê ku ji Wî xwestina xwe bistînin, lê bi temamîya dilê xweva dixwezin dilê Wî nas

bikin, û li Wî xweş bên, dighîjine halekî usa, nava kîjanîda fikira wan berbi tiştên jorine.Nava vî halîda em dibine mînanî Îsa: xwestina me ew e, ku em xwestina Wî mîyaser bikin, Yê ku mera dişîne. Encamê vî halî ew e, wekî me jî mînanî Îsa nikarin bidine sekinandinê, yan jî şaşkirinê: em bi rastî dikarin çawa xulamên padişatîya Xwedêye rast bêne navkirinê. Pawlos gotina xwe berdewam dike:

> "Dêmek, xwestinên dilên xweye vê dinîyayê bikujin: bênamûsîyê, heramîyê, temê xirab, dilhavijîya xirab û timayê, çi ku pûtparistî ye. Bona kîjana ku hêrsa Xwedê tê li ser zarokên ku ne gura wîdanin" /Kolosî 3:5,6/.

Xeberên Pawlos bixwînin: "timayî, ku pûtparistî ye". Awa kilîta meye bi sirê bona femkirina wê yekê, ku bi rastî pûtparistî çi ye.Wê yekê meriv dikare bi hêsanî li wan welatên necihû bibîne, li kîderê heykel çêkirîne, cîhên qurbanîya û paristgeh hene, lê femdarî û pircûretî lazime bona dîtina nava "kûltûra sîvîlîzasyonda". Pawlos dibêje, wekî gava ku em ji razîbûnê berbi timayê diçin, em heleqetîyên nêzîke tevî Xwedê dihêlin û pûtparistîyê, bênamûsîyê qebûl dikin.

Niha em xebera yûnanîye "*plêonêksîya*"-ê binihêrin, ya ku nava gotinêda bi xebera "timayê"-va hatîye tercimekirinê. Îzinê bidin sê şirovekirina ji kanîyên navdar pêşniyar bikim:

"Stûn" Şirovekirina peymana Nû: "Xwestina necayîz bona hebûna diha zêde".

"Ferhenga încîla bi zimanê yûnanîye kevinar": "Halekî usa, wextê ku meriv diha zêde dixweze, yê ku bona wî dûr e".

"Şirovekirina merkeza mesîhîtiyê": "Fikirdarîya tima, ya ku şexsê xwe dike pûtparist".

Guhdarîyê bidine ser şirovekirina dawîyê: "fikirdarîya tima, ya ku şexsê xwe dike pûtparist". Wextê ku fikirên me berbi padişatîya Ezmîn nînin, çimkî berê ewlin em wê negerîyane, wî çaxî emê bikevine nava "rêjîma xwexweykirinê". Emê destpê bikin xwe ji wî hemû tiştîva bigrin, çi ku bi fikira me bona razîbûna me lazim e. Emê razîbûna bedenî, hebûnê û berjewandîya matêrîyalî, navê bilind, statûsê, tabîyê, navdarîyê, serkarîyê, temê xirab û gelek tiştên başqe bigerin, kîjana meriv wextê bûyîna pûtparistiyê dixweze. Em dikevine nava vî halî, wextê ku em razî nînin. Em berbi wî hemû tiştî dicedînin, çimkî edilaya meye bi wî hemû tiştîva tune, çi ku Xwedê daye me. Em sertbûnê hindava wê progiramêda texmîn dikin, ya ku Xwedê bona me qirar kirîye.

Bêyî şikberî, razîbûn û timayî qewatên dijî hevdu ne. Razîbûn me ji pûtparis-

tiyê dûr dixe û nêzîkî dilê Xwedê dike, lê timayî me ji Xwedê dûr dixe û me dibe berbi cîhê pûtparistîyêye qurbanîyê. Fikirên van xebera dijî hev in û ew yek firqîya wana diha zêde dide kifşê. Niha em bi hêsanî dikarin fem bikin, ku bona çi xudanê kaxeza Îbranîya li ser xwe guman vî cûreyî dinivîse:

> "Perehizî bila nava jîyana weda cîh negire û destên weda çiqas heye razî bin, çimkî Xwedê got: "Ezê tu car ji te neçim û tu car te bernadim". Lema jî rûyê me digire ku em bêjin: "Xudan piştovanê min e û ezê netirsim: însanê çi li min bike?" /Îbranî 13:5,6/.

Nava serê kitêbêyî mayînda emê bidine eşkerekirinê, wekî razîbûna xwedêtîyê nava hemû tengavyada gumanê dide me. Razîbûn îzinê nade me ku em bikevine nava wan pêla, kîjana ev dinîya derdixe dijî bawarmenda. Nava razîbûnêda berjewandîya mezin û edilayî hene, ya ku ji fikira merivatîyê jortir e.

Çawa dijî vê yekê, timayî nerihetîyê nava meda pêşda tîne ku bi xwestinên bêsînor û temên xirabva gur dibe. Nava halê vî cûreyîda ese xapandin û undabûn hene.

## gava praktîk

Tiştekî bêhesab girîng e, wekî em zelal rastîya Xebera Xwedê fem bikin. Ew bona me nivîsar e, û wê yekêda sofîkirina me tune.Tu kes nikare li ber Xwedê bisekine û bêje: "Xudan, min nizanibû". Ew Xwe li hemû mileta, bi rîya efrandarîyê eyan dike û rûyê wê yekêda ew nikarin xwe sofî bikin. Hema bi wî cûreyî, ew xwestina Xwe, bi rîya kitêba Pîroz, li me eyan dike, û sofîbûna me jî tune.

Bi çiqasîva jî guhdarkirin dijwar be, wekî gurêkirina netam hema ew e, çawa ku pûtparistî ye, em gerekê razî bin, wekî derheqa vê yekêda em pê hesîyan. Eger em zanin, ku wextê întamê wê çawa bibe, em dikarin her car wê întamê teslîm bikin. Hema ev e qencî û rehma Xwedê.

Gelekî hêsa ye wan goveka nebînin, kîjanada em ne tam gura Xwedê da bûne, yan jî serhişk û tima bûne, hîvî ji Ruhê Pîroz bikin ku Ew wana nava jîyana weda eyan bike. Bona her govekekê tobe bikin, kîjana Ew nîşanî we dide û hîvî ji Wî bikin ku Ew we paqij bike. Û bi kutasî, hîvî ji Wî bikin, ku Ew jîyana we bi nûbûnêva tijî bike û qewatê bide we, ku hûn bi dil gura Wî da bin.

12

# HUKUM BIDINE SIVIKKIRINÊ

Nava serê kitêbêyî derbazbûyîda min du alîyên pûtparistîyê raber kirin, serhişkî û timayî. Niha wan her dû alîya bîr bînin, çimkî ew bi hevra dişuxulin, û eşkerekirina cûrê şuxulkarîya wan wê alî me bike ku em diha baş fem bikin, ku bawarmend bona çi nêzîkbûna hindava kevirê krîptonda baş fem dike.

## Ssênara dijwar

Em careke mayîn derheqa Şaûlê padişada bêjin. Ew razî nîbû ku nava Xwestina Xwedêda bima. Rûyê serhişkîya xweda ew bona timayê vekirî bû. Şaşîya wî ya ewlin amalekîyava girêdayî nîbû: ew yek destpêka padişaîtîya wî da qewimî bû, wextê pevçûyîna tevî filistînîya. Dijminên Îsrayêlê eskerekî mezin berev kirin. Diketine nava wî eskerî sê hezar erebeyên şêr, yên ku wan roja mînanî tanka bûn, û awqas gelek eskerê peya hebûn, wekî tê bêjî mînanî hebên qûma ber behrê gelek bûn. Ew li Makmasê berev bûn û bona êrîşê hazir bûn.

Meriv nikaribû eskerê Şaûl himberî wana bikira: ew eskerê tezesazbûyî bû û hela hê nava êtapa sazbûnêda bû. Nivîsar e:

> “Çaxê Îsaraêlîya dît, ku ew nava tengasîyêda bûn û cimet tevîhev bûye, wana xwe şikeftada, nava zevîyada, zinarada, bircada û çelada veşartin. Û Îbranî Ûrdunêva derbazî Gadîyê û welatê Galatîyê bûn, lê Şaûl hê li Gîlgalê bû û  temamîya milet peyî wî diçû, pêra jî dilerizî” /A Padişatî 13:6,7/.

Hûn tînin ber çavê xwe, ku Şaûl bin hukumekî çawada bû? Hûn rêber in, fer-

mandar û padişa ne, û li ber eskerê weyî cahil qewateke leşkerî ya mezin, yê diha cêribandî û qewat sekiniye. Şaûl nava xewina here xirabda bû: leşkerên wî direvîn. Feqet, alîkarî dihat: Samûêlê pêxember gerekê bihata û wê rojê bona Xudan qurban bida. Nava encamê wê yekêda bawarîya merivaye hindava Şaûl da wê bihata dasekinandinê, û ewê dîsa rabûna ser pîya, ku mêrxasîya xwe bidana kifşê. Feqet, pirsgrêkek pêşda hat:

> "Û Şaûl li gor wî wextê ku Samûêl kifş kirbû, hevt roja hîvîya wî ma, lê Samûêl nehate Gîlgalê, û cimet ji cem wî çû, belav bû. Û Şaûl got: "Heywanê ji bo gorîya şewitandinê û ji bo pêşkêşa aşîtîyê minra bînin": Û wî gorîya şewitandinê pêşkêş kir" /A Padişatî 13:8,9/.

Tiştê veşartinê nîbû, wekî Şaûl ji alîyê Xwedê da, bona dayîna qurbanê, ne wekîl bû. Ew kirin ya kahîn bû /Samûêl him pêxember bû, him jî kahîn bû/. Bêguman, nava halê wî cûreyîyî tund da, Şaûl û alîkarên wî dikaribûn bifikirîyana: "*Wedê gumanbirîyê gavên gumanbir dixweze*". Feqet, Samûêlê zûtirekê her şikberîke derheqa wê pirsêda bida dûrxistinê.

> "Wextê ku ewî pêşkêşkirina gorîyê xilaz kir, wî çaxî Samûêl hat. Û Şaûl çû pêşîya wî, ku silavê bidê. Lê Samûêl got: "Te çi kir?". Û Şaûl gotê: "Çaxê min dît, ku leşker ji dora min diçin û roja kişfkirîda tu nehatî, û filistînî nava Makmasêda civîyan, min got: "Filistînî wê niha peyayî Gîlgalê bibin û min li ber Xudan dua nekirîye". Û min xwe mecbûr kir, ku ez gorîya şewitandinê pêşkêş bikim". Û Samûêl gote Şaûl: "Te bêaqilî kir, te ew emirê ku Xudan Xwedêyê te li te kiribû, negirt. Eger te bigirta, Xudanê padişatîya te ya li ser Îsrayêlê heta-hetayê îzbat bikira. Lê niha padişatîya te wê ji tera nemîne. Xudan ji bo Xwe li gor dilê Xwe merivekî dixweze"" /A Padişatî 13:1O-14/.

Pêxember her şikberîkê belav dikin, dûr dixin, û me vedigerînine li ber emirkirinên Xudan. Nava demên dijwarda meriv dikarin bi hêsanî bîr bikin, ku Xwedê çi dixweze. Ji bêaminîya Şaûl û gavên ji nerazîbûna wî digotine Îsraêl, wekî nava wedê dijwarda em bi xwe dikarin qirar bikin, ku gura Xwedêda bin, yan na? Feqet ew yek rast nîne. Gurêkirina hindava Xudanda her dem tiştê herî sereke ye, nenihêrî wê yekê, ku çi diqewime.

Bêaminîya Şaûl da kifşê, wekî ew razî nîbû. Ewî dixwest hemû tiştên li dorberên xwe kontrol bikira, lê hal cûrekî mayîn bû. Ew hukum bona wî giran bû û ewî qirar kir wî hukumî bide sivikkirinê. Rûyê nerazîbûna xwe da ewî destpê kir

berbi hêsabûna bi xwestina xwe bicedîne.

Rastîk heye, kîjanê gerekê em qebûl bikin: wextê qulixkirina bona Xwedê, emê gelek cara rastî tengavîya, dijwarîya û cêribandina bên. Îsa garantîya vê yekê dide: “Dinîyayêda hûnê nava tengavîyêda bin” /Yûhenna 16:33/. Tengavî dide kifşê, ku bawarîya me çiqas e. Eger em dibînin, ku bawarîya me zeyîf e, sist e, eger bawarîya meye anegor tune, wî çaxî îdî wede ye gazî Xwedê bikin, Xebera Wî lêkolîn bikin û hîvîya Ruhê Wî bin. Eger em vî cûreyî bikin, emê bi bawarîya diha mezin ji tengavîyê der bikevin, lê ne ku çawa berê bû.

Bawarîya me giranbiha ye, diha biha ye, ne ku her tiştên ku li vê dinîyayê hene. Vî cûreyî bifikirin:eger kesek bernameke bîznêsêye sed selefê pêşniyarî we bikira û usa jî mecal bidana bona mîyaserkirina wê progiramê, weyê çi bikira? Gelo hûnê dudilî bûna û weyê bigota: “Ew yek gelekî dijwar e û xebata mezin lazim e”? Yan weyê carekêra ew mecal bidana xebatê û weyê ew bername mîyaser bikira? Bêguman, emê carekêra derbazî xebatê bûna û emê hîvîya kara mezin bûna.

Hema ew yek her car diqewime, wextê ku hûn rastî dijwarîya tên, yên ku diha mezin in, ne ku hûn, û bawarîya xwe li min bînin: Xwedê wê usa bike, ku mecalên weye wî cûreyî hebin. Ew naxweze gumanbirîyê bide we: meremê Wî ew e, wekî hûn *bawarîya diha mezin* bistînin, çawa heqê xwe.

## Dîsa ssênareke giran

Niha em derheqa Dawid da xeberdin, xeysetê kîjanî dijî xeysete Şaûl bû. Ew rastî halekî diha giran hat.

Ew û usa jî ew 6OO merivên ku hindava wî da amin bûn, hatine înkarkirinê. Ew roj rojeke baş nîbû, lê tiştê herî xirab hela hê pêşîyê bû. Ew paşda vegerîyane malê û dîtin, wekî hetanî ku ew li malê nebûne, amalekîya êrîş kiribûn û hemû tiştên wane qîmetlû, jinên wan, zarok û hebûna wan biribûn, lê tiştên mayîn jî şewitandibûn. Tu tişt nemabû.

Hûn tînin ber çavê xwe ku Dawid wî çaxî çi texmîn dikir. Ewî ji 12 sala zêdetir xwe li qûmistanên Îsrayêlê veşartibû. Nava wî wedeyîda ewî endamên malbeta xwe û hevalên xweye zarotîyê nedîtibûn, tevî wana neçûbû berevbûnên hebandinê, û tevî tu qewimandineke civakî yan jî hemmiletîyê nebibû. Ew mecbûr bû xwe veşêre, lê carina jî ji leşkerên Îsrayêle here baş direvî, yên ku peyî wî digerîyan.

Bi kutasî, hal usa yê qezîya bû, wekî ew leşkerên wî û malbetên wana mecbûr bûn ji welatê xwe dûr bikevin. Ew îdî serê du sala bû ku wana li welatê xerîb cîh dîtibûn. Gelo çiqas wede wê usa bûya? Heqê wanî bona qulixkirina bo Xwedê li kîderê bû? Çend cara Dawid dikaribû bi xwestina xwe bikira û rêberê Îsraêlê bikuşta, yê ku Xwedê çawa serwêrê wî kifş kiribû. Bi wê yekê, hukumê li ser

Dawid û tengavî wê bihatana sivikkirinê. Feqet ew amin ma û halê razîbûnê 14 sala ser hev xweyî kir.

Qasekê bisekinin û bifikirin. Gelo usa qewimîye, wekî piştî tengavîya sê hevtîya we xwestîye hûn teslîm bibin? Lê gelo weyê derheqa sê meha, yan jî sê salada çi bigota?

Bona dîtina tengavîyên hertimî sê sal wedekî dirêj e, lê himberî wê yekê çi ku Dawid dît, ew tu tişt nîne. Şaûl gerekê hevtêkê teyax bikira, lê teslîm bû. Ewî qirar kir ji gura Xwedê derbikeve, bona ku layîqî qedirgirtina bindestîyên xwe bibûya û tabîya xwe qewîn bikira. Ewî tabîke usa bijart, ya ku wê him halê wî bida sivikkirinê û wê qedirê wî bilind bikira. Ew hîvîya wê pêşdaçûyînê nesekinî, ya ku tenê ji Xwedê tê.

Em paşda vegerine ser serhatîya Dawid, wextê ku ew û leşkerên wî paşda vegerîyane malê û pê hesîyan ku ew tiştên bona wan biha û qîmetlû bûn, îdî tunebûn. Bi dîtina wê yekê, Dawid û leşkerên wî awqasî girîyan, hetanî ku bê-taqet bûn. Dawid dikaribû bifikirîya, wekî ji wêya xirabtir îdî tu tişt nikaribû bibûya, lê bi wê yekêva hemû tişt ser hevda nehat.Tengavîya diha mezin hîvîya wî bû. Leşkerên wî, 6OO hevalên wî yên dawî, ewqasî li ser wî hêrs ketin, wekî dixwestin ew bikuştana.

> “Dawid tevî hev bibû, çimkî cimetê dixwest ew bida ber kevira, çimkî ji wê cimetê dilê her kesî bona kur û keçên wana digirîya” /A Padişatî 3O:6/.

Nava halê Şaûlda leşkerên wî destpê kirin ji wî dûr bikevin. Ewî xwe tenê dît û destpêkir berbi begemîyê, qedir û hurmetê bicedîne. Bi mîyasernekirina emirê Xwedê, ew gihîşte meremê xwe. Feqet merivên Dawid nedireviyan, lê dixwestin ew bikuştana. Halê Dawid diha giran bû, ne ku yê Şaûl. Nerazîbûna Şaûl usa kir ku ew hal bide milahîmkirinê, dewsa aminaya Xwedê û dewsa wê yekê ku ew gerekê hîvîya Samûêl bûya. Bersiva Dawid lap cûrekî mayîn bû:

> “Feqet Dawid bi Xudan Xwedêyê xwe qewat stend... Û Dawid ji Xudan pirsî û got: “Ez pey vê komê bikevim? Ezê xwe bighînime wana?”. Û Ewî gote wî: “Pey wan bikeve, çimkî tê xwe wanra bighînî û tê hemûya aza bikî”” /A Padişatî 30:6-8/.

Dawid necêriband bona xilazkirina jîyana xwe wana bîne li ser fikireke mayîn û ne jî progirameke başqe pêşniyar kir. Ewî negot: “Bes e. Kara çi, wekî min bi aminayî Xwedêra qulix kir. Min salên xweye here baş dane Wî. Ewî ez danîme bin serwêrîya dîktatorekî mînanî min. Û Ew e menîya jîyana mine dojeyî”.

Dawid tu cara Xwedê neheq nekir. Ewî nedicedand ku li sera padişê be. Wextê ku ew nava tengavîyêda bû, ewî dikaribû bi kuştina Şaûl heyfa xwe hilda û bighîşta wî textê padişatîyê, yê ku Xwedê wîra soz dabû. Ew hîvîya Xwedê sekinî, lê Şaûl nesekinî. Dawid razîbûna xwe xweyî kir û qirar kir, ku pêşîya kirineke xwe berê ewlin ji Xwedê bipirse.

Ji alîyê Xwedêda dayîn û xilazbûn her dem tên, lê ne hetanî wî çaxî, wextê ku mecal çê dibe, ku gura Xebera Wî da nîbin. Eva mînanî cêribndina Îsa ye li qûmistanê ye, li kîderê mîrêcin pêşîya hatina milyaketa pêşniyarî Wî kir, ku ji tengavîya Xwe û qulixkirina bona Wî aza bibe. Bawar bikî her dem vî cûreyî dibe. Mayîna nava halê razîbûyî da alî dike, wekî em bi xwe bona stendinê û pêşdaçûyînê negerin.

## Paşdaçûyîna berbi amalekîya

Bi berdewamkirina lêkolînkirina jîyana Şaûl, werin em derheqa qewimandina girêdayî amalekîyava xeberdin, ya ku piştî şerê tevî filistînîya qewimiye.

Gelo vê carê Şaûl dîsa gura Xwedê nekir? Bona çi ewî jîyana padişê amalekîya xweyî kir û heywanên here baş nekuştin, nenihêrî wê yekê, wekî emirê Xwedê gelekî zelal bû? Em careke mayîn bêjin, wekî menî timaya Şaûl bû, ya ku ji bêaminîya wî û nerazîbûna ji xwestina Xwedê dihat.

Ya ewlin, bona çi jîyana padişê xweykin? Wî çaxî hildana welatekî destanîneke mezin bû û wextê ku padişa nava şêrda dighîştine serkeftinê, wana padişên binketî dianîn sera xwe. Padişê welatê binketî nîşana serkeftinêye sax bû. Her car, bi nihêrandina li wî, meriv dikaribû derheqa binketina wî welatîda bîr bianîya. Her car, bi nihêrandina li wî, xulamên padişê bîr dianîn ku ew qulixî rêberekî çiqasî qewat dikirin. Ew yek kanîya xwehizîyê, liserxwegumanbûnê bû û destanîneke mezin bû, bi taybetî, bona rêberê neamin.

Ya duda, bona çi pez, bizin, heywanên mezin, golik û berxa xweykin? Dîsa diwekilînim, wekî menî hema ew bû, Şaûl dixwest ji leşker û cimeta xwe qedir û hurmet bistenda. Eger ewî heywanên amalekîyaye here baş bida meriva, ewê bîr bianîyana ku ew rêberekî baş bû. Paşê ewê bi qewata wî, stratêgîya û serwaxtîya wîva firnax bûna, bi kîjana ewî êrîş bire li ser wî welatî û ew alt kir. Cimetê bidîta, wekî Xwedê tevî wîye, û wê tu cara serwêrtîya wî bin şikberîyêda nîbûya.

Rûyê bêaminaya xweda, Şaûl her dem dicedand ku tabîya xwe bide qewînkirinê. Piştî wê serkeftinê, ewî serbara serda bona xwe heykel da sekinandnê. Wextê ku pêxember bona gurênekirina wî, li ber kirinên wî derket, ew diha bi wê yekêva xemgîn bû, ku bindestî û welatîyên wî, wê derheqa wîda çi bifikirîyana, lê ne ku ew yek, wekî ewî gura Xwedê nekiribû /binihêre A Padişatî 15:3O-î/. Bi

fikira Şaûl, eger pêxemberê Îsraêlêyî herî qedirbilind, Samûêl, tevî wî paşda venegerîya li cem cimetê, ew yek wê zyan bigîhanda qedirê wî, bi taybetî rûyê wê yekêda, wekî hinekî pêşda Samûêl dijî wî derketibû. Hewcetîya wî hebû, ku wî serwêrtî û qedirê xwe bida îzbatkirinê, nenihêrî wê yekê, wekî Xwedê ew serwêrtî dabû wî. Ewî berbi qedir, hurmetê, mezinayê û serwêrtîyê diha zêde dicedand, ne ku berbi tiştekî başqe, rûyê çida jî bi serhişkî gura rêberîya Xwedê nedikir.

Zelal gotî, Şaûl nava xwestina Xwedêda zelal nîbû.

## Kanî

Niha femdarî ye, wekî pût bona me dibe kanîke tiştekî, wextê ku em xwestinên xwe mîyaser dikin. Ev yek dikare nava her govekeke jîyana meda biqewime. Pût wî cîhî digire, layîqî kîjanîye Xwedê. Ew dikare bibe mecal, bi kîjanê em bextewarîyê, berdildahatinê, edilayê, stendinê, serwêrtîyê, hurmetê û tiştên mayîn distînin. Xwedê dibêje: “Hûn bona xwe…pûta çê nekin” /Qanûna Kahîntîyê 26:1/. Em ew in, yên ku pûta çê dikin û her dem nîne, wekî pût bi kevir, bi dar yan jî hesinên giranbiha tên çêkirinê. Pût ji dilê me qewatê distîne.

Her tişt dikare bibe pût, çi ku em ji Xwedê zêdetir girîng hesab dikin. Pût ew e, çi ku em hiz dikin û çi ku li me xweş tê, bawarîya xwe li kîjanî tînin, çi ku dixwezin û çi ku ji Xudan zêdetir layîqî guhdarîya me dibe. Xudan bona kulfeta min, Lîzayê, eyan kir, wekî pût ew e, ji çi hûn qewatê distînin û qewatên xwe didine wî. Bawarmend dikeve nava pûtparistîyê, wextê ku îzinê dide ku dilê wî nerazîbûnê texmîn bike û ji xwestina Xwedê der razîbûnê bigere. Ew razîbûn dikare nava şexsekî, tiştekî, yan jî şuxulkarîkêda bibe.

Ez gumanim, wekî niha bona we zelal e, ku pûtparistî diha zêde ye, ne ku heykel, gorîgeh û paristgeh. Çimkî femdarîya derheqa pûtparistîyêda gelek cara bi tiştên vî cûreyîva hatîye sînorkirinê, gelek meriv guhdarîyê nadine ser eşaretîyên Încîlê yên here girîng. Nava serên kitêbêye mayînda emê heyîna pûtparistîyêye rast bidine ekşerekirinê û bidine kifşê, wekî ew yek nava kûltûra Rojavayêye sedsala 21-da bi çiqasîva tiştê tunekirnê ye.

## gava praktîk

Pûtparistî ew e, wekî tiştek, yan kirinek, yan jî şexsek, xêncî Xwedê heye, ji kîjanî hûn qewatê distînin û qewatên xwe jî didinê. Pût bona me dibe kanîke tiştekî. Em nakevine nava êkstrêmalîyê û nabêjin, wekî meriv gerekê xebata xwe bihêlin, çimkî ew gerekê guman bin, wekî Xwedê wê hewcetîyên wan tijî bike,

lê ne ku ew yek wê merivê ku xebatê dide bike. Feqet, em gerekê fem bikin, wekî Xwedê hewcetîyên me bi rîya xebata me tijî dike.

Em fem dikin, wekî Xwedê hizkirinê bi destî endamên malbeta me dide me, û em çawa bersiva wê yekê hiz dikin, lê fem dikin, wekî Xwedê ye Kanîya me, û em Ew çawa ku heye Wî dihebînin.Tiştê herî girîng ew e, wekî em Xwedê çawa Kanîya jîyana xwe bihebînin, û wî her tiştî înkar bikin, çi ku me ji Wî dide dûrxistinê.

Ez gumanim, wekî hûn îdî destpê dikin fem bikin, wekî pûtparistî ji wê yekê zêdetir e, wextê ku li ber heykela ta dibin. Hîvî ji Xwedê bikin, ku ew nîşanî we bide, ku pûtparistî hukumê çawa li ser bajar yan jî cîhê weyî jîyînê dike û bona wan goveka hîvî bikin. Dua bikin, ku Xwedê ronahya rastîya Xwe bişîne li wan cîha, bişîne zarokên Xwera, çawa ronahya Xwe û Xwe çawa Xudanê hemûya eyan bike.

13

# KEVIRÊ KRÎPTON

Werin em lez wî hemû tiştî bidine tomerîkirinê, çi ku em nava çend serên kitêbêye dawîda hîn bûn.

Heyîna pûtparistîyê heykel, heyeklên biçûk, gorîgeh û paristgeh nînin. Pûtparistî ew e, wextê ku merivatî xwestina Xwedê hesab hilnade, bona ku xwestinên xwe bide razîkirinê, yên ku dijî  xwestina Wî ne. Rûyê wan xwestinada fikira merivaye derheqa Xwedê da tevî hev dibe, şaş dibe. Dêmek, wextê ku meriv dibe pûtparist, Xwedê dûr dikeve û wî merivî teslîmî xwestinên bêesil dike, ku ew anegorî xwestinên xweye bêesil, tiştên eyb, bike. Razîbûn, xweşhatin û cedandin mêriv dibine berbi tiştên usa, encamê kîjana mirin e, lê ne ku jîyan e.

Ew yek dikare usa jî nava jîyana bawarmendda biqewime. Mesîhî dikeve nava pûtparistîyê wî çaxî, wextê ku ew wî hemû tiştî bêqedir dike, çi ku Xwedê zelal kirîye, bona ku wê yekê dest bîne, çi ku gelekî dixweze. Dêmek, pûtparistî ew e, wextê ku meriv *bi zanebûn gura* xwestina Xwedê *nake*. Feqet ew yek tiştekî mayîn e, wextê ku bawarmend *dikeve nava guneh* û tobe dike. Pûtparistî ew e, wextê ku bawarmend xwe *dide gunehê*. Wî çaxî wî merivî îdî xwestina xwe ji ya Xwedê bilinditir kirîye: ewî pût çê kirîye.

Pûtparistî kevirê *krîptonî ruhanî ye*.

Eger em paşda binihêrin û wan hemû mînaka bîr bînin, yên ku nava serên kitêbêye pêşinda me anîne ber çava, meriv dikare bê li ser wê fikirê, wekî nava wan hemû xirabkarîyên şirovekirîda tomerîbûnek hebû.  Ekar zelal bihîstibû, wekî ew hemû tiştên ku wextê êrîşê gerekê bihatana hildanê, yên ku meriva gerekê ji Erîhayê hildana, gerekê pêşkêşî Xudan bikirana, feqet piştî eşkerekirina xirabkarîya wî, ew xwe mikur hat: “Nava wan eşîyada…min dît, û min ew *bi*

*xwestin* hildan" /Yêşû 7:21/. Nava tercima "NLT"-da nivîsar e: "Min gelekî ew xwestin". Bona Ekar xwestina wî diha girîng bû, ne ku ya Xwedê. Xofa wî ya xwedêtîyê tune bû, û ewî bi zanebûn gurê nekir. Gunehkirina wîye bi zanebûn *pûtparistî* bû, çi jî me çawa kevirê *krîptonî ruhanî* şirove kir. Pûtparistîya wî ne tenê ew û malbeta wî anî ber dîwanê, lê temamîya cimetê zeyîf kir. Îsrayêl zeyîf bû û îdî nikaribû hindava miletên mayîn ser biketa.

Civîna korintîya gelek cara xwestinên bedenî dida razîkirinê, bi hesabhilnedana wê yekê, çi ku Xwedê li wana eyan kiribû. Pawlos pêra jî wanra dinivîse: "Hûn hela hê bi tebyeta xweye gunehkarva tên serwêrîkirinê" /A Korintî 3:3, NLT/. Wana hevsûdî dikirin, parçebûyî bûn, bi hevra diketine nava dewa, bêesilî dikirin û ew guneh hesab hilnedidan, hev didane dîwanê û wextê ku bona şîva Xudan berev dibûn, bi rastî wana Îsa bîr nedianî, lê medê xweyî bedenî didane razîkirinê. Bi vî cûreyî, wana gura emirên xwedêtîyê nedikirin. Ev e menî, wekî Pawlos dinivîse: "Bi vî cûreyî, xwşîk û birayên delal, wextê ku hûn bona şîva Xudan berev dibin, hîvîya hevdu bisekinin. Eger hûn bi rastî birçîne, li malê bixun, bona dîwanê neynine li ser hevdu, wextê ku hûn berev dibin" /A Korintî 11:33,34, NLT/. Rûyê timaya /pûtparistîya/ wanda gelek zeyîf û nexweş bûn û ji wede zûtir dimirin. Wana çawa baylozên Ezmîn jîyan nedikirin.

Ew yek usa jî derheqa wan bawarmendada bû, kîjanara Aqûb dinivîsî. Wana hevsûdîya hev dikirin, bi menîyên xwehiziyêva pêşda dihatin, hevra diketine nava dewa û bi hevra şer dikirin. Aqûb dide kifşê: "Hûn dixwezin û ya we tune" /Aqûb 4:2/. Em careke mayîn dibînin, wekî bawarmenda tiştên xirab dikirin, bona mîyaserkirina xwestinên xweye xwehizîyê. Ew çawa "jinên bêesil" hatine navkirinê, çimkî ketibûne nava pûtparistîyê. Wana ne heykel, ne heykelên biçûk, ne gorîgeh û ne jî paristgeh çê dikirin. Nenihêrî wê yekê, ku derheqa wê yekêda nivîsar nîne, ew kevirê krîptonî ruhanî, yê ku wana qebûl dikir, bi texmîn îzin nedida ku ew bi jîyana qewat bijîtana.

Pûtparistî gunehê sade nîne: ew gunehê *fikirmîşbûyî*, yan jî *bi zanebûn e*. Emê wî tiştî xweykin û bikin, çi ku girîng hesab dikin, nenihêrî wê yekê ku Xwedê derheqa wê yekêda çi gotiye.

Awa ku çawa hemû tişt li baxçê Êdênê destpê bû. Adem û Hêwa ew yek xwestin, çi ku li wana çawa tiştê qenc, kardar û xweş dihate texmînkirinê û çi ku dikaribû ew bikirana serwaxt. Wana bi zanebûn gura wê yekê nekir, çi ku Xwedê gotibû wana.

Ji wî çaxîda, wextê ku em vê rêyê dibijêrin, di meda xapandin çê dibe. Em bi dil bawar dikin, wekî tabîya meye li ber Xwedê hela hê ya heq e, lê bi rastî usa nîne. Wî çaxî Xwedê mecbûr dibe kesekî, şandî, pêxember, serwêr, yan jî hevalekî bişîne, yê ku me hiz dike û derheqa meda difikire, wekî hazir e rastîyê

bêje me. Feqet, hetanî wî çaxî xapandin di nava meda îdî werguhêzî qewînbûnê dibe, nenihêrî wê yekê ku meriv dikare wê qewînbûnê xirab bike, lê azabûna ji wê yekê dijwar e. Serê kaxeza romanîyaye ewlin dibêje, wekî merivên wî cûreyî "bi nerastîyêva rastîyê difetisînin" /xeber 18/. Meriv rastîya derheqa Xwedêda û rêyên Wî ji xwe dûr dixin, rûyê çida femkirin û texmînkirina wana diha gelekî dijwar dibe. Merivên nava xapandinêda destpê dikin "tiştê usaye bêfikir li ber xwe derxin ku Xwedê çi cûreyî ye. Nava encamê wê yekêda fikirên wan tarî bûn û şaş bûn. Bi gotina derheqa wê yekêda, wekî ew serwaxt in, ew bûne bêaqilên tam" /Romayî 1:21,22/. Rastî ji wan meriva dûr dikeve û ew hînkirinên şaş derheqa tebyeta Xwedêda çê dikin, yên ku begemîyê didine gunehê û rîya jîyanê tevlîhev dikin.

Hema wî cûreyî bawarmend dikeve nava pûtparistîyê. Awa, binihêrin ku Aqûb çi dinivîse: "Feqet xeberê biqedînin, ne ku tenê bibihên û usa xwe bixapînin" /Aqûb 1:22/.

Em zelal Xebera Xwedê dibihên û gurê nakin, tê bêjî dilê meda tiştek diqewime: xêlîya bi navê "xapandin" dilên me dipêçe. Niha em bi temamî li ser wê fikirê ne, wekî fikirên meye rast, yên derheqa Xwedê, Îsa û padişatîya Xwedê da hene, lê bi rastî tevgirêdana meye tevî Xwedê tune. Şirovekirina xebera "bixapînin" ev e: "merivekî bînine li ser fikirekê ku ew tiştekî nerast yan jî qelp çawa tiştê rast qebûl bi ke" /*Mêrîam-Wêbst*êr/. Ez nizanim ku gelo ev yek dilê weda xofa rast pêşda tîne, yan çawa dilê minda, lê ez guman im, wekî usa ye. Gerekê bi sivikayî nêzîkî gurênekirina bi zanebûn nebin.

Em xwe dixapînin, çaxê em difikirin, wekî em dikarin ev eşaretîyên peymana Nû hesab hilnedin, çimkî hemû tişt bi kerema Xwedê, bi baxşandin û hizkirina Xwedêva pêçayî ye. Bîra xweda xweykin,wekî hema dîsa ew Xwedê, yê ku kerema Xwe, baxşandin û hizkirina Xwe peymana Nûda eyan dike, usa jî derheqa qezîyayên gurênekirina bi zanebûn eşaretîyê dide.

Em nikarin wan beşên nivîsarên Pîroz bibijêrin, yên ku tenê li me xweş tên, û wan beşên ku li me xweş nayên em başqe bikin, yan jî hesab hilnedin.Fikirdarîya vî cûreyî xwexapandin e. Em gerekê temamîya şêwira Xebera Xwedê qebûl bikin. Mixabin, civîna wedê nihada hesabhilnedana rastîyê mînanî nexweşîyê belavbûyî ye. Û menî ew nîne, wekî Xwedê rastîyê paşda xweyî dike: menî pûtparistîya li civînê ye.

Aqûb berdewam dike:

> "Çimkî eger hûn Xeberê dibihên û gurê nakin, ew mînanî wê yekê ye, ku hûn çawa reng-rûyê xwe dinihêrin. Hûn xwe dibînin, dûr dikevin û bîr dikin ku hûn çawanin" /Aqûb 1:23, 24, NLT/.

Ew meriv, yên ku Xebera Xwedê dibihên û gurê nakin, wê bîr bikin ku ew nava Mesîhda kî ne. Li civînê, li koma biçûk û hemcivînada tabîya wan wê cûrekî mayîn be, nava kîjanada Xebera Xwedê tê terîfkirinê, lê ji wî cîhî dûrtir tabîya wan wê ji tabîya merivên vê dinîyayê cuda nebe. Xebera Xwedê neynîk e: bo wê yekê jî, wextê ku ew li ber in, ew anegorî wê yekê dikin. Dêmek, em gerekê hînkirinên tevîlîhevbûyî li ber xwe derxin, bona ku şirove bikin, ku bona çi em usa dikin, çawa ku ev dinîya dike. Diqewime hûn bêjin: "Bi rastî, mesîhî bi tu tiştîva ji bêbawbara nayêne cudakirinê: em baxşandîne", yan jî "Xwedê zane, wekî tebyeta min ya ketî ye û nava vê jîyanêda em tu cara nikarin bi pîrozyêva bijîn. Awa bona çi Ewî em bi kerema xweva pêçane".

Peymana Nû da em dikarin xeberên başqe bibînin, yên ku berê ewlin tê bêjî piştgirîyê didine van gotina, lê em mecbûr dibin ji gelek beşên başqe paşda bisekinin, bona ku bawarîya xwe li xwedêzanîya şaş bînin.

Em gerekê qirarê qebûl bikin:

- Gelo em bi rastî dixwezin nava herîya gunehêda bijîn?
- Gelo em dixwezin ku hukumê kevirê krîpton wê qewatê bide sînorkirinê, ya ku çawa baylozê Xwedê mera hatîye dayînê?
- Gelo em dixwezin ji wê derecê diha nimiztir bijîn, bona kîjanê em hatine çêkirinê, rûyê hînkirinên derewda?
- Gelo em dixwezin ku jîyana me ji vê dinîyayê cuda nebe, û rojekê em ji vê jîyanê aza bin û herine Ezmîn?
- Yan em dixwezin, wekî padişatîya Xwedê belav bibe û dîtinoka derheqa paristgeha bi rûmete dawî mîyaser bibe, derheqa kîjanêda me çend serên kitêbêye pêşinda got?

Bi hilbijartina kevirê krîpton, em ji qewatê, ji aktîvîyê, û ji karebûna gera li ser sêrî ya li temamîya dinîyayê miqûf dimînin. Em wî cûreyî rastîyê difetisînin. Em wê rastîyê paşda xweyî dikin û Îsa ji temamîya dinîyayê vedişêrin. Awa bona çi Pawlos bi kutasî bangî korintîya dike:

> "Rast bifikirin. Bona pîrozîyê hişyar bin. Bes e qewimandinên bûyîra bilîzin. Nezanîya derheqa Xwedê da kêfxweşî ye, kîjanê hûn nikarin nava wedê nihada îzinê bidine xwe. Gelo hûn şerm nakin, ku we îzin daye ku tiştê vî cûreyî awqas wede nava weda berdewam bikin?" /A Korintî 15:34, MSG/.

Ew dibêje civîna Korintîyê, wekî karebûna wan, ya mînanî jîyana Îsa, heye, lê ew hela hê nava pûtparistîyêda nin. Ew hela hê bawar dikin, wekî hêja ye rastîya ku Xebera Xwedê eyan kirîye hesab hilnedin, bona ku wî tiştî xweykin, çi

ku ewana girîng hesab dikin. Ew bi cûrê rast nêzîkî Xebera Xwedê nebûne, rastîya nava jîyana xweda fetisandine û nava encamê wê yekêda ew sînorkirî ne, bêtaqet in û nikarin civaka xwe biguhêrin.

Ev yek bi gelek alîyava tragîk e, lê tiştê herî xirab ew e, ku yên undabûyî, yên ku li rex pûtparistên vî cûreyî dijîn, wan meriva nabînin, yên ku Îsa raber dikin. Awa, vê gotinê bi tercimeke mayîn bixwînin: “Bi heqîtîyêva hişyar bin û guneha nekin, çimkî hinek Xwedê nas nakin: ez vê yekê dibêjim ku hûn şerm bikin”. Pawlos dibêje vê civînê: “Hûn Îsayê tek-tenê ne, Kîjanî merivê Korintiyê wê bibînin. Eger ew şedetîya qewata rabûna Wî ya ji nava mirîya û tebyeta Wî bi destî we nebînin, usa ye ewê wê yekê nebînin. Bona çi we rastî ne tenê bona xwe û civînê, lê usa jî bona wan merivên undabûîye li cîhê jîyana xwe fetisandiye?”.

Wextê ku em tevî Xwedê yekbûyîne, wî çaxî jîyana me hêsa ye.

Gelo hûn qet fikirîne, wekî merivên undabûyîye dora me berbi me nacedînin, lê eger dicedînin jî, guhdarîya wana diçe li ser tiştên şaş? Gelo guhdarîya wana diçe li ser henekên me, şuxulkarîya aqil, kirinên meye hewaskar, progiramên wedederbazkirinê û sazbendîyê? Yan, ew berê ewlin nava meda û di navbera meda Padişê sax û qewat dibînin? Derheqa civîna Ewlinda bifikirin: her dem bawarmend çawa “xwedê” nav dikirin, û ew bi mecbûrî diketin û dikirine qîrîn: “Na xêr, em xwedê nînin. Em zarokên Xwedêyê Jorin in”. Petrûs bi cûrê berk mecbûr bû bêje ofîsêrê romayî: “Rabe bisekine, ez bi xwe jî merî me” /Karên şandîya 1O:26/.

Pawlos mecbûr bû bikira gazî û berbirî welatîyên Lyûstrîyayê bibûya: “Hûn çi dikin! Em xwedê nînin” /Karên Şandîya 14:14,15, MSG/.

Welatîyên Maltayê “fikirîn, wekî ew [Pawlos] xwedê bû” /Karên Şandîya 28:6, MSG/.

Behsên êvarê, yên li Têsalonîkê didane kifşê: “Ewên dinîya tevîlîhev kirine, gihîştine vira jî” /Karên Şandîya 17:6/.

Derheqa welatîyên Orşelîmêda nivîsar e: “Hemû meriv qedirê wan digirtin” /Karên Şandîya 5:13, NLT/.

Li Korintyê behs tune bûn, çawa ku nava civaka meye Rojavayêda tunene. Gelo menî ew e, wekî em bi kevirê krîptonva razî bûne? Ez guman im, wekî em bi qîmetê «iPhone»-a xirbva razî bûne, bi kîjanêva em nikarin nivîsara bişînin. Meyê hesab bikira, wekî ew têlefon wê her dem nexebitîya bona ku wê fikirêra qayîl bûna, ku emê bêyî wê jî bijîn.

Ez hazir nabim vî halîva razî bim.Ez hazir nabim aktîvîya, jîyana, qewata, saxlemîya ku ji alîyê Xwedê da mera hatîye dayînê û karebûna eyankirina Xilazkir û Padişê sax li vê dinîya undabûyî, unda bikim. Ez guman im, wekî gelek meriv ji vê jîyanê westîyane.

Ez lezgînîya xwedêtîyê, emirkirina Xwedê texmîn dikim, ku derheqa vî hemû tiştîda wera binivîsim. Ev banga bona we nîne, eger jîyana vê dinîya qirêj, vala û bêfeyda we razî dike. Ew bona we ye, eger hûn jîyana diha bilind dixwezin.

Bav Xwedêyê we dixweze, ku hûn bi jîyana nebînayîva bijîn: na xêr, Ew wê yekê *bi dil dixweze*. Ew dixweze, wekî hûn tebyeta Wî, ya xwedêtîyê û bi qewata Wî, ji xwestina xwe zêdetir bijîn.

Xwedê me sînor nake. Eger em sînorkirîne, menî pûtparistîya me ye.

## III

Bi berdewamkirina vê hînbûnê, emê diha kûr wê xapandinê lê binihêrin, kîjanê li civîna wedê niha gelek meriv kor kirine. Emê bibînin, wekî ew çi ku me çawa mesîhîtîya normal qebûl kirîye, anegorî normên ezmana, normal nîne.

Navê me heye, usa jî yazîya me û rasthatina meye tevî nebînayê heye, ya ku hîvîya me ye. Wede ye ku em gurênedabûna xwe û nêzîkbûna wî cûreyî daweşînin û mezinayê, rûmetê, bilindayê û qewatê li xwe bikin, Îsa Mesîh li xwe bikin.

## gava praktîk

Pûtparistî wî çaxî destpê dibe, çaxê em dilên xwe hindava Xebera Xwedê berk dikin. Eva koka pûtparistîya her cûreyî ye. Awa bona çi Xwedê emirî li ser Îsraêlê kir, ku dilên xwe biqelêşin, lê ne ku kincên xwe. Ewî tobekirina sera-bera nedixwest, ya ku wê berbi koka pirsgirêkê neçûya, berbi dilên wane berkbûyî, kîjana îdî dengê Wî nedibihîstin, yan jî guhdarî nedidane li ser.

Nava Qanûna Ducarî 8-da nivîsar e, wekî Xwedê Îsrayêl şîret kir, bona ku wana bizanibûya, wekî meriv tenê bi nanva najî, lê usa jî bi her xeberekêva, ya ku ji devê Xwedê derdikeve. Jîyana bi xeberên Xwedê û bi dengê Wî, usa jî ew yek kirina kanîya jîyana me ew e, çi ku me ji pûtparistîyê xweyî dike û me berbi wê jîyana zor bilind dike, bona kîjanê Ew gazî me dike.

Dengê Xwedê nava jîyana weda rola çawa dilîze? Cara dawî hûn kengê şêwira Wî ya derheqa qirarên xweda gerîyane? Duayê we monolog e, yan dîyalog e? Hema niha wede kifş bikin û hîvî ji Xwedê bikin, ku Ew wera qise bike. Bêdeng bin û dengê Wî guhdar bikin. Wîra xeber bidin, û çaxê ku hûn xilaz bikin, çi ku Ew dibêje we, binivîsin.

14

# GUNEH

*Guneh*. Gelo em derheqa gunehêda bêyî vekişandin xeber didin? Gelo ew çawa tiştê neqayîlkirî tê hesabê? Bona çi gerekê em nexwezin, bo ku haj dijminê xwe tunebin? Ne axir wî çaxî emê bikaribin mecalên anegor bidine xebatê, ku li ser gunehê serwêrîyê bikin.

Gelek cara meriv xebera "guneh" bi sivikayî didine xebatê, yan jî wextê qisa terîfkirina ji wê xeberê direvin, derheqa wan merivada difikirin, yên ku ji gunehkirinên qanûnparêzîyê, hînkirina, yan jî terîfa, êşîyaîne. Bi vî cûreyî werin em bin ronahîya Încîlê da gunehê binihêrin.

> "Ew gunehên we bûn, ku hûn ji Xwedê dane birînê" /Îşaya 59:2, NLT/.

Nava vê gotinêda xebera "guneh" ji xebera Îbranîye *"avon"* hatîye tercimekirinê. Nava peymana Kevin da ew xeber ji wan çar xeberên hîmlî ye, yên ku bi fikira "gunehê"-ne. Anegorî "*Ferhenga lêkolînkirina xeberên peymana Kevine tam*", ev xebera "xirabîya gunehê dide kifşê, çimkî ew fikira bi zanebûn tevlîhevkirinê û ji rîya xwe derketinê dîyar dike". Gilî derheqa gunehê *bi zanebûn kirî da ne*, yan jî, bi şirovekirina me, *kevirê krîptonî ruhanî,* yê ku me ji Xwedê dûr dixe. Ew me ji qencîyên xwedêtîyê dide dûrxistniê, yên ku bona jîyana xwedêparêziyê lazim in. Wextê ku em guneha dikin û li cem me keder tune, usa ye em ketine nava pûtparistîyê û bûne jineke bêesil. Em bûne dijminê Xwedê.

Peymana Nû da xebera "guneh", xebera "hamartîya"-ye. Ev herdu xeber nava peymana Nû da bi fikira "guneh"-ê gelek cara tên xebitandinê. "*Ferhenga lêkolîna xeberên peymana Nûy e tam*" dibêje, wekî ewê ku "hamartîya"-ê dike "mer-

emê jîyanêyî rast û tijîbûnê, usa ye ew Xwedê berdide".

Qasekê xwendinê bidine sekinandinê û derheqa vê yekêda bifikirin. Wextê ku em gunehê dikin, em ji wê şuxulkarîyê dûr dikevin, ji kîjanê /eger rast bifikirin/ meyê tu cara nexwesta bixalifîyana. Em ji Kanîya jîyanê dûr dikevin û şabûnê, aşîtîyê, serwaxtîyê, razîbûnê, stendinê û gelek tiştên mayîn unda dikin… ev navnîşa bêsînor e.

Gelek dersdarên Încîlê gunehê çawa "dûrketina ji nîşangehê" şirove dikin. Ev şirovekirin rast e, feqet bi hesabhildana wê şirovekirina hîmlî, ya ku min raberî we kir, bi fikira we, "dûrketina ji nîşangehê" gunehê tam şirove dike?

Xeberên başqe jî hene, yên ku nava peymana Nû da çawa mînakên "guneh"-ê tên xebitandinê, mesele, bêqanûnî, xirabkarî, neheqî û teribandina qanûnê. Feqet meremê min lêkolîna xebera nîne, lê ew e ku ez cudatîyên gunehêye sereke û wê karebûnê raber bikim, bi kîjanê guneh meriva dikişîne alîyê xwe û ji kanîya jîyanêye rast dide dûrxistinê.

Guneh êrîşê dibe li ser aktîvîya, hizkirina qewata, fikirdarîya, cedandin û meremên me. Hûn gerekê qet şikber jî nîbin, wekî guneh zyandar û undakir e. Ew dikare bi rastî li mêriv xweş bê, lê tenê bi wedekî kurt. Bi gilîkî, kirina gunehê bijartina razîbûna bi wedê kurt dide kifşê, kîsî zehmeta wededirêj, çimkî wextê ku hemû tişt ser hevda tê /xilaz dibe/, guneh bi encamên mirinêye wedelû derbê dighîne me. Guneh bona tebyeta meye bedenî balkêş e, lê çawa tiştekî nû nava Mesîh da, yê ku bi tebyeta Xwedê ye, em nava xweda naxwezin guneha bikin û dikarin li ber balkêşîya gunehê ber xwe bidin.

Xwedê gote Qayîn: "Guneh li ber dêrî ketî ye. Ew heyra teda ye, lê bike ku tu hukumî li ser bikî" /Destpêbûn 4:7/. Guhdarîyê bidine ser, wekî dergeh heye, kîjanêra guneh dikeve nava jîyana mêriv. Ew derî çawa "xwestin" tê navkirinê, û Aqûb dinivîse: "Xwestinên mêriv kirinên bi gunehêva dixuliqînin" /Aqûb 1:15, NLT/. Ew derî yan girtî ye, yan jî vekirî ye, wê yekêva girêdayî ye, ku em çi cûreyî nêzîkî xwestinên xwe dibin. Guneh hazir e li ser me hukum bike. Xwestina gunehê jî heye ku me bike xulamê xwe. Îsa eşaretîyê dide: "Ez we didime bawarkirinê: ewê ku guneh dike, xulamê gunehê ye" /Yûhenna 8:34, NKJV/.

Pawlos me bawarmendara xeberên Îsa şirove dike:

> "Gelo hûn fem nakin, wekî hûn dibine xulamê wê yekê, gura kîjanî hûn qirar dikin bikin. Hûn dikarin bibine xulamê gunehê, encamê kîjanî mirin e, yan jî dikarin qirarkin, wekî hûnê gura Xwedê da bin, encamê kîjanê jîyana heq e" /Romayî 6:16, NLT/.

Eger eva bes nîne, Petrûs derheqa berdewamkirina gunehêda dinivîse: "Çim-

kî hûn xulamê wî tiştî ne, çi ku hukumî li ser we dike" /B Petrûs 2:19, NLT/. Xulamtî ne xweş e, lê guneh jî axayê bêrehm e. Hûn bi gunehêva nikarin şa bibin, çimkî ew alîyê mirinê ye. Ew xwestinên diha zêde nava meda pêşda tîne û me berbi gavên usa def dide, yên ku paşê zyanê didine me. Ew yek, wekî meremê gunehê ew e, ku me bike xulam, eşkere nayê kifşê. Guneh tiştekî xapînok e: ew serwêrîyê li me dike û dilên me berk dike /binihêre Îbranî 3:13/, û bona me diha dijwar dibe, ku em rêberîya Ruh texmîn bikin, fem bikin û guhdar bikin. Guneh me şaş dike û berbi pûtparistîya undakir dibe. Bîr bînin, wekî Xwedê du cara li Silêman eyan bû. Hûn dikarin bînin ber çavê xwe? Nenihêrî wê yekê, wekî ewî paşwextîyê xwedêyên feş hebandin. Diqewime hûn bifikirin: "*Ew çawa bû, wekî ew merivê ku du cara Xwedê dîtibû, berbi xwedêyên feş* çû?". Bersiva vê pirsê ev e: bi rîya xapandinê. Eger ev yek tevî Silêman qewimî, yê ku Xwedê dîtibû, gelo çiqasî hêsa ye, ku ew yek rastî wan meriva bê, yên ku Ew nedîtine.

Guneh tiştekî usa nîne, kîjanêra dikarin bilîzin. Ew gelekî hukumdar e û dikare lez dilê mêriv biguhêre. Tiştê herî xirab ew e, wekî nava wî halê berkbûyîda dilên me xapîyayîne û em destpê dikin bawar bikin, ku em rastin, nenihêrî wê yekê, wekî bi rastî em şaşin. Em gunehkarîya xwe nabînin. Tu cara bawarîya xwe li vê derewê neynin: "Ez bi keremêva pêçyayî me: eger ez guneh bikim, bi tomerî hildayî, tu qezîya bona min tune".Tabîya vî cûreyî dide kifşê, ku meriv agir ra dilîze.Îzinê bidin ku ez şirove bikim.

## Gunehê bi zanebûn berbi gunehê hertimî dibe

Gunehê *bi zanebûn* dawîyê dibe gunehê *hertimî*. Awa ew yek çawa diqewime. Wextê ku em cara ewlin gurê nakin, wijdanê me mera xeber dide. Em ne ku deng dibihên, lê li cem me tê bêjî acizayî tê texmînkirinê. Dilê me tê bêjî bi bêdengî dike gazî: "Tu ji nîşangehê dûrketî: tu ji rîya jîyanê xalifîyî û gerekê şaşîya xwe rast bikî, tobe bikî û baxşandinê hîvî bikî". Eger wî çaxî em gunehê xwe berdin, bi dil tobe bikin, dilê me wê paqij bibe, û emê her dem dengê Ruh bibihên. Nava Xebera Xwedê da nivîsar e: "Ewê ku neheqîya xwe vedişêre, xêrê nabîne, lê yê ku xwe mikur tê û dihêle, wê rehmê bibîne" /Mesele 28:13/.

Çi jî hebe, eger em dengê wijdanê xwe hesab hilnedin, wî çaxî dilê me wê bi xêlîyêva bê veşartinê /derheqa vê yekêda me serê kitêbêyî pêşinda got/. Eger em careke mayîn gurêda nîbin, wî çaxî texmînkirina acizîyê îdî wê qewat nîbe. Ewê diha sist be û emê bi dijwarî guhdar bikin, çimkî texmînkirina dilê me wê kêm bibe. Feqet, em hela hê dikarin baxşandinê hîvî bikin û bêne dasekinandinê, eger em nêzîkbûna xweye hindava gunehê kirî dilê xwe û fikira xweda biguhêrin.

Feqet, eger em dîsa dengê lêhilatina wijdanê xwe hesab hilnedin, dilê me wê

bi xêlyekêva jî bê veşartinê û texmînkirina me wê diha zeyîf bibe. Eger em gura Xebera Xwedê nekin, wî çaxî emê dengekî gelekî zeyîf, yê acizîyê, texmîn bikin. Guhdarkirin wê diha dijwar be, çimkî wî çaxî wijdanê me îdî nêzîkî texmînnekirina tam e. Wî çaxî em hela hê dikarin baxşandinê hîvî bikin û bêne dasekinandinê, eger em bi rastî fikira xwe û dilê xweda bêne guhartinê, lê texmînkirina şaşîya wê diha dijwar be.

Eger em carekê jî evî dengê lêhilatinê hesab hilnedin, dilê me wê dîsa bi xêlîkêva bê veşartinê. Eger vî cûreyî berdewam bibe, wijdanê me wê rûyê pûtparistîya meda bi kutasî bişewite. Texmînkirinên meye ruhanî wê ko bin û emê hindava Ruh da tu tiştî texmîn nekin. Emê bikaribin hêsa guneha bikin û emê bikevine nava halê gunehê. Emê hela hê bikaribin baxşandinê bistînin û bêne dasekinandinê, feqet emê nexwezin wê yekê bikin, çimkî emê gunehê çawa guneh qebûl nekin.

Gava bi sirê ew e, wekî Xwedê wê pêxember, serwêr yan jî hevalekî bişîne, ku ew bighîje me. Eger em wî mizgîndarî guhdar nekin, gava bi sirê, ya ku Xwedê wê biavêje ku bighîje me û guhdarîya me bikişîne li ser wî alî, wê bibin dijwarî, tengavî û cefa. Dawid dibêje: “Hetanî dîtina cefa, ez dixalifîm, lê niha ez Xebera Te xweyî dikim” /Zebûr 119:67, NKJV/.

Werin em fem bikin: cûrê herî baş, yê hînbûna ji Xwedê ew e, ku em gura wî hemû tiştîda bin, çi ku Ew li me eyan dike û ji gunehê dûr bimînin. Lê eger em usa nekin, ew awqasî me hiz dike, wekî wê tengavîya bide xebatê, bona ku me hîn bike û paşda vegerîne li ser rîya jîyanê. Nava *“Tercima Saxe Nû*”-da xeberên Dawid vî cûreyî ne: “Ez dixalifîm, hetanî ku Te ez şîret kirim: lê niha ez bi guhdarî dîna xwe didime Xebera Te” /NLT/.

Eger em careke mayîn xeberên Pawlose bona korintîya bixwînin, emê dîsa wê şirovekirinê bibînin, ya derheqa wê yekêda, ku Xwedê çawa dicêribîne me paşda bîne. Ew dibêje civîna korintîyê: Feqet, çaxê ku ji alîyê Xudanda dîwana me dibe, em têne şîretkirinê, wekî dîwana me tevî vê dinîyayê nebe” /A Korintî 11:32, NLT/. Xwedê guman e, wekî ev tengavî, zêrandin û qezîya, yên ku Ewî îzin daye ku em bibînin, wê guhdarîyê bibine li ser xwe û wê me def bidin, ku ji rîya mirinê em vegerine berbi rîya jîyanê.

Em dîsa wê prînsîbê dibînin, wextê ku Pawlosê şandî derheqa wî merivîda dibêje, yê ku tevî dêmarîya xwe ketibû nava heleqetîyên bedenî. Ew dibêje: “Hûn gerekê vî merivî teslîmî mîrêcin bikin, bona ku bedena wî ceza bikin, [bona undakirina xwestinên bedenî, yên ku ew berbi zinêkarîyê def dan], wekî ruhê [wî] bikaribe [hela hê] ji roja Xudan Îsa xilaz be” /A Korintî 5:5, AMPC/. Wextê ku serwêrê vê civînê got, ku gerekê vî merivî ji nava xwe derxin, meremê wî ew bû ku ne tenê civîna Korintîyê ji wî gunehê heram biparêze, yê ku lez bela

dibe, lê usa jî alî wî merivî bike, yê ku nava gunehda bû.

Xwedê bi kûrayî û bi germayî zarokên xwe hiz dike. Awa bona çi Ew dicêribîne bi gelek cûra bighîje me, nenihêrî wê yekê, ku em li cem gunehê kîjan êtapa xulamtîyêda nin. Ew pêşda çawa pirsa ewlin hesab dike, ku cûrê herî baş bona me kîjan e, bi hesabhildana halê meyî niha.

Nava kaxeza îbranîyada gotinek heye, ya ku şuxulkarîya gunehê eşkere dike:

> "De werin em hemû giranîya ji xwe dûr bixin, ya ku pêşdaçûyîna me dide hêdîkirinê, bi taybetî wî gunehî, yê ku usa dike ku em hêsa bişimitin" /Îbranî 12:1, NLT/.

Guhdarîyê bidine li ser xeberên wî: "…yê ku usa dike, ku em hêsa bişimitin". Gunehê ku bi hêsanî min dide şimitandinê, ne îçikevexwerin, ne timayî, ne hukumê narkotîka, ne buxdanbêjî û ne jî gunehên eyane mayîn bûn. Bona min ew yek pornografîya bû. Ew yek şerkarîya jîyana min ya mezin bû û nava serîkî kitêbêyî mayînda ezê derheqa wê yekêda gilî bikim, ku sala 1985-a ez ji wê yekê aza bûm. Gotina vê xeberêye sereke ev e: em gerekê bizanibin, ku em hindava kîjan gunehada dibine nîşangeh, û emê wî hemû tiştên lazim bikin, bo ku ji wana dûr bimînin. Îsa vî cûreyî dibêje:

> "Eger destê te te ji rê derdixe, wî jê bike, çimkî hê qenc e tu qop bikevî jîyîna heta-hetayê, ne ku du destên te hebin û herî cenimê, nava agirê ku qet natemire…Eger nigê te te ji rê derdixe wî jê bike…Eger çavê te te ji rê derdixe, wî derxe" /Marqos 9:42,44,46/.

Îsa derheqa bi rastî jêkirina destê we, yan jî nigê we, yan jî derxistina çavê weda nabêje. Ew dixweze bêje, wekî em gerekê ji wan guneha dûr bimînin, yên ku usa dikin, ku em bi hêsanî bişimitin.

Gelek hevalên min hene, yên ku pêşda îçikexur bûne, û minra hatîye gotinê ku ez alî yekî bikim, ku ew ji wê yekê azad bibe. Roja îroyîn ew meriv naxweze qet ronkeke biçûk jî şerabê vexwe û fesal ji wan cîha dûr dimîne, li kîderê îçikên alkohol hene. Hevalê min zane, wekî ew yek ew goveka gunehê ye, ya ku dikare bi hêsanî wî bike xulam. Ew bi serwaxtî gura xeberên Mesîh dike û her mecaleke ku dikare wî bike xulam ji xwe dûr dixe.

Feqet, nava salên xwendina minda, pêşîya qebûlkirina mesîhîtîyê, min îçike dida xebatê û tevî xwendikarên mayîn û tevî hevalên xwe ez serxweş dibûm. Carekê, wextê hêsabûna girêdayî Bûyîna Pîroz ra, ez barekêda tevî hevalên xwe bûm, û em gelekî serxweş bûn. Ewê rojê ez nîvê şevê gihîştime malê, çimkî min hevalên xwe birine malên wan, paşê çûme mala xwe. Min dît, wekî dayîka min

hîvîya min bû, min derheqa hevalên xweda wêra gilî kir, û nava xeberdana xweda min gote wê:

-Dayê, rast gotî, îçike li min xweş nayê.

Ew kenîya û got:

-Tu Bîvêrê rastî.

Wî çaxî min fem kir, wekî min tu cara bavê xwe serxweş nedîtibû. Malbeta wîda serxweşê ji alkolohê tune bûn, û ew yek ew guneh nîbû, yê ku usa dikir ku Bîvêr bişmitin, nenihêrî wê yekê, wekî gunehên mayîn hebûn. Ew gunehên ku bi hêsanî me alt dikin, gerekê îzinê nedine wana ku ew bikevine nava jîyana me.

Xudanê kaxeza îbranîya serda zêde dike:

Gelo we ew gotinên dildayînê bîr kirine, yên ku Xwedê wera çawa tevî zarokên xwe xeber da? Ewî got:

> "Lawê Min, şîreta Xudan pişt guhê xweva nevêje, û ne jî gava ku Ew te rast dike, li ber xwe nekeve. Çimkî Xudan wana şîret dike kê hiz dike, û wana ceza dike, kîjanî çawa lawê Xwe qebûl dike" /Îbranî 12:5,6, NLT/.

Xudan me şîret dike, wextê ku em guneh dikin. Werin em lez careke mayîn vê şuxulkarîyê lê binihêrin.Gava ewlin ew e, ku em bi Xebera Wî xwe rast bikin, wextê ku Ew dilê meda li me hiltê.Eger em guhdar nekin û îzinê bidin, ku wijdanê  me bi xêlîyava bê veşartinê, lêhilatin wê bighîje bi destî hevalê me, serwêr yan jî pêxember. Eger em dîsa guhdar nekin, Ewê dijwarîya, tengavîyê, yan jî zêrandina bide xebatê.

Derheqa vê yekêda bifikirin, bona çi xudanê nivîsarê dinivîse?: "Ber xwe nekevin", wextê ku Xwedê şîret dike. Ew yek dide kifşê, wekî ew şîret gelekî berk e. Awa ku peyî wê yekêra çi nivîsare:

> "Feqet, şîreta Xwedê her dem bona me kardar e, bona ku em jî mîna Wî pîroz bin. Tu şîretek wê demê dilê merîya şa nake, lê diêşîne. Lê belê, ewê bona wana bibe berê jîyana edilayê, yên ku bi vî cûreyî hîn bûne" /Îbranî 12:1O, 11, NLT/.

Guhdarîyê bidine ser, wekî şîret diêşîne. Meriv ji vê yekê zelaltir bêje: Xwedê natirse ku lawên Xwe "bi darê şîretêva" rast bike. Derheqa wê yekêda bifikirin, ku em çiqasî bêaqil in, wextê ku em qirar dikin peyî wan xwestina herin, yên ku dijî Xwedê ne. Derheha vê yekêda bifikirin: em dikarin nava jîyana xweda diha hindik biêşin, eger em ji gunehê dûr bimînin, dewsa dîtina tiştên bi wedê kurt.

Ruhê Xwedê dicedand ku bi destî Pawlosê şandî alî korintîya bikira, usa jî alî wî merivî bikira, yê ku tevî jina bavê xwe zinêkarî dikir. Xwedê vê yekê dîsa berdewam dike, bi wê gumanê, wekî me paşda vegerîne li ser rîya jîyanê, bona ku em mîna Wî bibin pîroz. Ev herdu rê li rex hev nabin. Em yan gerekê lezeta jîyana tijî bibînin, gura Xebera Xwedê bikin, yan jî qirar bikin ku berbi pûtparistîyê herin, berbi gunehê bi zanebûn /kevirê krîptonî ruhanî, yê ku gelek tengavîya û cefa dide me/.

## gava praktîk

Guneh bi xwe xapînok e. Xapandin ew e, wekî guneh dikare razîbûnê bide me. Xapandin ew e, wekî em serwêrîyê li gunehê dikin, lê fem nakin, wekî eger em berdewam bikin nava gunehêda bimînin, wî çaxî ewê bi temamî serwêrîyê li me bike. Encamê xapandina gunehêye here xirab ew e, wekî guneh me ji wê rûmeta rast dûr dixe, bona kîjanê em hatine gazîkirinê û îzinê nade ku heleqetîya saxe tevî Mesîh hebe.

Lê eger dîtinoka meye derheqa wê yekêda heye, ku Xwedê çi dikare nava jîyana meda bike, qewatê, azayê, kardarîya nebînayî, nêzîkaya tevî Wî û nava gelek govekên mayînda, wî çaxî emê fem bikin, wekî guneh feş e û ew yek xapandin e.

Hîvî ji Xwedê bikin, ku Ew nava her govekeke jîyana weda nîşan bide, ku li kîderê we destpê kirîye dîtinoka derheqa wê jîyanêda unda bikin, ya ku Ew dixweze bide we, wan goveka, kîjanada diqewime guneh û berdaxustin destpê kirine diha zêde li we xweş bên. Îzinê bidine Wî, ku Ew dîtinoka nû bona wan govekên jîyana we bide. Çi ku Ew nîşanî we dide, binivîsin.

# BEŞA SISÎYA

# 15

# QEWATA GUNEHÊ /BEŞ YEK/

Peymana Kevin da Qayîn eşaretî stend: “Fesal be. Guneh li ber dêrî ketiye û dixweze serwêrîyê li te bike. Feqet, tu gerekê wî alt bikî û serwêrîyê li wî bikî” /Destpêbûn 4:7, NLT/. Ev yek derheqa her merivekîdane.Guneh berbi me dicedîne: ew dixweze me bike xulam û serwêrîyê li me bike, bona ku ew nava jîyana meda kifş be. Guneh xapînok e, mêriv berbi xwe dikişîne û dijminekî qewat e.

Meriv çawa dikare serwêrîyê li gunehê bike? Bersiva vê pirsê ev e: gura xwestina Xwedê, Xebera Wî û rêyên Wî  bikin. Em bixwînin, ku Xwedê pêşîya Destpêbûn 4:7-da çi gote Qayîn: “Tê qebûlkirî bî, eger tu rastîyê bikî. Lê eger tu ji kirina rastîyê paşda bisekinî, fesal be. Guneh li ber dêrî ketiye”. Gurêdabûna bi dil *li ber xwestina guneh*ê *derî digire.*

Xeberên Pawlos yên bona bawarmenda bîr bînin /bîra xweda xweykin, wekî Pawlos ew meriv bû, yê ku eyantîya here mezin, ya derheqa Kerema Xwedê da, stendibû/:

> “Gelo hûn fem nakin, ku hûn dibine xulamê wî tiştî, gura kîjanî hûn qirar dikin bikin? Hûn dikarin bibine xulamê guneh, encamê kîjanê mirin e, yan jî gura Xwedê da bin, encamê kîjanê jîyana heq e” /Romayî 6,16, NLT/.

Gotinên Pawlos mînanî gotinên bona Qayîn in. Feqet, firqîke mezin heye. Peymana Kevin da ruhê meriva mirî bû, ji merivê  nava wanda jîyan nedikişiya. Peymana Nûda û ruhê ku îro bawarîya xwe li Îsa tîne, sax e: ew tevî Xwedê yek e û tebyeta Wî ya xwedêtîyê heye. Bo wê yekê jî em dikarin qirar bikin, wekî emê gura merivê hundur da, ruhê xwe, yan jî merivê me ê der, bedena xwe, bikin.

Xêncî wê yekê, niha kerema Xwedê dişuxule: ew ne tenê xilaz dike û dibaxşîne, lê qewatê dide, bona ku em gura rastîyê bikin. Xebera Xwedê li ber dilê me da tê: “Wê keremê qewîn bigrin, bi kîjanê em bi xweşî Xwedê dihebînin” /Îbranî 12:28/. Kerem karebûna gurêkirinê, ya hindava Xwedê da, dide me.

Petrûs dinivîse: “Bila Xwedê diha zêde û zêde *keremê* bide we… Xwedê bi qewata /bi kerema/ Xwe ya xwedêtîyê ew tişt daye me, hewcê kîjanê ne em, ku em jîyana xwedêparêzîyê derbaz bikin” /B Petrûs 1:2, 3, NLT/. Nava van her du gotinada, usa jî nava xeberên peymana Nûye mayînda, kerem çawa qewat tê şirovekirinê. Bi pêşkêşa kerema Wî, tebyeta meye nûye bi qewat heye, ya ku ne li cem Qayîn, ne jî li cem tu kesekî nava peymana Kevinda tune bû.

Wî çaxî pirs pêşda tê, gelo bona çi gelek bawarmendara li hev nayê ku serwêrîyê li guneh bikin? Ew yek girîng e, wekî em dikarin qewat bin, lê wextê ku em wê yekê nadine xebatê, wî çaxî kara wê, feydayê wê, tune. Xwedê mecala bijartinê dide me her kesî, û tu tiştî mecbûr nake. Dêmek, wextê ku mesîhî gura Xwedê nake, guneh destpê dike serwêrîyê li jîyana wî bike. Gelo bona çi bawarmend gerekê îzina wê yekê bide? Ew yek dikare wî çaxî biqewime, wextê ku guneh wî bawarmendî bîne li ser wê fikirê, wekî xwestina wî wê bona wî diha karadr be, ne ku ew gura Xwedê bike. Ev e menî, wekî Pawlos dinivîse:

> “Qewata guneh ji qanûnê ye” /A Korintî 15:56/.

Ev gotin bi dijwarî tê femkirinê û diqewime mêriv zendegirtî jî dihêle. Guneh hukumî li ser mêriv dike û qewata xwe ji *qanûnê* distîne. Berê ewlin hûn dikarin bifikirin: *“Ez bin qanûna Mûsa da nînim”*. Ev yek rast e, lê lazim e bidine kifşê, wekî xebera “qanûn” nava Încîlê da her car nîne ku derheqa qanûna Mûsada ye. Aqûb derheqa “qanûna padişatîyêda” dibêje /binihêre Aqûb 2:8/, ya ku derheqa hizkirina merivê nêzîkda ye. Usa jî “qanûna Xwedê” heye /binihêre Romayî 8:7/, ya ku li ser dilên bawarmenda ye, heye “qanûna Mesîh” /binihêre Galatî 6:2/, ya ku wî çaxî dibe, wextê ku barê hevdu dibin û “qanûna azayê” /binihêre Aqûb 2:12/, bi kîjanê emê li ber dîwanê bisekinin. Usa jî gelek “qanûnên” başqe hene. Nava Korintî 15:56-da Pawlos derheqa van qanûnada nabêje.

Wî çaxî Pawlos derheqa kîjan qanûnêda dibêje, bi kîjanê guneh qewatê distîne, bona ku hukumî li ser bawarmenda bike? Hetanî dayîna bersiva vê pirsê, îzinê bidin ez şirove bikim. Awa hinek fikir, yan jî xeber, yên ku derheqa van merivada nin, yên ku bin vê qanûnêda nin: “Ez gerekê vê fîlmê temaşe nekim, çimkî wêda gelek tiştên vekirî û kifirî hene”, “Ez gerekê bac bidim”, yan jî “Ez gerekê wî alîyê serayê nenihêrim, çimkî jina ku li wir e bi kincê vekirî ye”.

Ev gotin derheqa kîjan qanûnêda nin? Bona wî merivî, yê ku tiştên vî cûreyî xeber dide, Xebera Xwedê faktora sînorkirî ye, lê ne ku şabûna wî ye. Bona wî

Xebera Xwedê çawa tiştekî mecbûrkirinê û zeftkirinê ye, û ew jî miqabilî xeberên zebûra ye: “Ez bi şabûn dijîm, wextê ku xwestina Te dikim, Xwedêyê min, çimkî gotinên Te li ser dilê min nivîsarin” /Zebûr 4O:8, NLT/. Merivê ku bin “qanûnêda ye” bi dil *“naxweze xwestina Wî bike”* /binihêre Yûhenna 7:17/.

Tê bêjî ev şirovekirin hemû tiştî dibêje: “Minê bixwesta ew yek bikira…lê Xebera Xwedê tiştekî mayîn dibêje”. Peymana Kevinda jî mînakeke derheqa wê yekêda heye.

## Pêxemberê ku qayîl nabe

Bilam pêxember bû. Ewî dengê Xwedê nas dikir û rêyên Xudan bona Wî eyan bûn. Balaq padişê Mowabê bû û xêncî wê yekê ewî serwêrtîya midîyaniya dikir. Temamîya bineliyên welêt nava tirsêda bûn, çimkî cimeta Îsrayêlê nêzîkî wana dibû. Îsrayêlîya welatê dinîyayêda herî hukumdar talan kiribûn, û behra Sor derbaz bibûn. Qewatên Misirêye leşkerî, malhebûna gundîtîyê û êkonomîka wê li ber tunebûnê sekinîbûn, û kurê her malbetekî, yê ewil, teslîmî mirina nebînayî bibû.

Piştî derketina ji Misirê, Îsraêlî rastî êrîşa cimeta Amoryayê hatin û bi temamî hatine hincirandinê. Niha Îsraêl li deştên Mowabê esker berev kiribû, û cimeta Mowabê, rêber û padişê wan ditirsîyan, difikirîn, wekî Îsraêl jî wê hema ew yek bianîya serê wan, çi ku misirîya û amorîya anîbûn serê wan.

Balaqê padişara derheqa pêxemberekî kifş û hukumdarda gilî kirin, navê kîjanî Bilam bû. Wextê ku ewî meriv dua dikirin, ew rastî tiştên qenc dihatin, lê wextê ku ewî nifir li meriva dikirin, ew rastî tiştên xirab dihatin. Balaqê padişa qasidên xwe, bi pêşkêşa û bi vê pêşniyarê şandine li cem Bilamê pêxember: “Ez reca dikim, were, bona xatirê min nifira li wî miletî [Îsraêl] bike, çimkî ew ji min qewattir e. Belkî ezê hingê bikaribim zora wî bibim û berdimê û ji erdê xwe derxim” /Jimar 22,6/.

Bilam bersiva qasida da:

> “Ewî gote wan: “Îşev li vir bimînin, û ezê bersiva we usa bidim çawa ku Xudan minra bêje”. Wekîlên Mowabê cem Bilam man” /Jimar 22:8/.

Guhdarîyê bidine ser wê yekê, wekî Bilam Wî çawa “Xudan” nav dike. Ewî şêwira xwe tevî xwedêkî başqe nedikir, çimkî ew pêxemberê Xwedêyê tektenêyî rast bû. Dewsa xebera “Xudan” ewî navê *“Yahvêh”* dida xebatê. Eva navê Xwedê ye: xudanên peymana Kevin tu cara ev nav nedidane xebatê, wextê ku wana derheqa Xwedêyê feşda digotin.

Gelo wana gelek cara xebera “Xudan” didane xebatê, wextê ku wana dixwest derheqa Îsa û Bav Xwedyêyê meda bigota? Em derheqa xwedêyên başqeda nabêjin, lê derheqa Efirandarê xwe, Xudanê Tewrebilind û derheqa Wî da dibêjin, Yê ku jîyana Xwe bona me da. Bilam jî wî cûreyî dikir.

Bi guhdarî bixwînin, ku wê şevê Xwedê çi gote Bilam. Tiştekî hewaskar e ku em bidine kifşê, wekî Ew hîvîyê nesekinî ku Bilam Wî bigere.

> “Xwedê hate cem Bilam û got: “Ev merivên hane cem te kî ne?””
> /Jimar 22:9/.

Xudan, bi texmîn, digote Bilam: “Ev meriv bona Min kî ne? Ew tevî Min nava peymanêda nînin. Tu bi rastî dixwezî derheqa nifirkirina li wê cimeta peymana Min da ji Min bipirsî? Tu bona çi derheqa vê yekêda dixwezî dua bikî? Gelo ev bersiv kifş nîne?”.

Tişt hene, bona kîjana gerekê dua nekin. Em îdî zanin, ku xwestina Xwedê kîjan e, wextê ku em wê yekê dixwînin, çi ku nava peymana Wî ya nivîsarda eyankirî ye. Hewce nîne dua bikin û ji Xwedê bipirsin, ku gelo gerekê tevî mesîhîyîên başqe berev bibin, yan na? Xwedê îdî gotîye: “Bila em dest ji lihevcivînê nekişînin, çawa ku hineka ew yek xwera kirîye xeyset”/ Îbranî 1O:25/.

Hewce nîne ku dua bikin û ji Xwedê bipirsin, ku gelo lazime bona wan meriva qurbana berev bikin, yên ku qulixî we dikin, çimkî kitêba Pîroz dibêje: “Xudan emir kir, ku yên Mizgînîyê dannasîn dikin, ji Mizgînîyê bijîn” /A Korintî 9:14/.

Hewce nîne bipirsin, ku gelo dikarin bikevine nava heleqetîyên bedenîye yekqismê, yan jî piştgirîyê bidine wê yekê? Xwedê îdî zelal derheqa vê yekêda gotîye:

> “Hûn fem nakin, ku yên neheq wê padişatîya Xwedê war nebin? Hûn xwe nexapînin. Ewên ku xwe didine gunehên bênamûsîyê, yan jî pûtparist in, yan zinêkarîyê dikin, yan jî mêr in, lê bedena xwe difroşin, yan qunde ne, yan diz in, yan merivên tima ne, yan serxweş in, yan jî şerûd in, yan jî meriva dixapînin: ji vana tu kes wê padişatîya Xwedê war nebe” /A Korintî 6:9,1O, NLT/.

Hewce nîne, ji Xwedê bipirsin, ku hûn dikarin dêklarasîya bac bidine feşkirinê, çimkî ev yek dizî ye.Yan jî hûn cîguhastî mala hevalê xwe, yan jî hevala xwe bibin û bi jîyana bedenî tevî wê, yan jî wî, hetanî zewaca xwe derbaz bikin: eva gunehê bedenî ye.Yan jî heleqetîya tevî jina merivekî mayîn destpê bikin: eva zinêkarî ye û tiştên mayîn. Nava peymana Nûda gelek temî hene, yên ku îdî zelal xwestina Xwedê didine kifşê.

Bi texmîn, Xwedê gotina Xwe berdewam kir:

> “Baş, Bilam, eger tu fem nakî, yan jî diha rast naxwezî fem bikî, Ezê zelal xwestina Xwe bona te eyan bikim”. “Tevî wan neçe, nifira li wî miletî neke, çimkî ew milet *buhurtî ye*” /Jimar 22:12/.

Ev gotin hewcê şirovekirinê nînin.

Lê niha guhdarîyê bidine li ser wê yekê, ku Bilam çawa bersiva gotina xwedêtîyê da:

> “Bilam sibehê rabû û gote wekîlên Balaq: “Herine welatê xwe, çimkî Xudan îzina min *nade*, ku tevî we bêm” /Jimar 22:13/.

Gelek meriva wê pesinê Bilam bidana. Meyê bona şikestîbûna wî destê xwe lihevxista û meyê bigota: “Ew birayekî xwedêparêz e”. Feqet, nava gotina wîda tiştek heye, û ew yek me mecbûr dike ku em cûrekî mayîn bifikirin. Guhdarîyê bidine li ser wê yekê, wekî ewî got: *“*Xudan *îzina* min *nade”.* Ewî got: “Xudan xwestina Xwe zelal da kifşê û rûyê wê yekêda ezê neçim”. Ewî gotina *“îzin neda”* da xebatê.

Em mînanekê bînin ber çava. Komeke şagirtên mekteba bilind qirar dikin herin tişta bikirin, lê paşê jî herine sînêmayê. Êmî, ya ku yeke ji wana ye, bona çûyînê îzinê ji dê û bavê xwe hîvî dike. Ew jî dibêjine wê:

- Êmî, vê êvarê emê bi malbetêva tevayî şîvê bixun, diha baş e ku tu tevî me bimînî.

Hevalên Êmîyê bi avtomaşînê tên li ber mala wê, bona ku wê jî tevî xwe bibin. Dema ku ew dêrî vedike, hevalên wê ji wê dipirsin:

-Tu hazirî?

Êmî medekirî dibêje:

-Ez nikarim bêm.

Ev yek dide kifşê: *“Zarno, minê bixwesta ku ez tevî we bihatama, lê ez gerekê bona ş*îva malbetê li malê bimîn*im”.* Xwestina dê û bavê wê îzinê nade wê ku ew wê yekê bike, çi ku ewê bi rastî dixwest. Gotinên dê û bavê wê bona wê *qanûn* in. Gotina Bilam jî hema wî cûreyî bû.

## Peymana diha kardar

Wekîlên Mowabê paşda vegerîyane li cem padişê xwe û caba Bilam gîhandine wî. Feqet wê yekê padişê razî nekir: înkarkirin bona wî bersiv nîbû. Dêmek, ewî merivên diha bi qedir û bi pêşkêşên diha mezin şandin ku Bilam teglîf bike. Awa gotinên padişê: “Ji kerema xwe, texsîr neke, were, ezê qedir-hur-

meteke mezin bona te bikim û çi ku bêjî ezê bikim, tenê were bona min nifira li vî miletî bike" /Jimar 22:16, 17/.

Eger cînarekî we bigota we: "Ezê bona te çi ku bêjî bikim", wî çaxî ewê tiştekî mezin nîbûya, lê wextê ku padişê dewleteke mezin pêşniyareke wî cûreyî dike, wî çaxî ew yek gelek tiştî dide kifşê.

Wextê ku ez li mekteba bilindda hîn dibûm, wî çaxî komîkekî eyan, yê bi navê Flîp Wîlson hebû. Ji gotinên wîye kifş yek ev bû: "Mîrêcin ez mecbûr kirim, ku ez wê yekê bikim". Eva tiştekî pêkenînê bû û meriva gelek cara gotinên wî diwekilandin, lê ew gotin nerast in. Mîrêcin nikare bawarmend mecbûr bike, ku ew tiştekî bike. Xebera Xwedê zelal dibêje: "Lê her kes *dibe maşoqê dilhavijîyên xwe*, dixape û tê cêribandinê" /Aqûb 1:14/. Nava vê gotinêda "dibe maşoqê dilhavijîyên xwe" gotina kilît e. Awa ew hemû tişt, çi ku mirêîcin dikare bîne serê bawarmend. Feqet hûn nikarin wî tiştî bikin, çi ku hûn naxwezin. Eger li ber min narkotîk danîyana, minê bigota: "Wî tiştî ji min dûrxin". Tu kes wê nikaribûya usa bikira, ku min ew tişt qebûl bikira, çimkî xwestina min ya hindava narkotîkada tune.

Feqet mîrêcin aqil e û xweranedîtî nîne. Ew teslîmî cina dike, ku ne tenê jîyana we lêkolîn bikin, lê usa jî jîyana dê û bavê we, kal û pîrên we lêkolîn bikin. Ew derheqa kêmasîyên malbeta we û usa jî xwestinên weda zane.

Ewî jîyana Bilam lêkolîn kiribû û zanibû, wekî xwestina wî pêxemberî ya nesaxlem hindava hebûkê, pêşkêşa û tiştên mayînda hebû. Ez guman im, wekî ev bû menî, wekî mîrêcin usa kir, ku padişa Balaqê bêxwedê pêşniyarên diha mezin bikira. Feqet bisekinin: bi çiqasîva pêşniyar mezin bû, ewqasîva jî bersiva Bilam balkêş bû:

> "Dixwezî Balaq mala xwe ji zêr û zîv bide min, ez *nikarim* ser gotina Xudan Xwedêyê xwera derbaz bibim, ku tiştekî biçûk, yan mezin, bikim" /Jimar 22:18/.

Meyê careke mayîn bona wê tabîya Bilamê pêxember destên xwe lihevxista, çimkî ew gura Xebera Xwedê da bû, eger pêşniyara hê mezin jî bûya. Feqet, em careke mayîn wan xeberên kilît dibînin, yên ku nîşan didin, wekî pêxember xwe sînorkirî texmîn dikir. Ewî got: "Ez nikarim", lê negot: "Ez naxwezim".Tu tişt nehatibû guhartinê. Ew hela hê bi Xebera Xwedêva zeftbûyî bû, ya ku bona wî qanûn bû. Xeberên wîye bi sirê hema vê yekê îzbat dikin:

> "Û niha ez reca dikim, ku hûn îşev li vir bimînin, wekî bizanibin ku Xudanê çi tiştê mayîn bêje min" /Jimar 22:19/.

Gelo pêşniyara diha zêde wê fikira Xwedê bida guhartinê? Gelo kesek dikare bawar bike, wekî Xwedê gote Bilam ku cara ewlin bêje “na”, çimkî Ewî zanibû, wekî padişayê pêşniyareke hê zêde kardar tevî qasidên mayîn bikira? Eva fikirdarîke bêaqil e. Xwedê pêşniyarî Bilam nedikir, ku ew bona pêşniyareke hê baş hîvîyê bisekinîya. Dêmek, eger hewcetî tunebû ku Bilam cara ewlin dua bikira, usa ye hewcetî tunebû cara duda jî dua bikira. Xwedê xwestina Xwe ya cara ewline derheqa merivên pêşda hatîda zelal got: “Tu tevî wan neçî”.

Nenihêrî vî hemû tiştî, Bilam qirar kir wê şevê dua bike. Feqet, niha bersiva Xudan guhdar bikin:

> “Eger ev merivana hatine û gazî te dikin, rabe tevî wan here, lê tenê çi ku Ezê tera bêjim wê bike”/Jimar 22:2O/.

Bisekinin. Niha Xwedê dibêje: “Tevî wan here”. Gelo me rast nexwend? Ev çi diqewime? Ev çawa hemû tişt hate guhartinê? Niha Bilam ji Xudan hîvîya xeberê bû, wekî ew tevî qasidên Mowabê biçûya. Û ewî ew yek usa rast kir, çi ku Xudan gote wî. Ewî kerê xwe hazir kir û tevî qasidên Mowabê çû. Ewî gura gotina Xwedê kir. Feqet, ev tişt qewimî:

> “Û rûyê çûyîna Bilam da hêrsa Xwedê gur bû” /Jimar 22:22/.

Ev çi diqewime? Gelo Xwedê bi şîzofrêniyayêva dizêre? Bilam ew yek rast kir, çi ku Xwedê wê şevê gotibû wî, lê Xwedê li ser wî hêrs ket. Vê yekê meriv çawa dikare şirove bike? Încîlêda bersiveke logîkî heye, ya ku gelek tiştî dikare li me eyan bike. Ev bersiv derheqa wê rastîyêda ye, wekî *guneh qewata xwe ji qanûnê distîne*. Derheqa vê yekêda emê serê kitêbêyî mayînda eşkere bikin.

## gava praktîk

Gelek bawarmend hewcene ku guhdarîya vê banga gumanê bikin: hûn dikarin ji serwêrtîya gunehê bi temamî azad bibin.

Belê, we rast xwend. Mesîhî dikarin ji gunehê bilindtir bin. Îsa tenê bona wê yekê nemir ku “bilêta Ezmîn” bide we: Ewî hûn ji serwêrtîya gunehê û mirinê aza kirin. Serwêrtîya gunehê li ser we tune: serbara serda serwêrtîya we li ser gunehê heye.

Ev yek tenê bi kerema Xwedê dikare bibe, bi zoraya Wî ya xwedêtîyê, ya ku wan tişta dikare bike, çi ku meriv nikare bike. Kerem mera hatîye dayînê û zoraya keremê ya me ye. Feqet emê wan cudatiyên keremê nestînin, eger em wê

nedine xebatê. Çawa qanûn, bawarmend kerema Xwedê nadine xebatê, çimkî ew fem nakin wekî ew ya wane.

Roja îroyîn li ber gunehê qewat bin, bi fikirmîşbûna dora wan parçên Încîlê, yên ku eyan dikin wekî serwertîya weye rast li ser gunehê heye. Derheqa vê yekeda Xwedê ra xeberdin û bona  wan goveka tobe bikin, kîjanada we îzin daye gunehê ku ew serwêrtîyê nava jîyana weda bike. Bona ku îro hûn azayê bidine xwe, ji Xwedê razî bin. Bona teribandinên xweye berê, bibaxşînine xwe û hîvî ji Xwedê bikin ku Ew nîşanî we bide, ku Ew çawa teribandinên we  dinihêre. Wê yekê binivîsin, çi ku Ew nîşanî we dide, yan jî li we eyan dike.

# 16

# QEWATA GUNEHÊ /BEŞ DUDU/

Em serpêhatîya serê kitêbêyî pêşda destpêbûyî, ya derheqa Bilam pêxemberda berdewam bikin.

Xwedê gotibû Bilam, ku ew tevî koma ewlin, ya merivên ji Mowabê û Midyamê hatî, neçe. Feqet, wextê ku koma duda hat, ya ku ji nevsên berbiçav bû, Bilam careke mayîn çû cem Xudan. Gumana wî hebû ku ewê bersiva başqe bistenda.

Hûn qet ketine nava halê vî cûreyî, wextê ku hûn dilê xweda haj pê hebûne, ku xwestina Xwedê çi ye, lê hûn dîsa bi duakirinê berbirî wî bûne, wekî Ewê bersiveke mayîn bide? Diqewime we xwestina xweye şaş veşartiye û gotiye: "Ezê bona wê yekê dua bikim", yan jî "Ezê careke mayîn dîsa bona wê yekê dua bikim".

Ez nizanim hûn çawa, lê ez nava vê pirsêda gunehkar im, û hinekî şûnda nava vî serê kitêbêda ezê derheqa du cêribandinên xweye xirabda, yên nava vê govekêda, wera gilî bikim.

Bilam gelekî dixwest ji wî padişê hukumdar him pêşkêş, him jî qedir bistenda, lê pêra jî turuş nedikir, ku ji "sînorkirinên" gotina Xwedê der biketa. Ewî fem dikir, wekî ewê duakirî nîbûya, eger ew bi zanebûn gura Xwedê da nîbûya. Carina tabîya vî cûreyî bona xapandina hê mezin derî vedike.

Dêmek, bicêribînin ecêbmayîna Bilam bînine ber çavê xwe, wextê ku Xwedê got: "Rabe, tevî wan here". Diqewime Bilam fikirî: *"Tiştê ecêbmayînê ye! Çiqasî baş e,wekî min careke mayîn jî bona vê yekê dua kir!"*.

Sibeha mayîn Bilam hişyar bû û ew yek usa kir, çawa ku Xwedê şev gotibû wî, û dûra em ecêbmayî dixwînin: "Û bona çûyînê hêrsa Xwedê gur bû" /Jimar 22:22/.

Ev çi diqewime, gelo Xwedê bi şîzofrêniyayêva dizêre? Bêguman, eva pirseke vî cûreyîy e, çimkî em hemû kes jî zanin: *bêguman , na*. Wî çaxî Xwedê bona

çi hêrs ket? Bilam ew yek usa rast dikir, çawa ku Xwedê gotibû wî: ew tevî wan diçû.Û nişkêva Xwedê bona çûyîna wî hêrs ket. Ew çi diqewimî?

Nava vê beşêda rastîk eyanbûyî ye, kîjanê gelek nizanin û fem nakin, û bona min gelek salên bi dijwarîya lazim hatin, hetanî ku min ev yek eşkere kir.

*Eger em bi qewat /bi timayê/ tiştekî dixwezin, lê Xwedê xwestina Xwe, ya derheqa wê yekêda mera eyan kirîye /yan bi Xebera Xwe, yan jî wextê duakirinê/, lê em hela hê wê yekê dixwezin, Xwedê gelek cara wê yekê wê bide me, nenihêr*î wê yekê, *wekî Ew zane ku ew yek bona me tiştê herî baş* nîne, û dawîyê emê bona wê yekê li ber dîwanê bisekinin.

Diqewime ev gotin me ecêbmayî bihêle, lê ew yek rast e. Îzinê bidin, ku ez wê yekê bi mînakên Încîlê şirove bikim.

## Hîvîkirinên bersivstendî

Îsrayêl dixwest ku padişê wan hebûya. Rêberên cimetê berbirî Samûêl pêxember bûn û hîvîkirina wan eyan kirin. Wana got: “Li ser me padişa dayne, bona ku ew dîwana me bike, çawa ku hemû miletên mayîn in” /A Padişatî 8:5/.

Samûêl derheqa hîvîkirina wan da ji Xudan pirsî, û Xwedê bi destî pêxember bersiva rêbera da, şirove kir, ku bona çi heyîna padişê wê bona wana baş nîbûya. Ewî eşaretî da, wekî padişayê bona eskerê xwe kurên wana bibirana eskerîyê. Padişayê usa jî kurên wana bona bêcerkirina deşta, dirûna deşta û çêkirina sîliha berev bikira. Ewê keçên wana hilda û wê bi mecbûrî bikira xwerinçêkir, paqijkir, çêkirçîyên rûnên bînxweş û bona gelek şuxulên başqe. Xêncî wî hemû tiştî, padişayê dewa deştên here baş, baxên tirîya, baxên zeytûna, pêz-dêwêr bikira û wê ew bidana merivên xweye resmî. Xwedê dîsa şirove kir û got, wekî paşê cimetê reca bikira, ku ji wî padişayî aza bûna, yê ku wana xwestibû, lê Ewê îdî alî wan nekira.

Feqet, nivîsar e: “Lê cimetê nexwest guhdarîya gotina Samûêl bike û wana got: “Na, li ser me gerekê padişa hebe, û em jî gerekê mînanî hemû mileta bin”” /A Padişatî 8:19,2O/. Samûêl ew xwestina gur, ya cimeta Xwedê, wekiland. Bersiva Xudan ya bo Samûêl dijî xwestina Wî bû. Ewî got: “Dengê wan guhdar bike û li ser wan padişa dayne” /A Padişatî 8:22/. Çi ku wana xwest, Xwedê da, nenihêrî wê yekê, wekî ew yek bona wana ne tiştê herî baş bû.Wana padişê xwe stend: him ewî, him jî peyîhatîyên wî, ew hemû tişt kirin, derheqa çida Xwedê pêşda eşaretî dabû cimetê.

Mînakeke başqe. Wextê ku Îsrayêl ji Misirê derket, Xwedê cimet bi xurekê nebînayîva têr dikir. Ew çawa manana dihate navkirinê, nanê ezmana, yê ku Încîl usa jî çawa “nanê milyaketa” nav dike /binihêre Zebûr 78:25/. Ew xurek ewqasî

toq bû, wekî paşê Îlîyas tenê du nanên ji mananayê çêkirî xwerin, û çil rojî ser hev ew, bêyî sekinandin, bi wê qewata stendî revî. Minê bixwesta nava wededa xurekê usa bixwera.

Feqet Îsrayêl ji wî nanî westîya û goşt xwest. Û wana bona wê yekê hîvî kir. Zebûr dinivîse: “Bi xwestina wan, Wî sûsik şand” /1O5:4O/. Xwedê bi cûrê ecêb bersiva hîvîkirina wana da. Nivîsar e:

> “Wî li ezmana bayê rohilatê rakir, û *bi qewata Xwe* rê da bayê başûr. Û goşt wek tozê, û teyrede bi baskên xwe, mînanî qûma behrê, ser wanda barand, û wan ew yek nav konên xwe danîn, dora cîhên lê diman” /Zebûr 78:26-28/.
>
> Xwedê ne tenê bersiva hîvîkirina wan da, lê ew yek bi cûrekî ecêb kir. *Bi qewata xwe*, ewî bi seda hezara teyrede anîne li cîhê jîyana Îsrayêl. Hewce nîbû, ku îsraêlîya nêçîra wan teyreda bikirana: bona wana seyên nêçîrê, sîlih û tiştên mayîne bona girtina wan teyreda nelazim bûn. Karîtk li ser wan da bariyan, û wana ew teyrede, yan nava hewêda, yan jî ji erdê berev dikirin. Eger ew yek roja îroyîn biqewimîya, wî çaxî ew serpêhatî wê nava hemû torên sosîalîda belav bûya, û wê bibûya behseke here sereke. Xwedê bi cûrê hukum tevî wê yekê bû, lê werin berdewama vê Zebûrê bixwînin. Bi vî awayî xwerin û pir  têr xwerin, Xwedê xwestina wana bi cîh anî. Xwerina wan di devê wanda bû, wextê ku hêrsa Xwedê li ser wan rabû, yên herî hêzdar kuştin û cahilên Îsrayêlê erdê xistin” /Zebûr 78:29-31/.

Xwedê ne ku xwedêyê feş e, ne jî cin e, lê ew tişt da wan, çi ku wana dixwest, lê ew jî bi cûrê ecêb. Feqet, hetanî xilazkirina xwerina xwe dîwana Wî hate li ser wan.

Em gerekê bîra xweda xweykin, wekî hetanî çêkirina mêriv, Xwedê qirar kir xwestina aza bide wî, nenihêrî wê yekê, wekî Ewî fem dikir, ku em dikarin wê yekê bibijêrin, çi ku dijî xwestina Wî ye û serbara serda ew yek bona me gelekî zirar e.

Mînaka kurê bênamûs bîr bînin. Ewî hîvî kir, ku mîrasa wî bidinê. Bavê wî zanibû, wekî ew hela hê awqasî gihîştî nîbû ku ewî serwêrîya wê mîrasê bikira. Feqet, kur gelekî ew yek dixwest, bavê ber daxust û mîras dayê. Nava encamên wê yekêda kur kete cîhê beraza û bi kûrayî poşman bû.

Încîlêda usa jî mînakên başqe hene, lê ez difikirm, wekî we ew rastî fem kir. *Em niha nava halê nekardar û bi qezîya da nin, wextê ku em bi xwestina mezin tiştekî usa hîvî dikin, çi ku ne anegorî xwestina Xwed*ê *ye*.

## Kerê aqil

Bi hesabhildana vî hemû tiştî, em paşda vegerine li ser serpêhatîya Bilam.

Ew îdî diçû, bona ku rastî padişê Mowabê bihata. Alîkarên padişê rêberîya wî dikirin, lê Xwedê rûyê kirina wîda hêrs ketibû. Nişkêva milyaketek li ber Bilam sekinî. Hîvî dikim ku bîra teda be, wekî milyaket zarokên qaline biçûk nînin, yên bi tîrkevanava, lê ew bi bedenên mezin û qewat in. Bi texmîna min, bejina wî milyaketî ji du û nîva hetanî sê mêtira bû.

Milyaket li ser rê, pêşîya Bilam, bi şûrê derxistî, sekinî û Xwedê bi cûrê ecêb çavên *kerê* vekirin. Gava ku kerê ew bedena mezin dît, yê ku hazir bû bi şûr derbê bighînê, ew ji rê derket û berbi deştê çû, bona ku ji wî bireve. Bilam destpê kir bi hêrs kera xwe bixe, û ew paşda vegerande li ser rê.

Milyaket li ser wî milê rê sekinî, li kîderê li herdu alîya jî dîwar çêkirî bû. Gava ku kerê dîsa milyaket dît, careke mayîn cêriband ji wî bireve, û nigê Bilam di navbera bedena xwe û dîwêrda guvaşt. Bilam diha zêde li ser kerê hêrs ket û careke mayîn destpê kir kerê bixe.

Ya mayîn, milyaket li wî alîyê rê sekinî, li kîderê bona derbazbûnê cîh awqasî teng bû, wekî cîh tunebû bizviryana.Vê carê, gava ku kerê şûrê milyaket dît, ew bin Bilamda mexel hat. Bilam dîsa bi hêrsketî destpêkir kerê bixe.

Xwedê devê kerê vekir û ewî gote Bilam: “Min çi kirîye, wekî te vî cûreyî sê cara min xist?” /Jimar 22:28/. Bilam û kerê çend gotin bi hevra pevguhartin û paşê Xwedê çavên Bilam vekirin, ku ew jî milyaket bibîne. Ew carekêra deverû ket.

Hetanî vê gavê min derheqa vî milyaketîda çawa qulixçîkî Xwedêyî ezmana gotîye. Feqet, tercimeçîyên tercima Încîlêye “Nyû Kîng Cêyms”-ê /usa jî ez/ bawar dikin, wekî ew milyaket Xudan bi Xwe bû. Çi jî hebe, ezê îzinê bidim, ku hûn bi xwe wê yekê qirar bikin, çimkî meremê min ew nîne, ku nava wê yekêda we bînime li ser fikira xwe, yan jî wekî mayîn.

Milyaket li Bilam hilat û gote wî:

> “Binihêre, Ez bona sekinandina li pêşberî te derketim, çimkî rêya te li ber Min xwar e. Kerê Ez dîtim, û sê cara berê xwe ji Min vegerand. Eger ew ji ber Min venegerîya, bêguman, Minê te bikuşta, lê ew sax bihişta” /Jimar 22:32, 33, NKJV/.

Kerê Bilam xilaz kir. Ewê mirî bûya, eger kerê ji ber Xudan rêya xwe neguharta. Diqewime hûn bifikirin, wekî Bilam gote rêberên Mowabê û Midyamê: “Xilaz, ez diçim. Bêjine padişê xwe, bila perê xwe xwera bihêle”. Feqet, ewî tiştekî mayîn got. Dewsa wê yekê Bilam li ber Xudan xwe mikur hat:

> “Min tobe kirîye, çimkî min nizanibû, wekî Tu li ser rê li ber sekinîyî. Û eger ew yek li Te xweş nayê, ezê paşda vegerim” /Jimar 22:34, NKJV/.

Bilam gunehê xwe qebûl kir, lê serda zêde kir: “Eger ew yek li Te xweş nayê”. Bilam, bi rastî? Îdî çi te lazim e? Nenihêrî wê yekê, Xudan bi Xwe hat û bi cûrekî kifş li ber wî sekinî, lê Bilam hela hê dicêriband xwestina xwe bistîne. Ewî ewqasî dixwest pere û qedirê ji alîyê padişêda pêşniyarkirî bistenda, wekî şîretê xwedêtîyê hesab hilnedida. Rûyê pûtparistîya xweda ewî îdî texmîn nedikir ku dilê Xwedê da çi hebû.

Awa çi diqewime, dema ku xwestinên me diha qewat in, ne ku cedandina bona gurêdabûna Xwedê da, wextê ku li meva tê kifşê ku gotinên Wî me didine sînorkirinê. Qewata gunehê bi rîya xapandinê zêde dibe.Wî çaxî meriv îdî wê yekê nabîne, çi ku eşkere dijî xwestina Xwedê ye. Bona merivên şikestî hemû tişt zelal e: feqet wextê ku meriv dikeve bin hukumê pûtparistîyê, ew jî wî çaxî dicêribînin begemîya Xwedê bona xwestinên xwe bistînin.

## Teribandinên min

Wextê ku ez ji sî salîyê derbaztir bûm, Xwedê zelal nîşanî min û Lîzayê da, wekî ew yek xwestina Wî nîbû ku me peyman tevî hevaltîke çapkirinêye eyan mor bikira. Wextê ku rêdaktorê wê çapxanêyî ku bi pirsên projeyên nûva mijûl dibe, berbirî min bû, min ew înkar kir, lê ne usa çawa ku Bilam ew yek kir, wextê ku cara ewlin ew rastî wekîlên Balaq hat. Vî rêdaktorî, bawar bikî her roj, têlêfon dikir. Ewî digot, wekî banga min bona bedena Mesîh girîng bû, û gilî dikir, ku çawa xudanên kitêbaye neeyan piştî çapkirina kitêbên xweye li çapxana wana bûne nivîskarên bi nav û deng. Min ew hesinê biçûk, yê lefekarîyên wî daqurtand. Hetanî wî çaxî, min du kitêb bi xwe çapkiribûn, û ew gihîştibûne hindik xwendevana. Min dixwest ew mecal bida xebatê, çimkî hukumê wê çapxanêyî hemmiletîyê hebû. Xwedê jî dixwest, ku bangên min belav bûna, lê ew wedê ji alîyê Wî da qirarkirî hela hê nehatibû, Ewî nedixwest hema ji wê bangê destpê bikira û hazir nedibû wê çapxanê bide xebatê. Xêncî wê yekê, menîyên min jî şaş bûn: min dixwest ku ez naskirî bûma, ya ku Xebera Xwedê çawa *kubarîya vê jîyanê* nav dike, ya ku berbi tabiya bilind, navê bilind dicedîne.

Xwestina min, ya bona çapkirina kitêbên xwe, ya bi destî hevaltîke eyan, ewqasî gur bû, wekî min rêberîya Xudane kifş, şêwirên jina xwe û gelek pirsgirêkên mayîn hesab hilnedan, yên ku wî çaxî nava jîyana meda pêşda hatin. Rêberîya Ruhê Pîrozî dilê meda, dengê Wîyî ku eşaretîyê dide, temirî bûn, û

dewsa wê yekê xwestina gur ya ji xapandinê pêşdahatî cîhê xwe girtibû.

Ew çapxane li ştateke mayîn bû. Me qirar kir, ku Lîza bi teyarê biçûya û wê ji navê qulixdarîya me peyman îmze bikira, çimkî rûyê mijûlîya minda ez nikaribûm biçûma. Sibehê, wextê ku Lîza gerekê biçûya, kurekî meyî biçûk usa vereşîya, wekî ji pêpelîngên qatê yekê destpêkirî hetanî yên qatê duda lewitandin. Hetanî ku me li wandera paqij dikir, kulfeta min bîntengbûyî got:

-“Con, tu fem nakî, wekî Xwedê naxweze ku em wê yekê bikin?”.

Min li ber xwe da:

-Na, dijmin dicêribîne me aciz bike û me bide sekinandinê.

Eger pirsa tek-tenê ew bûya, diqewime ez rast bûma. Em rastî gelek tiştên ne baş dihatin, lê min ew nedidîtin: bi qewata gunehê ez xapiyayî bûm.

Ewê rojê Lîza bi teyarê çû ew peyman îmze kir. Nava her sê mehên piştra krîzîs kete nava jîyana min. Edilayî ji min dûr ket: şerkarî destpê bû. Ez sê meha ser hev nexweş bûm. Ez bi vîrûsên cûre-cûre, ji sermê nexweş diketim û ew nexweşî diweklîn. Heleqetîyên meye tevî wê çapxanê ewqasî xirab bûn, ku em dora tu tiştî bi hevra qayîl nedibûn. Xêncî wê yekê, qulixdarîya me zirara bi hezara dolara dît.

Ez tenê bi tiştekîva ji Bilam cuda dibûm: bi kutasî min fem kir, wekî ew xwestina min ya gur ez kor kiribûm û min xwestina Xwedê nedidît. Ez bin dîwana Xwedê da bûm. Xeberên Pawlos bîr bînin: “Lema jî nava weda gelek nexweş û xweyîzede hene û hinek jî mirine. Lê eger me dîwana xwe bikira, dîwana meyê nehata kirinê. Lê gava dîwana me bibe, em ji Xudan tên şîretkirinê, wekî dîwana me tevî vê dinîyayê nebe” /A Korintî 11:3O-32/. Min gelek dijwarîyên badîhewa dîtin, hetanî ku min ew pût dît, yê ku min çê kiribû. Min tobe kir û tê bêjî hemû tişt carekêra hate guhartinê. Piştî hinek wede wê çapxanê elamî min kir, wekî ew dixweze heleqetîyên xweye xebatêye tevî me bide teribandinê.

Piştî salekê hevaltîke eyan jî pêşniyarî min kir, ku bangeke mayîn çap bike, ya ku min derheqa azabûna ji xeydê nivîsîbû. Xwedê gote min: “Çapxana pêşda fikira te bû: lê ev çapxane ya Min e”. Bi saya wî şîretî, yê ku min salekê pêşda stendibû, menîyên min hatibûne guhartinê. Niha min dixwest ku ez gura Xwedê da bûma, bona ku meriv bi rastî azad bûna. Xwedê dixwest, ku hema ew bang bihata çapkirinê, û niha ew kitêba, ya bi sernavê *“Tela şeytan”* îdî nêzîkî du mîlîon meselava hatîye firotanê.

Ez dixwezim bêjim, wekî ez dersa xwe hîn bûm û min tu cara ew xêfiktî newekilandîye. Feqet, wextê ku ez ji çilsalîyê derbaztir bûm, min carekê jî xwestina Xwedê ya zelale eyanbûyî, usa jî şêwira jina xwe û endamekî qulixdarîya me, hesab hilneda.Wî çaxî xapandin diha gur bû, lê şîretê ku ji tengavîya, dijwarîya û zêrandina bû, diha berk bû. Wê yekê nêzîkî 18 meha kişand. Carekê jî

min ew pût dît, yê ku min nava xweda çê kiribû û min tobe kir, lê ew hemû tişt bi bihakî gelekî giran qewimî.

Ez bi temamî guman im, ku eger Bilam ew yek qebûl bikira, çi ku dilê Xwedê da hebû, jîyana wî wê paşê baş bûya. Feqet, ewî usa jî pûtparistîya xwe berneda û mir, li ber dîwana Xwedê sekinî /binihêre Yêşû 13-22/.

Xwendevanê hizkirî, ez naxwezim, wekî hûn bi rîya tengavîya hîn bin, çawa ku ez hîn bûm. Ez guman im, wekî ev banga berk wê we bide ser rêyeke usa, ku hûn ji dijwarî û zêrandinên badîhewa dûr bimînin, çawa ku min ew dîtin.

## gava praktîk

Eger em xwestinên xwe nekine bin kontrola Xwedê, ewê me ji wî dûr bixe, û diqewime Xwedê me tevî xwestinên me bihêle. Gelek cara em Încîlêda dibînin, wekî Xwedê xwestina Xwe zelal eyan dikir, lê wextê ku cimeta Wî dijî wê yekê derdiket, Ewî tiştê ku wana dixwest dida, hema wî çaxî jî eger wê yekê tengavî dida wana.

Roja îroyîn Xwedê dîsa wî cûreyî dike. Ewê wê yekê bide me, çi ku em dixwezin, û eger xwestina me jî dijî xwestina Wî ye. Feqet, emê wî duayî nestînin, berbi kîjanî em dicedînin: emê şîret bistînin, yê ku wê bona me bi êşê be û nexweş be.

Hewcetî tune, wekî ew yek nava jîyana meda bibe. Dewsa wê yekê em gerekê bawar bikin, wekî Xwedê wê qencîyê bona me bike. Gelek cara Ewî îdî qirar kirîye, ku bi kîjan rêyê wê wî tiştî bide me, çi ku em dixwezin, lê bi cûrê heq. Eger em peyî Wî herin, Ewê bi rîya duakirî rêberîyê li me bike, lê encamê ku em dixwezin wê nava wedê ji alîyê Wî da qirarkirî bê. Roja îroyîn şuxulandina xwe teslîmî Xudan bikin. Ji Wî hîvî bikin, ku Ew rêberîyê li we bike, anegorî xwestinên Wî, lê ne ku li gora xwestinên we. Ji Wî bipirsin, ku hûn îro gavên çawa dikarin biavêjin, bona ku diha nêzîk peyî Wî herin. Wan gava binivîsin û biavêjin.

# 17

# ŞAŞBÛYÎ

Bona ku em derbazî têma xweye hîmlî bibin, em pûtparistîyê bidine tomerîkirinê. Pûtparistî ew e, wextê ku bawarmend, yan jî şexs, xwestina Xwedê hesab hilnadin, bona ku bighîjine xwestinên xwe, yên ku dijî xwestina Wî ne. Awa Pawlos bo çi dinivîse:

> "Çimkî hûn vê yekê zanin, wekî tu qab, yan heram, yan timakar, ku pûtparist e, padişatîya Mesîh û Xwedê da war nabe. Bila tu kes bi xeberên pûç we nexapîne, çimkî bona van tişta hêrsa Xwedê li wan merivên neguhdar radibe. Dêmek, tevî wana nebin" /Efesî 5:5-7/.

Hêrsa Xwedê wê bê li ser bêbawara, lê Xwedê usa jî wî bawarmendî şîret dike, yê ku ketiye nava pûtparistîyê, bona ku wî paşda vegerîne li cem Xwe. Feqet, eger bawarmend dîsa bi serhişkî gurêda nemîne, çawa ku Bilam bû, ew yek dikare encamên gelekî giran pêşda bîne, hetanî mirina wî jî. Pawlos eşaretîyê dide bawarmenda: "Çimkî eger hûn bi bedenî bijîn, hûnê bimirin" /Romayî 8:13/. Aqûbê şandî eşaretîyê dide me: "Hingê dilhavijî kelê xwe distîne, guneh jê difirike û guneh jî ku mezin dibe, mirin jê dibe. Nexapin, xwîşk-birayên mine delal!" /Aqûb 1:15, 16/.

Pûtparistî mînanî jehrê ye, ya ku hêdî-hêdî mêriv dikuje. Ew kevirê krîptonî ruhanî ye. Emê îzinê nedine xwe ku wê yekêra bilîzin.Têlê pûtparistîyê him kifş nîne, him jî qewîn e: me bi cûrekî hukumê wê yekê dît, wextê ku me jîyana Bilam lêkolîn kir, lê werin em gavekê pêşda herin. Bi guhdarî eşaretîya Xwedê, ya bona rêberên Îsrayêlê, bixwînin:

> “Xebera Xudan bona min got: “Kurê însên, van meriva *pûtên xwe dilên xweda dane sekinandinê*, û danîne li ber xwe, çi jî wana def dide, ku ew nava neheqîyêda bişimitin. Gelo Ezê îzinê bidim, ku ew ji Min bipirsin?” /Hezeqêl 14:3, NKJV/.

Em carekê jî dibînin, wekî pûtparistî bi şikila, heykela, gorîgeha û paristgehava nayê sînorkirinê. Xwedê derheqa wê yekêda qet şikberîke biçûk jî nahêle û dibêje, wekî wana “pûtên xwe dilên xweda dane sekinandinê”, lê ne ku heykelên biçûke bin darada, merkezên bajarada, yan jî paristgehada. Na xêr, ew pût dilên wanda hatibûne sekinandinê. Dilên wanda xwestin hebûn, yên ku dijî xwestina Xwedê bûn. Xwedê berdewam dike:

> “Dêmek, wanra xeberde û bêje wana: “Wa dibêje Xudan Xwedê”: “Her kesekî ji maleke Îsrayêlê, yê ku dilê xweda pûta dide sekinandinê û dide ber xwe, çi jî wî def dide ku nava neheqîyêda bişmite, û tê cem pêxember, Ezê, Xudan, li gora zêdaya pûtên wî, bersiva ewê ku tê bidim”” /Hezeqêl 14:4, NKJV/.

Wextê ku merivayî nava pûtparistîyêdane /xwestinên kîjanî dijî xwestina Xwedê ne/ tê li cem qulixçîkî û rêberîyê, şêwirê, yan jî hînkirina Încîlê ji wî hîvî dike. Diqewime ew bersivê bistîne, lê ewê nebe anegorî xwestina Xwedê. Ew bersiv wê mînanî caba ku Bilam stendibû bibe. *“Încîla Nû, Ya Standarta Amêrîkî”* bi vî cûreyî vê xeberê ji kitêba Hezeqêl tercime kirîye: “Xudan, ezê mecbûr bim bersiva pirsa wî bidim, bi hesabhildana zêdeya pûtên wî” /NASB/.

Lê niha wê eşaretîyê guhdar bikin, ya ku bona wî qulixçîyî ye, yê ku piştgirîyê dide pûtparistîya meriva, û usa wanra xeber dide, ku tê bêjî hemû tişt baş e /qulixçî, pêxember û kahînên peymana Kevinda: ji vî alîda ez wana himberî qulixçîyên roja îroyîn dikim/:

> “Lê eger pêxember wê bersivê dide mêriv, kîjanê ew dixweze [bi wê yekê îzinê dide xwe, ku ew jî tevî gunehê /pûtparistîya/ ewê ku dipirse bibe], Xudanê min, ezê usa bikim, wekî ew pêxember nava bersiva xweda xapîyayî be” /Hezeqêl 14:9, AMPC/.

Nava duakirinêda ez digirîyam û min kedereke mezin didît, wextê ku ez dora wan hînkirina difikirîm, kîjana qulixdarîyên wedê niha terîf dikin, bi taybetî li Rojavayê. Min dikire qîrîn, ku min bersiva derheqa wê yekêda bistenda, ku gelo menîya neçarîya bangên ku roja îroyîn tên nivîsarê û terîfkirinê kîjan e. Çawa bersiva wê yekê, Ruhê Xwedê ez birime berbi serên kitêba Hezeqêle 13-a û 14-a.

Ev serên kitêbê didine kifşê, ku li pişt hînkirinên roja îroyîne ronbûyî çi heye, yên ku dijî gunehê ku berdewam dibe, dernakevin: gilî derheqa *pûtparistîyê* da ne. Eger qulixçî bi cûrê netam Mizgînîyê dannasîn dike, çimkî ew naxweze peyîhatîyên xwe, yan jî navê xwe unda bike, wî çaxî ew yek timakarîya veşartî ye. Awa bona çi wî çaxî, wextê ku qulixa bi feşbûnêva tijî zêde dibû, Yêremîya dikire gazî: "Çimkî ji wana, ji yê herî biçûk destpêkirî hetanî yê herî mezin, hemû jî xwe dane timakarîyê. Pêxember, kahîn û her merivekî nava wanda xebera tevî hev dikin û rastîyê feş dikin" /Yêremîya 6:13, cumila ewlin-NKJV, cumila duda MSG/.

Min destpê kir bibînim, ku çawa nava temamîya civîna wedê nihada, hukumê kevirê krîpton û neçarîya ruhanî tên kifşê. Nava jîyana gelekada min nerazîbûn dîtin, yên ku dihebînin, ku bawarmend in, û ji halê dilê wî cûreyî xwestina hindava wî hemû tiştîda pêşda tê, ya ku "nava jîyana wanda tune" /hîmlî gilî derheqa hewcetîyên herrojeda nîne, lê derheqa xwestin û cedandinada ne/.

Rêberên şaşbûyî, yên ku bi xwestina xalifîne, ew parçên usaye ji Xebera Xwedê dannasîn kirine, yên ku tê bêjî halê neheq hesab hilnadin û begemîyê didine wê yekê. Bi wê yekêva tevayî, ew bi cûrekî fesal dora wan beşên nivîsarên pîrozra derbaz dibin, kîjan dijî kirinên wî cûreyî ne. Rûyê wê pûtparistîyêda, him qulixçî, him bawarmend, bang û şêwirên usa guhdar dikin, yên ku derheqa cedandin û xwestinên wanda nin. Ew jî xwestinên wana diha gur dikin, yan jî pûtên wana didine qewatkirinê.

Nava peymana Nûda, Pawlos, mînanî Yêremîya û Hezeqêl, derheqa pêşerojêda bi pêxembertî dibêje:

> "Çimkî wede tê, wextê ku merivê îdî guhê xwe nedine li ser hînkirina saxlem û ya bi fikira saxlem. Ewê li peyî *xwestinên xwe* herin û wê dersdarên usa bigerin, yên ku wê wanara wî tiştî bêjin, çi ku guhên wan hiz dikin bibihên" /B Tîmotêyo 4:3, NLT/.

Bi xêr hatine nava wî wedeyî! Îro, bona guhdarkirina xwestina xwe meriv gerekê tenê "qulixçîyên" usa bigerin, yên ku wî cûreyî berbi xwestinên xwe dicedînin.

Feqet, rêberê xwedêparêz û yê ku xofa Xwedê li cem wî heye, tu cara wê ji şêwira Xebera Xwedê dûr nekeve. Ew hindava temamîya banga Încîlê amin e, lê ne ku hindava beşên cuda. Ew ji rastkirinê û lêhilatinê, usa jî ji piştgirîyê, natirse.

Ew qulixçî, derheqa kîjanada Pawlos dibêje, bona navê xwe, bilindbûna qulixa xwe û progiramên xwe xemgîn in. Meriv wana dikare bi meremên mezin, yan jî bi dayîna pera bîne alîyê xwe, û ewê anegorî wê yekê terîf bikin û hîn bikin, çawa

ku guhdarên wana dixwezin, dewsa wê yekê, wekî ew gerekê Xebera Xwedê dannasîn bikin, bêyî hesabhildana wê yekê, wekî ewê bê qebûlkirinê, yan na.

## Tenê qulixçîkî rastî elam kir

Padişê Cihûdayê, Yêhoşefat, bi rîya zewaca zarokên xwe, tevî padişê Îsrayêlê, Ahab, peyman mor kir. Eva ji alîyê Yêhoşefatda gaveke rast nîbû, çimkî ew merivê bi xofa Xwedê bû, lê Ahab pûtparist bû. Piştî hinek wede Yêhoşefat çû Samerîyayê ku padişê Îsrayêlê bibîne.

Ahab hîvî ji Yêhoşefat kir, ku Chûdayê berevke û tevî Îsrayêl here li ser Aşûrayê şêr. Yêhoşefat got: “Belê, bêguman. Ez û tu bira ne, û leşkerên min bin fermandarîya teda nin. Emê nava şêrda ese bighîjine te”. Feqet Yêhoşefat serda zêde kir: “Berê ewlin, were em bidine zelalkirinê ku Xudan çi dibêje” /binihêre B Dîrok 18/.

Ahabê padişa nêzîkî 4OO qulixçî û rêberên ruhanîye Îsrayêlêye berbiçav berev kirin. Ev meriv qulixçîyên Bahel, Kamovs, Astaroft yan jî xwedêyên mayîne feş nîbûn, lê qulixçîyên Xudan Xwedê bûn /wana ji navê *Yahvêh* digot/. Ahab ji wana pirsî, ku gelo lazim bû biçûya şêr, yan ew gerekê ji fikira xwe paşda bisekinîya?

Hemû qulixçîya bi hevra gotin: “Belê, here û nesekine! Xwedê wê serkeftinê bide padişê” /B Padişatî 18:5,NLT/. Ew rêber hîn kiribûn, ku ew tenê bi bangên piştgirîyê û yên baş berbirî guhdarvanên xwe bûna, bi taybetî merivên hukumdar. Nenihêrî wê yekê, wekî ew qulixçîyên Yahvêh bûn, lê wana xwe dabû timakariyê: ew pûtparist bûn.

Nenihêrî wê yekê, wekî qedirê qulixçîya li Îsrayêlê bilind bû, û bangên wana kifş bûn, Yêhoşefat ji şêwira wan razî nema. Bi saya xofa Xwedê, ewî rastî ji hev cuda dikir. Ewî pirsî: “Li vir pêxemberekî Xudanî mayîn tune, ku em ji Wî bipirsin” /xeber 6, NKJV/. Ewî zanibû, wekî ewên ku xeber didan, pêxemberên *Yahvêh* bûn, lê li wir tiştekî şaş bû.

Ahab got: “Merivek jî heye, yê ku dikare şêwira Xudan bona me bipirse, lê ez wî hiz nakim. Ew tu cara bona min pêxember nîne, xêncî xirabîyê. Navê wî Mîxîya ye” /xeber 7, NLT/. Merivê pûtparist, yan jî yê ku ji ola wan bawarmenda ye ku hînî lefekîyê bûye, gelek cara qulixçîyê Mizgîniyêyî rast çawa yê xirab hesab dike.

Mîxîya ji yên mayîn cuda dibû, çimkî ewî nedixwest ku peyîhatîyên wî bi wî cûreyî zêde bûna, yan jî bo wê yekê ku tiştek ji Ahab bistenda. Ew ji Xudan diha gelekî ditirsîya, ne ku ji meriva, û diha zêde berbi begemîya Xwedê dicedand, ne ku berbi açixîyê. Ewî zanibû,wekî kanîya wî *Yahvêh* bû, û wekî diha baş bû

ku ewî Ew razî bikira, lê ne ku padişakî, yê ku bin hukumê kevirê krîptonda bû. Bi saya wê tabîyê, ew ji wê xapandinê dûr û aza mabû, binê kîjanêda qulixçîyên mayîn bûn.

Ahab emir kir ku Mîxîya bînin. Hetanî ku qulixçîyê Xwedêyî rast wê bihata, qulixçîyên mayîn li ber her du padişa dîsa pêxembertî dikirin. Ji wana yekî bi navê Sedekîya, yê ku ji eşîra Bênîyamîn bû, ji hesin stirû bona xwe çê kiribûn û pêra jî digot: "Xudan /*Yahvêh*/ wa dibêje: bi vana tê Aşûra def bidî, hetanî ku tu wana tune bikî" /xeber 1O/.

Peyî wê yekêra hemû qulixçî  bi hevra gotine padişê: "Here û tê açix bibî, û Xudanê /Yahvêh/ [serkeftin] bide destê padişê " /xeber 11/. Nava elaleta rêberada çareserî heye, ne usa ye? Hemû bang mînanî hev bûn û yek ya mayîn îzbat dikir, bi rastî tê bêjî çareserî dihate texmînkirinê. Belê, wana xwestinên dilê Ahab îzbat dikirin û ew hema xût derheqa pûtparistîya wîda bûn.

Hetanî ku qulixçîya bi yekdengî şêwir didane padişê, qasid Mîxîya dît û gotê: "Awa pêxember bi yekdengî qencîyê bona padişê dibêjin û bila xebera te jî mînanî ya wana be, û tu jî qencîyê xeber bide" /B Padişatî 18:12/.

Min xeberên wî cûreyî bihîstine, wextê ku ez teglîfî li çend civînên eyan kirime: "Con piştgirîyê bide meriva. Bangên baş bide wana. Şexsê wan çê bike û ber dilê wanda were. Emê berevbûnê bi stiranê ser hevda bînin, dêmek tu jî dikarî bi nota bilind banga xwe ser hevda bînî? Em dixwezin, wekî ew bi beşereke baş herine malê". Tê bêjî îzina qasidekî sade heye, ku banga padişê bide guhartinê. Eger em bidine guhartinê, wî çaxî emê îdî nebine ew baylozên ku xeberên Xwedê elam dikin, lê emê bibine merivên sade, yên ku wan xeberên Wî yên baş didine xebatê, yên ku peymana Nûda nin, bona ku em bighîjine xwestina xwe.

Bersiva Mîxîya berk bû, çimkî tu kesî nikaribû bi qelpîyê ew bikirîya: "Xudan sax e, Xwedêyê min çi ku minra bêje, ezê wê bêjim" /xeber 13/.

*Bavo, wan rêbera mera bişîne, yên ku roja îroyîn wê wî cûreyî bikin.*

Wextê ku Mîxîya li ber Ahab sekinî, û hema ew pirsa dîsa hate dayînê, bersiva kîjanê qulixçîyên mayîn îdî dabûn. "Mîxîya bi cûrê enkis got: "Belê, here û tê serbikevî, çimkî tê wana alt bikî" /xeber 14, NLT/.

Cûrê gotina Mîxîya hêrsa Ahab rakir. Peyî wê yekêra, Mîxîya bona wî halê pêşdahatî Xebera Xwedê got: "Min dît, ku çawa Îsrayêl li ser çîyayên belavbûyî, mînanî pezê ku bêyî şivan e û Xudan got: "Xweyê van tune: bila her merivek bi edilayê vegere mala xwe" /xeber 16/.

Ahab li Yêhoşefat nihêrî û got:

> "Lê min negote te, wekî ewê bona min tu tiştekî qenc nebêje, xêncî tiştên xirab" /xeber 17/.

Mîxîya xeberdana xwe berdewam kir û gote Ahab ku bi rastî çi diqewimî û wê çi biqewimîya:

> "Dêmek, xebera Xudan guhdar bikin: min dît ku Xudan li ser textê Xwe rûniştî ye û hemû eskerên Ezmîn li alîyên Wîye rastê û çepê sekinîne. Û Xudan got: "Kê wê padişê Îsrayêlê Ahab bixapîne, bo ku here li ser Ramovt-Galatê şêr û wê unda bibe?". Û yekî vî cûreyî digot, yê mayîn jî cûrekî mayîn digot. Û ruhek derket, li ber Xudan sekinî û got: "Ezê wî bixapînim". Û Xudan gote wî: "Tê çawa bixapînî?". Ewî jî got: "Ezê derkevim û devê hemû pêxeberada bibime ruhê derew". Û Xudan got: "Tê bixapînî û tu dikarî bikî jî: here û usa bike". Usa jî heye, Xudan ruhê derew danîye devê wan pêxembera, feqet, Xudan bona te xirab gotîye" /xeber 18-22/.

Xwedê bersiva Ahab da, li gora pûtparistîya /timaya/ wî. Ev beş wê rastîyê tîne ber çava, derheqa kîjanêda Hezeqêl dinivîse. Xwedê anegorî pûtparistîya dilê Bilam got, çawa ku me serê kitêbêyî pêşda xwend, lê vî serê kitêbêda jî anegorî pûtparistîya dilê Ahab got. Bi wê yekêva tevayî, ewî dîsa hindava wan merivada wî cûreyî kir, kîjana ew bang belav dikirin.

Ahab ew bang qebûl kir, ya ku ewî dixwest guhdar bikira, feqet ewî xeberên Xwedê, yên rast, înkar kirin, yên ku wê ew biparastana û xilaz bikirana. Ahab çû şêr. Nenihêrî wê yekê, wekî ewî qirar kir ku bêqezîyabûna xwe bide çareserkirinê û usa çû ku Aşûra ew nas nekirana, lê tîrek wî ket, û ew hetanî dawîya rojê mir. Meriv dikare ji mêriv xwe veşêre, lê meriv nikare xwe ji Xwedê veşêre.

Roja îroyîn çi diqewime? Em dixwezin parastina, dayîna û xilazbûna ji alîyê Xwedêda sozdayî bistînin, yan em dixwezin, ku derheqa meda tiştên baş bêjin, lefekarîyê bikin? Em dixwezin wî çaxî "edilayê" guhdar bikin, wextê ku xapandin dikare nava jîyana meda pirsgirêkên mezin pêşda bîne?

Werin em derheqa vê yekêda bin ronahiya Încîlêda bifikirin. Gelo bona me kîjan e girîng , parastina wededirêj, ya wextê gurêdabûna hindava şêwira Xebera Xwedê, yan duayê wedekurte sera, ya tevî şîretê wedê nêzîk, yan jî dîwanê?

## gava praktîk

Ewên ku dihebînin ku mesîhîne, dixwezin tenê bangên baş guhdar bikin. Rûyê timayê û usa jî tirsa mêrivda gelek qulixçî hazir in bangên usa terîf bikin, yên ku tenê piştgirîyê didine peyîhatîyên xwe. Hemû bangên wana gelekî baş têne texmînkirinê, lê ew ne tam in. Encamên wana wê nebaş bin him

bona dersdara, him jî bona peyîhatîyên wana.

Em gerekê rastîyê guhdar bikin, eger ew pêşda me biêşîne jî. Guhdarkirina rastîyê çiqasî jî bi êşê be, ew ji wê tengavîyê baştir e, kîjanêda hûnê xwe bibînin, eger em nava xapandinêda bijîn.

Hûn dikarin merivekî usa bin, yê ku berbi rastîyê dicedîne.

Ji Xwedê hîvî bikin, ku Ew rastîya derheqa jîyana weda eyan bike: hîvî ji Wî bikin ku Ew wan goveka eyan bike, kîjanada hûn bi nezanî xapîyayî ne. Wan rastîya binivîsin, kîjana Ew li we eyan dike, bona ku hûn bikaribin dora wana nava rojên peyîra, yan jî hevtîyên peyîra, bifikirin. Peyî wê yekêra hîvî ji Xwedê bikin, ku Ew qewatê bide we, ku hûn bikaribin rastîyê bêjin, hema wî çaxî jî, eger ew qebûlkirî, yan jî "bi sîyasî rast" nîne. Hewce nîne, ku hûn tevî meriva bikevine nava şêr, lê hûn dikarin mînanî Mîxîya bêjin: "Xudan sax e, çi ku Xwedêyê min bêje min, ezê wê yekê bêjim".

18

# ÎSAYÊ FEŞKIRÎ

Diqewime hûn bifikirin: “Îsayê feş*kirî?...ev çi ye?”*. Ev serê kitêbê wê prosêsê şirove dike, ya ku bawarmenda berbi pûtparistîyê dibe. Emê derheqa wê yekêda eşkere bikin, ku bona çi nava mesîhîtîya wedê nihada gelek meriv bi hêsanî dibine qurbana kevirê krîptonî ruhanî, yê ku qewatên me ji me distîne, hin çawa civîn û hin jî çawa şexs.

## Min anî cem xwe

Çawa ku min îdî da kifşê, derketina Îsrayêleye ji Misirê sembola xilazbûna me ye, derketina me ye ji vê dinyayê ye. Mûsa rêberîya îsraêlîyaye berbi çîyayê Sînayê kir, li kîderê ew rastî Xwedê hatibû. Mûsa dixwest, wekî cimeta wî jî wî cûreyî rastî Xwedê bihata. Bona çi ewî gerekê bixwesta rêberî li wan bikira berbi welatê Sozdayî, pêşîya nasandina tevî Ewê ku soz dabû? Nivîsar e ku ew çawa gihîştine Sînayê:

> “Mûsa hilkişîya cem Xwedê, û Xudan ji çîyê gazî wî kir û gotê: “Wa bêje mala Aqûb û zarokên Îsrayêlva bide eyankirinê: “We dît Min çi anî serê misirîya û hûn çawa hildan li ser perên teyrên sîmir û hûn *anîne cem Xwe*”” /Derketin 19:3,4/.

Xeberên Wî bixwînin: “Anîne cem Xwe”. Ev gotin dide kifşê ku menîya Xwedê çi bû, ku me ji vê dinyayê xilaz bike. Ew berbi me dicedîne, Ew dixweze tevî me nava heleqetîyada be û Ew dixweze mera xeberde, çawa bav kurra.

Hûn dikarin bînine ber çavê xwe, wekî Xwedê çiqasî ruhdar bibû, wextê ku

hazir dibû rastî wê cimetê bihata, ya ku 4OO salî nava dîltîyê bû. Ez bîr tînim, ku dema Lîza hêna çar kurên meda hemle bû, û ez bêsebir hîvîya bûyîna wan bûm. Bona her yekî hîvîyê bûm. Min dixwest ew hembêz bikirana, bidîta, ku ew çawa mezin dibin, dengê wan bibihîsta, çawa şexs ew nas bikirana û tevî wana xeberda, çawa bav kurra. Bi gilîkî, ez bêsebir hîvîya wan bûm.

Nêzîkbûna Xwedê jî hema wî cûreyî bû: firqî tenê ew bû, wekî Ew ji neh meha zêdetir hîvîyê sekinîbû.

Cimetê gerekê hazirîyên xwe bidîta, bona ku ew rasthatin biqewimîya. Xwedê got: “Here cem cimetê û wana îro û sibê paqij bike, bila kincên xwe bişon. Bona roja sisîya hazir bin, çimkî roja sisîya li ber temamîya cimetê Xudanê peîyayî li ser çîyayê Sînayê bibe” /Derketin 19:1O,11/.

Xudan digote cimeta Xwe: “Ez hîvîya we me, lê bona rasthatina rast hûn gerekê heramîya Misirê ji ser kincên xwe paqij bikin. Ez Bavê we me, lê usa jî Xwedêyê pîroz im, û naxwezim ku heleqetîyên tevî we yên ji derva bin”.

Ew yek tiştê bûyînê nîne, ku kesek bixweze tevî merivên xwehiz bikeve nava heleqetîyên kûr û bi fikir. Xwedê bi temamî Şexsê Xwe daye me. Ewê wê yekê qebûl neke, ku em mînanî vê dinîyayê bikin, meriva bidine xebatê, bona ku xwestinên xwe, yan jî şexsê xwe razî bikin.

Du roj derbaz bûn, û sibeha roja sisîya Xudan peîyayî li ser çîyayê Sînayê bû, li cem cimetê. Wextê ku ew yek qewimî, meriv tirsîyan û lerizîn. Hingê gotine Mûsa: “Tu tevî me xeberde û emê guhdarîya te bikin, lê bira Xwedê tevî me xeber nede ku em nemirin” /Derketin 2O:19/. Mûsa zendegirtî mabû: çawa ew dikaribûn ji Wî dûrbiketana, Yê ku ew xilaz kiribûn û ji xulamtîyê aza kiribûn? Gelo wana nedixwest dengê Efrandarê xwe bibihîsta? Lê hûn dikarin açixîya Xwedê bînin ber çavê xwe? Ew wî çaxî hîvîyê bû. Ewî dixwest ew nas bikirana, mîna Mûsa. Feqet wana hazirîya Wî înkar kir.

Ez nikarim bînim ber çavê xwe, ku minê çi texmîn bikira, eger kurekî min bigota: “Bavo ez naxwezim tu minra xeberdî, ez tenê dixwezim ku tu gotina xwe bi destî birayekî min bêjî min”. Gelo evê gumana mêriv çawa bibrîya!

## Hîmdarîya kahîntîyê

Xwedê qirar kir kahîntîyê bide hîmdanînê, çimkî cimetê nedixwest raste-rast tevî Wî biketa nava heleqetîya. Kahîn ew meriv e, yê ku ji navê cimetê Xwedêra xeber dide. Pêxemberê cuhîya hebû, yê ku ji navê Xwedê cimetêra xeber dida, ew Mûsa bû. Feqet, Xwedê mecbûr bû usa jî kahîntîyê bide hîmdanînê, bona ku tevî cimetê heleqetî hebin.

> “Peyî wê yekêra Xwedê got: “Here peya bibe û tevî Harûn hilkişe”” /Derketin 19:24/. Harûn wê bibûya serekkahînê Wî, lê progirama Xwedêye pêşinda usa nîbû. Pêşda Ewî dixwest ku hemû bibûna kahîn.Wextê ku cimet gihîşte çîyayê Sînayê, Ewî got: ““Hûnê jî Minra padişatîya kahîna û miletekî buhurtî bin””. Ev in ew gotin, kîjana tu gerekê zarokên Îsrayêlra bêjî” /Derketin 19:6/. Ewî dixwest, ku li Îsraêlê her kes bikaribûya tevî Wî biketa nava heleqetîya.

Xwedê li ser Mûsa emir kir, ku tevî Harûn hilkişe ser çîyê, feqet em nabînin,wekî cîhekî derheqa wê yekêda tê bîranînê ku Harûn peyî wê bangê çû. Ew careke mayîn paşda vegerîya li cem cimetê, lê Mûsa li ser çîyê 4O roja û şeva ma. Harûn bona çi neçû? Gelo ewî nava hazirîya merivada berdildahatina diha mezin didît, yan li cem Xwedê? Gelo ew ditirsîya tevî Xwedê tenê bima? Em bersiva vê pirsê nizanin, lê em wê yekê zanin ku Harûnê çi bikira, ew beaqilî bû.

## Yahvêhê feşkirî

> “Gava cimetê dîna xwe dayê, ku Mûsa derengî dikeve û ji ser çîyê nayê xwerê, hingê cimet topî li cem Harûn bû” /Derketin 32:1/.

Ew çi diqewimî? Berê ewlin, meriva dixwest xwestinên xwe mîyaser bikirana û ew qulixçîyên Xwedê digerîyan, yê ku wê ew mecal bida wana.Ya duda, pêşkêşa Harûne rêberîyê hebû, û wê pêşkêşê bala meriva dikişand. Eva tiştekî girîng e, çimkî rêberê qewat guhdarîya meriva dikişîne li ser xwe, nenihêrî wê yekê, ku ew gura Xudanda ye, yan na. Ew yek, wekî peyîhatîyên rêber gelek in, her dem nîne ku dide kifşê, wekî ew peyî Xwedê diçe. Niha guhdar bikin, ku cimetê çi gote Harûn:

> “Rabe mera xwedêya çê bike ku pêşîya me bikevin, çimkî ew Mûsayê meriv, yê ku em ji welatê Misirê derxistin, em nizanin çi hate serê wî” /Derketin 32:1/.

Berê ewlin guhdarîyê bidine ser, wekî cimetê negot: “Çimkî em nizanin, ku çi hate serê Xwedê”. Eva tiştekî girîng e û êmekî şûnda ezê derheqa wê fikirêda bêjim.

Ya duda, guhdarîyê bidine ser, wekî wana got: “Bona me xwedêya çê bike”. Nava zimanê îbranîda xebera “*xwedêya*” xebera “ê*lohîm*”-e. Nava peymana Kevinda ev xeber ji 26OO carî zêdetir tê xebitandinê, û ji 225O-î zêdetir cara ew xeber derheqa Xwedêda ye. Mînak, tenê serê kitêba Destpêbûnêye ewlinda ew 32

cara hatîye nivîsarê. Nava xebera Încîlêye ewlinda nivîsar e: “Pêşda Êlohîm erd û ezman çêkir”.

Mînakeke wî cûreyî jî Qanûna Ducarî 13:4-ye: “Peyî Xudan /*Yahvêh*/ Xwedêyê /Ê*lohîm* / xwe herin, ji Wî bitirsin, emirên Wî xweykin, guh bidine Wî, Wîra qulix bikin û xwe li Wî bigrin”. Hûn dikarin bibînin, wekî nava vê beşêda navê Xudan çawa “*Yahvêh*” hatîye nivîsarê, lê paşê Ew çawa / Êlohîmê/ me tê navkirinê. Ew Xwedê ye: serwêrtîya here bilind e û kanîya hemû tiştî ye.

Dêmek, peymana Kevinda xebera Êlohîm nêzîkî 25O-î cara bona gotina derheqa xwedêyên feşda tê xebitandinê, mesele derheqa Dagon /A Padişatî 5:7/ û Bahel /G Padişatî 18:21/. Bo vê yekê jî, wextê ku em vê xeberê dixwînin, gerekê bi wê hemtêkstê lê binihêrin, bona ku fem bikin ku gilî derheqa kêda ye.

Harûn bersiva hîvîkirina meriva da û ji wana dewa guharên zêr kirin. Ewî ew zêr heland û ji wî zêrî golik çê kir.Wextê ku ew hazir bû, gotine wî: “Ev in xwedêyên te Îsrayêl! Yê ku tu ji welatê Misirê derxistî” /Derketin 32:4/. Nava zimanê Îbranîda xebera “Ê*lohîm*” careke mayîn hatîye xebitandinê. Dêmek ji xeberên wan em destpê dikin fem bikin, ku ew derheqa kêda dibêjin: “Yê ku tu ji welatê Misirê derxistî”. Wana zanibû ku kê ew ji welatê Misirê derxistin: ew bêaqil nîbûn. Texmînkirina me hema xebera bi sirêda îzbat dibe:

> “Gava Harûn ev yek dît, ber wî gorîgehek çê kir. Harûn kire gazî û got: “Sibê cejina Xudan e”” /Derketin 32:5/.

Nava vê gotinêda xebera “Xudan”, xebera “*Yahvêh*” e. “*Ferhenga tam, ya lêkolîna xeberên Încîlê*” wê yekê vî cûreyî şirove dike: “Ev xeber, navê rast, yê Xwedêyê Îsrayêl dide kifşê, ew nav e, bi kîjanî Ewî Xwe li Mûsa eyan kir /Derketin 6:2,3/. Ev navê xwedêtîyê bi edetî nedihate gotinê, hîmlî bi hesabhildana qedirgirtina hindava pîrozîya wêda. Berê nava têksta îbranîda, ya peymana Kevin, ew çawa “YHVH” dihate nivîsarê”.

Nava temamîya Încîlêda ev xeber bona navkirina tu xwedêyekî feş nehtîye xebitandinê. Ew yek dide dîyarkirinê ku çi diqewimî. Şikberî tune, wekî Harûn û cimet carekêra li ber wê golikê sekinîn, û ew çawa *Yahvêh* nav kirin. Wana ew çawa Bahel, Dagon, Astaroft, Ra, Nêptîs nav nekirin û navekî xwedêyî misirîya nedan. Wana negot: “Awa Ra, yê ku em ji Misirê aza kirin”.

Bîr bînin, ku wana çi got: “Em nizanin ku çi hate serê Mûsa”.Wana negot: “Em nizanin, ku çi hate serê Xwedê”. Wana ew yek înkar nedikir, wekî *Yahvêh* hebû, û wekî Ew nava jîyana wanda bû. Wana ew yek qebûl dikir, wekî *Yêhova*, yan jî *Yahvêh* ew xilaz kiribûn, ew aza kiribûn, ew qenc kiribûn û ew têr kiribûn. Wana awqasî şikilê *Yahvêh*î rast wî şikilîra pevguhartibûn, yê ku dihate kon-

trolkirinê, yê ku wê ew tişt bida, çi ku wana dixwest.

Ezê mînakeke wedê niha bînim ber çava. Ez û Lîza gelekî rêwîtîyê dikin. Qulixdarîya me, “Mêsîncêr întêrnêyşinil”, ji komeke gelekî baş saz bûye. Ew çi ku ezê binivîsim, tiştekî li ber xwe derxistî ye, çimkî endamên koma me wê tu cara tiştên wî cûreyî nekirana. Çawa serkarên qulixdarîyê, ez û Lîza, me hertim cêrge prînsîbên xebatê û çandî pêşda dikişandin, çimkî ew bona me girîng bûn. Ji wana çend heb ev in. Em ji endamên koma xwe kardarîya neh seheta hîvî dikin, lê ew jî nava heyşt sehetada. Em dixwezin ku atmosifêra xebatê bi şabûn derbaz bibe, hemû tiştî baş bikin, hiz bikin û qulixî her kesî bikin, bona hevalkar yan jî rêberê civînê, yê ku tevî me tevgirêdanê îzbat dike, pêra jî xebata berfireh bikin, nava rojê û temamîya hevtêda û gelek tiştên başqe. Serkarê xebatêyî sereke, navê kîjanî ezê daynim Tîm, bona xweykirina normên xebatê û kûltûrî cabdar e.

Bînin ber çavê xwe, wekî ez û Lîza nava rêwîtîyêda nin û pêra jî cabdarê xebatê nava rêwîtîyêda ye. Cabdarê mayîn serkarê beşa fînansî ye, navê kîjanî Cordan e /ev nav jî li ber xwe derxistî ye/. Piştî çûyîna Tîm, Cordan elamî temamîya komê dike: “Guhdar bin, Con û Lîza dixwezin, wekî atmosifêra ya şa be. Werin em sazbendekî kirê bikin û cîhê xebatê werguhêzî cîhê reqasê bikin, bi ronahiyên cûre-cûreva û usa jî bi dûva tijîbûyî, û werin em çend roja ser hev êvarîya derbaz bikin.

Nava temamîya wan êvarîyada koma me “dihebîne”, wekî hemû tiştî rast dike, çi ku me ji wana hîvî kirîye. Ew her dem dibêjin: “Eva xwestina Con û Lîzayê ye. Ew dixwezin ku atmosifêra me ya şabûnê be”. Feqet, endamekî ji komê dike gazî: “Guhdar bin, ez niha tevî Con bi têlefonê xeber didim. Min Conra derheqa êvarîya meda gilî kir û ewî pesinê me da”. Çawa tê kifşê ew derewa dike, çimkî eger min têlêfon bikira û pê bihesîyama, wekî tiştekî usa diqewime, ezê li ser koma xweda hêrs biketama.

Bînin ber çavê xwe, wekî serkarê beşa xebatê diha zû paşda vedigere ofîsê, ne ku ez û Lîza. Eger eva usa bûya ewê jî gelekî hêrs biketa. Ewê miqam bitemiranda, ronahiyên anî û maşîna ku dû derdixe, paşda bişanda, û wê gelekî ser wanda hers biketa û bigota wan: “Eva ew nîne, çi ku Con û Lîza dixwezin. We gotinên wana şaş raber kirine”. Peyî wê yekêra ewê ew meriv ji xebatê derxistana, kîjana ew teşkîldarîya feş çêkiribûn.

Niha dîna xwe bidinê ku Îsrayêlê çi kir, wextê ku wana “*Yahvêh”*-ê ku tê kontrolkirinê çê kirin:

> “Roja din, serê sibehê rabûn, dîyarîyên tevayîşewatê dan û dîyarîyên heleqetîyê anîn, cimet rûnişt, xwer, vexwer û rabûn namûsa hevra lîstin” /Derketin 32:6/.

Ew roja cejinê pêşkêşî *Yahvêh* bû. Rêbera û cimetê qurban dane wî, lê paşê hemû sînor unda kirin. Wana bi xwe xwe anîbûne li ser wê fikirê, wekî kirina wana li "*Yahvêh*"-ê wana xweş dihat. Wana bawar dikir, wekî Ew dijî têrnexwerina wan, kêf û şahiyên wan û kirinên wan /meriv dikare texmînke, wekî bênamûsîya bedenî jî dikete nava wê yekê/ nîbû. Wana kirina xwe çawa tiştekî, ku li Xwedê /*Yahvêh*/ xweş tê, raber dikirin, lê bi rastî ew hemû tişt li Wî xweş nedihatin.

Ew derbazî cûrê pûtparistîyêyî diha xapînok dibûn.Wana *Yahvêhê* feş çê kiribû, yê ku mînanî Xwedêyê rast nîbû.Wê yekê îzin dida wana ku usa bijîn, çawa ku wana dixwest, ku pêra jî begemîya Wî hebûya. Kirinên wana ji kirinên wan miletên necihû cuda nedibûn, yên ku nedixwestin Xwedê bihebandana /qulix bikirana/. Careke mayîn, Pawlos dinivîse: "Destpê kirin fikirên bêaqil derheqa wê yekêda li ber xwe derxin ku Xwedê çi cûreyî ye" /Romayî 1:21, NLT/. Firqîya tek-tenê ew e, wekî miletên necihû xwedêyên xwe bi navên başqeva nav dikin, mînak: Dagon, Bahel, Hapî, Ammît, Sopdû û navên başqe, lê Îsrayêl xwedêtîya xwe çawa *Yahvêh* nav dike.

Wî çaxî, Xwedê serkarê, cabdarê, beşa xebatêyî sereke, Mûsara got: "Peyabe here, çimkî cimeta teye ku te ji welatê Misirê derxist ji rê şihitî. Evana usa zû ji wê rê şihitîn, ya ku min temî dabû wan" /Derketin 32:7,8/.

Mûsa paşda vegerîya û destpê kir ji meriva dewa hesaba bike. Yê ewlin Harûn bû, yê ku ewî çawa cabdar hiştibû, yê mayîn jî rêber bûn, û bi kutasî cimet bû. Nivîsar e: "Mûsa dîna xwe dayê ku cimetê hewila xwe ji dewilê avîtibû /wê li ber dijminên xwe bibûna robet, çimkî Harûn îzin dabû ku wana hewila xwe ji dewilê biavîta/. Hingê Mûsa ber dergehê zomê sekinî û got: "Kê alîyê Xudan e, bila bê cem min" /Derketin 32:25, 26/. Ew meriv, usa jî em, li rex Xudan nesekinîn, navê Wî nehebandin, yan jî pesinê Wî nedan. Em qirar dikin, wekî em li rex Wî ne, dema ku em anegorî Xebera Wî dijîn.

Ev serpêhatî çend pirsên girîng pêşda tîne:

Diqewime ku me "Îsayê" usa feş çê kirîye, yê ku wî hemû tiştî dide me, berbi kîjana xwestinên meye şaşbûyî dicedînin?

Gelo em fem dikin, wekî Îsa xwîna Xwe bona me rêtiye, em xilaz kirine û ji vê dinyayê aza kirine?

Diqewime, wekî nenihêrî wê yekê ku em pesinê Wî didin, wekî Ewî Ezman bona me vekiriye, lê bi rastî "Îsayê me" ew Îsa nîne, yê ku li alîyê Bavêyî rastê rûniştî ye?

Diqewime me Îsayê feş çê kirîye?

Diqewime wekî bêhesab merivên civînê xapîyayî ne, mînanî wan îsraêlîya, yên ku ji Misirê derketine?

Dîsa pirsek: ew serkarên beşa xebatêye sereke, yên mîna Mûsa, kî ne, yên ku wê ji çîyayê Xwedê bi dilên agir û hizkirinêva tijî peîya bin û wê li ser merivên xapîyayîda hêrs bikevin?

Eger ew neyên, xapandina me wê diha berk be. Û kevirê krîpton wê dîsa zeyîfîyên me bide xebatê, hetanî dereca mirinê jî.

## gava praktîk

Li Rojavayê gelekî hêsa ye bêjin, ku hûn Îsa dihebînin. Feqet, piranîya Rojavayê ji mesîhîtîyê westiyaye, çimkî di navbera mesîhîya û vê dinyayêda hindik firqî heye. Mesîhî navê Îsa terîf dikin û dibêjin ku qedirê Xwedê digrin, lê bi jîyana gunehkarva dijîn, lê Ew jî eşkere, li ber çava begemîyê nadê. Çawa ku Mûsa got, wextê ku bona cabdarîyê gazî Îsrayêl kir: “Kî alîyê Xwedê ye, bila bê cem min”.Wede ye, ku Mesîhîyên rast rabine li ser pîya û berbi rastîyê gazî bira û xwîşkên xwe bikin.

Bona çûyîna li peyî Îsa em ji hemû tiştî paşda disekinin. Jîyanên me ne yên mene. Xwestina me bûyîna gura Xwedê da ye: eger usa nîbe, usa ye Ew Xudanê me nîne. Em bawar dikin, wekî Ewê wî tiştî bide me, hewcê kîjanêne em. Ev e banga mesîhîtîyê: belê, werin û xilazbûnê bistînin, feqet hûn jî gerekê bona şexsê xweyî kevin bimirin û bibine yê nû.

Dora banga mesîhîtîyêye rast bifikirin. Fikirên xweye derheqa wê yekêda binivîsin ku bi çiqasîva ew bang anegorî wî hemû tiştî ye, çi ku hûn hîn kirine, yan jî bi çiqasîva ew ji wê yekê cuda dibe. Merivekî yan nava malbeta xweda, yan jî li civînê bibînin, tevî kîjanî hûn dikarin derheqa wê yekêda xeberdin. Vê rastîyê derbazî li cem wan bikin.

19

# XALA DESTPÊKÊ

Ber cava ye, wekî wextê ku Mûsa ji çîyayê Xwedê peya bû, Îsrayêl bi temamî nava pûtparistîyêda bû, nenihêrî wê yekê, wekî wana qebûl dikir, ku *Yahvêh* ew ji Misirê xilaz kiribûn û aza kiribûn. Çawa ku me dît, nava hîmê pûtparistîyêda gurênekirin e, gura xwestina Xwedêye eyanbûyî nakin. Eger em dihebînin, wekî Îsa Mesîh Xudan û Xilazkirê Me ye, lê eşkere gura serwêrtîya wî nakin, wî çaxî ew dibe cûrê pûtparistîyêyî herî xapînok.

Em paşda vegerine li ser mesela li ber xwe derxistî, ya koma meye "Mêsîncêr întêrnêyşinil"-ê. Çawa ku serkar, cabdarê beşa xebatêyî sereke, Tîmê vegere ofîsê û wê kêf-şahiya wî cûreyî bibîne, ewê li ser serkarê beşa fînansî, Cordan, hêrs bikeve. Feqet Cordan dikare bêje Tîm: "Em wê yekê rast dikin, çi ku Con û Lîza dibêjin. Me atmosifêra eşq saz kirîye".

Tîmê bersiva  çawa bide? "Belê, bêguman, Con û Lîza dixwezin ku atmosifêra eşq hebe, lê tê derheqa tiştên mayînda çi bêjî, yên ku wana dane me?: Kardarîya neh sehetêye nava heyşt sehetada, mîyaserkirina xebata herroje û tiştên mayîn. We ji dewakarîyên wan tenê yek cuda kirîye û li ser wê sekinîne, lê yên mayîn hesab hilnedane".

Diqewime me nava civîna wedê nihada usa kirîye? Ez difikirim, wekî peymana Nûda hinek xal hene, yên ku li me xweş tên. Me elam kirîye, wekî em bi rîya bawarîyê bi keremê xilazbûyî ne, û em nikarin wê keremê qazanc bikin, çimkî ew yek xwestina Xwedê ye. Me gotîye, wekî lazim e ku hevdu hiz bikin û qulixî hevdu bikin, stiranên pesindayînêye nû bistirên, amin bin, serkarîya teşkîlbûyî hebe û olên civînêye saxlem çê bikin. Vî hemû tiştî em bi cedandina  mezin dikin. Ev  hemû gotin rast in, û peymana Nû derheqa wê yekêda dibêje.

Feqet em girîngîya şikestîbûnê, pîrozîyê, paqijaya bedenî, hesab hilnadin, usa jî dûrmayîna ji gunehên mayîn, mînak ji pornografîyayê.

Gelo me eşaretî daye wan meriva, kîjana em hiz dikin, ku ji bênamûsîyê, serxweşîya ji alkoholê, heneqên bênamûs, xeberdana vala, nebaxşandinê, talayê û buxdanbêjîyê birevin? Gelo me temîyên mayîne girîng dannasîn kirine, gotin û eşaretîyên mayîn raber kirine, yên ku peymana Nûda nivîsar in?

Gelo em dikarin tenê guhdarîyê bidine li ser wan hînkirinên Îsa, yên ku dijî normên ku nava civaka meda îzbat bûne û bêesilîyê nînin?

Gelo em dikarin Îsakî usa çê bikin, yê ku dijî rêyên kûltûra meye bêxwedê dernakeve?

Gelo em dikarin derheqa wê yekêda xeber nedin, ku Ew çi hiz nake û tenê wan beşên gotinên Wî bêjin, yên ku bona civaka me yên qebûlkirinê ne?

Gelo em dkarin wê rêyê û dergeh berfireh bikin, yên ku dibine berbi jîyanê?

Gelo em dikarin bawar bikin ku eger meriv çend xebera diweklîne, ew bi xwe xilazbûyî ye?

Diqewime me Îsayê feşkirî çê kirîye, yê ku ji wî Îsayî cuda dibe, derheqa Kîjanîda temamîya kitêba Pîroz da nivîsar e. Em paşda vegerine li civîna Korintîyê, ya ku ji kevirê krîptonî ruhanî zirarê ketibû. Pawlos wanra dinivîse û tomerî dike:

> "Ez ditirsim, wekî xwepêşkêşkirina weye paqij û tam, ya hindava Mesîh da, heram bibe, çawa ku Hêwa bi rêyên mehrê fêlbazva hate xapandinê. Hûn bi şabûn her tiştî qebûl dikin, çi ku kesek dibêje we, eger ew derheqa Îsakî *başqeda* dibêjin, lê ne ku derheqa Wî da, kîjanî em terîf dikin" /B Korintî 11:3, 4, NLT/.

Ev koma bawarmenda bi hêsanî şaş bibû, ne ku bi rêya hebandineke ku heyîna Xwedê, yan jî Îsakî feş înkar dike, lê bi bawarkirina Îsakî feşî başqe. Bîr nekin,wekî zarokên Îsrayêl xilaz bûn, azayî û stendina xwe avîtine ser navê Yahvêhyê feşkirî, golika zêrîn… lê ewê usa jî îzin dida û serbara serda piştgirî dida kirineke usa, ya ku dijî tebyeta Xwedê ye, derheqa çida Xebera Wîda nivîsar e. Diqewime me Îsayê feşkirî çêkirîye, yê ku piştgirîyê dide û îzina tiştên wî cûreyî dide? Gelo em bi zanebûn wan banga hesab hilnadin, yên ku peymana Nûda dibêjine me?

Pawlos tiştekî usa dibêje, kîjanî ji me tu kes nikare hesab hilnede:

> "Îro ez elam dikim, wekî ez amin bûme. Eger kesek mirina heta-hetayê bibîne, ew yek gunehkarîya min nîne, çimkî min ji wê yekê xwe neda paş, ku *wê yekê elam bikim*, çi ku Xwedê dixweze ku hûn bizanibin" /Karên şandîya 2O:26, 27, NLT/.

Pawlos tenê bangên Mizgînîyêye ku li wana xweş dihatin dannasîn nedikir. Ewî li ser xwe guman ew yek elam dikir, çi ku Xwedê dixwest ku me bizanibûya. Ew mînanî serkarê beşa meye fînansîyî sereke nîbû, yê ku tenê xwestinên min û Lîzayêye ku li wana xweş dihatin digote komê. Gotinên Pawlos, yên bi tercima "Nyû Kîng Cêyms"-ê vî cûreyî ne: "Ez netirsîyam ku *bi temamî ş*êwira Xwedê elamî we bikim" /NKJV/. "Nava tercima "Êmplîfayd klasîkê"-da nivîsar e: "Ez tu cara netirsîyame, paşda nesekinîme, ku bêyî kêmasî temamîya meremê Xwedê, program û şêwira Wî elamî we bikim" /AMPC/.

Eger em ji dannasînkirina hînkirinên peymana Nû, yen ku li meriva xweş nayên, birevin, emê nikaribin mînanî Pawlos bêjin: "Eger kesek mirina heta-hetayê li ser xwe bibîne, ew gunehkarîya min nîne". Bi rastî, eger em nava dannasînkirina beşên peymana Nûye kilîtda qels bin, wî çaxî wê cûrekî mayîn be. Gelo emê xemgîn bin, wekî merivên ku cara ewlin hatine, wê neyêne qulixa bi sirê, yan jî berevbûna koma biçûk?

Nava kûltûra meye mesîhîtîyêda, bi sala ser hev, em ji dîyarkirina wan xetên xeysete girîng revîne, derheqa kîjanada nava Xebera Xwedê da nivîsar e, û roja îroyîn em encamên kirinên xwe didrûn. Mixabin, gelek meriv roja îroyîn li ser rêya şaş in. Derheqa vê yekêda mînakên bêhesab meriv dikare bîne ber çava. Qulixçîke jine hukumdar bîra minda ye, ya ku xudana kitêbaye eyan û terîfkira hemcivînaye bi nav û deng bû. Sala 2O16-a ewê elametî belav kir, wekî zewaca wê îdî ser hevda hatîye. Ew ji mêrê xwe cihê bû û wextê nivîsara vê kitêbê ew nîşankirî bû û niha jî tevî jineke başqe dijî.

Ew peyîhtîyên xwera derheqa jîyana xwe û wê jinêda gilî dike. Nava nivîsareke xweda ewê şikilek raber kirîye, kîjanêda tê kifşê ku çawa hevala wêye jin wê radimûse, û şirove dike, dinivîse, wekî jîyana wê ew anîye li cem wê jinê, û wekî hemû tişt nava heleqetîyên wanda "pîroz"-e. Încîl heleqetîyên wana wî cûreyî şirove nake. Dilê min bona wê yekê diêşe. Awa "qulixçîkî Mizgînîyê", yê ku bawar dike, wekî ew li ber Xwedê li ser tabîya heq e û dixweze alî meriva bike, bona wan qulix bike û wana hiz bike, lê bi rastî ew xapiyayî ye.

Şirovekirinên ku ji alîyê bi seda hezara peyîhatîyên wêda, yên ku piştgirîyê didine wê, diha zêde mêriv xemgîn dikin. Nivîsarên wê raber dikin, wekî ew yek Xwedê raber dike, û peyîhatîyên wê wêra qayîl in. Nava temamîya wî wedeyîda ew diha zêde bi nav û deng bû. Halê vî cûreyî halekî bi êş e û tragîk e, lê bi wê yekêva tevayî jî tirsê pêşda tîne.

Halekî tiragîkî mayîn: serwêrekî Amêrîkayêyî eyan van axirîya elamî hemû peyîhatîyên xwe û civîna xwe kir, wekî em gerekê bi temamî cotên homosêksûal çawa peyîhatîyên Îsaye rast qebûl bikin. Ewî got, wekî ew qirar piştî derbazkirina wedekî dirêj tevî merivên wî cûreyî ewî qebûl kirîye, û eşkere kirîye, wekî

heleqetîyên wana mînanî heleqetîyên mêr û jinê ne. Ewî dikaribû tenê bi zanebûn hesabhilnedana cêrge beşên peymana Nû û hînkirina Încîlêye tomerî bihata ser wê fikirê. Mînanî Harûn û golika zêrîn, rûyê elametîya vî rêberîda gelek meriv wê ji rastîyê dûr bikvin.

Eva xapandina tragîk e, çimkî fîlosofîya Rojavayêye qulixdarîyê li ser Îsayê feşkirî çê bûye û bona meriva diha dijwar dibe, ku Xilazkirê rast bibînin. Em gerekê bipirsin: "Gelo Îsayê rast wî cûreyî ye? Gelo hizkirina Xwedê wî cûreyî ye? Gelo hizkirina rast tenê bi rehmê, bi sebirê û bi alîkirina merivava tê şirovekirinê? Ev cudatî rast in, û ji alîyê civaka meda hatine qebûlkirinê. Feqet, diqewime me ew tişt hesab hilnedaye, ku nava Încîlêda hizkirin çawa tê şirovekirinê?: "Çimkî bi vê yekê em hizkirina xwe hindava Xwedêda didine kifşê, gava em temîyên Wî xweyî dikin" /A Yûhenna 5:3/.

Gelo em tenê bi hinek beşên peymana Nûva razî bûne, bona ku şirovekirina hizkirinê bibînin?

## Pêwîstîya tobekirinê

Diqewime Mizgînîya tevlîhevkirî rûyê tunebûna tobekirinêda pêşda hatîye? Gelo ew jina ku serwêr û xudanê kitêba bû, yan jî rêberên Mizgînîyêyî mayîn, usa jî gelek meriva gotibûn, wekî lazim e guneh bihêlin, bona ku peyî Îsa herin? Yan ew tenê hînî wê yekê kiribûn, çi ku bûye duayê meyî sade? : "Îsa, were nava jîyana min, min bike mesîhî".

Xeberên Pawlos guhdar bikin:

> "Ez ji wê yekê paş nemame, ku bêjime we, ku we çi gerekê hin eşkere, hin jî malên xweda guhdar bikira. Bangeke min bona cuhîya û yûnana hebû, ku ew tobe bikin, vegerine berbi Xwedê û li cem wan gerekê *pêwîstîya* bawarîya hindava Xudan Îsa hebe" /Karên şandîya 2O:2O,21, NLT/.

Tenê bangek. Gava ewlin *pêwîstîya* tobekirina gunehê ye. Bona bûyîna zarokê Xwedê, tobekirin *borcdarî ye*, lê ne ku ew yek tê bijartinê. Feqet, gelek cara ew nayê bîranînê, wextê ku em Mizgînîyê şirove dikin û pêşnîyar dikin ku meriv xilazbin.

Çend sal pêşda, wextê roja ewline nava rojîyên minda, min dengê Ruhê Pîroz bihîst: "Serê kitêba Marqose ewlin bixwîne". Min temamîya serê kitêbê xwend û tu tiştekî nû eşkere nekir. Ruhê Pîroz gote min: "Careke mayîn bixwîne". Min carekê jî xwend û dîsa tiştekî nû tune bû. Ewî ev yek cara sisîya, çara û pênca

gote min. Û min çend cara ew xwend û dîsa tu tişt nedît. Bi gilîkî, ew beş hevt cara hate wekilandinê. Paşê min qirar kir wê yekê hêdî-hêdî bixwînim, û vê carê gotina ewlin tê bêjî ji rûpelê kitêbê derket:

> "…destpêka Mizgînîya Îsa Mesîh" /Marqos 1:1/.

Kilîta wê yekê nava xeberên mayînda bû: "Va ye Ezê qasidê Xwe pêşîya Te da bişînim, bona ku rêya Te li pêşîya Te hazir bike". Ew mizgîndar Yûhennayê Nuxumdar bû. Qulixdarîya wîye "nuxumandina tobekirinê" hebû. Nuxumandin niqobûna bi temamî ye, lê ne ku ya par-parî ye. Banga Yûhenna ya derheqa tobekirina bi temamîda ye, ya ku destpêka Mizgînîyê ye, yan jî xala destpêkê ye. Tu kes nikare tevî Îsa bikeve nava heleqetîyên rast, eger ew ji tobekrina rast destpê neke.

Ruhê Pîroz minra got: "Qulixa Yûhenna destpêka her Mizgînîkîda tê bîranînê. Serpêhatîya Yûhenna nava tu kitêbeke peymana Kevin da nivîsar nîne, çimkî banga wî hema beşa peymana Nûye girîng e".

Gava mayîn ew bû, wekî Ruh rêberîya li min, ya berbi xeberên Îsa, kir:

> "Çimkî hemû pêxembera û qanûnê hetanî Yûhenna şedetî dan" /Metta 11:13/.

Ez ji ser kursîya xwe banzdam û min kire gazî: "Bi rastî, ew yek rast e". Îsa negot: "Çimkî hemû pêxember û qanûn hetanî Min /Îsa Mesîh/ şedetî dan". Na xêr, çimkî banga Yûhennaye derheqa tobekirina tamda hema xala destpêka Mizgînîyêye peymana Nû ye. We heleqetîyên xweye tevî Îsa destpê nekirine, çimkî we gunehên xwe tobe nekirine.

Tobekirin dergê ketina li hundur e.

Serpêhatîya meye derheqa Castîn, Ancêlayê û fikirdarîya wêye derheqa zewacêda bîr bînin. Ewê usa jî hevalên xweye berê nehiştin. Ewê mêrê xwe hiz dikir: Castîn bona wê yê ewlin bû û ewê dixwest piranîya wedê xwe tevî wî derbaz bikira. Feqet tu cara negotibûne wê, wekî bona morkirina peymana zewacêye tevî Castîn *pêwîst bû* , wekî ew gerekê hemû tevgirêdanên xweye /yên fikirdarî, yên fîzîkî/ tevî hevalên xweye berê biteribanda. Ev qirar wê bibûya destpêka ketina nava peymana tevî Castîn, yan jî xala destpêkê.

Ew zandegirtî mabû, wekî Castîn rûyê qirara derheqa rasthatina tevî Tonî hêrs ketibû. Ew her dem difikirî: "*Ew bona* çi *hers ketiye? Ew kumreş*îyê dike?". Belê, ew kumreşîyê dike, û gerekê hema wî cûreyî jî bibe. Xwedê jî kumreşîyê li me dike û hema gerekê wî cûreyî bibe. Em tevî Wî nava peymanêda nin: çawa dikare bibe, ku hizkirîyên meye mayîn hebin?

Gelo çawa qewimîye,wekî Încîlêda xeberên Yûhennaye ewlin ev in: “Ji gunehkirinê vegerin, çimkî padişatîya Ezmana nêzîk bûye” /Metta 3:2/.

Gelo tenê Yûhenna vê yekê dibêje? Gelo banga wî ya tek-tenê ye û ji alîyê mizgîndarên peymana Nûye mayînda nayê wekilandinê? Bêguman, na. Temîya Îsaye ewlin ev e:

> “Tobe bikin, çimkî padişatîya Ezmana nêzîk bûye” /Metta 4:17/.

Xudan û Padişê me zanibû, wekî tobekirin pêwîst e û bona heleqetîyên wededirêje tevî Xwedê ew yek gaveke girîng e. Tiştê ecêbmayînê nîne, wekî eva ew norm e, yê ku Ewî da xebatê, bona ku biryar bike, ku gelo meriv yên Xwedê bûn, yan na?

Îsa li ser wan bajarada hêrs ket, li kîderê Ewî gelek keremet kiribûn, çimkî ew *ji gunehkirinê paşda veneger*îyan, û berê xwe nedane Xwedê /binihêre Metta 11:2O/.

Eger bona xilazbûnê tenê pêwîst bûya, ku “berê xwe bidana alîyê Xwedê, wî çaxî Îsayê tenê derheqa wê yekêda xeber bida. Feqet, çawa ku Ancêla gerekê hevalên xweye berê bihişta, bona ku bi temamî xwe pêşkêşî Castîn bikira, usa jî em gerekê tobe bikin, bona ku bi temamî xwe pêşkêşî Îsa bikin.

Em her dem vê bangê dibînin, çimkî ew banga qulixa Îsaye girîng e. Ew dibêje: “Ez hatime gazî bikim… wana, yên ku zanin, wekî gunehkar in û *gerekê tobe bikin*” /Lûqa 5:32,NLT/. Derheqa xebera “gerekê”-da bifikirin. Tobekirin tiştê bijartinê nîne. Îsa ev xeber gotine komeke meriva: “Hûnê jî unda bin, eger hûn ji gunehkirinên xwe paşda venegerin û berê xwe nedine Xwedê” /Lûqa 13:3, NLT/.

Rastî ev e: *ew yek tiştê bûyînê nîne, ku bêyî tobekirin paşda vegerine alîyê Xwedê*.

Werin em pêşda bilivin, bona ku bibînin, ku çawa şagirtên Îsa Mizgînî dannasîn dikirin. Awa wana çawa cara ewlin, wextê mîsîya xwe ew yek kirin, wextê ku Îsa ew şandibûn: “Û şagirt derketin, rastî her kesê ku dihatin, dannasîn dikirin, ku ew ji *gunehkirinên xwe paşda vegerin* û berê xwe bidine Xwedê” /Marqos 6:12, NLT/.

Derheqa van xeberada bifikirin: “*Rastî her kesê ku dihatin*”. Çimkî bêyî tobekirinê xilazbûn tune, pêwîst e, wekî derheqa wê yekêda her kesîra bêjin. Ew merivê dewletîyî, ku li dojê dişewitî jî derheqa girîngîya tobekirinêda zanibû:

> “Merivê dewletî got: “Na, Bavê Birahîm, eger ji mirîya yekî bişînine cem wan, wî çaxî ewê tobe bikin û vegerine berbi Xwedê” /Lûqa 16:3O, NLT/.

Lê piştî rabûna Îsaye ji nava mirîya? Gelo banga wan hate guhartinê? Lûqa derheqa wê yekêda dinivîse, wekî Îsa şagirtên Xweva eyan bû, û bona berkbûna dil li wan hilat, lê paşê fikira wan vekir. Paşê Ewî ew yek wekiland, çi ku pêxembera derheqa Wî da gotin:

> "Usa jî nivîsar e, wekî ji Orşelîmê girtî bi navê Wî nava hemû miletada wê bê dannasînkirinê: "Baxşandina guneha *bona wana* heye, *yên ku tobe dikin*"" /Lûqa 24:47, NLT/.

Pêxembera têra didîtin, wekî meriv dikaribûn tenê bi rêya tobekirinê nava Xilazkir da baxşandin bidîtana, û Petrûsê şandî peyî mesela wan çû. Niha banga Wî ya berdildahatinêye derheqha xilazbûnêda guhdar bikin, ya ku ewî roja Pêncîyî gote wan meriva, yên ku bi hazirî Xwedê digerîyan: "Ji we her kes gerekê ji gunehê paşda vegere û berê xwe bide Xwedê, û bi navê Îsa Mesîh bê nuxumandinê, bona baxşandina guneha" /Karên şandîya 2:38, NLT/.

Careke mayîn, bêyî tobekirin nikarin berbi Xwedê vegerin. Lê Pawlos? Gelo ewî banga xweye bona necuhîya guhart? Na xêr:

> "Ez dijî wê dîtina li ber çavaye ji ezmên nesekinîm. Min pêşîyê yên Şamê, lê paşê bona yên li Orşelîmê û temamîya topraxên Cihûdistanêra dannasîn kir, usa jî *necuhîyara*, wekî hemû kes *gerekê ji gunehkirinên xwe paşda vegerin*, û berbi Xwedê vegerin û bidine kifşê, wekî ew bi karên qencva, kîjana ew dikin, ew hatine guhartinê" /Karên Şandîya 26:19, 2O, NLT/.

Nivîsar e: "hemû kes gerekê", ne ku: "hemû kes dikarin". Yan jî "fikireke başe, wekî…". Tu cara nabe. Ew dibêje: "Hemû kes gerekê ji gunehkirinên xwe paşda vegerin".

Pawlos şirove kir, wekî xût Xwedê ev dewakarîya xilazbûnê dabû bona her kesî, him bona cuhîya, him jî bona ne cuhîya:

> "Nava zemanê berêda Xwedê nezanîya merivaye derheqa van tiştada hesab hilneda, lê niha Ew temîyê dide her kesî, ku ew ji *gunehkirinên xwe paşda vegerin*, û berê xwe bidine Wî" /Karên Şandîya 17:3O, NLT/.

Çi ku derheqa hînkirinên Îsa Mesîhe hîmlîda ye, tiştê ecêbmayînê nîne ku meriv bibîne, ku nava wê navnîşêda kîjan e ya ewlin: hûn bi xwe wê yekê texmîn bikin.

> "Dêmek, werin em *hînbûnên h*îmlîye derheqa Mesîh da dîsa û dîsa nedin wekilandinê. Dewsa wê yekê em pêşda herin û bi fikira xwe bighîjin. Bêyî şikberî, hewce nîne ku em ji wan hînbûnên ku girîngîya wane bingehîn hene, careke mayîn destpê nekin, yên ku ji *tobekirinê* û bawarkirina Xwedê destpê dibin" /Îbranî 6:1, NLT/.

Min derheqa hemû beşên peymana Nûda xebernedaye, kîjanada ev temî tê dayînê. Feqet, min gelek beş dane rêzê, bona ku girîngîya tobekirinê nîşan bidim. Ew yek tiştê bûyînê nîne, ku bawarîya xwe li Xudan Îsa Mesîh bînin, eger pêşîya wê yekê tobekirina bona bi zanebûn nekirina gura Xwedê tune bûye.

Bi vî cûreyî, em nikarin bibine mesîhî, eger em bi zanebûn matêrîyalên pornografîk didine xebatê.

Em nikarin bibine bawarmend, eger em naxwezin heleqetîyên bedenîye tevî hevala, yan jî hevalê xwe, bidine sekinandinê.

Em nikarin bibine mesîhî, eger em naxwezin terka homosêksûalîzmê /heleqetîyên yekqismê/ bidin.

Em nikarin bibine bawarmend, eger em dîsa reqemên bacdayînê feş dikin.

Em nikarin bibine peyîhatîyê Îsa, eger em xwe li alîyê heleqetîyên gêndêrîyê digrin.

Em nikarin bibine mesîhî, eger em naxwezin bibaxşînin. Ev navnîş dikare gelekî dirêj bibe.

Eger em bi serhişkî tenê çend beşên peymana Nû qebûl dikin, usa ye me "Îsayê feşkirî" çê kirîye. Dilê xweda em xapîyayîne û bawarîya me tenê xiyale. Û Xebera Xwedê eşaretîyê dide: "Tenê guhdarîya Xebera Xwedê bikin. Hûn gerekê wê mîyaser bikin. Eger usa nebe, wî çaxî hûn xwe dixapînin" /Aqûb 1:22, NLT/.

Merivên ku Xwedê digerin wê çawa derheqa vê yekêda bizanibin, eger em vê yekê elam nekin? Gelo em, rêber, difikirin, wekî ewê bi xwe van tişta fem bikin? Eger em awqasî bêjine wan: "Hûn ji Xwedê dûr in? Ew hîvîya we ye ku hûn bêne malê. Awqasî vî duayî tevî min dua kin", gelo em bi rastî wana hiz dikin?

Eger nêzîkbûna me vî cûreyîye, wî çaxî em dîsa wê yekê dikin, çi ku endamên malbeta Ancêlayê, yan jî merivên başqe kiribûn, kîjana Ancêla derheqa zewacêda hîn kiribûn. Wana negotibû Ancêlayê, wekî bona zewaca tevî Castîn ew gerekê ji hevalên berê paşda bisekinîya. Diqewime ew fikirîbûn, ku Ancêlayê bi xwe ew yek fem bikira? Niha Ancêla tevlîhevbûyî ye. Lê Castîn, yê ku wê hiz dike û bi rastî xwe pêşkêşî peymana tevayî kirîye, gelekî hêrsketî ye.

Xwendevanên çawa jî hebin, yek e gerekê Mizgînîke raste tek-tenê hebe, ya ku gerekê bi vî cûreyî bê dannasînkirinê: berê ewlin, *tobekirina* gunehên

ku bi zanebûn tên kirinê, lê paşê vegera berbi Xwedê. Bawarîya rast tune, eger pêşîya wê *tobekirin* tune bûye.

Mêtoda dannasînkirina wedê niha ev e: rêberîya meriva dikin berbi bawarîyê û tevî wan dua dikin û tenê peyî wê yekêra, nava çend hevtîyada, mehada, yan jî salada, wana ji gunehên bi zanebûn kirî dûr dixin. Feqet, diqewime ku ew meirv îdî nexwezin tobekin, çimkî ew bawar dikin, wekî îdî xilazbûyî ne.

Ancêla poşman bibû, wekî hetanî zewaca tevî Castîn, ewê derheqa rastîyêda nebihîstibû. Em jî merivên civînê, kîjanêda konflîkt hene, saz dikin, wextê ku em derheqa dewakarîyên xilazbûnêda rastîyê nabêjine wana.

## gava praktîk

Banga peymana Nû zelal e: bêyî tobekirina guneha xilazbûn tune. Hûn nikarin tevî Îsa bizewicin û bi wê yekêva tevayî heleqetîyên xweye tevî vê dinîyayê xweykin. Hûn gerekê bona jîyana kevin bimirin, bona ku jîyana nû destpê bikin.

Eger hûn rola xeberdankirda bûne, hûn fem dikin, wekî gerekê gotina xweye hîmlî gelekî zelal raberî meriva bikin. Eger usa nîbe, wî çaxî diqewime ku aûdîtorîya we fem neke û meremê gotina we mîyaser nebe. Xwedê derheqa vê yekêda zane. Awa bo vê yekê jî Ewî gelekî zelal got: “Tobe bikin”.

Hetanî niha, wextê xwendina vê kitêbê: diqewime we îdî çend cara tobe kiriye. Feqet, ev serê kitêbê nava weda ew yek çi cûreyî îzbat kir, wekî tobekirin girîng e? Jîyana we çi cûreyî hate guhartinê, wextê ku hûn derheqa vê yekêda pê hesîyan? Ewê çawa heleqetîyên weye tevî vê dinîyayê, tevî hizkirîyên we û merivên undabûyî biguhêre? Ji Xwedê hîvî bikin, wekî ew nîşanî we bide ku hûn çi dikarin bikin, bona qewînkirina girîngîya tobekirinê. Mînanî her dema, wê yekê binivîsin, çi ku Ew wera dibêje, nava wêda usa jî derheqa wan progiramada, ku hûnê çawa gotinên Wî mîyaser bikin.

20

# TOBEKIRIN

Serê kitêbêyî derbazbûyîda me her dem dixwend: “Ji gunehkirinên xwe paşda vegerin û berbi Xwedê herin”. Çimkî tobekirin tiştê bijartinê nîne, lê bona stendina jîyana heta-hetayê *pêwîst e*, werin diha bi hûrgilî wê yekê lê binihêrin. Bi eşkerekirina vê rastîyê, emê dîsa eşkere bikin /serîkî kitêbêyî mayînda/ wekî bona mesîhî tobekirin pêwîst e, bona xweykirina heleqetîyên nêzîke tevî Xwedê.

Ya ewlin, ew yek gelekî girîng e fem bikin, wekî peymana Nûda tobekirin usa nîne çawa ku peymana Kevinda ye. Wextê ku peymana Kevinda cimeta Xwedê tobe dikir, ewê kincên bi pirça bizinê û komir li xwe dikirin. Ew digirîyan, diketin erdê û gelek cara hêsir dibarandin, ku tobekirina xwe bidana kifşê. Tobekirin ji derva poşmanî dida kifşê û pêra jî vegera berbi gurêdabûna xwedêhizîyê. Emê bibînin, wekî peymana Nûda, guhdarîya hîmlî nayê danînê li ser nîşandayîna ji derva, lê guhdarî tê danînê li ser ya dil.

## Tobekirin peymana Nûda

Peymana Nûda xeberên “tobekirin” /“mêtanoya”/ û “tobekin” /“mêtanoêo”/ meriv dikare 24 û 34 cara bibîne. Şirovekirina vê xeberêye here eyan û şirovekirina wêye bi berfirehî belavbûyî çawa “fikirguhartin” hatîye qebûlkirinê. Feqet, eger bi vê yekêva bêne sînorkirinê, emê fikira wêye tam fem nekin.

Anegorî “Ê*nsîklopêdîya Bêyk*êre Încîlê”, tobekirin “bi gilîkî fikirguhartina ne ku bona program û meremên şexsî ye, lê bona guhartina şexsîtîya t*emam e* , wextê ku ji karên gunehkar vedigerî berbi Xwedê” /xebera kifşkirî zêdekirî ye/.

Gotina “Şexsîtîya t*emam*” li min xweş tê. Ez dikarim fikira xwe biguhêrim,

lê bi temamî li ser wê fikirê nîbim. Bi vê gotinê xwedêzan didine kifşê, wekî tiştên diha zêde hene, ne ku tenê guhartina fikirê. “Kitêba Lêkshême xeberên xwedêzanîyê” diha bi kûrayî vê xeberê şirove dike û dide kifşê, wekî tobekirin “şuxulandin e, kîjanêda şexs fikir û xwestina xwe dide rastkirinê, ji gunehê dûr dixe û dibe berbi Xwedê”.

Bêyî şikberî, tobekirin derheqa fikirêdane, lê hukumê wê diha kûr e: ew hukum li ser xwestin û texmînkirinên me dike. Ew diçe kûraya dilê me, li kîderê fikirên meye hîmlî ne. Îsa dibêje:

> “Çimkî *ji dil* fikirên xirab, kuştin, zinêkarî, qavî, dizî, derewî, buxdan dertên. Ev in ku meriva diherimînin” /Metta 15:19,2O/.

Terbe him bi cûrê nişkêva, him jî bi cûrê sade ji dilê me pêşda tê. Eger bona tobekirina rast lazim bûya tenê fikir bidana guhartinê, Îsayê bigota, wekî ew hemû terbe ji fikirê pêşda tên. Încîlêda nivîsar e: “Çimkî ew dilê xweda çawa difikire, ew bi xwe jî usa ye” /Gotinên Silêman 23:7, NKJV/. Ew yek, ku em kûraya dilê xweda jîyanê çawa fem dikin, kirinên me û cabdayînên me didine kifşê, lê evên axirîyê jî derheqa meda raber dikin.

Diqewime hûn bifikirin: *“Ez naxwezim bi kirina xweva bême raberkirinê”*. Ez wê yekêra qayîlim, çimkî ew yek rastîya xweş nîne, lê em nikarin xeberên Îsa hesab hilnedin: “Hûn dikarin wana bi berên wanva qirar bikin, dêmek bi wê yekêva ku ew çawa dikin” /Metta 7:16, NLT/. Rastî ew e, wekî em kirinên xweva, lê ne ku bi meremên xweva, tên raberkirinê”.

Ev rastî bi xwe qewata Mizgînîyê dide kifşê, çimkî Mizgînî dikare fikirên dilê me biguhêre û bi wê yekêva jî kirê me biguhêre. Heyîna hukumê Mizgînîyê bi rastî nade kifşê ku li cem mêriv dikare fikirdarîya nû, yan jî cabdayîna texmînkirinêye nû hebe, lê dikare guhartina femdarîya û fikira hebe, ya ku bi kirê rast çêbûyîva tê raberkirinê.

Tobekirin wî çaxî diqewime, wextê ku em bona rastîyê hişyar dibin û wextê ku em bi kûrayî tên li ser wê fikirê, wekî fîlosofîya me û kirên me dijî Efrandar in. Femdarîya vî cûreyîye bi dil diqewime, wextê ku ne tenê fikira me tê guhartinê, lê usa jî xwestinên me tên guhartinê. Wî çaxî em bi mêrkîmî qirarê qebûl dikin, ku xwestin û cedandinên xwe biguhêrin, yên ku dijî xwestina Xwedê ne, em qirar dikin wana berdin û pêra jî hiz nekin. Tobekirin şikestîbûna rast e, lê şikestîbûn bona kerema ku ji alîyê Xwedê da bi cûrê nelayîq tê dayînê derî vedike, ya ku karebûnê dide me bona jîtina bi jîyana xwedêparêzîyê

## Bêbawar

Tobekirin him bona bêbawara, him jî bona bawarmenda ye, lê hinekî bi cûrên cuda-cuda. Werin em berê ewlin derheqa bêbawarada xeberdin.

Serê kitêbêyî derbazbûyîda me derheqa Yûhennayê Nuxumdar, Îsa û şagirtên Wî da guhdar kir: “Ji gunehkirinê paşda vegerin û berê xwe bidine Xwedê”. Bi rastî, ev her du temî jî bi cûrekî six hevva girêdayîne û ji hev cuda nabin. Bi gilîkî mayîn gotî, yek bêyî yekî nikare hebe, çimkî ew mîna tiştekî usa ye, çawa ku her du rûyên perên hesin in. Tobekirna anegorî Încîlê dide kifşê, ku bi hemû alîyava berê xwe bidine Xwedê. Ew merivê ku bi rastî Mesîh qebûl dike, dibêje:

> “Min her dem berbi wî hemû tiştî cedandiye, çi ku bona min tiştê herî başe bûye, lê niha ez zanim, wekî ez bi temamî şaş bûme. Ji nihada destpêkirî, tiştê herî baş ew e, çi ku Xwedê dibêje min, eger ew çi jî bibe: ezê bi temamîya dilê xwe, fikir û kirên xwe, bawar bikim û qebûl bikim”.

Ew bi dil qirar dike /çi ku fikira wî, texmînkirin û xwestina wî dike nava xwe/, wekî wê xwestina Xwedê mîyaser bike. Bi qebûlkirina vê qirarê, ew duayê distîne: ew dîsa dengê Xwedê dibihê. Careke mayîn, ezê bînime bîra we, Îsa got: “Her kesek, yê ku dixweze emirê Xwedê biqedîne, wê bizanibe ku gelo hînkirina Min ji Xwedê ye, yan na?” Yûhenna 7:17, NLT/. Bi tobekirinê, merivê bêbawar xweserkarîkirinê dihêle, berdide, û serwêrtîya Xwedêye tam dibijêre. Ev qirar dilê wî vedike, bona ku ew dengê Xwedê guhdar bike.

Wextê ku bêbawar bi rastî tobe dikin, ew pûtparistîyê berdidin û serwêrtî, gurêdabûnê û serwêrtîya Xwedê dibijêrin. Ew elam dikin: “Ezê îdî tu cara fikirên usa, tiştên wî cûreyî qebûl nekim, yên ku xwe ji Xebera Xwedê bilindtir hesab dikin”. Pawlos li ser xwe guman dibêje:

> “Bona *wêrankirina* kelayên fikirdarîya mêriv û *xirabkirina* menîyên feş em ne ku çekên eskerîya vê dinîyayê didine xebatê, lê yên qewate ji Xwedê. Em her bilindcîke kubarîyê *wêran dikin* , ya ku îzinê nade ku meriv Xwedê nas bike. Em hemû fikirên wane ku serê xwe bilind dikin û wana hîn dikin, ku gura Mesîhda bin. dikine hêsîr”…“B Korintî 1O:4, 5, NLT/. Çekên Xwedê Xebera Wî, serwaxtî û şêwira Wî ne. Çekên vê dinîyayê fîlosofîya civakê, kûltûra, edet, qanûn û stîla jîyanê ne, yên ku dijî Xebera Xwedê ne. Diqewime hûn bipirsin: “Çekên vê dinîyayê hene?”. Bêguman: doje her dem bi rêya sîstêma vê dinîyayê êrîşê dike, him mesîhîya, him jî bêbawara, def dide ku ew berbi berdaxustinê herin.

Niha guhdarîyê bidine li ser xeberên Încîlêye “xirabkirin” û “wêrankirin”. Hema van xebera jî gelek cara nava peymana Kevinda didine xebatê, wextê ku meriva berên xwe ji pûtparistîyê vedigerandin. Îsrayêl pûtên sekinandî xirab dikirin, dişkênandin, diavîtin û wêran dikirin /gunehkirinên wan bîr bînin: koka pûtparistîya bi zanebûn berdewamkirina gunehê ye. Wana hema ew yek wêran dikirin, lê ne ku tenê heykel/.

Ew prînsîb, derheqa kîjanada Pawlos dibêje, yek in. Em Xebera Xwedê dijî wan didine xebatê, fikirdarîyên kîjana yên pûtparistîyê ne, yên ku ji Mesîh dûr ketine. Bi vî cûreyî xwendevanên me tobe dikin /xirab dikin û wêran dikin/, ji hemû fikirdarîyên merivatîyê, menîya û gurênekirinê dûr dikevin. Hema ev e tobekirin, wextê ku meriv ji gunehkirinê paşda vedigere. Wextê ku meriv vî cûreyî dike, ew bi rastî paşda vedigere berbi Xwedê û azayê distîne.

## Firqîya fîlosofî

Hema li vir, em nava qulixa mesîhîtîyêye roja îroyînda, bi taybetî li Rojavayê, rastî firqîyên fîlosofîye berbiçav tên. Komeke rêberaye mezin fikirdarîya usa qebûl kirîye, wekî bona gihîştina yên undabûyî lazim e ku em bangên xwe li ser wan alîya bidine merkezkirinê, yên ku dijî Mizgînîyê nînin. Bi gilîkî mayîn gotî, em gerekê baş bin û wan guneha bîr neynin, kîjana gerekê tobe bikin. Bi nêzîkbûna wî cûreyî, em bi zanebûn, yan jî bi nezanî, dibine mînanî wî tucarî, yê ku dicêribîne bikirçî bîne ser wê fikirê, ku ew eşîya bikire û bi wê yekêva tevayî pesinê eşîyayê xwe tenê dide, lê alîyên xirab vedişêre. Mixabin, fikirdarîya vî cûreyî bona gihîştina undabûya bûye norma mêtoda.

Nava qulixêda ev fîlosofîya şaş du zêdayên berbiçav dide kifşê. Ya ewlin, em her mecaleke bona êşandina meriva diatînine alîkî. Qanûnparêzî bi rastî ji dilovanîyê dûr e û li ser herfa qanûnê hatîye merkezkirinê. Merivên qanûnparêz dicedînin rast bin, kirên xwe kontrol bikin û bi nav û deng bin. Rûyê berkbûnêda qanûnparêzî li peyî xwe merivên êşîyayî dihêle, yên ku îdî nikarin Xwedê bigerin, çimkî ew şexs, yan jî ew îdare, ya ku Îsa raber dike, zirar daye wana. Bi texmîn, qanûnparêzî ji her tiştî zêdetir diha gelek ji Xwedê dane dûrxistinê.

Îsa encamên “qulixa” dînî da kifşê:

> “Çimkî hûn li ber meriva dergê padişatîya Ezmîn digrin. Hûn bi xwe nakevinê û îzinê nadine yên mayîn jî ku ew bikevinê” /Metta 23:13, NLT/.

Dêmek, xwestina azabûna ji qanûnparêzîyê rast e, lê em nikarin berê xwe bidine berbi alîkî mayîne xirab. Gelo em gerekê ji qulixdarîya peymana Nû birevin, çimkî

em ditirsin, wekî dikarin bikevine wê telê û zyanê bidine meriva? Gelo em gerekê ji lêhilatina gunehê paşda bisekinin û banga tobekirinê bikin, bona ku her gaveke qanûnparêzîyê dûr bixin? Gelo emê bi vê yekê, tevî birîyê, çav jî dernexin? Em gerekê derbazî van pirsa bibin, derheqa wanda xeberdin, çimkî ew yek roja îroyîn nava dannasînkirina Mizgînîyêda bûye norm, û ew ne anegorî Încîlê ye. Em çawa dikarin xilazbûnê pêşniyar bikin, bêyî tobekirinê, eger Încîl zelal dide hînkirinê, wekî tobekirin pêwîst e? Û gelo ew meriv, kîjana em bi mizgînîya vî cûreyîye sînorkirî qazanc dikin, bi rastî xilaz dibin, yan na? Ew "zêdaya" duda, ya bona derbazbûna dora tobekirinêra, ew e, wekî em dikarin bi hêsanî wan merivên tezehatî qazanc bikin û bi wê yekê qulixdarîya diha mezin, civînê, yan jî koma biçûk çê bikin. Feqet em bîr dikin, wekî hema piranîya meriva peyî şaşîya Harûn çûn? Reqema peyîhatîyên meye mezin, yan jî biçûk nîne, ku qirar dike, ku gelo em anegorî dilê Xwedê dikin, yan na? Faktora qirarkir rastî ye, lê ne ku reqema meriva ye.

Gelo me derheqa bahê çûyîna li peyî Îsa bîr kirîye? Gelo me emirên Wîye ku tên wekilandinê, yên derheqa berdana gunehda /înkarkirina şexsê xwe/ û hildana xaçda /gurêdabûna Wî da/ hesab hilnedaye?

Eger em dijî gunehên ku berdewam dibin, dernekevin, ew merivên ku Îsa qebûl dikin wê dîsa anegorî normên vê dinîyayê bijîn, lê ne anegorî Xebera Xwedê. Nava civaka meda bi temamî tiştên qebûlkirinêne, ku tevî hizkirîyê xwe, bêyî zewacê bijîn û bikevine nava heleqetîyên bedenî, homosêksûalîst bin, ya ku bi şaşî çawa "zewac" tê navkirinê, bi alkoholê serxweş bin, marîxûnayê, yan jî narkotîkên başqe bidine xebatê, progiramên bênamûsî û necayîz, fîlm û vîdêoyên wî cûreyî temaşe bikin û gelek tiştên mayîn. Feqet ev hemû tişt dijî temîyên peymana Nû ne.

## Normên Ezmîn

Lê gelo peymana Nûda temî hene? Belê, bi rastî, peymana Nûda ji 5OO-î zêdetir temî derheqa azabûna ji fikirdarî û kirên şaşda hene. Pawlosê şandî ew meriv e, yê ku derheqa kerema Xwedê da eyantîya mezin stend. Ew dinivîse:

> "Ne sinetbûn tiştek e û ne jî nesinetbûn, lê serî temîyên Xwedê qedandin e" /A Korintî 7:19/.

Mînak, Xwedê zelal dibêje, wekî heleqetîyên bedenîye ji zewacê der ne tenê tên qedexekirinê, lê ewê usa jî teslîmî dîwanê bibin. Ev beş xeberên vala nînin:

> "Çimkî hûn gerekê vê yekê zanibin, wekî ew merivê ku nava fikir yan jî jîyana xweda, qavîyê û heramîyê dike…padişatîya Mesîh û Xwedê da war nabe. Îzinê nedin tu kesî, ku bi xeberên

> pûç û menîyên bêhîmva [derheqa van gunehada] we bixapîne, çimkî rûyê van tiştada hêrsa Xwedê li ser van merivên neguhdar radibe" /Efesî 5:5,6, AMPC/.

Û careke mayîn:

> "Xwedê wê ese dîwana wan meriva bike, yên ku bêesil in û wana, yên ku bênamûsîyê dikin" /Îbranî 13:4, NLT/.

Ew xeberên ku hinekî pêşda we xwendin, ne tenê derheqa heleqetîyên bedenîye ji zewacê der in, lê usa jî derheqa pornografîyayê û her heleqetîke wî cûreyîda nin. Û merivê çawa vî hemû tiştî bizanibin, eger em derheqa vê yekêda dannasîn nekin? Gelo em bi rastî hindava van merivada hizkirinê didine kifşê, eger em van rastîya ji wana vedişêrin?

Xwedê zelal dibêje, wekî ew meriv, jîyana kîjanada bêesilî, homosêksûalîzm, dizî, serxweşîya ji alkoholê /dikeve nava kîjanê usa jî xebitandina narkotîka/ û kirên mayîn hene, yên ku roja îroyîn nava civaka meda bona geleka tiştên qebûlkirinê ne, wê padişatîya Xwedê war nebin:

> "Çima hûn fem nakin, ku yên neheq wê padişatîya Xwedê war nebin? Xwe nexapînin! Ewên ku xwe didine bênamûsîyê, yan jî pûtparistîyê, yan jî zinêkarîyê dikin, yan jî qunde ne, yan jî konene, yan jî diz in, yan merivên tima ne, yan jî serxweş in, yan jî şerûd in, yan jî meriva dixapînin: ji vana tu kes wê padişatîya Xwedê war nebe" /A Korintî 6:9,1O, NLT/.

Merivên qanûnparêz rûyê hizkirina rast û tunebûna rehmêda zyaneke mezin gîhandine meriva. Wana fikir û qanûnên xwe li ser gotinên peymana Nû zêde kirine, bona ku meriva berbi wê yekê defdin, ku ew bi xwestina xwe bikin. Feqet diqewime me bi cûrê gelekî berk hukumî li ser vê yekê kirîye, bi wê derecê, wekî em îdî temîyên Îsa dannasîn nakin, yên ku, yan raste-rast ji alîyê Wî da, yan jî bi rîya kitêbên şandîyên Wî, derbazî li me bûne.

Van axirîya, li civîneke mezine eyan, min ev xebera kitêba A Korintîya dannasîn dikir. Piştî mîyaserkirina çend qulixdarîya, serwêrê wê civînê got, wekî wextê qulixdarîyên mayîn ezê îdî derheqa têma homosêksûalîzmêda bîr neynim. Tiştekî pêkenînîyê bû, wekî hema wî çaxî xebatkareke polîsîaêye jin, ya ku îdî ji 2O salî zêdetir bû ku jîyana bedenîye yekqismê derbaz dikir, hêsir çavada, nêzîkî me bû û got: "Minra ew kitêb lazim e, derheqa kîjanêda ewî îro êvarê dannasîn dikir: "Qencî, yan Xwedê?". Îro Con bi rastî dilê minra xeberda".

Merivê çawa normên ezmîn nas bikin, eger em fîlosofîya qulixdarîyêye niha xweykin? Derheqa banga Yûhennayê Nuxumdarda bifikirin. Hînkirina wî dijî wan guneha ye, yên ku nava civaka rojên wîda ser diketin. Ewî temî didan wan meriva, yên ku hebûk berev kiribûn, tevî feqîra nîvekar bin, dizara digot ku terka dizîyê bidin, ewên ku meriv ditirsandin, wanra digot ku terka tirsandinê bidin, lê xebatkarara jî digot ku bi miaşa xweva razî bin /binihêre Lûqa 3:1O-14/.

Meriv diçûn qûmistanê, li kîderê qewilên berk bûn bona ku guhdarîya wî bikirana, çimkî xwestina wane guhdarkirina rastîyê hebû. Peyî guhdarkirina Yûhennara, meriva caba banga wî didan û tobe dikirin. Wana hema wî cûreyî rast dikir, çawa ku wextê wê berevbûna civînê xebatkara polîsîyaêye jin kir, ya ku derheqa encamên jîyana xweda haj pê tunebû.

Yûhennayê Nuxumdar eşkere gote padişê Cihûdayê, Hêrovdês, wekî ewî qanûna Xwedê diteriband, wextê ku ew tevî jina birayê xwe dikete nava heleqetîyên bedenî û piştî hinek wede bona dannasînkirina rastîyê serê wî jê kirin. Yûhenna nedicêriband ku wî serwêrê hukumdar bide razîkirinê, feqet ewî hurmet dest anî. Eger Yûhenna eşkere dijî gunehê Hêrovdês derneketa, jîyana wî wê diha dirêj bûya. Feqet, derheqa encamên wededirêjda bifikirin. Piştî hinek wede, Îsa li ber elaleta mezin qedirê Yûhenna girt /binihêre Metta 11:7-15/, û em tenê dikarin bînin ber çavê xwe, ku roja Dîwanê ewê heqê heta-hetayêyî çawa bistîne. Yûhenna bi helalî norma Ezmîn, ya bo merivên undabûyî xweyî kir.

Pawlos peyî vê mînakê çû û hema dîsa ew tişt dannasîn kirin. Banga wîye zelal bona undabûyîya hebû: “Hemû kes gerekê tobe bikin, berbi Xwedê vegerin û bidine kifşê, wekî ew bi wan kirên qencva hatine guhartinê, yên ku ew dikin” /Karên Şandîya 26:2O, NLT/. Ewî temî da Tîmotêyo:

> “Tu, çawa terîfkirê Xeberê, gerekê nîşanî meriva bidî ku çi cûreyî jîyana wan şaş e” /B Tîmotêyo 4:2, AMPC/. Ewî temî da qulixçîkî mayîn: “Bi temamîya serwêrtîya xwe li wan hilê” /Tîto 2:15, NLT/.

Pawlos her berdaxustinek hesab hilnedida. Carekê mecaleke gelekî baş bona wî pêşda hat, ku Mizgînîyê bona nevsekî dewletêyî hukumdar û merivekî gelekî zengînî bi navê Felîks û jina wî Drûsîlayê dannasîn bike. Ev şandîyê mezin bona wana ne tiştekî piştgirîyê, ne jî lêhilatinê got. Dewsa wê yekê nivîsar e:

> “Bi anîna Pawlos, hetanî ku ewî derheqa bawarîya hindava Îsa Mesîhda gilî dikir, wana guhdar dikir. Wextê ku ewî derheqa heqîtîyê, xweserkarîkirinê û dîwana ku wê bê xeber dida, Felîks tirsîya. “Niha here, - ewî got,- wextê ku lazim bibe, ezê careke mayîn gazî te bikim”” /Karên Şandîya 24:24, 25, NLT/.

Tercima /AMPC/ diha zelal e: “Feqet wextê ku ewî derheqa heqîyêda, paqijaya jîyanê /kontrolkirina xwestina/ û dîwana ku wê bê, xeberda, Felîks tevlîhev bû û tirsîya, ewî got here”.

Wextê ku em serpêhatîyê bi temamî dixwînin, em didine zelalkirinê, wekî Felîks gazî Pawlos kiribû, çimkî ewî dixwest derheqa Xwedê û jîyana wanda bibhîsta. Bêyî şikberî, wî merivî dixwest, ku heleqetîyên wîye tevî Efrandar hebin. Wî merivî em dikarin himberî merivekî roja îroyîn bikin, yê ku Xwedê digere, bi wê yekêva hewaskar e, xilazbûyî nîne û diçe civînê. Ber cava ye,wekî dannasînkirina Pawlos dijî wan gunehên wî bû, yên ku Felîks nedixwest berdana, çimkî ew *tirsîya* û Pawlos paşda şand.

Ew hal roja îroyîn dikaribû wî cûreyî bibûya: bînin ber çavê xwe, wekî bêbawarekî hukumdar ji civînê derdikeve û dibêje: “Ezê paşda neçime li wir: wê bangê ez tirsandim”. Bona çi ew gerekê bitirsîya. Diqewime menî ew e, wekî ew naxweze wî gunehî berde, yê ku dijî wê bangê ye?

Eger Pawlos anegorî fîlosofîya Rojavayêye îroyîn dannasîn bikira, banga wî wê vî cûreyî bûya: “Felîks, Xwedê te hiz dike. Ewî Îsa şand ku bona te bimire, ku tu xilazbûyî bî. Tê bixwezî Wî dilê xweda qebûl bikî? Eger erê, vî duayî tevî min biwekilîne: “Îsa, were nava dilê min û min bike kurê Xwedê””. Û hemû tiştê bi vî cûreyî ser hevda bihata.

Feqet, gotinên Pawlos Felîks tirsandin. Pawlos zanibû, wekî Felîks dikaribû bibûya mesîhî, eger ewî ji wan guneha tobe bikira, yên ku ewî bi zanebûn dikirin. Eger Pawlos *duayê merivê gunehkar* tevî Felîks dua bikira, piştî banga piştgirîyê û nelêhilatinê, Felîksê *xapîyayî* bûya. Ewê bi dil bawar bikira, wekî ew *careke mayîn xuliqî bû*, lê bi rastî ewê çawa *pûtparistê nexilazbûyî* bima.Wî çaxî Pawlosê îzin bida, ku kevirê krîpton biketa nava civînê. Feqet, çawa qulixçîyê helal, yê Îsa Mesîh, ewê tu cara tiştê usa nekira.

Ez zanim, wekî ev hemû tişt mêriv dide hişyarkirinê, lê roja îroyîn, em çawa baylozên Mizgînîyê, gerekê ji wî cuda nebin.

## gava praktîk

Piranîya civînên roja îroyîn li ser wê yekê hatine çêkirinê, wekî pêşniyarî meriva dikin, ku “Duayê gunehkar” biwekilînin, yê ku dide kifşê ku qurbanîya Îsaye bona gunehên me qebûl bikin û Wî teglîfî nava dilê xwe bikin. Bînin ber çavê xwe, ku civîna we wê çi cûreyî bûya, eger koma rêbera meriv teglîf bikirana, ku ew tobe bikin û berbi Xwedê vegerin. Bi fikira we, çend meriv wê bimana?

Diqewime ev yek hêrsa geleka rake, bi taybetî ya rêberên civînê, lê bînin

ber çavê xwe, ku yên mayîn wê çi cûreyî bûna. Hişyarbûna ewline Mezin, bi wê yekêva cuda dibû, wekî terîfkirên hişyarbûnê ji civînekê diçûne civîneke mayîn, bona ku tobekirin dannasîn bikirana. Ew bi wê yekêva cuda dibû, wekî ewên ku ev bang guhdar dikirin, xwe ji kursîyava digirtin, yan jî diketin û tobe dikirin, dikirine qîrîn, yan jî digirîyan û reca Xwedê dikirin ku wana xilaz bike. Hema ev merivên bi hezara bûn, ku ev dinîya guhartin. Hemû bajar guneh berdan û berê xwe dane Xwedê. Diqewime terîfên derheqa tobekirinêda civînên me vala bikin, lê usa jî diqewime, wekî civîn tijî bibin. Hîvî ji Xwedê bikin, ku ew qewata tobekirinê weva eyan bike, paşê dua bikin, wekî Ew vê qewatê nava jîyana weda û civîna weda bike rastî.

21

# SÊ PADIŞA

Bona nivîsara vê kitêbê ez ruhdar bûm, wextê ku min cara bi sirê şeş kitêbên ji peymana Kevin careke mayîn xwendin. Nava van çil salên axirîyêda, min gelek cara kitbên Padişatî û Dîrok xwendine û lêkolîn kirine. Lê van axirîya min bi guhdarî û bi dua ew lêkolîn dikirin. Ez zendegirtî mam, wextê ku Xwedê çavên min li ser tiştekî vekirin, çi ku min pêşda nedîtibû.

Ev yek dikare hinekî çawa tiştê akadêmî û pêra jî yê westandinê bê texmînkirinê, lê ezê zelal wê yekê bidime kifşê, çi ku min nava van kitêbada dît, lê bêyî bi kurtayî tomerîkirina jîyana padişên peymana Kevin, hukumê gotinên min wê zeyîf be. Rastîke hukumdar heye, ya ku wextê tomerîkirina jîyanên wan eyan dibe. Hêsa nîne ku wê yekê bibînin, wextê ku em bi sirê van şeş kitêba dixwînin, bona gelek serpêhatîyên nava wanda.

Berê, wextê ku min ev kitêb dixwendin, min her dem hesab dikir, wekî du cûrên padişa hebûn: ewên ku “li ber Xudan heqîtî dikirin”, û yên “pûtparist”. Feqet min fem kir, wekî bi rastî *sê* cûrên padişa hebûn.

Çi ku derheqa padişên Îsraêlêda ne, ji wana tu kes li ber Xudan heqîtî nekir, xêncî Yahû, lê dawîya jîyana xweda, mixabin, ew jî ji rastîyê xalifî. Dêmek, werin em derheqa Cihûdayêda xeberdin. Piştî Şaûl, Dawid û Silêman, li Cihûdayê bîst padişa padişatî kirin. Rehobowam, Ebîya (Abiyam), Yoram, Vokozîya, Atalya /padişa jin/, Ahaz, Minaşe, Amon, Yehoahaz, Yahoyakîm, Yehoyakîn û Tsedekiya padişên pûtparist bûn. Hêna serkarîkirina van padişa Cihûdayê dijwarîyên mezin dîtin û ew ji alîyê neyarada hate êrîşkirinê. Ew êrîş, li ber kîjana Cihûdayê gelek cara nikaribû ber xwe bida, zirareke mezin gîhandine welêt.

Padişên Cihûdayêye mayîn bi heqîtî şuxulîn /Dawid û Silêman jî bi heqîtî

şuxulîn, nenihêrî wê yekê, wekî Silêman salên dawîda paşda vekişîya/. Piştî parçebûna padişatîyê, Asa, Yêhoşeft, Yoaş, Amatsya, Ûzîya (Azarya), Yotam, Hezeqêl û Yoşiya padişên heq bûn. Feqet, van heyşt padişa jî meriv dikare pareveyî ser du koma bike. Koma ewlinda ew padişa bûn, yên ku nava jîyana xweye şexsîda li ber Xudan heq bûn, lê wana bilindayên bona pûtparistîyê têradîtî, yên nava wê cimetêda ku wana serwêrî lê dikir, xirab nedikirin.

Koma mayînda ew padişa bûn, yên ku ne tenê nava jîyana xweye şexsîda li ber xudan heq bûn, lê wana usa jî ew bilindayên bona pûtparistîyê têradîtî, yên nava cimeta xweda, xirab dikirin, tune dikirin. Hêna serwêrtîya van padişada, açixîya welêt ji wedê wan padişa cuda dibû, kîjana ew bilindayî xirab nedikirin.

Em niha her yekî binihêrin:

1. Dawid: Hêna padişatîya wî, li welêt pûtparistî tune bû. Ew bi cecandin ber dilê cimetêda dihat, ku ew bi temamîya dilê xwe, fikira xwe, şexs û bedena xweva qulixî Xudan bikin. Ew nava şerada bin nediket, û padişatîya wî gelekî dewlemend bû. Ewî padişatîya gulvedayî derbazî kurê xwe kir.
2. Silêman: Nava temamîya wedê padişatîya xweda, Silêman bi rêça bavê xwe-Dawid diçû. Encamên şikestîbûna wî ne tenê nava jîyana wîda, lê usa jî bindestîyên wîda balşkêş bûn. Nivîsar e: “Saxîya Silêmanda temamîya Cihûdayê û Îsrayêl nava aşîtîyê û çareserîyêda dijîtin. Û ji Dan -Bakûr, hetanî Bad -Şeb, li başûr, her malbetek mala wan û baxçên wan hebûn” /G Padişatî 4:25, NLT/. Derheqa vê yekêda bifikirin: tu kes hewcê piştgirîya hukumatê nîbû, çimkî welat gelekî dewletî bû. Serwêrtîya wî ewqasî berbiçav bû, ku “padişên hemû welata baylozên xwe dişandin, bona ku serwaxtîya Silêman guhdar bikirana” /G Padişatî 4:34, NLT/. Û “ji hemû mileta dihatin, ku şêwirekî ji wî bistînin û serwaxtîya wî guhdar bikin, ya ku Xwedê dabû wî” /G Padişatî 1O:24, NLT/. Usa jî nivîsar e: “Açixîya wî nava hemû tiştîda hebû û temamîya Îsraêlê gura wîda bû” /A Dîrok 29:23,NLT/. Cimeta welêt nava bereketa mezinda bû: “Padişê mînanî kevir zîv û zêr li Orşelîmê zêde kirin û darên merxêye giranbiha ewqasî belavbûyî bûn, çiqas darên hêjîraye beyanî bûn, yên ku li çolên Cihûdayê dighîştin” /B Dîrok 1:15, NLT/.

   Feqet, paşwextîyê Silêman gura Xwedêda nema û gelek jinên ji miletên başqe sitendin.Wana dilê wî birine berbi xwedêyên bîyanî /gunehê bi zanebûn/ û paşê Xudan dijmin rakirin, yên ku bona pêşkeftina Silêman dijwarî pêşda anîn û nava padişatîyêda pirsgirêk pêşda hatin /binihêre A Padişatî 11:14, 23/. Rûyê wê yekêda, ku Silêman gura Xwedêda nîbû, padişatîya wî parçe-parçeyî bû: tenê du eşîr gihîştine kurê wî, lê dehên

mayîn unda bûn.

Niha ezê tenê navên padişên Cihûdayê bidim:

3. Rehobowam: Li ber Xudan bi heqîtî pêşda nehat.
4. Ebîya (Abiyam): Li ber Xudan bi heqîtî pêşda nehat.
5. Asa: Ew bi cedandin peyî Xwedê çû. Ew ne tenê bi heqîtî li ber Xwedê nava jîyana xweye şexsîda bi heqîtî şuxulî, lê pêra jî bi mêrkîmî pûtparistî nava cimeta xweda eşkere kir û tune kir. Ewî mêr û jinên paristgehêye xwefiroş derxistin, hemû pût dane dûrxistinê û pîrika xwe Maaka ji tabîya wê derxist, çimkî ewê heykelê Astarovfte elîwat çêkiribû /binihêre G Padişatî 15:11-13/. Ewî hemû gorîgehên xerîb û bilindcîhên necuhîya dûrxistin, heykelên wan şikênandin û cîhê zyaretên necuhîya ji hemû bajarên Cihûdayê derxistin. Asa bangî cimeta Cihûdayê kir ku ew tobe bikin. Ewî emir kir, ku Xudan bigerin û gura qanûn û temîyên wî bikin /binihêre B Dîrok 14:2-4/.

   Emirkirina wîye bona berdana guneha encamên baş sitedin: "Padişatîya Asa hinek wede nava edilayêda bû" / B Dîrok 14:5/. Nava wan salên edilda ewî karibû nava temamîya Cihûdayêda bajarên bi sûrava dorgirtî çê bike. Tu kes necêriband nava wî wedeyîda dijî wî şer bike. Paşê eskerekî ji mîlîonek leşkera êrîş anî li ser Asa û Cihûdayê, lê nivîsar e: "Ew ji alîyê eskerê Xudan û Wî da hatine tunekirinê û eskerê Cihûdayê bi talanekî mezin paşda vegerîya" /A Dîrok 14:13,NLT/. Xêncî wê yekê, wekî neyarên wan bin ketin, nava encamên êrîşa wanda Cihûdayê hebûkeke mezin dest anî.

   Em zelal dibînin, ku duakirina vî rêberî çi cûreyî ye, yê ku ne tenê gura Xwedê kir û gunehê bi zanebûn berda, lê pêra jî bangî wê cimetê kir, serwêrtîya kîjanê ewî dikir, ku ew jî mînanî wî bikin.
6. Yêhoşefat: Ew jî bi heqîtî li ber Xwedê şuxulî, him nava jîyana xweye şexsîda, û him jî nava serkarîkirina xweda. Ewî bangî cimetê kir, ku ji pûtparistîyê paşda vegerin /ji gunehê ku bi zanebûn dihate kirinê/. Ewî ji welêt mêr û jinên xwefiroşe mayî derxistin /binihêre G Padişatî 22:47/. Ewî bilindcîhên necuhîya û kelayên Astaroft ji Cihûdayê dûrxistin / binihêre B Dîrok 17:6/. Nava sala sisîyada, ya padişatîya xweda, ewî meriv bona hînkirinê şandine hemû bajarên Cihûdayê.Wana mînakên qanûna Xudan hildan û çûne hemû bajarên Cihûdayê ku cimetê hîn bikin.

   Gelo serkarîkirina Yêhoşefat feydayên çawa pêşda anîn? "Wî çaxî tirsa Xudan peîyayî li ser padişayên dor-bera jî bû û ji wana tu kesî nedixwest dijî Yêhoşefat şer elam bikira. Ji filistînîya hineka jî pêşkêş bona wî anîn… Û Yêhoşefat diha zêde û zêde qewat bû" / B Dîrok 17:1O-12,

NLT/. Peyî wê yekêra nivîsar e : "Yêhoşefat xweyê hebûk û navê mezin bû" / B Dîrok 18:1,NLT/. Gelek esker êrîş anîne li ser wî û Cihûdayê, lê Xwedê usa kir, wekî ew esker destpê kirin nava hevda hev tune bikin û nava encamê wê yekêda Cihûdayê hebûkeke mezin xwera anî.

Peyî wî hemû tiştîra nivsar e: "Û Xudan serwêrtîya Yêhoşefat li ser padişatîya Cihûdayê îzbat kir. Ew bû yekî gelekî dewletî û bi navekî mezin. Ewî bi kûrayî xwe pêşkêşî rêyên Xudan kiribû" /B Dîrok 17:5, 6, NLT/.

Ewî şaşîke mezin kir, wextê ku tevî malbeta Ahabê padişê pûtparist peymana tifaqê mor kir. Hindik mabû ku ew rûyê wê yekêda bihata kuştinê, lê nava encamê wê yekêda xeysetê kurê wî heram bû. Pêxemberekî bi navê Yahû li wî hilat: "Bona çi tu alî wan neheqa dikî û wana hiz dikî, yên ku Xudan hiz nakin" /B Dîrok 19:1,2, NLT/. Feqet Yêhoşefat û Cihûda, bi tomerî hildayî, nava encamê gurêdabûna Wîda gulvedan, pêşda çûn, ya ku dida kifşê, wekî şerkarîya dijî gunehê /pûtparistîyê/ dihate mîyaserkirinê.

7. Yoram : Li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.
8. Vokozîya : Li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.
9. Atalya / padişa jin /: Li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.
10. Yoaş : Derheqa wîda nivîsar e: "[Ew] usa şuxulî, ku li Xudan xweş hat" /B Dîrok 24:2, NLT/. Feqet çawa serwêrê welêt, ewî lap cûrekî mayîn kir. Ewî ew bilindcîh, kîjanada meriva pût diparastin, xirab nekirin, bangî wê cimetê nekir, serwêrîya kîjanê ewî dikir, ku ji gunehên xwe paşda vegerin. Nivîsar e, wekî piştî hinek wede "Rêberên Cihûdayê… ew anîne li ser wê fikirê, ku ew guhdarîya şêwira wan bike. Wana qirar kir, ku paristega Xudan bihêlin…û dewsa wê yekê wana heykelên Astarofta û pûta hebandin /B Dîrok 24:17, 18, NLT/.

   Ew kete bin hukumê wê cimetê, li ser kîjanê ewî gerekê hukum bihişta. Nivîsar e, wekî "rûyê wî gunehîda hêrsa xwedêtîyê hate ser Cihûdayê û Orşelîmê" / Xeber 18,NLT/. Pêxemberek hate li cem wî û gotê: "Bona çi hûn gura temîyên Xudan nakin û bi xwe îzinê nadin ku hûn pêş bikevin?" /Xeber 2O, NLT/. Û dawîyê, "bihara sala îsalin… eskerê Aşûra hate dijî Yoaş. Wana… hemû serwêrên welêt kuştin… [birin] talan tevî xwe, berbi…Şamê… Aşûra bi eskerê hindik êrîş kirin. Xudan alî wan kir, ku ew hindava eskerê Cihûdayêyî mezin ser bikevin… Û dijî Yoaş dîwan hate kirinê" /xeber 23,24 NLT/. Ew wî çaxî birîndar bû, lê paşê hate kuştinê. Ji ser text ketina Yoaş dide kifşê, ku rêber dijî gunehê cimetê derneket û ev hemû tişt bûne encamên tabîya wî cûreyî.

11. Amatsya: Nivîsar e: “Amatsya jî bi cûrê baş şuxulî ku li Xudan xweş bê, lê ne bi temamîya dilê xweva” /B Dîrok 25:2, NLT/. Ewî “gorîgehên necuhîya xirab nekirin, û cimetê hela hê wanada qurban didan” /D Padişatî 14:4, NLT/. Encamên wê yekê bona padişatîyê gelekî xirab bûn. Amatsya hindava Edovm da ser ket û gelekî kubar bû. Kubarîya wî usa kir, ku ew dijî padişê Îsrayêlê Yoaş şer elam bike. Yoaş eşaretî da wî, ku ji welatê wî dûr bimîne. Amatsya guhdar nekir, û li ber eskerê Îsrayêlê bin ket. Ew dîl ket. Îsraêlîya 18O mêtr ji sûra Orşelîmê xirab kirin û temamîya zêr, zîv û hebûka paristgeha Xudan xwera birin. Îsraêlîya xiznên sera padişatîyê hildan û pêra jî gelek meriv dîl birin. Amatsya hate kuştinê /binihêre B Dîrok 25:11-28/. Em careke mayîn dibînin, wekî halên wî cûreyî bona wî rêberî kardar nîbûn, yê ku ew tişt kirin, çi ku li Xudan xweş dihatin, lê ew li ber gunehên bindestîyên xwe teyax nekir.
12. Ûzîya (yan jî Azarya): Ew jî bi cûrekî usa şuxulî ku Xudan xweş dihat, û çimkî ew hela hê Xudan digerîya, Xwedê gulvedan dida wî. Ew bû yekî gelekî hukumdar û açix. Nenihêrî wê yekê, wekî derheqa wê yekêda nivîsar nîne, ku ewî hindava cîhên pûtparistîyêda çi dikir, em zanin, wekî ew rûyê kubarîyêda hate kuştinê.
13. Yotam: Derheqa vî padişayîda gelek tişt nivîsar nîne. Ew jî bi cûrê lêxweşhatinê hindava Xudan da dişuxulî, lê cimet dîsa bi rêyên xweye herambûyîva diçû. Mixabin, “Ewî cîhên zyaretên necuhîya xirab nekirin û cimetê hela hê wanda qurban didan” /D Padişatî 15:35, NLT/. Nava encamên wê yekêda, “wan roja Xudan padişê Aşûr Resîn û padişê Îsrayêlê Pekah bona êrîşkirina li ser Cihûdayê şandin” /D Padişatî 15:37, NLT/.
14. Ahaz: Ew li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.
15. Hezeqêl- Bavê Hezeqêl, Ahaz, padişakî gelekî neheq bû. Ewî dergehên paristgehê girtin û bi temamî dawîya hebandina rast anî. Hezeqêl berê ewlin dergehên paristgeha Xudan vekirin, hemû derdanên qirêjbûyî paqij kirin û avayê paristgehê çêkir. Derheqa wîda nivîsar e: “Ewî jî usa kir ku li Xudan xweş bê, çawa ku kalikê wî Dawid. Ewî gorîgehên necuhîya dûrxistin, sitûnên wan xirab kirin û heykelên Astaroft şikênandin. Ewî ew mahrê ji sifir çêkirî hûrxweşî kir, yê ku Mûsa çê kiribû, çimkî cimeta Îsrayêlê qurban didane wî” /D Padişatî 18:3, 4, NLT/. Peyî wê yekêra, ewî careke mayîn cejina Xudan îzbat kir. Ew yek qewimandineke mezin bû, û wextê ku ew ser hevda hat, meriv paşda vegerîyan “hemû bajarên Cihûdayê, Binyamîn, Efrayîm û Minaşe û wana hemû sitûn tune kirin, hemû heykelên Astaroft şikênandin û cîhê cuhîyaye zyaretî û gorîgeh dûrxistin” /B Dîrok 31:1, NLT/.

Derheqa Hezeqêlda nivîsar e: “Ew nava hemû tiştên Xudanda amin ma, û fesal gura hemû temîyada ma, yên ku Xudan dabûne Mûsa. Û Xudan tevî Wî bû, û Hezeqêl nava hemû karên xweda açix bû” /D Padişatî 18:6, 7, NLT/. Aşûr êrîş bire li ser wî welatî, lê milyaketê Xudan çû li cem wan û 185OOO hezar leşkerên Aşûrê kuştin. Hezeqêl dijî gunehê bi zanebûn, yên bindestîyên xwe, şerkarî kir, û him ew û him jî cimeta wî pêşda çûn.

16. Minaşe: Li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.
17. Amon: Li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.
18. Yoşiya: Ew padişakî bi prînsîpîyalî şikestî bû, him nava jîyana xweye şexsîda, him jî nava serkarîkirina xweda. Derheqa wîda nivîsar e: “Padişê xwend [bona temamîya cimeta Orşelîmê û Cihûdayê] temamîya Kitêba Peymanê, ya ku li paristgeha Xudan hatibû dîtinê” /D Padişatî 23:2, NLT/. Peyî wê yekêra ewî peyman çêkir û emirî li ser kahîna kir, ku ji paristgeha Xudan wan hemû tişta derxin, yên ku bona hebandina Bahel, Astaroft û hemû eskerên ezmana dihatine xebitandinê. Ewî ew hemû tişt şewitandin û komira wana li ser mexberên pûtparista reşand.

    Vî padişayî gelek tişt kirin, ku ji gurênedabûna bi zanebûn azad bibin. Min ew hemû beş dane dîyarkirinê, kîjanada nivîsar e, wekî Yoşiya “derxist, şewitand, da sekinandinê, hûrxweşî kir, kire komir, xirab kir, heram kir /yan jî tune kir/”, û hemû xeberên mayîn, yên ku li Cihûdayê bona şerkarîya dijî gunehê ku bi zanebûn dihate kirinê, dihatine xebitandinê. Serê kitêba D Padişatî 23-ada 24 qewimandinên wî cûreyî hatine dîyarkirinê. Derheqa vî padişayîda nivîsar e: “Pêşda tu cara padişê mînanî Yoşiya tunebûye, yê ku bi temamîya dilê xwe, şexs û qewata xwe berê xwe da Xudan, bi hemû qanûnên Mûsa gurêda ma. Û peyî wîra padişê mînanî wî tunebûne” /D Padişatî 23:25, NLT/. Hêna wîda him ew, him jî cimet nava gulvedanêda bûn.

19. Yehoahaz: Li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.
20. Yahoyakîm: Li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.
21. Yehoyakîn: Li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.
22. Tsedekiya: Li ber Xudan bi heqîtî neşuxulî.

Werin em serpêhatîyên van padişa bidine tomerîkirinê. Ew rêber gulvedana wededirêj dîtin, jîyana kîjana li Xudan xweş dihat û wana dijî gunehên /pûtparistîyê/ şerkarî dikirin. Hal usa jî kardar nîbû, wextê ku rêber jîyana xwedêparêz derbaz dikir, lê dijî gunehên cimetê dernediket.

Roja îroyîn civîn gerekê ji vê yekê dersa hilde. Emê rastî dijwarîya bên, eger em hîvî ji merivê ku cara ewlin hatîye civînê bikin, ku duayê gunehkar dua bike, û wê yekê çawa perde bide xebatê û em banga tobekirinê nekin. Ewê çawa bibe,

eger ew merivên tezehatî hazir nabin gunehên xwe berdin? Usa dertê, wekî em pûtparista teglîfî ola xweye civînê dikin.

Em, rêber, dikarin nava jîyana xweye şexsîda xwedêparêz bin, lê eger em dijî “bilindcîhên gunehê”, yên nava jîyanên merivada dernekevin, wê dîsa usa bibe, çawa ku nava jîyanên wan padişada qewimî. Diqewime em bighîjine açixîya wedekurt, lê emê negihîjine dawîya açix. Ji wan padişa çend meriv, yên ku dijî van tişta şerkarî nedikirin, pêşda açix bûn, lê paşê ew rastî encamên rêberîya bi kêmasîya hatin.

Eger em wê rêyê bibijêrin, ya ku wextê belavkirina Mizgînîyê miqabilderketina pêşda nayne, emê bi merivên pûtparistva bên dorgirtinê, yên ku bawar dikin ku ew li ber Xwedê rast in. Wî çaxî emê civîna xwe bona kevirê krîptonî ruhanî bikine nîşangeh.

## gava praktîk

Meriv dikarin şikilê tomerî unda bikin, wextê ku guhdarîyê didine li ser tiştên hûrik. Meselek heye: “Em mêşe unda dikin, wextê ku dicêribînin dara xilazkin”. Ev yek usa jî wextê lêkolînkirina Xebera Xwedê dikare biqewime, bi taybetî eger em êtapên dîrokîye mezin lê dinihêrin. Feqet, lêkolîna têmatîk û wede, çawa nava vî serê kitêbêda, tiştên usa nîşanî me didin, yên ku meyê cûrekî mayîn nedîta. Em şikilê tomerî dibînin.

Şikilê dîroka Îsrayêl û Cihûdayêye tomerî ew e, wekî Xwedê pêşkeftin dida wan rêbera, wextê ku wana diha zêde dikir û cabdarîya rast nava hemû govekada hildidane ser xwe, nava kîjanada Xwedê serwêrtî dabû wan.

Diqewime hûn padişa nînin. Dibek hûn li cîhê xebata xwe serwêr jî nînin. Feqet, dorana weye hukum heye, kîjanêda Xwedê serwêrtî daye we. Ew yek, ku bi çiqasîva hûnê cabdarîyê ne tenê nava jîyana xweye şexsîda hildine ser xwe, lê usa jî nava dorana hukumê weda, wê qirar bike ku Xwedê wê çawa bona we bişuxule. Hîvî ji Xwedê bikin, ku ew dorana hukumê we nîşan bide, usa jî serwaxtîyê bide we, we hîn bike ku hûn çawa cabdarîyê hildin ser xwe û nava wê yekêda heqîtîyê îzbat bikin. Wî hemû tiştî binivîsin, çi ku Ew dibêje we, lê paşê progiram bikin, ku hûnê wê yekê çawa bikin.

KEVIRÊ KRÎPTON BIŞKÊNIN

# BEŞA ÇARA

22

# RÛBIRÛKIRIN

Werin em şuxulkarîya xirabkirina kevirê krîpton destpê bikin, him bi şexsî, him jî çawa ola civînê. Berê ewlin em tevî wan encama "Rû bi rû bisekinin", yên ku dema em ewê prosêsa mirinê hesab hilnadin, pêşda tên.

Wextê ku min mekteba navînda dixwend, em bi borcdarî tevî dersên durojeye derheqa narkotîkada dibûn, wextê kîjana wana encamên xirab raberî me dikirin, yên ku rûyê xebitandina narkotîkada pêşda tên. Pêşîya rasthatina tevî Mesîh, nava wan salada, wextê ku ez tevî êvarîyên hertimî dibûm, ez ji her cûre narkotîka dûr dimam: menî ew bû, wekî ez ji encamên wan ditirsîyam.

Bêyî şikberî, tirseke nesaxlem heye, ji kîjanê Îsa em aza kirin. Feqet, usa jî xofa xwedêtîyê heye, ya mînanî wê texmînkirinê, ya ku li mektebê li cem min pêşda hat, wextê ku ez derheqa narkotîkada pê hesîyam. Ev tirs me ji wî hemû tiştî xweyî dike, ya ku dikare jîyana me ji me bistîne. Xebera Xwedêda nivîsar e: "Çawa ku sozê bona ketina nava rihetîya Wî hê dimîne, werin em bitirsin, ku ji we tu kes ji wê rihetîyê nemîne" /Îbranî 4:1, NKJV/, û "Bi tirsa Xudan merivê ji xirabîyê dûrkeve" /Mesele 16:6/.

Nava evî serê kitêbêda ezê derheqa rêberên mesîhîda xeberdim. Feqet, ev banga me gerekê me hemûyara hişyarbûnê bîne, çimkî bawarmend "serî"-ye, "lê ne ku xilazî"-ye /Qanûna Ducarî 28:13/. Em hatine gazîkirinê, bona ku bibine baylozên padişatîya Wî, û ew qulixeke girîng e.

Gelo em bin ronahiya kitêba Pîrozda, derheqa stratêgîya qulixa xweda fikirîne? Nava pirsa dijîderketina hindava wan bilindcîhên gunehê em bona çi dudilîne? Merivên ku dicedînin Xwedê naskin, li me dinihêrin, bona ku rastîyê

guhdar bikin. Feqet em derheqa wê yekêda xeber nadin, çi ku dijwarîya pêşda tîne, ku ew tevî Xwedê bikevine nava heleqetîyên bêqelp. Gelo em wana diparêzin? Lê em derheqa wê yekêda nefikirîne, wekî pêşerojêda em zyanê didine wan meriva, yên ku Xwedê digerin? Bona çi em gerekê wan meriva bixapînin, yên ku tên ku derheqa jîyana heta-hetayêda guhdar bikin.

Hema ew yek wê bê serê wan, çi ku hate serê Ancêlayê. Ancêlayêra hema destpêkêda jî rastî negotibûn û mêrkirina wê kete nava halê neqewîn û dijwar. Bona çi em dixwezin ku meriv bifikirin, wekî dikarin gunehên xweye hertimî xwera bînin, usa jî bînin nava heleqetîyên tevî Mesîh? Ew yek tiştê bûyînê nîne. Tiştê usa dibe, wekî em eleqeta usa pêşniyar dikin, ya ku bi rastî tune? Dibe, wekî em xilazbûna feş pêşniyar dikin?

Werin em ji hemû alîyava vê pirsê binihêrin. Emê bibînin, wekî ewê encamên çawa bona wan meriva pêşda bîne, yên ku Xwedê digerin, bona wan rêbera, yên ku kevirê krîpton bîr naynin û usa jî bona ola civînê. Ji alîyê pêşerojêda, bona hersê koma jî ev encam yên undakirinê ne.

## Ewên ku Xwedê digerin

Em gerekê bîr bînin, wekî roja dîwanê ne ku çend meriv, lê *gelekê* bên cem Îsa, yên ku wê bi dil bawar bikin, wekî dikarin bikevine padişatîya Xwedê, lê wê van xebera guhdar bikin: “Ji Min dûrkevin, neheqno!” /Metta 7:23/.

Ev meriv kî ne? Evana ruhdarkir in, ji dînên başqe ne, yan ketine nava tela dînên başqe? Eger em xeberên Îsa lêkolîn bikin, emê bibînin, wekî ew meriv nava meda nin: ew diçine civînên me û dihebînin, wekî mesîhî ne. Ew dibêje: “Ne ku ewê ku Minra dibêje: “Xudan! Xudan!” wê bikeve Padişatîya Ezmana, lê ewê bikevê, yê ku emirê Bavê Minî Ezmana diqedîne” /Metta 7:21/. Îsa derheqa wan merivada dibêje, yên ku dibêjin, wekî Îsa Xudan e. Ne ku Cozêf Smît, Mehmed, Bûdda, Krîşna, Konfûsîos, Ran, yan jî pêxember û xwedêyê başqeye feş. Na xêr, îzina van meriva nedan ku ew bikevine Padişatîya Ezmana, yên ku Îsa Mesîh çawa “Xudanê” xwe nav dikin, û wê yekê bi cedandineke mezin dikin.

Bona çi nava vê gotinêda xebera “Xudan” dubare tê xebitandinê? Ez careke mayîn bêjim, çawa ku îdî hatîye kifşkirinê, wekilandina her xeberekê, yan jî gotineke nava Încîlêda badîhewa nîne. Feqet, ev mecal ne tenê dide dîyarkirinê, lê pêra jî êmosîyayên qewat dide kifşê.

Mînak, wextê ku Dawidê padişa pê hesîya, wekî eskerê Hovab kurê wî kuştibûn, ewî bi êmosîya gelekî berk kire qîrîn. “Û padişê bi her dû destên xwe

sifetê xwe girt û *bi dengekî bilind kire qîr*în: “Kurê min! Abîşalom! Abîşalom! kurê min! kurê min!” /B Padişatî 19:4/. Çawa ku tê texmînkirinê, Dawid xebera “kurê min” newekiland: qîrîna wî ya awqasî bi keder bû, wekî xudanê nivîsarê ew çendbare kirîye, bona ku xwendevan êmosîyayên wî fem bike.

Hema bi wî cûreyî Xudan nîşan dide, wekî nêzîkbûnên merivaye bi cedandin hindava Wî da hebûn. Ew ne tenê wê serwêrîyêra qayîl bûn, wekî Îsa Mesîh Kurê Xwedê ye, lê ew bi bawarîya xweva ketibûne nava wê yekê. Gilî derheqa wan merivada ne, yên ku bi şabûn nêzîkî mesîhîtîyê dibûn û derheqa bawarîya xweda bi şabûn xeber didan.

Ew ne tenê bi cûrê tam hînkirinên Mesîh qebûl dikin, lê usa jî ketine nava qulixa bona Wî:

> “Ez dikarim wê bibînim: Wê Rojê bi hezara meriv bi tabîya kubar nêzîkî Min dibin û dibêjin: “Xudan, me Bang dannasîn dikir: me cin derdixistin: me hemûya derheqa wan projeyada xeber dida, yên ku me ji Xwedê stendibûn”” /Metta 7:22, MSG/.

Xebera “Bang” dide kifşê, wekî meriv dîtindar nîbûn. Ew nava xebata civînada bûn, yan jî piştgirî didane wê xebatê. Ew jî çawa merivên usa eyan bûn, yên ku bawarîya xwe li Mizgînîyê dianîn: “Me Bang dannasîn dikir”. Bawar bikî, wana jîyanên meriva didane guhartinê.

Nava vê wergerêda xebera “bi hezara” hatîye nivîsarê, lê nava hemû wergerada xebera “geleka” tê xebitandinê. Nava zimanê yûnanîda ev xeber, xebera “polyûs” e, şirovekirina kîjanê “reqema mezin, çapa mezin û gelek” e. Ev xeber gelek cara bi fikira “bi piranî” tê xebitandinê. Îsa her car derheqa koma merivaye biçûkda nabêje, lê derheqa gelekada û diqewime piranîyêda dibêje.

Werin em vê yekê tomerî bikin: Îsa derheqa wan merivada dibêje, yên ku bawarîya xwe li hînkirinên Mizgînîyê tînin: ew meriv Îsa çawa Xudan nav dikin, ew nava xebatêda nin, banga Mizgînîyê belav dikin û nava qulixa mesîhîtîyêda nin. Emê bi hêsanî wana çawa mesîhîyên rast nav bikin. Dêmek, ew ji bawarmendên rast bi çiva cuda dibin? Îsa dibêje me: “Hingê Ezê eşkere wanra bêjim: “Ji Min dûrkevin, neheqno!, Min hûn tucar nas nekirine” /Metta 7:23/.

Gotina vê xeberêye kilît “kirina neheqîyê” ye. Berê ewlin neheqî çî ye? Nava zimanê yûnanîda ew xebera “anomîya” ye. “Ferhenga Tayêre yûnanî” vê yekê çawa “[bûyîna] nava halê bêqanûnîda, rûyê hajpêtunebûna qanûnê, yan jî teribndina wêda”. Zelal gotî, merivê neheq gura serwêrîya Xebera Xwedê nake. Ew bêyî tobekirina rast her dem guneha dike. Merivê vî cûreyî pûtparistê roja îroyîn e.

Bi vî cûreyî, neheqî cûrekî *kevirê krypton e*.

Ev mêr û jin *car-carina* naşimitin: ew her dem dora Xebera Xwedêra derbaz dibin, hesab hilnadin, heram dikin û gurê nakin. Halê gunehkar dibe cûrê jîyana wan. Ew li ser wê fikirê ne, wekî hinek beşên nivîsarên Pîroz tiştekî mayîn didine kifşê, lê yên mayîn difikirin, wekî ew derheqa rojên meda nînin, û piranîya wana bawar dikin, wekî ew bi keremeta nivîsarên Pîrozva nixamtî nînin.

> Tiştekî xemgînî ye, lê ez hêvîdar im, ku ew rûyê wê yekêda nava gunehêda nin, wekî rêberên wana tu cara dijî cûrê jîyana wana derneketine û banga tobekirina rast bona wan nekirine. Tu kesî negotîye wana, wekî îzina wan tune ku pûtên xweye hizkirî bikine nava heleqetîyên peymana tevî Îsa Mesîh. Eger ew bi rastî bi keremêva xilazbûyî bûna, ewê ne tenê ji fikirên derheqa gunehêda xof bikişandana, lê wê usa jî qirar qebûl bikirina, ku gunehê bi zanebûn berdana. Wanayê bedena xwe bi xwestinên xweva xaç bikirana û wê peyî xeyset û dayîna xwedêtîyê biçûna. Bawarmendê rast hema vî cûreyî ye.

Ew yek tiştekî hewaskar e bidine dîyarkirinê, ku Îsa elam kir: “Min tu cara hûn nas nekirine”. Xebera *“naskirin”* xebera yûnanî ye “gînosko” ye, ya ku dide kifşê “ji nêzîkva naskin”. Ev meriv tu cara tevî Wî nava heleqetîyên rastda nîbûne. Nenihêrî wê yekê, wekî Îsara dibêjin “Xudan”, lê ew yek bona wana tenê nav e, çimkî ew gura Wî nakin. Şedetîya heyîna heleqetîyên raste tevî Xwedê ew e, wextê ku meriv Xebera Wî xweyî dike:

> “Bi wê yekê em zanin, ku em Wî nas dikin, eger em temîyên Wî xweykin. Yê ku dibêje: “Ez Wî nas dikim”, lê temîyên Wî naqedîne, ew derewîn e û rastî nava wîda tune ye” /A Yûhenna 2:3,4/.

Ev gotin bi temamî anegorî wê yekê ye, ku Îsa çawa ev beş destpê kir: “Hûn dikarin meriva bi kirên wanva naskin” /Metta 7:2O, NLT/. Bi gotina kirên wan, Îsa derheqa qulixa mesîhîtîyêda nabêje, yan jî terîfkirina Mizgînîyê, çûyîna li civînê, çimkî ewên ku wê îzina wana tunebe bikevine Ezmîn, wê bi van tiştava cuda bin. Roja îroyîn gelek meriv wê wî merivî çawa zaroka Xwedê hesab bikin, yê ku Îsara dibêje Xudan, yê ku bawarîya xwe li hînkirinên Wî tîne û tevî qulixa mesîhîtîyê dibe. Feqet, em zelal ji xeberên Îsa dibînin, wekî cudatîyên başqe hene, bi kîjana dikarin bawarmendê rast bînin ber çava.

Îzinê bidin ez vê yekê bêjim: bêyî şikberî, ev hemû cudatî derheqa bawarmendên rastda nin. Tu kes nikare bêyî van cudatîya bibe bawarmendê rast. Feqet,

heyîna tenê van tişta nade kifşê, wekî meriv bi rastî zaroka Xwedê ye. Faktora qirarkir ev e: gelo ewî gunehên xweye bi zanebûn û hertimî tobe kirine û gelo ew bi cedandin dixweze gura Wî da be? Mecaleke rast heye, bo ku vê yekê biryarkin: *"Gelo ew xeberên* Îsaye "îdî gu*neha neke" çawa yên bi bijartin, yan bi borcdarî hesab dikin?"* /binihêre Yûhenna 5:14/.

## Mizgîndar

Niha em encamên wededirêj bona rêber û mizgîndarên Mizgînîyê lê binihêrin. Kitêba Pîroz dîwanê dijî wan meriva elam dike, teslîmî kîjana Mizgînî kirine, feqet ewên ku wan alîya terîf nakin, yên ku neyartîyê hindava rastîyêda pêşda tînin. Bi guhdarî vê eşaretîyê bixwînin, ya ku Xwedê dide mizgîndarên Xwe:

> "Eger Ez *eşaretîyê bidime* neheqa û bêjim: "Hûn gerekê bêne cezakirinê", lê tu wê *eşaretîyê* derbazî cem wan nekî, ewê nava gunehên xweda bimirin. Lê ezê bona mirina wana *te gazî ber cabdarîyê bikim*. Eger tu *eşaretîyê bidî* wana, û ew nexwezin tobe bikin û dîsa guneha bikin, ewê nava gunehên xweda bimirin. Lê tê *xwe xilazkî*, çimkî te gura Min kir. Eger merivên heq ji kirên xweye heq dûr bikevin û wan qedexeya hesab hilnedin, kîjana Ez diatînime li ser rîya wana, ewê bimirin. Û eger tu *eşaretîyê nedî* wana, ewê nava gunehên xweda bimirin. Kirên wane heq wê neyêne bîranînê û Ezê bona mirina wana *te gazî ber cabdarîyê bikim*. Feqet eger tu *eşaretîyê bidî* yên heq, ku ew guneha nekin, û ew gura te bikin, guneha nekin, ewê bijîn, û tê jî *xwe xilzakî*" /Hezeqêl 3:118-21, NLT/.

Guhdarîyê bidine ser ku çend cara, nava xeberên dîyarkirîda, xebera "eşaretî" tê xebitandinê. Îzinê bidin, ku bi bêqelpî ji serwêra, rêbera û hemû bawarmenda bipirsin, çimkî teslîmî me hemûya kirine, ku bighîjine undabûyîya û bi hizkirin dijî neheqa derbikevin. Gelo hûn dixwezin bona wan meriva cabdar bin, kîjanara we gotîye, wekî tabîya wane li ber Xwedê ya heq e, lê bi rastî usa nîne, çimkî bona berdana gunehê hertimî we *eşaretî nedaye?* Ew bi şaşî hesab dikin, wekî ew xilazbûyî ne, lê rûyê nestendina eşaretîyada ew dîsa nava gunehêda dijîn, û roja Dîwanê ewê bibihên: "Ji min dûrkevin".

Diqewime hema ev e menî, wekî Mizgînîyê gerekê terîf bikin?: "Eşaretîyê bidine her merivekî û her kesî bi hemû serwaxtîya hîn bikin, bona ku bikaribin her kesî yektîya Îsa Mesîhda gihîştî bidine sekinandinê" /Kolosî 1:28, NKJV/. Em gerekê ne tenê hîn bikin, lê usa jî *eşaretîyê bidin*.

Bifikirin, ku nava xeberên jorinda dîyarkirî Xwedê çi got: “Ezê bona mirina wana *te gazî li ber cabdarîyê bikim*”. Hûn derheqa wê yekêda fikirîne, wekî encamên nerastîya me wê heta-hetayê li ber me bin. Îşaya dinivîse, ku hêna ezmanê nû û dinîya nû wê çi bibe:

> “Temamîya merivatîyê wê her hevtê û her meh bê ku Min bihebîne. Wextê ku ew derkevin, ewê bedenên xweye mirî bibînin, yên ku dijî Min derketine. Çimkî kurmên ku wana dixun, wê tu cara nemirin, û agirê ku wana dişewitîne, wê tu cara netemire. Hemû kesên ku kêleka wanra derbazbin wê bi tirs li wana binihêrin” /Îşaya 66: 23, 24, NLT/.

Gelo hûn difikirin, wekî “ewên ku bona cabdarîyê hatine gazîkirinê” wê derheqa wê yekêda bîr bikin, wekî ew meriv nava gola agirda dişewitin, çimkî wana nexwestiye eşaretîyê bidine wan?

Eger fîlosofîya me usa ye, ku em meriva usa qebûl bikin, çawa ku ew hene, pêşniiarî wan bikin, ku ew duayê xilazbûnê bêyî tobekirinê dua bikin û gumana feşe bona çûyîna li Ezmana bidin, bi fikira we, encamê wê yekê wê çawa be? Em çareserîya feş didine guhdarvanên xwe û xwestina tobekirina rast ji dilê wan dûr dixin. Femdarî ye, wekî emê “bi tirseke tam” li wana binihêrin, yên ku ji alîyê meda hatine şaşkirinê.

Xeberên Pawlose balkêş bîr bînin: “Eger kesek mirina heta-hetayê bibîne, ew yek *neheqîya min nîne*, çimkî min xwe neda paş û ew hemû tişt wera gotin, çi ku Xwedê dixweze ku hûn bizanibin” /Karên şandîya 2O:26,27, NLT/. Pawlos derheqa wê yekêda baş zanibû, ku Xwedê bi destê Hezeqêl çi gote her kesî, yê ku Xebera Wî dannasîn dike. Eger em rêyên Wî dannasîn nekin, emê bona cabdarîyê bêne gazîkirinê: “Ewê bibe neheqîya me. Diqewime hema ev e menî, ku Aqûbê şandî mera dinivîse:

> “Bira û xwîşkên mine delal, ne hemû kesê ji we gerekê li civînê bibine dersdar, çimkî dîwanê li ser me dersdara hê giran be” /Aqûb 3:1, NLT/.

Ev xeber Încîlêda bona wê yekê nehatine nivîsarê, ku em wana hesab hilnedin, yan jî bi sivikayî nêzîkî wan bin. Xwedê hîvî ji me dike, ku em xeberên Wî veneşêrin û bi sivikayî nêzîkî banga tobekirina gunehê hertimî nebin. Ew vê yekê him bona rêber, him jî bona wî dibêje, yê ku Xwedê digere. Ew me hiz dike, lê Ew Xwedêkî pîroz e û nikare tebyeta neheq nava hazirîya Xweda qebûl bike.

Dêmek, Ewî dergeh hazir kiriye: Ewî bihakî mezin daye, bona ku hin me xilazke, hin jî qewatê bide me, ku em ji gunehê aza bin. Dêmek, emê çawa ji dîwanê dûr bimînin, eger em derheqa vê xilazbûna mezinda hîn nekin û wê yekê qebûl nekin?

Gelo hêjaye wê banga Încîlê bêyî guhdarî bihêlin, dewa kîjanê peymana Nû dike. Nava xeberên kitêba peymana Nûye dawîda nivîsar e: "Û eger yek ji xeberên pêxembertiyêye vê kitêbêda tiştekî kêm bike, Xwedê jî wê para wî ji dara jîyînê û ji Bajarê Pîroz kêm bike, bona kîjana vê kitêbêda nivîsar e" /Eyantî 22:19/. Em çawa dikarin vê eşaretîyê hesab hilnedin? Em çawa dikarin nebêjine wan meriva /yên ku dixwezin ji me rastîyê bibihên/, wekî gava ewline berbi xilazbûnê tobekirina guneha ye?

Diqewime em difikirin, wekî em ji Xwedê zêdetir zanin? Wekî diha girînge usa bikin, ku yên tezehatî bêne civînê, û diqewime paşê ew gerekê bên li ser wê fikirê ku gerekê tobe bikin? Feqet, eger gotine mêriv, wekî ew xilzabûyî ye, çimkî ewî duayê tobekirinê dua kirîye û ew nava "malbetêda" hatîye qebûlkirinê, bona çi peyî wê yekêra ew gerekê lazimatîya tobekirinê texmîn bike? Ne axir ew îdî "qebûlkirî ye" û "bi keremêva nixamtî ye"?

Çarlz G. Fînnî mizgîndarekî mezin bû. Qulixa wî usa qewat bû, wekî çend cara şuxulkarîya gund û bajaraye herroje /carekê jî bajarê qeza Nyû Yorkêyî Roçêstêrê/ rûyê hukumê berevbûnên wîda disekinî. Carina ewî çend êvara derheqa tobekirina gunehada usa dannasîn dikir û ber dilê merivada dihat ku xilazbûnê qebûl bikin, wekî merivên hazir bi dijwarî li ser kursîyên xwe diman. Û nava wî wedeyîda ewî hela hê bona xilazbiûnê dua nedikir. Piştî çend roja, ewî tiştekî wa got: "Eger hûn dixwezin bibine mesîhî, piştî berevbûna îro li ce me wê "qulçê pirskirinê" hebe".

Wextê berevbûnên wî, bi hezara meriv xilaz dibûn û serhpêatî dide kifşê, wekî ji 9O selefî zêdetir merivên ku bi destî wî paşda vegerîyane, hindava bawarîyêda amin diman. Roja îroyîn hesabên wî cûreyî gelekî nimiz in. Açixîya wîye mezin hebû, çimkî ewî anegorî hînkirina peymana Nû dikir: "Ewî zanibû, wekî mêtodên here baş nava Xebera Xwedêda nin.

## Ola civînê

Niha îdî femdarî ye, wekî ew hemû tişt girîng e, derheqa çida me destpêka vê kitêbêda digot. Eger em bona wan meriva xilazbûnê pêşniyar bikin, yên ku dîsa guneha dikin, wî çaxî emê olên xweye civînê bikine nîşangeh bona hevîrtirşkê gunehê. Gunehê ku bi zanebûn tê kirinê, lez belav dibe û ew hukumî hin

li ser şexsa, hin jî li ser olên civînê dike, çawa ku kevirê krîpton hukumî li ser Sûpêrmêrxas dike.

Rûyê wê yekêda ku em dijî guneh derneketine, me civînên xwe û cîhên jîyana xwe zeyîf kirine û nava encamê wê yekêda gund, bajar û dewletên me rûmeta Xwedê nabînin. Bi saya qewata rûmeta Xwedê, civîna Ewlin gund, bajar û heta rêgîonên mezin jî diguhartin. Bona çi me hela hê sedsala 21êda olên xwe neguhartine? Mecalên têknolocî bin destê meda nin, bi saya kîjana em dikarin bighîjine meriva, diha pêşkeftî ne, ne ku hêna civîna Ewlinda.

Bona çi abort /ji dayîka hemle deranîna zarokêye ji wede zûtir/, bêesilî, bênamûsî, homosêksûalîzm destpê kirin li Amêrîkayê û welatên Rojavayêye mayîn belav bibin? Menî ew nîne, wekî civakên me diha pêş dikevin. Zedebûna neheqîya vî cûreyî sedsalên çara û pêncada jî dihate kifşê, wextê ku civînê aktîvîya xwe unda kir, wextê ku mesîhîtîyê destpê kir nava civaka romayada bê naskirinê, civîn bû mîna wê civakê. Qewata civînê destpê kir bitemire, hetanî ku ew nekete nava wedê me, yên ku niha çawa sedsalên Tarî eyan in.

Ez tu cara naxwezim tiştekî usa bibînim, û ez zanim, wekî gelek meriv minra qayîl in. Emê elamkirina rastîyê nedine sekinandinê, kîjanê emê bi hizkirin bikin.

Ez hîvî dikim, ku bighîjine hev û qirarê qebûl bikin, ku hûnê rastîyê elamkin, nenihêrî wê yekê, ku ew belavbûyî ye, yan qebûlkirî ye, yan na? Xebera Xwedê bêjin, ya ku wê meriva, cîhên jîyînê, bajara û welata biguhêre. Kirina bi cûrekî mayîn dide kifşê, wekî em naxwezin merivên nêzîkî xwe hiz bikin.

## gava praktîk

Nava bedena Mesîhda tabîya usa tune, kîjanêda dikarin encamên guneh veşêrin. Usa jî nîne, wekî guneh tenê bi destî rêbera dikeve civînê: guneh dikare bi destî merivekî belav bibe, yê ku wî gunehî nava jîyana xweda qebûl dike. Bêdengîya meye derheqa gunehêda dikare meriva unda bike û me jî bona mirina wana bike cabdar.

Cumila dawî careke mayîn bixwînin, lê ji navê xwe: bêdengîya min ya derheqa gunehêda dikare meriva unda bike û min jî bona mirina wana bike cabdar. Çend cara bi dengê bilind vê cumilê biweklînin û îzinê bidin ku ev xeber bighîjine kûraya dilê we. Îzinê bidin, wekî ev rastî bi cûrê tam bikeve dilê we û nava fikira we.

Xwedê wê bona vê yekê hesab ji we bixweze. Em nikarin guneh veşêrin. Bi fikira we, ev rastî wê çawa hukumî li ser jîyana we bike? Ewê çawa hukumî li ser

zewaca we û terbyetkirina zarokên we bike? Gelo hûnê destpêkin cûrekî mayîn nêzîkî endamên civîna weye malê bibin? Hîvî ji Xwedê bikin, ku caba van pirsa bide, hetanî ku hûn zelal fem bikin, ku hûn çawa anegorî vê rastîyê bijîn. Paşê, tevî hevalekî xwe wê yekê gotûbêj bikin, ku hûn çawa hazir dibin vê rastîyê nava jîyana xweda bidine xebatê?

# 22

# QEBÛLKIRIN

Werin em derbazî wan xebera bibin, yên ku Padişê meyî ji nava mirîya rabûyî gotine.

Kitêba Încîlêye dawîda Îsa heft banga bona heft civînên li Asîyayê belav dike. Eger xeberên Wî tenê bona wan heft civîna têradîtî bûna, wî çaxî ewê Încîlêda nehatana nivîsarê. Ew yek, wekî ew xeber nava kitêba Pîrozda nin, ew derheqa binyata wane pêxembertîyêda dibêje. Bi cûrekî mayîn gotî, ew roja îroyîn tên xebitandinê, çawa ku wî çaxî ew cara ewlin hatine gotinê.

Xebera Xwedê sax e: bo wê yekê jî emê xeberên Îsa usa qebûlkin, çawa ku tê bêjî ew nava wedê nihada derheqa meda nin. Bi vî cûreyî, eger ev bang bona me ye, werin em wê qebûl bikin: yan bi rûmeta Wî qewat bin, yan şîreta Wî, ya bi hizkirinêva tijî, hildin ser xwe.

## Kî ye Îzabêl?

Ew civîna dîrokî, derheqa kîjanêda emê xeberdin, Tîyatîra ye. Îsa xebera Xwe destpê dike, Xwe nav dike çawa “Kurê Xwedê, Yê ku çavên Wî mîna alava êgir in û nigên Wî mîna wî sifirê xasî ku dibiriqe” /Eyantî 2:18/. Em dikarin vê gotinê vî cûreyî şirove bikin: çavên Wî mîna tîrêncên lazêrê ne, yên ku hemû îşî dibînin, û nigên Wî mîna sifirê biriqandî ne, û ew yek dide kifşê ku Ew hemû tiştî dikare bike.

Baş e, wekî Ew destpê dike pesinê me dide: “Ez haj kirên te, hizkirina te, bawarîya te, xizmetkarî û sebira te heme. Ez zanim, ku kirên teye paşwextîyê, ji yên pêşiyê zêdetir in” /Eyantî 2:19/. Ew yek dide kifşê, wekî Ew civîna mirîra

xeber nade: ew civîn sax e û pêşkeftina wê heye.

Ew destpê dike hizkirina me qîmet bike û piştgirîyê bidê. Wextê ku civîn, yan jî qulix, dimire, berê ewlin hizkirina Xwedêye hindava merivada ditemire û sar dibe. Rûyê halê wî cûreyî tragîkda usa jî berên heqîtîyê unda dibin.

Tiştê ecêbmayînê nîne, wekî Xudan ji hevt civîna ya ewlinda, li Efesîyê, vê yekê rast dike: wê civînê hizkirina xweye ewlin berdabû. Feqet Tîyatîra usa nîbû. Îsa pesinê hizkirina wê civînê dide. Ew derheqa ola bawarmendaye usada dibêje, ya ku hindava merivada guhdar e, û ew yek bona Xwedê gelekî girîng e. Ez bi xwe bawarim, wekî ev e menî, wekî hetanî xeberdana derheqa tiştekî mayînda, usa jî derheqa bawarîyê, qulixê yan jî sebirêda, Îsa pesinê hizkirina me dide.

Qewimandina ecêbe mayîn ew e, wekî civîn bi hizkirinê, bawarîyê, qulixê û sebirê dighîşt. Çiqas tiştekî berbiçav e! Ola wan bawarmenda tenê tiştek xweyî nedikir, ya ku li cem wan tunebû: ew nava govekên qulixêye girîngda pêşda diçûn. Xebera “bang” vê gotinê şirove dike: “Ez wî hemû tiştî dibînim, çi ku tu bona Min dikî. Çiqas berbiçav e! Hizkirin û bawarî, qulix û qewînbûna te. Belê, gelekî berbiçav e. Li cem te her roj diha baştir dibe”. Her rêberek yan jî endamekî civînê, wê bi hizkirin ev xeber hema ji Xudan guhdar bikira.

Feqet, nişkêva pesinê Wî bi lêhilatinêva tê guhartinê.

Lê gazineke Min li te heye. Tu îzinê didî wê jinê, wê Îzabêlê, ya ku xwe çawa pêxember hesab dike, xulamên Min şaş dike. Ew wana hîn dike, ku ji rîya xwe derkevin û qurbanên pûta bixun” /Eyantî 2:2O, NLT/.

Nava van xeberada awqas tişt hene, kîjana gerekê fem bikin. Berê ewlin guhdarîyê bidine ser navê Îzabêl. Gelo ev nav nava vê beşêda yê evê jina kivşkirî ye? Piranîya şiroçîyên Încîlê dibêjin, ku usa nîne. Xebata bi sernavê “Ş*irovekirina Amêrîkîye Nû*: Eyantî” dibêje: “Nava lîtêratûra yûnanî-romayîye wî wedeyîda derheqa navê Îzabêlda nayê bîranînê…wekî tu cihûk wê navê keça xwe dianenîya Îzabêl, çiqasî ku tiştê bawarkirinê nîne, wekî mesîhîk wê navê kurê xwe danîya Cihûda, yan jî cihûk navê kurê xwe danîya Îsa, piştî sedsala yekê”. Tercimeçîyên “*Tercima saxe nû*” eşkere vê yekêra qayîlin, çimkî wana xeberên Îsa çawa “ew Îzabêl” tercime kirine.

Bi wî cûreyî, bîranîna navekî hema wî cûreyî ye, wextê ku merivê ku yên mayîn dide kenandinê, nav dikin çawa “ew komîk”. Ew xeber navê wî nîne, lê kirên wî tîne ber çava.

Meriv dikare bêje, wekî nava wî wedeyîda gilî derheqa jineke hukumdarda ne. Ew bi navê “Îzabêl” hate navkirinê, yê ku navê wêyî rast nîbû. Hukumê wêyî mezin hebû û komeke rêbera hînkirinên wê belav dikirin. Nava rojên meda ev yek dikare vî cûreyî biqewime: mêrek, jinek, yan jî diha gelekî nêzîkî aqila ye, wekî komeke rêbera hema hînkirinên wî cûreyî terîf dikin. Çawa jî ew yek

biqewimîya, fikira sereke ew e, wekî ew fîlosofîya qulixdarîyê hukumê zyandar li ser civînê dihişt.

Bona çi Xudan ew jin usa nav kir. Bi texmîn, berê wê mîna berê Îzabêlê bûn. Îzabêl, derheqa kîjanêda kitêbên Padişatiyêye G û D -da nivîsar e, jina Ahabê padişa bû. Derheqa wêda meriv dikare gelek tiştî bêje, lê em hukumê wêyî tomerîyî li ser Îsraêlê lê binihêrin. Ewê pûtparistî belav kir, nava encamê kîjanêda dengê Xebera Xudan li Îsraêlê hate kerkirinê. Serwêrên cimetê îdî dengê xwe bilind nekirin, lê cimet jî kete nava xweranedîtina ruhanî, gihîşte dereca tevizîbûnê. Tenê merivek hebû, navê kîjanî Îlyas bû, yê ku nedetirsîya dijî wî halî xeberda.

Em dikarin hukumê Îzabêlê eşkere bibînin, wextê ku Îlyas dijî temamîya milet derket û pêşniyar kir, ku di navbera Xwedê û gunehê hertimîda gurêdabûna hindava Xwedêda bibijêrin. Ewî ew yek bi hazirîya Bahel û Astarovtê pêxember kir, yên ku ji alîyê Îzabêlêda dihatine kirêkirinê, kîjana mecalên prêssayê kontrol dikirin, serkarîya teşkîletên mexsûs dikirin, yên ku hiqûqzan û mafparêz bûn û tiştên mayîn. Temamîya milet berev bibû, û Îlyas gote cimetê, li ber wan “wekîlên derecebilind”:

> “Hûnê çiqas wede li ser sûrê rûnên? Eger Xwedêye Xwedêyê rast, peyî Wî herin! Eger Bahel [gunehê hertimî] ye, peyî wî herin! Qirarê qebûlkin!” /G Padişatî 18:21, MSG/.

Bona çûyîna peyî Xwedê zêdetir tê xwestinê, ne ku bawarîya bêdeng. Em gerekê Xebera wî terîf bikin. Em çawa bayloz hatine gazîkirinê. Wê yekê çawa bikin? Pawlos zelal dide kifşê:

> “Xeberê elam bike û dannasîn bike! Û ser wê nêt-fikirê be [nêzîk û hazir be], nenihêrî wê yekê, ku ew mecal karadar e, yan na. [Nenihêrî wê yekê, ku ew fesal e, yan nefesal e, tiştê xwestinê ye yan nexwestinê ye, tu çawa terîfkirê Xeberê, gerekê nîşanî meriva bidî, ku jîyanên wana çi cûreyî şaş in]” /B Tîmotêyo 4:2, AMPC/.

Li Îsraêlê Îlyas yê tek- tenê bû, yê ku awqasî meriv hiz dikirin û hazir bû nîşanî wan bida, ku jîyanên wana çi cûreyî şaş bûn.

Hukumê Îzabêlê di nava serwêra û cimetêda tirs pêşda anîbû. Ew bêdeng bûn, tevizî bûn, tirsonek bûn û îdî bona piştgirîya *Yahvêh* eşkere xeber nedidan. Gunehê hertimî serketibû, û Xebera Xwedê nedihate hesabhildanê. Tiştekî wî cûreyî usa jî li civîna peymana Nû destpê kir biqewime. Îsa nedixwest îzina wê yekê bida, û Ewî xulamekî Xwe dît, Yûhennayê şandî, yê ku mînanî Îlyas hazir bû xeber bida.

## Pirsgirêka heyî

Em gerekê pirsekê bidin: gelo Îsa dixwest bigota, wekî endamên civîna Tîyatîrayê bi fîzîkî ketibûne nava heleqetîyên bênamûsîyê û goştê pûtên qurbankirî dixwerin? Dikare bibe, lê ezê wê şirovekrinêra qayîl nebim, çimkî Pawlos xwerina qurbanên pûtara kirî nava namên xweye bona her dû civîna gunehkar nekir /binihêre Romayî 14 û A Korintî 1O/. Bona çi Îsa gerekê ew tişt çawa yên xirab hesab bikirana, çi ku Pawlos bin ruhdarîya Ruhê Pîrozda îzin dida? Şirovekirineke eyan dibêje: "Çi ku  derheqa bênamûsîya merivaye fîzîkîda ne, gelek şiroçî hesab dikin, wekî ew yek tiştê bûyînê nîbû, çimkî civînê ew yek qebûl nekira. Dewsa wê yekê gilî derheqa bêaminîya ruhanî yan jî serwêrtîyêda ne" /"Ş*irovekirina Amêrîkîye Nû*: *Eyantî*"/.

Nenihrî wê yekê, ku gilî derheqa çida ne, lêhilatina Îsa derheqa wê yekêda nîbû. Em gerekê guhdarîyê bidine li ser wê şuxulkarîyê, yan jî bêkarîyê, derheqa kîjanêda Îsa got. Gilî derheqa *qebûlkirinêda ye*. Ewî got: "*Tu îzinê didî*". Nava zimanê yûnanîda xebera "êao" tê xebitandinê. Kitêba bi sernavê *"K'itêba Eyantîya Yûhenna"* vê xeberê bi cûrekî tam şirove dike: "Fikira vê xeberê dikare baş be: "tu îzinê didî", "tu extîyarîyê didî", yan jî bi fikira xirab: "tu qedexe nakî", "tu nadî sekinandinê", "tu dijwarîya pêşda naynî"".

Ev yek mêriv zendegirtî dihêle. Îsa derheqa wî merivê xirabda nabêje, eger ew kî be jî, yan jî nava wedê meda derheqa wan xirabkarada ji alîyê kîjanada hînkirin tê belavkirinê, yên ku temê cimeta Wî berbi pûtparistîyê dibin /gunehê hertimî/. Ew zelal dibêje: "Min wext da wê, wekî ew ji gunehkirinê vegere…lê ewê tobe nekir" /Eyantî 2:21/. Ber cava ye, wekî pêşda jî eşaretî hebûne, lê mixabin, ew nehatibûne hesabhildanê.

Dewsa wê yekê, Ew hindava wan kesada lêhilatinê dide kifşê, yên ku îzinê didin, ku ew yek berdewam bibe: bi gilîkî mayîn gotî, em dijî wê pirsgirêkê dernakevin. Dewsa wê yekê, em dîsa berdewam dikin, tenê wan beşên peymana Nû hîn bikin, yên ku li mêriv xweş tên û piştgirîyê didin. Usa dertê, ku em bêdeng in, xwe ker dikin, û em ji cimeta Îsraêlêye hêna Îzabêlê cuda nabin. Wê yekê meriv dikare himberî halekî vî cûreyî bike: "Em hemû kes avayîda nin, yê ku dişewite, lê ji me tu kes tu tiştî nake bo ku birevin, û ne jî dicêribîne alî yekî mayîn bike, ku ew meriv ji wir bireve. Em dîsa berdewam dikin piştgirîyê bidine hevdu û dibêjin, ku em çiqasî duakirîne, û hizkirinê hindava hevduda didine kifşê, lê ban û dîwarê avayî dihedimin.

## Dudilîbûnên mînanî hev

Cihûdayê şandî rastî dudilîbûna wî cûreyî hatibû. Ewî dixwest bigota peyîhatîyên xwe û bona cudatîyên xilazbûna me piştgirî bida wana, lê nikaribû. Mal dişewitî. Ew gerekê dijî wî kevirê krîpton derketa, yê ku ketibû nava civîna. Xeberên wî bixwînin: "Hevalên hizkirî, xwestina mine mezin hebû, ku min wera derheqa wê xilazbûnêda binivîsîya, kîjanêda em hevpar in. Lê niha ez hesab dikim, wekî ez gerekê derheqa tiştekî mayînda binivîsim, ber dilê weda bêm, ku wê bawarîyê biparêzim, ya ku Xwedê sparte cimeta Xweye pîroz. Ez vê yekê dibêjim, çimkî çend merivên bêxwedê ketine civînên we û dibêjin, wekî kerema Xwedêye ecêb îzinê dide wana, ku jîyana bênamûs derbaz bikin" /Cihûda 3,4, NLT/.

Vî qulixçîyî bi cedandin dixwest wan merivara binivîsîya, kîjan ewî hiz dikirin, derheqa wan cudatîya, dua û sozdayînada, yên ku nava Mesîhda nin. Mînanî geleka ewî jî dixwest meriv ruhdar bikirana û piştgirî bida wana.

Ez halê wîyî dijwar fem dikim. Şerkarîke here mezin ew e, rastî kîjanê ez têm, hin wextê nivîsarê, hin jî wextê hînkirinê, ew xwestina piştgirîyê ye. Ez hiz dikim ruhdar bikim: kî wê yekê hiz nake? Feqet, Ruh me berbi wê yekê dibe, ku em derheqa wan qewimandinada bêjin, yên ku dicedînin zarokên Xwedêye giranbiha tune bikin.

Bi vî cûreyî, hizkirina Cihûdaye bêqelp ew dibire berbi wê yekê, ku ew eşaretîyê bide bawarmenda, bona ku wana biparêze. Ew çi diqewimî? Hal hinekî cûrekî mayîn bû, lê ne ku ew çawa li Tîyatîrayê bû. Ew merivên bêxwedê yên ku bin maskên serwêra, rêbera, yan jî bawarmendada xwe veşartibûn, hîn dikirin, yan jî diqewime "kerema îzindayînê", lê ne ku "kerema qewatdayînê" tomerî dikirin. Ew "kerema ku îzinê dide", ya ku wana hîn dikir, ji kevirê krîpton nediparast, û ne jî karebûna bona dûrketinê dida, lê îzin dida bi çend nivîsarên pîroze hindikva bijîn, yan jî qet bêyî wan jî bijîn. Nava qewilên wî cûreyîda civak destpê dike cûrê xweyî jîyînê pêşda bikişîne, çimkî kerem hatîye biçûkkirinê û ew werguhêzî xêlîyê bûye, ya ku vedişêre, lê ne ku werguhêzî qewata ku karebûnê dide, bûye. Dêmek, bawarmend wî çaxî dibine nîşangeh, çimkî ew aza peyî xwestinên tebyeta xweye ketî diçin, anegorî kûltûra dor- berên xwe, û li ser xwe hukumê kevirê krîpton dibin. Meremê kerema Xwedê başqe ye.

Cihûda hazir nedibû ew hevîrtirşk *qebûl bikira*, yê ku nava civînada belav dibû. Ew bavê ruhanîyî rast bû û zarokên xwe ji cûrê jîyînêyî tevlîhevbûyî diparast, meremê kîjanî ew bû, ku wana ji jîyîna Xwedê dûr bixista. Îsa wê mecbûr nîbûya ku ew rast bikira, mînanî rêberên Tîyatîrayê: dewsa wê yekê Ewê pesinê cihûda bida.

Pawlos jî bavekî guhdar bû, bêdeng nedima, wextê ku di navbera bawarmendada ji hev cihêbûn, şer, bênamûsî, gunehkarî, timayî û kirinên gunehkirinêye mayîn

hebûn. Ewî awqasî ew hiz dikirin, ku nikaribû dijî wî hevîrtirşkî gav neavîtana, yê ku lez nava temamîya bedenêda wê belav bûya. Aqûb û Petrûs jî wî cûreyî dikirin.

Eger hûn bangên bavên civîna Ewlin bixwînin, hûnê bibînin, ku ew peyî mînaka şandîya diçûn, û Xebera Xwedêye, ku hatîye nivîsarê û tê terîfkirinê, çawa sîlih didane xebatê, bona ku dijî gunehê hertimîyî nava cimeta Xwedê da derketana. Wana xeber dida, ew fikir û xweheqkirin xirab dikirin, yên ku ji alîyê kûltûra dor-berada çê bibûn, û dijî serwêrîya saxlem bûn. Wana pûtên kûltûrayê xirab dikirin, û merivên Îzabêlê ew neditirsandin.

## Bêdengî nîşana qayîlîyê ye

Wextê ku gilî derheqa serwêrada ne, bêdengî tevgirêdana ne bi xeberê ye. Ew qayîlîyê û îzindayînê dide kifşê û tê bêjî dibêje: "Ew çi ku hûn dikin, baş e". Metelokeke latînîye kevin heye: "Bêdengî nîşana qayîlîyê ye: wextê ku hela hê mecal hebû, wî çaxî lazim bû xeberda". Ji bav û rêberên civîna Ewlin tu yek bêdeng nedima, wextê ku kevirê krîpton dikete nava wan meriva, yên ku ew hiz dikirin û bona kîjana ew cabdar bûn. Wana digot, çimkî wana hesab dikir, wekî kevirê krîpton xirabkir e, ewî jerh û mirin dianî û dikaribû mîna hevîrtirşk belav bûya.

Yûhennayê şandî dibêje "Temamîya dinîyayê bin hukumê xirabda ye" /A Yûhenna 5:19/. Nava civakêda xirabî her dem dikişe, cûrê kîjanêyî herî xirab, *xirabîya veşartî ye*. Belê, ew bin maska qencîyêda veşartî ye. Ev tiştê xapînok çawa "şuxulandina vê dinîyayê" tê navkirinê /Efesî 2:2, NKJV/.

Vî cûreyî bînin ber çavê xwe: nava çemda hûn dijî avê sovekarîyê dikin, bona ku hûn pêşda herin. Ev dinîya jî wî cûreyî dişuxule, ya ku dijî padişatîya Xwedê ye, lê tiştê herî bi qezîya ew e, wekî ew yek bi fêlbazî ye: li ser wê maska *qencîyê* heye. Wextê ku em dengê xwe nakin, ew jî wî cûreyî ye, çawa ku em sovekarîyê nakin û çawa av dikişe, em jî usa diçin. Berê qeyîka me dikare dijî avê be: em hela hê bi cûrê mesîhîne û dikarin mînanî mesîhî xeberdin, wî çaxî emê anegorî normên civaka roja îroyîn bikin û emê kardarîya xwe unda bikin.

Em ditirsin dengê xwe bikin, bêdeng dimînin, lê wextê em dijî tiştekî dernakevin, tu tişt nayê guhartinê. Êdmûnd Bûrkê nivîsîye: "Bona ku xirabî serbikeve, tenê bes e ku merivên qenc tu tiştî nekin". Pûtên kûltûrayê li dil û fikirên bawarmendada hukumê diha mezin dest tînin, wextê ku rêber dengê xwe nakin.

Xapandin çiqasî zêde dibe, awqasî ew tişt pêşda tên, kîjana em qebûl dikin, û nava meda tevizîyê pêşda tînin. Em destpê dikin wan tişta qebûlkin û mînanî wan tişta bin, yên ku qewatên meye nebînayî unda dikin. Duruşma "mesîhîtîyê" li ser me ye, lê em ne ku *baylozê qewatê ne*, lê *faktora şaşbûnê ne*. Dinîya dora me dipirse: "Em civînên we dibînin, sazbendî û hînkirinên weye derheqa hizki-

rinê û keremêda dibihên. Lê kanê şedetîya derheqa wê yekêda, wekî Xwedêyê weyî Herî Zor tevî we ye?".

Pawlos li ser xwe guman elam dike, wekî ewên ku dihebînin ku mesîhî ne, lê tevî vê dinîyayê diçin, bi rastî neyarên xaç in. Belê, neyar!

> "Çimkî gelek jîyana xweda dijminên xaçê Mesîh in, bona kîjana min gelek cara wera gotîye, niha jî bi girî dibêjim. Axirîya wan undabûn e, Xwedêyê wan zikê wan e û kirên wane şermî jî rûmeta wan e. Ewana tenê ser tiştên vê dinîyayê difikirin. Lê welatê me li ezmana ye, ji ku em çavnihêrîya Xilazkir, Xudan, Îsa Mesîh in" /Fîlîpî 3:18-2O/.

Bi guhdarî xebera ewlin bixwînin. Berê ewlin nivîsar e "gelek". Ya duda, xeberên wan nînin, yên ku nîşan didin ku ew dijmin in, çimkî ew bi devikî Îsa qebûl dikin. "Ew dibêjin, ku Xwedê nas dikin, lê bi kirên xwe Wî înkar dikin" /Tîto 1:16/. Ew bi wergirtina xwedêparêzîyêva veşartîne, lê kirên wana didine kifşê ku ew dijmin in. Ew bi cedandinên bedenî, xwestina, bi nav û dengva, bênamûsîya bedenîva, buxdanbêjîyê û tiştên mayînva tên rêberkirinê.

Pawlos dibêje: ew dij derdikeve û qebûl nake. Namên wî bixwînin û hûnê bibînin, ku çend cara ew eşaretîyê derheqa kirên vê dinîyayêda dide me û nava wê yekêda dijî wê yekê derdikeve. Lê bizanibin, wekî, bi rastî, bi destî qelema Pawlos, Xebera Xwedê berbirî me dibe.

Rûbirûkirina bi rîya elamkirina Xebera Xwedê mecala tek-tenê ye bona xirabkirina wan kela. Eger em bi Xebera Xwedê dijî wê yekê dernekevin, emê îzinê bidin ku kelayên fîlosofî nava dil û fikirên bawarmenda û merivên undabûyîda diha hukumdar bibin. Wextê ku em naxwezin xeberdin, em derî bona hukumê kevirê krîpton vedikin.

## Encamên miqabil

Îsa çawa banga Xwe, ya bona wê civînê, tomerî kir? Xeberên Wî bona yên dilên zeyîf nînin. Ew zelal dibêje, wekî merivên ku hînkirinên feş qebûl dikin, wê bikevine "nava tengavîyên mezin", eger ew tobe nekin. Evê bibe nîşan, û hemû civînê bizanibin, ku Ew fikir û dilên me

> dicêribîne, û wekî Ewê wê yekê bide me her kesî, layîqî çi ne em /binihêre Eyantî 2:22, 23/.

Lê awa behseke baş: ew merivên ku kevirê krîpton qebûl nekirine, yên ku

qewîn tevî Ruhê Wî û Xebera Wî bûne, Îsa dibêje, wekî serwêrtîya wana wê li ser mileta hebe… hema ew serwêrtî, ya ku ji alîyê Bavê meda Îsara hate dayînê.

Encam gelekî dijî hev in: hinekara cezayê berk têra tê dîtinê, lê yên mayînra heqê ku nayê gotinê. Em dikarin îzinê nedine xwe, ku guhdarîyê nedine li ser van emirkirina, bi taybetî, wekî ew xeberên Padişê me ne, Yê ku ji nava mirîya rabûye.

## gava praktîk

Îzabêlê pêxemberên Xwedê dida kerkirinê, û hela gelek jî dikuştin. Tenê pêxemberek hazir bû, ku derheqa Xudanda bigota, lê binihêrin ku Xwedê hazir bû bi destî pêxemberekî çi bikira. Ewî ew parast, qewat da wî û qulixa wî bi nîşanên nebînayîva îzbat kir, bi kîjanava em hetanî roja îroyîn hijmekar in.

Xwedê hetanî roja îroyîn merivên usa digere, yên ku wê bisekinin û rastîyê bêjin. Ev yek nade kifşê, wekî gerekê awqasî meriva rexne bikin. Em gunehên yên mayîn hesab nakin. Feqet, bi wê yekêva tevayî, em nikarin îzinê bidine xwe, ku em bitirsin, xwe ker bikin, bêdeng bin, bitirsin, wekî merivê me çawa paşdamayî nav bikin, yan jî wê qerfên xwe li me bikin.

Gava ewlin ew e, ku hûn nava jîyana xweda guhdarîya vê eşaretîyê bikin. Çi jî bona wê yekê bê xwestinê, ji wan guneha azad bin, yên ku we berê kirine. Hema we ew yek kir, derbazî şuxul bibin, û merivên başqe azad bikin, bi kel û ced derheqa qezîyayên gunehên wanda eşaretîyê bidine wana. Pawlos dinivîse: “Em hazir in ceza bidine hemû neguhdara, gava guhdarîya we tam bibe” /B Korintî 1O:6/.

Eger hûn rûbirûkirinê hiz nakin, ji Xwedê hîvî bikin ku Ew hizkirina hindava merivada bide we, ya ku wê we bibe berbi rûbirûkirina tevî wana. Vê yekê bikine meremê xweyî bi sirê, û hûn gerekê bighîjine wî meremî. Wextê ku ev yek biqewime, hûnê bi kerema Xwedê bikaribin usa jî alî merivên başqe bikin, bo ku ew bighîjine vî meremî.

# 24

# HIZKIRIN Û RASTÎ

Em dighîjine wî alîyê xirabkirina kevirê krîptonî dawî, wê menîyê, yan jî wê qewatê, bi kîjanê meriv dikare wê yekê bike. Bi texmîn, rûyê tunebûna vê qewata mezinda ye, ya ku kevirê krîpton dişkêne, wekî em ketine nava vî halê niha. Ew qewat, derheqa kîjanêda ez dibêjim, *hizkirina Xwedê* ye. Pawlos vî cûreyî dibêje me:

> "Emê neqewîn nîbin, wextê ku meriv bicêribînin bi derewên bi hostatî çêkirî, yên ku çawa rastî tên kifşê, me bixapînin. Dewsa wê yekê, emê *bi hizkirin rastîyê bêjin*, bi her cûreyî zêdetir nava wê yekêda bighîjin, mînanî Mesîh bin" /Efesî 4:14,15, NLT/.

Hînkirinên feş, yên mînanî li Tîyatîrayê, derheqa kîjanada Îsa dibêje, û derheqa wan hînkirinada, derheqa kîjanada Petrûs, Yûhenna û Pawlos nava namên xweda dinivîsin, usa bi hostatî hatine çêkirinê, û wextê ku himberî hev dikin, meriv dikare ewên feş bi hêsanî tevî rastîyê şaş bike. Dijmin diha gelekî aqil e, ne ku çawa em difikirin. Eger ewî karibû Hêwa bida şaşkirinê, ya ku bi hazirîya Xwedêva tijîbûyî bû, ewê diha hêsa bikaribe nava evê dinîya heramkirîda meriva bixapîne. Gelo çi dikare me ji xapandina hînkirinên feş biparêze?

Bersiva vê pirsê rastî ye, lê ne ku awqasî rastî, lê rastîya bi hizkirinê gotî. Rastîya bêyî hizkirin berbi rîya "herfa qanûnê" dibe, ya ku dikuje: ew çawa *qanûnparêzî* tê navkirinê. Ew xapandinê zêde dike û piştgirîyê dide wê. Hema qanûnparêzî jî menî ye, ku meriva destpê kir eşaretîyên nivîsarên pîroz hesab hilnedin, kemala kîjana bona halê civînêyî saxlem girîng e.

Qanûnparêzî zirarê dide me, çimkî ew bêrehm e, berk e û bi hiznekirinêva tijî ye. Bona dijîderketina hindava bêrehmîya wêda em hizkirinê pêşda dikişînin. Feqet,

hizkirin bêyî rastîyê, hizkirin nine. Ew feş e, ya ku ji rehmê, nazikayê û sebirê hatîye çêkirinê û ji derva şikilê wê mînanî hizkirina xwedêtîyê ye. Eger ev hemû tişt ne anegorî rastîyê ne, wî çaxî çawa encam emê bikevine li ser rîya xapandinê.

Werin em bêqelp bin: em derheqa hinek rastîyên nivîsarên pîrozda nabêjin, çimkî em hesab dikin, wekî ew wê hizkirinêva girêdayî nînin, berbi kîjanê em bi dil dicedînin. Rastî ew e, wekî em ditirsin bangî meriva bikin, ku ew cîhê xweda nemînin, lê guhartina bînine nava jîyanê. Em hesab dikin, wekî gazîkirina merivaye bona tobekirinê, tunebûna nermayê, rehmê, nazikayê û hizkirinê ye. Feqet, bînin ber çavê xwe, ez merivekî kor dibînim, yê ku berbi kevîya zinar diçe, yê ku dikare bikeve û bimire. Ez dikarim îzinê bidim, wekî ew qezîya biqewime, çimkî tevbûna min, ya hindava rêya ku wî merivî bijartîye, wê çawa ya xirab, yan jî neqebûlkirinê, bê hesabê. Lê eger ez wî merivî nedime sekinandinê û alîyê çûyîna wî neguhêrim, ewê bimire. Eger ez bi xeberên baş û ruhdarkirinê piştgirîyê bidime wî, lê banga bona guhartina rê nekim, wî çaxî ezê gavên wîye dawî diha zêde werguhêzî yên qencîyê bikim, lê çawa jî hebe, ewê dîsa bikeve gelî û bemire. Gelo tabîya vî cûreyî dikare bê hesabê çawa hizkirina rast?

Nava civaka meda û bona gelek bawarmenda, hizkirina wî cûreyîye rast tê qebûlkirinê çawa fanatîzm û hiznekirin. Ev dîwarê fikirdarîyê nava jîyana gelek bawarmendada pêşda hatîye, çimkî ew jîyanê ji alîyê jîyana 7O-ê yan jî 8O-salîyêda, lê ne ku alîyê heta-hetayêda, dinihêrin. Awa mînakeke derheqa wê yekêda: eger bextewarîya min tenê bi rojekêva tê sînorkirinê, ezê herime êvarîya şahîyê û wî hemû tiştî bixum, çi ku li ser sivira danî ye. Ezê rojeke xweş û bextewar derbaz bikim. Feqet, eger fikirdarîya mine derheqa bextewarîyêda hetanî şeş meha berfireh bibe, ezê cûrekî mayîn bikim. Ezê tenê kadekî bixum, yan jî diqewime tu tiştî jî nexum. Menî ew e, wekî ezê nexwezim, ku rojtira mayîn zikêşa min hebe, ezê nexwezim ku nava çend rojada kîlogiramên min ji wan kada zêde bibin û ezê nexwezim pirsgirêkên saxlemîya bedena min li cem min pêşda bên.

Bona femkirina hizkirinê em gerekê jîyanê ji alîyê heta-hetayêda lê binihêrin. Hizkirina tenê ji alîyê jîyana dinîyayêda usa meriva qebûl dike, çawa ku ew hene, û bang nake ku ew jîyana xwe biguhêrin. Ew awqasî dixweze ku meriv gavên xweye mayî hetanî ketina li çela heta-hetayê biavêjin. Feqet, hizkirina rast, pêrspêktîva kîjanê heye, dibêje: “Ez awqasî derheqa teda difikirim, wekî ez hazirim bi wedê kurt bêfesalîyê bidime te, bona ku te ji zêrandin, êş û cefayê heta-hetayê xilaz bikim”.

Dojeya rast heye. Ew çawa alêgorîya, yan jî çawa gotinek, yan jî çawa cîhekî cezakirina wedelû nîne. Ewên ku herine dojê “wê şev û roj, heta-hetayê biçerçirin” /Eyantî 2O:1O/. Gelo em dikarin xeberên Îsa hesab hilnedin?:

“Û evê herine cefê heta-hetayê” /Metta 25:46/, û xeberên Pawlos: “Ewê bela xwe ji wêranbûna heta-hetayê bibînin, ji hizûra Xudan û rûmeta qewata Wî bêne avîtinê” /B Têsalonîkî 1:9/.

Xebera *heta-hetayê herdemîyê* dide kifşê: şirovekirina vê xeberêye mayîn tune. Cefa, êş û cezayê li dojê yên nebînayî ne û ewê tu cara xilaz nebin. Doje rûyê wê yekêda usa bi tirse, wekî meriv heta-hetayê ji hazirîya Xudan qetîyayî ye. Ev cihêbûn tenê derheqa jîyana jorinda nîne, lê derheqa vê jîyanêda ne. Hinekî şûnda ezê derheqa vê yekêda bêjim.

Xwedê doje bona meriva çênekiriye, lê “bona mîrêcin û milyaketên wî” /Metta 25:41/. Mîrêcin merivatî xapand û ew kirine tevbûyên cezakirina xwe. Îsa bi hizkirin hat, ku me ji wê yazîyê xilaz bike, ya ku me bi xwe bi destê xwe kir. Eger Ewî xilazkirineke wî cûreyî kir, wî çaxî em çawa dikarin bi sivikayî nêzîkî wê rêyê bibin, ya ku Ewî hazir kir, bona ku em ji wê undabûnê aza bin.

Em paşda vegerine li ser mînaka êvarîya şahyê. Qirara min tenê derheqa xwerina kadekîda ne, ya ku dikare dijwarîya pêşda bîne. Yên mayîn dikarin bêjin: “Con, ev kade gelekî baş in. Ew xweş in û wê te bidine şakirinê. Were em ji jîyanê lezetê bibînin!”.

Feqet, ev gotin ji rastîyê dûr in û wê min bidine şaşkirinê. Bi rastî, ew nabêjine min “were em ji jîyanê lezetê bibînin”, lê ew dibêjin “were em lezetê ji vê rojê bibînin”. Rastî ew e, wekî ezê diha zêde lezetê bibînim, eger pêrspêktîva min ya wededirêj hebe. Ev prînsîb usa jî derheqa padişatîya Xwedêda ye.

Bi fikira we, bona çi Pawlosê şandî teyax kir, wextê ku ew dane ber kevira, ewî pênc cara derbên 39 qamçîya stend, sê cara bi dar hate lêxistinê, şev û roj cefa dît, û gelek tengavîyên mayîn dîtin? Diqewime hûn difikirin ku ewî ew yek kir, bona ku bibûya şexsekî bi nav û deng û xeberdankirê hemcivînaye eyan, yan jî bibûya nivîskarekî bi nav û deng? Na xêr, lê hizkirina Xwedê wî mecbûr dikir: hizkirinê ew pêşda dibir. Ewî ji alîyê heta-hetayêda dinihêrî û bêyî tirs hiz dikir. Ewê qayîl nebûya, ku kîsî hesabhilnedana rastîyê bi nav û deng bûya, çimkî ewî ew meriv hiz dikirin, li cem kîjana ew hatibû şandinê, bo ku rêberîya berbi Mesîh bikira.

## Hizkirina rast çî ye?

“Xwedê hizkirin e” /A Yûhenna 4:8/. Usa nîne, wekî awqasî hizkirina Wî *heye*: Ew bi Xwe hizkirin *e*. Bi vî cûreyî, em gerekê hizkirinê çawa şirove bikin?

Van axirîya min dua dikir, û Xudan dilê minda xeberda: “Kurê Min, cimeta Min li ser nîşandayînên hizkirina ji derva hatîye merkezkirinê, lê ew gerekê derbazî şirovekirina bingehîn bibe”.

Ez derheqa wê yekêda fikirîm, wekî hizkirin sebirkir e, hizkirin qenc e, hizkirin kubar nîne, hizkirin hişk nîne, hizkirin ya xwe nagere û gelek tiştên mayîn, yên ku kaxeza A Korintîyada û beşên Încîlêye mayînda nivîsar in. Peyî wê yekêra Ruhê Pîroz ev yek nîşanî min da: eger we zarokên biçûk derheqa firqîya di navbera mêr û jinêda hîn bikirana, weyê çawa ew yek bikira? Eger me tenê bigota: “Du nigê jinê hene, du çav, poz, dev, du dest, û du zendên jinê hene”, gelo şirovekirina me wê rast bûya?

Bi stendina şirovekirina vî cûreyî, zarok dikare dîna xwe bide mêrekî û bêje: “Ew jin e”. Menî ew e, wekî we zelal firqîya di navbera mêr û jinêda şirove nekirîye. We negotiye: “Awa ku bi çiva jin ji mêr cuda dibe…”.

Li vê dinîyayê jî hizkirin heye. Ew jî sebirkir e, qenc e, hişk nîne û gelek alîyava mînanî hizkirina Xwedê ye. Feqet, nava vê xeberêda ew şirovekirin nivîsar e, ya ku firqîya sereke ya di navbera hizkirina Xwedê û hizkirina vê dinîyaêda nîşan dide: “Ev e hizkirina Xwedê, gava em temîyên Wî xweyî dikin” /A Yûhenna 5:3/.

Eger bi menîyên cûre- cûre me ev şirovekirina bêhesab girîng nava nama wîye ewlinda nedîtîye, Yûhenna, yê ku çawa şandîyê hizkirinê eyan e, derheqa wê yekêda nava nama xweye dudada diwekilîne:

> “Hizkirin ew e ku em li gora temîyên Wî bijîn” /B Yûhenna 6/.

Ev şirovekirin mînanî şirovekirina Pawlosê şandî, ya hizkirinê, ya kaxeza A Korintîyada nîne. Yûhenna cudatîyên hizkirinê nayne ber çava, lê carekêra şirovekirina wêye hîmlî raber dike, û dibêje ku çi hizkirina Xwedê ji hizkirina cûrekî mayîn cuda dike. Hizkirin xweykirina temîyên Îsa ye. Xudan zelal derheqa wê yekêda wextê şîva Dawî got:

> “Ewên ku temîyên Min qebûl dikin, û wana xweyî dikin, ew in,
> yên ku Min hiz dikin” /Yûhenna 14:21, NLT/.

Dêmek, eger ez qencim, sebirkirim, bi xeysetê xweva nermim, hişk nînim, peydar û hêrs nînim, lê her dem xayîntîyê li jina xwe dikim, yan jî dêklarasîya bacê dewletê feş dikim, wî çaxî ez bi hizkirina Xwedêva naşuxulim.

Eger ez qencim, sebirkirim, nermim, hevsûdîyê nakim, hişk nînim, peydar û hêrs nînim, lê begemîyê didime bênamûsîya bedenî, mesele, homosêksûalîzmê, ya ku roja îroyîn diha zêde tê qebûlkirinê û destpiştxistinê, hetanî ji alîyê hukumatên welatên cudada jî, usa ye ez bi hizkirina Xwedêva naşuxulim.

Bi rastî ez xapîyayîme û nava halekî diha bi qezîyadame, ne ku ew meriv, yê ku hişk e, sert e, paydar û hers e, çimkî ew zane ku ew ji Xwedê dûr e. Ez bi şaşî

difikirim, wekî li ber Xwedê li ser tabîya heqim, çimkî kesek tevî min “duayê gunehkar” dua kirîye lê min usa jî tobe nekiriye. Bi gilîkî mayîn gotî, ez temîyên Îsa xweyî nakim.

Îzinê bidine min ku ez navbirîyê bidim û tiştekî gelekî girîng bêjim. Ez temîyên Xwedê bona xilazbûnê xweyî nakim. Ez usa dişuxulim, çimkî ez xilazbûyî me, û çimkî hizkirina Wî nava minda dijî. Şikestîbûna min şedetîyê dide, wekî min bi rastî dilê xwe û emirê xwe pêşkêşî Wî kirîye.

Carekê jî bêjim, rastî ew e, wekî her cûrekî hizkirinê, yê ku dijî Xebera Xwedê û rêyên Wî ye, ew hizkirina heta-hetayê nîne. Ew wedelû ye. Hizkirina wî cûreyî wê mêriv bîne li ser wê fikirê ku ew qenc e, û serbara serda dikare xwe pêşkêş bike, lê ewê heta-hetayê nemîne. Ew berbi jîyana heta-hetayê rêberîyê nake. Rojekê ewê ji zinar bikeve berbi çela gola agire heta-hetayê.

Wî çaxî, menî çî ye, wekî ew hizkirin, ya ku tê texmînkirinê ku rast e, ya wedelû ye? Adem û Hêwayê hesab kirin, wekî berê dara qencîyê û xirabîyê qenc bû û wê serwaxtî bida wana:

> “Û kulfetê dît, wekî berê darê *qenc bû*…hewaskar bû bona *zanebûnê*” /Destpêbûn 3:6, NKJV/.

Bi texmîn, Hêwa pêşda wa fikirî: *“Bona çi Xwedê temî da, ku em wê yekê nexun, çi ku bona me “qenc” e. Eva nêzîkî aqila nîne”*. Û ewê qirar kir, ku wê *“qencîyê*” û *“zanebûnê*” qebûl bike, yên ku nava şêwira Xwedêda nîbûn. Em dixwezin cabên pirsa bistînin, lê werin em rast xeberdin: carina Xwedê dixweze, ku em gurêda bin, eger em fem nekin jî. Em bawar dikin, wekî Ew me hiz dike, wextê ku temîyê dide me ku ji tiştên usa dûr bimînin, yên ku bona me qenc tên texmînkirnê? Em aminaya xwe li Wî tînin, yan dibine hakim, yên ku dibêjine Wî ku kîjan bona me qenc e, çawa ku li baxçê Êdênê Adem û Hêwayê kirin.

Meriv dikare gelek mînaka derheqa şêwirên Xwedêda bîne ber çava, usa jî derheqa menîyên raste derheqa temîyên Wî da xeberde, lê îzinê bidin ez mînakekê bînim ber çava. Piştî bûyîna mine 4O sala, ya nava Mesîh da, ez usa jî rastî kesekî nehatim, yê ku dikaribû minra şirove bikira, ku Xwedê bona çi ev temî da pêxemberekî: “Çimkî bi xebera Xudan bona min vî cûreyî hate emirkirinê, ku nan nexuî û avê venexuî û bi wê rêyê paşda venegerî, bi kîjanê tu çûyî” /G Padişatî 13:9/. Wî pêxemberî gura wê temîya ku *bêfikir dihate texmînkirinê*, nekir, û rûyê gurênekirinêda jî emirê xwe unda kir.

Bi bêqelpî gotî, carina dikare bê texmînkirinê, ku hizkirina rast dijî wê yekê ye, kîjanê em çawa hizkirin hesab dikin. Bona çi Pawlos gote civîna Korintîyê: “Ezê bi dilekî şa xwe û mal-halê xwe jî bona we bidim, nenihêrî wê yekê, ku

tê kifşê ku ez çiqasî gelekî we hiz dikim û hûn awqasî hindikî min hiz dikin" /B Korintî 12:15, NLT/. Civîna Korintîyê difikirî, wekî Pawlos wana hiz nake, û ew yek çawa tiştekî bêfikir tê texmînkirinê. Feqet ez guman im, wekî menîya wê yekê ew e, ku wana Pawlos çawa rêberekî berk, qanûnparêz hesab dikir, yê ku dixwest ku ew li gora cêrge qanûna bijîtana. Diqewime wana destpê kiribû ew çawa fanat hesab bikira, lê ew bi temamî şaş bûn. Ewî ew *bi hizkirina heta-hetayêva* hiz dikirin, lê ne ku bi hizkirina vê dinîyayêva. Ew bi rastîyê dijî wan derdiket, eşaretî dida wana û gazî dikir bona tobekirinê, nenihêrî wê yekê, wekî guhdarvanên wî dikaribûn ew yek çawa hizkirin hesab nekirana. Feqet, xeberên wî bi hizkirina Xwedêye rastva tijîbûyî bûn.

## Bi hizkirin rastîyê bêjin

Peyî vî hemû tiştîra werin em derheqa girîngîya hizkirina rastda xeberdin. Careke mayîn şirovekirina hizkirinê binihêrin:

Hizkirin sebirkir e.

Hizkirin qenc e.

Hizkirin hevsûdîyê nake.

Hizkirin peya nade.

Hizkirin kubar nabe.

Hizkirin hişk nîne.

Hizkirin ya xwe nagere.

Hizkirin hêrs nakeve.

Hizkirin şaşîya hesab nake.

Hizkirina rûyê neheqîyêda şa nabe.

Hizkirin tu cara teslîm nabe.

*Ev e hizkirin, bo ku hûn temîyên* Wî xweykin.

Em derheqa rastîyêda dibêjin, lê em neqenc in, sebirkir nînin, lê dewsa wê yekê hevsûdîyê dikin, pesinê xwe didin, kubar in, hişk in, ya xwe digerin, hêrs dikevin, şaşîyên hindava meda kirî hesab dikin, nabaxşînin, rûyê neheqîyêda şa dibin û teslîm dibin, difikirin, wekî hinek meriv wê neyêne guhartinê, em temîyên Wî xweyî nakin. Em dikarin tobekirinê, hebandina hindava Îsa Mesîh û wî hemû tiştê, çi ku Încîlêda nivîsar e, dannasîn bikin, lê em bi hizkirina rastva naşuxulin. Em bûne qanûnparêz û dewsa rêberkirina merivaye berbi Xwedê zirarê didine wana.

Carekê xortek nêzîkî min bû û got:

-Ez hatime gazîkirinê, ku nava wê qulixêda bim, ya ku ya we ye. Ez hatime

gazîkirinê, bo ku rastkirinê bînime nava bedena Mesîh.

Wextê ku ewî derheqa wê yekêda gote min, min dilê xweda fem kir, wekî menîyên wî şaş bûn. Ruhê Pîroz bona wî ev xeber dane min:

-Tu dixwezî bizanibî, ku nava qulixa pêxembertîyêye rastda çawa bişuxulî?

Li ser sifetê wî ken hate kifşê, û ewî got:

-Belê, gelekî dixwezim bizanibim.

-Nava temamîya wededa, wextê tu eşaretîyê didî, dilê te gerekê hindava wan merivada bi hizkirinêva tijîbûyî be, bona kîjana tu dannasîn dikî, - min gotê.

Ew çend deqîqa bêdeng ma.

- Bi fikira min, Xwedê gerekê hela hê tevî min bixebite.

- Ez bi te firnax dibim,- min gotê. –Xeberên wî cûreyî tenê merivê şikestî dikare bêje. Tu diha gelekî nêzîkî wî halê ruhanî yî, ne ku çawa tu difikirî, dilê te nazik e.

Hizkirin diha gelekî derheqa yên mayînda difikire, ne ku derheqa şexsê xweda. Hizkirina wî cûreyî bes e, bona ku îzinê nede meriva ku ew ji zinêr bikevin. Hizkirin hemû cudatîyên milahîm dide kifşê, derheqa kîjanada serê kitêba A Korintîyaye 13-da nivîsar e, lê bi wê yekêva tevayî, ew gerekê tu cara ji temîyên Xwedê û Xilazkirê me nexalife.

Hizkirin awqasî lazim e û awqasî girîng e: ew heyîna jîyanê ye. Dua bikin, ku Xwedê dilê we bi hizkirina Xwe, bi Xwe tijî bike, bona ku hûn bi rastî diha zêde derheqa wan merivada bifikirin, ne ku derheqa jîyana xweda. Nivîsar e, wekî Ruhê Pîroz wê hizkirinê dilên meda radixe. Em dikarin hizkirina Wî, bi kûrayê, dirêjayê û bilindayê hîvî bikin.

Dêmek, careke mayîn hîvî bikin, û dîsa hîvî bikin, bona ku Ew dilên we bi hizkirina xwedêtîyê, ya heta-hetayêva tijî bike.

## gava praktîk

Em gerekê dengê xwe dijî wî gunehî bilind bikin, yê ku dixweze bikeve civînê, lê wê yekê gerekê bi hizkirin bikin. Eger usa nîbe, eşaretîyên me wê encamên lazim nedin. Xwedê bi rîya Xebera Xwe her dem eşaretîyê dide me, lê hizkirina Wî ya mezin usa kir, ku Ew diha zêde bike: Ewî Kurê Xwe şand, ku bahê wan hemû guneha bide, derheqa kîjanada Ewî eşaretî dida me.

Hizkirina vî cûreyî gerekê li cem me hebe, wextê ku em eşaretîyê didine meriva. Û kanîke hizkirinêye tek-tenê heye, ew jî Xwedê ye. Xwedê hizkirin e. Eger em dixwezin nava hizkirinêda bighîjin, em gerekê heleqetîyên xweye tevî Xwedê bidine kûrkirinê.

Awqasî girîng e, ku em her dem wede tevî Xwedê derbaz bikin, Wî bigerin û hîvî bikin, ku Ew me bi hizkirina Xweva tijî bike. Wextê ku em bi hizkirinêva tijî bibin, Ewê hemû tirsên di nava meda bide derxistinê. Ewê me mecbûr bike ku em bo merivên dor-berên xwe bişuxulin, ne tenê bi avîtina gavên merivhizî, lê usa jî bi eşaretîdayînêva, wextê ku hewcetî hebe. Hizkirina Xwedê wê me aza berde, û emê bikaribin wê azadiyê bidine merivên başqe. Îro wede başqe bikin, bona ku hûn bi cedandin dua bikin û hîvî ji Xwedê bikin, ku ew dilê we bi hizkirina Xweva tijî bike, û nava vî duayîda lez teslîm nebin.

25

# KEVIRÊ KRÎPTON BIŞKÊNIN

Sê tabî derheqa gunehêda hene, yên ku zyanê dighînine bawarmend.

Ya ewlin, hene bawarmend, yên ku qirar dikin rûyê dilên xweye berkbûyîda gunehê hesab hilnedin. Ew hindava wê yekêda tu tiştî texmîn nakin, wekî ew bi gunehkirinê dilê Xwedê diêşînin. Xudan bona wan dike axîn: “Gelo ew ji van kirên xirab şerm dikin? Na xêr: ew qet nizanin ji şermê sor bin jî” /Yêremîya 8:12, NLT/. Wujdanê wana zyanêketî ye, carina jî şewitî ye.

Ya duda, ya ku dîsa bi qezîya ye, hene bawarmend, yên ku bawarîya xwe li wê derewê tînin, wekî tebyeta me hemûyaye gunehkar heye. Ew bawar dikin, wekî qewata xwîna Îsa bes e, ku me ji cezayê gunehê azad bike, lê ne ku ji xulamtîya gunehê. Ew wê rastîyê qebûl dikin, wekî em nava Mesîhda bûne pîroz, lê bawarîya xwe li wê derewê tînin, wekî derbazkirina jîyana pîroz pêwîst nîne. Li civîna Tîyatîrayê hema hînkirina wî cûreyî dannasîn dikirin. Pawlos bi taybetî derheqa wê yekêda dibêje, dinivîse:

> “Bi vî cûreyî em nava gunehda bimînin, ku kerema Xwedê ser meda zêdebe? Na xêr. Çawa ku em bona guneha mirin, em çawa dikarin hê nava wanda bijîn? /Romayî 6:1, 2, NLT/.

Ev herdu tabî kevirê krîpton didine kifşê, ku gunehê bi zanebûn berdewam dibe, yê ku hin bawarmendên cuda, hin jî her civîneke olî zeyîf dike. Merivên nava van herdu komada xwe dane gunehê. Roja Dîwanê ewê hema ji Îsa bibhên: “Ji min dûrkevin” /binihêre Metta 7:2O-23/.

Ya sisîya, hene meriv, yên ku şerkarîyê dikin, ku ji gunehê azad bibin. Ew dixwezin azad bin, lê gunehê ew hişk girtine. Nava Xebera Xwedêda wana hela

hê eyan nekiriye, ku çawa azadya xwe bi bawarîyê bidine xebatê. Wextê ku ew guneh dikin, dilê wan diêşe, çimkî ew Xwedê hiz dikin. Ew bi rastî tobe dikin, lê piştî hinek wede careke mayîn guneh dikin. Mixabin, hema ji wan tişta jî yek ew e, yê ku wana nava xulmtîyêda xweyî dike, ew jî texmînkirina gunehê ye, tevî gunehkarkirinê. Ew şerma ku ew rûyê gunehê xweda texmîn dikin, wana nava wî gunehîda xweyî dike.

Eger hûn nava evê koma sisîyada nin, ez hîvî dikim, guhdarîya min bikin. Îsa dibêje me: “Eger birê te guneh bike, lê hilê, eger ser kirina xwe poşman be, wî bibaxşîne. Û eger nava rojêda hevt cara neheqîyê li te bike û vegere, tera bêje: “Ez tobe dikim”, wî bibaxşîne” /Lûqa 17:3,4/. Xudanê me temîyê dide me, ku em wî merivî bibaxşînin, yê ku guneh dike, lê rojekê ser hev, bi bêqelpî, tobe dike: em gerekê wî cûreyî bibaxşînin, çawa ku Bavê meyî Ezmana dibaxşîne me /binihêre Efesî 4:32/. Ez dixwezim ku hûn bizanibin: eger we gelek cara guneh kirine, lê her car hûn bi dilêşî û bi tobekirina rast nêzîkî Xwedê bûne, hûn baxşandîne, û xwîna Îsa we usa paqij dike, ku tê bêjî we tu cara guneh nekirine. Xwe ceza nekin, çimkî wî çaxî hûn mezinaya xwîna Îsa biçûk dikin û careke mayîn dicêribînin bi kirên xwe xwe afû bikin. Vî cûreyî hûn nikarin xilaz bin û baxşandinê bistînin. Xilazbûn pêşkêş e, ya ku Xwedê bi kerema Xwe daye.

Ev serê kitêbê hema bona wan meriva ye, yên ku li ser vê tabîya sisîya nin. Ez dixwezim derheqa wê yekêda gilî bikim, ku Xebera Xwedê çawa ez xilaz kirim.

## Ez nikaribûm xilaz bûma

Ez 12 salî bûm û çend hevalên min nasîya min dane kovarên pornografîk. Me ew kovar derbazî cem hev dikirin, û nava wedekî kurtda ez pêva hatime girêdanê.

Hemû tişt ji pornografîya sivik destpê bû, lê ez lez derbazî matêrîyalên diha giran bûm. Li cem min fikirên cûre-cûre pêşda hatin, yên ku îdî nedihatine kontrolkirinê. Li mektebê, wextê dersa, min dîna xwe dida keçika û heleqetîyên bedenîye tevî wan dihatine ber çavê min. Xwestineke gelekî mezin li cem min pêşda hatibû.

19 salîyêda, wextê berevbûneke li cîhê jîyîna xwendikarên xort, min jîyana xwe pêşkêşî Mesîh kir. Gelek guneh serwêrtîya xweye nava jîyana minda carekêra unda kirin: serxweşîya ji alkoholê, kifirî, nêzîkbûna neraste hindava keçikada, nêzîkîbûna hişk û gelek tiştên wî cûreyîye xirab tê bêjî unda bûn. Feqet, pornografîya û xwestina mine mezin ez bernedam. Ez hela hê wê yekêva girêdayî bûm û nikaribûm azad bûma. Her car, wextê ku min xwe dida wî gunehî, min lez tobe dikir û bi bêqelpî hîvî ji Xwedê dikir, ku Ewî bibaxşanda min.

Hetanî xilazbûnê, min dijî ewê xwestina bedenîye mezin şerkarî nedikir, lê

her car ez teslîm dibûm, wextê ku li cem min xwestin pêşda dihat. Piştî xilazbûnê, ez nava şerkarîya gurda bûm: min nedixwest pornografîya temaşe bikira, çimkî min zanibû, wekî ew yek dijî xwedêparêzîyê ye, lê min texmîn dikir, wekî ew yek diha qewat bû, ne ku qewata mine berxwedayînê.

Sala 1982-a, wextê ku ez 23-salî bûm, min Lîza stend. Ez difkirîm, wekî peyî wê yekêra xwestina min gerekê bitemrîya, çimkî min ew keç stendibû, derheqa kîjanêda ez pêşda nava xiyalada bûm. Feqet, ew xwestin dûr neket: dewsa wê yekê hemû tişt diha giran bû. Çawa ku her matêrîyaleke pornografîk li ber çavê min diket, ewê ez berbi xwe dikişandim, çawa ku magnît hesin berbi xwe dikişîne. Wê yekê hukumê xirab li ser heleqetîyên min û Lîzayê dihişt, hin nava cîhada, hin jî nava govekên mayînda.

Sala 1983-a, ez ketime nava qulixêdarîyê, lê min hela hê dijî pornografîyaê şerkarî dikir. Min diha zêde lêhilatina diha qewat texmîn dikir, wextê ku min şaşîya xwe fem dikir. Li civînê borcdarîyên min ew bûn, ku min qulixî serwêrê xwe, malbeta wî, usa jî qulixçîyên mêvan bikira. Civîna me li Amêrîkayê civîneke here naskirî bû, û me gelek serwêr û mizgîndarên bi nav û deng bi mêvandarî qebûl dikirin. Yekî ji wana bi qulixa xweye azakirinêva gelekî eyan bû. Ew çend sala li Asîyaê mabû. Gelek serhatîyên dokûmantal hene, yên derheqa wê yekêda, wekî bi saya qulixa wî gelek meriv ji guneha û cina aza dibûn. Ew serhatî gelekî cuda bûn. Xwedê ew bi cûrên cuda-cuda dida xebatê. Ew Lêstêr Samral bû.

Payîza sala 1984-a ew cara bi sirê hate civîna me, ku sêmînara çarroje bide derbazkirinê, û min careke mayîn ew qebûl kir. Ji seredanên pêşda nasîya min, ya tevî wî qulixçîyî, gelekî baş bû. Vê carê, wextê ku min bi avtomaşînê rêberîya wî dikir, û em tenê bûn, min hesab kir wekî ew demeke baş bû, bona ku min wîra derheqa şerkarîya xweye dijî ewê xwestina xwe gilî bikira. Min xwe şikênand û hetanî dawîyê min dilê xwe vekir, çimkî min dixwest ji wê yekê aza bûma. Lêstêr minra berk xeberda, mînanî bavê bawarîyêyî rast. Min bi guhdarî her xebereke wî bihîst, û paşê min bi gumanbirî ji wî hîvî kir: “Dua bikin, bo ku ez azadiyê bistînim”.

Ewî duakî hukumdar kir, lê ez ecêbmayî mam, wextê ku nava hevtîyên mayînda û mehên mayînda li cem min tu tişt nehate guhartinê. Min dîsa dijî wê xwestina xwe şerkarî dikir.

Neh meh derbaz bûn, û bona min malek pêşniyar kirin, ku ez bona rojîgirtinê û duakirinê başqe bûma. Roja çara, ya rojîgirtinê, şeşê gulana sala 1985-a /ezê tu cara wê rojê bîr nekim/, wextê ku ez nava duayê kûrda bûm, ez bi temamî ji wî ruhê xwestinê azad bûm. Ruhê Pîroz rêberî li min kir, ku ez bi serwêrîyê emir bikim, ku ew xwestina ji jîyana min dûr bikeve. Min ew yek kir, û ew serwêrtîya

ku hate nava jîyana min, diha zêde bû, ne ku yên ku min pêşda dîtibûn. Razîbûna ji Xwedê, hetanî roja îroyîn ez ji wê yekê aza me!

## Bona çi diha dereng?

Piştî çend sala, wextê jîyana azaye ji wî gunehî, pirseke mayîn li cem min pêşda hat, ya ku ez bi duakirin anîme li ber Xudan. “Bavo,- min jê pirsî,- ez fem nakim. Ez li ber ewî qulixçîyê mezin, Lêstêr, ta bûm. Gelek meriv bi rîya qulixa wî aza bibûn, bona çi min hema wê rojê azayî nestend, wextê ku ewî bona min dua kir? Bona çi piştî neh meha min azadî stend?”.

Xudan destpê kir jîyana mine nava wî wedeyîda nîşanî min bide. Payîza sala 1984-a, wextê ku Lêstêr bona dannasînkirinê hate civîna me, min her sibeh 9O deqa dua dikir. Îdî du sala ser hev min ew yek dikir. Ez her sibeh seheta O5:OO hişyar dibûm, hetanî O5:3O, ez ji malê derdiketim û hetanî O7:OO min dua dikir.Wî çaxî duayên mine here baş ev bûn: “Xwedê, min bide xebatê, ku ez rêberîya geleka, ya berbi Îsa, bikim: min bide xebatê ku ez nexweşa qenc bikim: min bide xebatê ku ez  azayê bidime meriva. Bavo, min bona hiştina hukume li ser mileta û rêberkirina wane berbi Îsa bide xebatê”. Min ew yek her dem dua dikir, her roj hîvî ji Xwedê dikir, ku qulixê bide û dergehên usa veke, kîjana tu kes nikare bigre. Min bi cedandineke mezin dua dikir.

Rojeke payîzê, wextê ku ez nava duakirina xweye her sibehêda bûm, û min dîsa ew tişt dua dikirin, derheqa çida min bi meha û hela sala jî ser hev hîvî dikir. Nişkêva, nava wedekîda, wextê ku min dîsa bi cedandin hîvî dikir, Ruhê Pîroz minra got: “Kurê min, tu dikarî gelek elaleta bona Îsa qazanc bikî, azadiyê bidî geleka û nexweşa qenc bikî, lê heta-hetayê jî dojeyêda derbaz bikî”.

Ez zendegirtî mabûm: *“Gelo eva tiştê bûyînê ye? Gelo ez bi rastî dengê Ruh*ê Pîroz dibhêm?”. Ez hinekî bi şikberî nêzîkî guhdarkirina xwe bûm, hetanî ku Wî careke mayîn bêdengî teriband û got: “Kurê min, Cihûda xebata xwe hişt, ku peyî Min bê: ewî Mizgînî dannasîn dikir, bi navê Min nexweş qenc dikirin, bi navê Min meriv aza dikirin, û Cihûda li dojê ye”.

Ez li malbeteke katolîk mezin bibûm û wî çaxî pênc sal bûn, ku ez bibûme bawarmend: dêmek, ez bi temamî wê yekêra nenas bûm, çi ku ez niha wera dibêjim. Saw minda çû: ez lerizîm, wextê ku min xeberên Wî dilê xweda bihîstin. Ez dilerizîm û ditirsîyam xeberdim. Ez bi temamî tevlîîhev bibûm, lê bi wê yekêva tevayî, min zanibû, wekî Xwedê minra xeber dida, û ji hazirîya Wî ez tirsîyayî bûm.

Bi kutasî, min qewatên xwe berev kirin, û bi cûrê qedirgirtin got: “Wî çaxî, ji her tiştî zêdetir ezê berbi çi bicedînm? Tiştê herî girîng kîjan e?

Û min usa zelal bersiva Wî bihîst: “Naskirina Min, ya ji nêzîkva”.

Piştî vê rasthatinê, bi lêkolînkirina Xebera Xwedê, min fem kir, wekî Dawid, Mûsa, Pawlos û ewên ku nava jîyana xweda gihîştine dawîya açix, ji her tiştî zêdetir hema ev yek dixwestin. Pawlos dibêje:

> "Û serda jî ez her tiştî zyan hesab dikim, û himberî vê yekê nakim, ku Xudanê xwe Mesîh Îsa nas bikim, ku kara ser kara ye! Bona xatirê Wî ez ji her tiştî qetîyam û çawa gemar hesab dikim, wekî Mesîh qazanc bikim" /Fîlîpî 3:8/.

Meremê wî naskirina Îsaye ji nêzîkva bû, û ji wê naskirinê qulixa wîye bi qewat dikişîya: min berbi qulixê dicedand, lê ne ku berbi naskirina Îsaye ji nêzîkva. Wê rojê hemû tişt hate guhartinê.

Peyî wê yekêra, duayên mine herroje vî cûreyî bûn: "Xudan, ez dixwezim Te awqasî naskim, çiqas meriv dikare naske. Ez dixwezim Te awqasî razî bikim, çiqasî meriv dikare razî bike. Dilê Xwe nîşan bide, eyan bike, çi ku bona Te girîng e, û wê yekê eyan bike, çi ku bona Te awqasî jî girîng nîne. Min hînî rêyên Xwe bike, û bila jîyana min şabûnê pêşkêşî Te bike…".

Ez dîsa sibeh zû hişyar dibûm, lê hîvîkirinên min wî cûreyî bûn. Min fem nedikir ku çi diqewimî, lê paşê Xwedê ew yek nîşanî min da.

Pirsa min ev bû: "Bona çi ez azad nebûm, dema ku Lêstêr Samral bona min dua kir?", û min destpê kir bersiva wê fem bikim. Xwedê minra got: "Wextê ku te dilê xwe li ber wî mizgîndarî vekir, tu ditirsîyayî wekî ew guneh, ew xwestin, wê îzin neda te ku tu biketayî nava wê qulixê, bona kîjanê çawa ku te zanibû, Min gazî te kiribû. Tu ditirsîyayî, wekî ew yek wê te bêqedir bikira. Kedera te li ser te merkez bibû: ew keder ya vê dinîyayê bû".

Ewî gotina xwe berdewam kir: "Piştî neh meha, te bona ji nêzîkva naskirina Min dikire qîrîn, dilê te destpê kir rûyê wê yekêda biêşe, wekî bi gunehê xwe te dilê Min diêşand. Te zanibû, wekî Ez bona azadkirina teye ji wî gunehî miribûm, û bona te tiştekî gelekî nehizkirinê bû, ku tevî tiştekî usa bibûyî, bona çi Min xaç bilind kiribû. Kedera te berbi Min bû: ew jî kedera bi cûrê xwestina Xwedê bû.

Pawlos civîna Korintîyêra dinivîse:

> "Lê niha ez şame, ne ku bona wê yekê ku hûn ber xwe ketine, lê çimkî hûn bona tobekirinê ber xwe ketin. Hûn li gora xwestina Xwedê ber xwe ketin, usa ku we tu zyan ji me nedît. Berxweketina *li gora xwestina Xwedê* mêriv berbi tobeyîyê dibe, ku xilazke û poşmanî têda tune, lê berxweketina ji vê dinîyayê berbi mirinê dibe" /B Korintî 7:9,1O/.

Nava vê xeberêda xebera “xilazbûn” nava zimanê yûnanîda eseyî nîne, wekî bide kifşê ku careke mayîn xuliqîye. Xebera “sotêrîya” çawa “çareserî, azayî, parastina ji qezîyayê, yan jî undabûnê” tê şirovekirinê /*“Ferhenga tam, ya lêkolînkirina xeberên peymana Nû”*/. Em xebera “azadî” ji vê şirovekirinê cuda bikin û nava gotina jorinda dewsa xebera “xilazbûn” daynin: “Berxweketina li gora xwestina Xwedê mêriv berbi tobeyîyê dibe ku *aza bike*”. Min azayî stend, aza bûm, û berxweketina li gora Xwedê bû, wekî bona wê yekê derî vekir.

## Du cûrên berxweketinê

Du cûrên berxweketinê hene, ya xwedêtîyê û ya vê dinîyayê. Mînakên Şaûlê padişa û Dawidê padişa, firqîya di navbera van herduyada nîşan didin. Çawa ku me nava serîkî kitêbêyî pêşda da dîyarkirinê, nava şerê tevî amelêkîya, Şaûl dijî Xwedê gurênekirin da kifşê. Ewî gurênekirina xwe qebûl nekir, wextê ku Samûêlê pêxember ew yek destnîşan kir, lê Samûêl teslîm nebû. Şaûl cimet gunekar kir, û tenê wî çaxî, wextê ku pêxember gotina xwe îzbat kir, ew li xwe mikur hat: “Min guneh kir”. Piştî xwemikurhatinê ewî lez gote Samûêl: “Min guneh kir: ez reca dikim, niha li ber rîspîyên cimetê û Îsraêlê qedirê min bigre” /A Padişatî 15:3O/. Berxweketina Şaûl li ser wî ya bi xwe bû. Samûêl li ber serwêra û cimetê ew dabû şermê. Şaûl dixwest qedirê xwe bida dasekinandinê.

Himberî wî, Dawidê padişa diha gelek guneh kirin. Ewî tevî jineke merivekî mayîn zinêkarî kir û emir kir ku wî merivî bikujin, bona ku xirabkarîya wî bê veşartinê. Natanê pêxember li ber serwêra û cimetê li Dawid hilat. Wextê ku gunehên Dawid eşkere bûn, ew kete erdê û got: “Min dijî Xudan guneh kirîye” /B Padişatî 12:13/.

Şaûl got: “Min guneh kir”. Dawid got: “Min dijî Xudan guneh kirîye”. Firqîya di navbera van gotinada ev e. Dilê Dawid diêşîya, çimkî ewî Hizkirîyê xwe êşandibû. Berxweketina wî li ser wî merkezbûyî nîbû, çawa ku ya Şaûl bû. Em vê yekê dibînin, wextê ku Dawid temamîya şevê li ber Xudan pal da û hevt roja rojî girt. Ew bi temamî bona kirên xweye dijî Xwedê poşman bibû. Ewî ew yek zelal da kifşê, wextê ku kire qîrîn:

> “Li ber Te tenê himberî Te min guneh kir û xirabî li ber çavê Te kir, usa ku Tu rast î qirara Xweda û paqij î hakimtîya Xweda” /Zebûr 51:4/.

Berxweketina vê dinîyayê li ser me merkez dibe: “Ev yek wê encamên çawa bide?”, “Ezê bona vê yekê bême gunehkarkirinê?”, “Ezê bêqedir bim?”, “Ezê cezayê gunehê xwe bistînim?”, “Merivê derheqa minda çi bifikirin?” û tiştên

mayîn. Berxweketina li gora Xwedê li ser Îsa merkez dibe: “Min dilê Hizkirîyê xwe êşand, û Ew çi jî qirarke, *hakimtîya Wî heq û rast e, û ez teslîmî rehma Wî dibim*”.

## Azaya tam

Ez îdî azad bûm, lê hela hê hewcetîya çêkirina fikira min hebû. Bona wê yekê du-sê sal lazim hatin. Hetanî gulana sala 1985-a, eger min hinek cîha matêrîyalên pornografîk didîtin, min nikaribû ber xwe bida. Lê peyî vê yekêra, min îdî dikaribû xwe kontrol bikira û ji van matêrîyala dûr biketama, lê eger jineke bedew li rex minra derbaz dibû, ez mecbûr dibûm alîkî mayîn binihêrim, bona ku fikira min neçûya berbi wê yekê. Eva ew azadiya tam nîbû, ya ku Îsa dabû me. Azadbûna min hela hê ya tam nîbû.

Di navbera stendina azadiyê û bûyîna azad firqî heye. Min şeşê gulanê azadî stend, lê Îsa dibêje: “Û hûnê rastîyê naskin, û rastî wê we aza bike” /Yûhenna 8:32/. Merem azabûn e, lê bona wê yekê rastî gerekê bikeve nava we.

Ez nava Xebera Wî û duayêda mam û fikira min destpê kir jina usa binihêre, çawa ku Ew wana dibîne. Guhartina ewlin wî çaxî qewimî, wextê ku min dilê xweda fem kir, wekî hemû jin *ewled in*. Ruhê Pîroz nîşanî min da, wekî her jinek keça dê û bavekî ye. Ew parçên goşt nînin, çawa ku min li wana dinihêrî hetanî azadbûna xwe.

Piştî hinek wext, dilê min eyantîke hê mezin stend. Bona min zelal bû, wekî hemû jin bi şikilê Xwedê hatine çêkirinê, û wekî Ewî ew bi rûmet û rewşêva xemilandine /binihêre Destpêbûn 1:26, 27 û Zebûr 8:5/. Careke mayîn biwekilînim, wekî diqewime ev eyantî gelekî kûr neyê texmînkirinê, lê ewê jîyana min bi temamî da guhartinê.

Niha, wextê ku li ber min şkilekî pornografîk tê kifşê, ew yek bona min çawa tiştekî bêhurmetkirinê ye. Belê, wextekê ez berbi çi diçûm, niha ewê yekê ez ji xwe dûr dixistim. Niha, wextê ku jinek li rex minra derbaz dibe, hewce nîne ku ez berê xwe lê vegerînim, çawa ku çend sal pêşda, pêşiya ku min azadî stend. Niha ez dikarim li çavê wê jinê binihêrim û silavê bidimê, bêyî wê xwestina mine berê.

Min qewata kerema Îsa Mesîh eşkere kir. Ez fem dikim, wekî piranîya mesîhîya keremê çawa xilazbûn, afûkirina guneha û pêşkêşa ku nelayîq tê dayînê, dibîne. Min fem kir, wekî ev hemû cudatîyên ecêb dikevine nava Kerema Xwedê, lê ew usa jî qewatê dide me ku em bêne guhartinê, ku wî hemû tiştî bikin, bona çi rastî gazî me dike.

Gelo em dikarin bawar bikin, wekî pêşkêşa Îsaye ku belaş mera tê dayînê, me ji *cezayê guneh*ê heta-h*etayê* aza dike, lê awqasî qewat nîne, ku ji *xulamtîya guneh*ê me azad bike? Hûn nikarin nava wê pirsêda fikira min biguhêrin.

Ez zanim. Min kerema Wîye ku jîyanê diguhêre, dîtîye û ez niha azame. Ez awqasî razîme, wekî Ewî ew yek bona min kir, û awqasî razîme, wekî Ewê wê yekê bona we jî bike. Ew yek şerkarî bû, lê ne ku gera nava tebyetêda bû: çimkî ji min xwestina qewîn û duayê bi cedandin hate xwestinê. Bi texmîn, ew yek wê ji we jî bê xwestinê. Behsa qenc ew e, wekî hûn bin nekevin, çimkî kerem û hizkirina Xwedê bin nakevin. Bo wê yekê jî tevî kerema Wî bimînin û azad bin.

## gava praktîk

Xwedê Xilazkirê we ye, û yekî mayîn tune. Ne bernameke ji pênc gava hazirkirî, ne cedandineke merivatîyê û ne jî navnîşeke qanûna nikarin we ji xulamtîya gunehê aza bikin. Feqet ew yek nade kifşê, wekî Xwedê me ji gunehê azad dike, wextê ku em bêkar in. Xwedê wê we aza bike, lê bona gera Wî, dîtina Wî, cedandin lazim in. Wextê ku em Bavê xweyî ezmana bi menîyên rast bigerin, bona naskirina Wî, lê ne ku bona ji Wî tiştekî bistînin, emê berbi azadya xwe herin.

Pirs ev e: stendina azadiyê bona we çiqasî girîng e? Bona ku hûn Xwedê bigerin, hûnê wede başqe bikin? Hûnê ji karên xweye herroje cuda bin, eger hewcetîya wê yekê hebe? Hûnê berdewam bikin, bikine qîrîn, hetanî ku hazirîya Wî bibînin û sozên Wî bistînin? Hûnê nêzîkî Wî bibin, îzinê bidine Wî, ku Ew biryar bike ku heleqetîyên we wê çi cûreyî bin? Hûnê bicedînin bo heleqetîyên xwe ji gunehê azad bin, lê ne ku bi wê menîyê, wekî ew yek îzinê nade we ku hûn bi xwestina xwe bijîn? Hûnê ta bin, îzinê bidin, wekî rêberên kifşkirî û xwedêparêz bona we dua bikin û jîyana weda wera bêjin?

Bahê xulamtîya xwe hesab kin, lê usa jî bahê azadiya xwe hesab kin. Û bi temamîya dilê xwe li peyî Xwedê herin. Ew hîvîyê ye, ku ji nêzîkva we nas bike.

26

# GUNEHÊ KU NE GUNEH E

Hûn zendegirtî man, wextê ku we ev sernivîsar xwend?

Alîkî pûtparistîyê jî heye, derheqa kîjanîda me hela hê xeber nedaye û wî alîyî meriv dikare vî cûreyî nav bike: "*gunehê, ku ne guneh e*". Em nikarin wê yekê hesab hilnedin, eger em dixwezin bi temamî kevirê krîpton bişkênin, çimkî ew dikare ji her tiştî zêdetir usa bibe, ku meriv nikaribe wî bibîne. Werin em bi metelokekêva destpêkin.

Rojekê merivekî gote Îsa, ku wê çiqasî baş bûya, ku nava padişatîya Xwedêda biçûna şahîyê. Îsa ji wê gotina wî merivî encam dît û rastîke girîng eyan kir: "Merivekî şahîke giran hazir kir û gelek meriv teglîf kirin. Gava wextê şahîyê pêra gihîşt, ewî xulamê xwe şand ku hemû teglîfkirîyara bêje: "Her tişt îdî hazir e, kerem kin werin". Lê her yekî destpêkir menî girt" /Lûqa 14 :16-18/. Fikira vê metelokêye girîng ew e, ku wana menî raber kirin.

Gelo hûn rastî tiştên usa hatine? Hûn hîvî ji kesekî dikin, tiştekî dixwezin, ku ew alî we bike, bê êvarîyê tiştekî girîng bike, xebateke teslîmkirî, yan jî tiştekî mayîn, û çawa bersiva wê yekê ew menîyên zeyîf raber dike. Ew yek çi dide kifşê? Bi rastî gotî, gilî derheqa wê yekêda ne, wekî bernamên wan diha girîng in, ne ku hîvîkirina we. Bi texmîn, ew dibêjin: "Karên min diha girîng in bona min, ne ku yên te".

Bi gotinên Îsa, wî merivî kivav, hot-dog, yan jî çîps nedida ber we. Ew şahîke mezin bû û qewimandineke girîng bû. Ewî ew yek teşkîl kiribû, bona ku yên ji alîyê wîda teglîfkirî bihatana duakirinê. Teglîfname hatibûne hazirkirinê, morkirinê û wanra hatibûne şandinê, yên ku wê bixwestana tevî şahîyê bibûna, lê hemûya bi menîgirtinê bersiv dan: "Yê pêşin wîra got: "Min xwera erd kirîye,

ez eseyî gerekê herim bibînim. Ez hîvî ji te dikim, min bibaxşîne”” /Lûqa 14:18/.

Ezê pirseke girîng bidim: gelo çûyîna dîtina erd guneh e? Bêguman, na. Eger usa ye pirsgirêkên min wê hebin, çimkî nava jîyana minda usa qewimîye, wextê ku min erd kirîye. Feqet, wextê ku kirîna erd diha girîng e ne ku Xebera Xudan, ew guneh e, “gunehê ku ne guneh e, guneh nîne”. Diha rast ew pûtparistî, yan jî kevirê krypton e.

Em lê binihêrin, ku yê mayîn çi got: “Û yê din got: “Min pênc cot ga kirîne, ez diçim ku wan bicêribînim. Ez hîvî ji te dikim, min bibaxşîne”” /Lûqa 14:19/.

Careke mayîn, gelo kirîna ga, yan jî bi gilîkî mayîn gotî, bona xebatê kirîna dem û dezga guneh e? Bêguman, na: nava jîyana minda min bona xebata xwe gelek tişt kirîne. Feqet, wextê ku kirîna tiştekî diha girîng e, ne ku Xebera Xudan, wî çaxî ew guneh e. Dêmek, careke mayîn bêjin, ew yek “guneh e, yê ku guneh nîne”, lê diha rast ew yek pûtparistî yan jî kevirê krypton e. Werin em guhdarîya teglîfkirê dawî bikin:

> “Û yê mayîn jî got: “Ez zewicîme, lema nikarim bêm”” /Lûqa 14:2O/.

Îzinê bidin cara dawî pirs bikim: gelo zewac guneh e? Eger usa ye, gelek mêr, nava wanda usa jî ez wê rastî pirsgirêka bên. Bêguman ew yek guneh nîne. Feqet, wextê ku zewac diha girîng e, ne ku Xebera Xudan, ew yek guneh e. Careke mayîn, ew yek “guneh e, yê ku ne gunehe” diha rast ew pûtparistî ye yan jî kevirê krypton e.

Ez difikirim, wekî fikira vê gotinê femdarî ye: wextê ku em şexsekî, yan jî tiştekî, yan jî şuxulkarîkî diha girîng hesab dikin ne ku Xebera Xudan, ew çi ku guneh nîne, dibe guneh.

## Kevirê minî krîpton eşkere bû

Çawa ku min îdî got, ez bengîyî li ser Îsa Mesîh bûm, wextê ku li zankoya “Pûrdyû”-yê xwendikarê kûrsa duda bûm. Sala 1981-ê, li cîhê jîyana xwendikarên xort min Ew çawa Xudan qebûl kir. Hindava Wî da ez bi agirva tijîbûyî bûm.

Piştî çend meha sêzona fûtbola amêrîkî destpê bû. Ez îdî kûrsa sisîyada bûm û çawa xwendikar hemû bilêtên lîstikaye koma me li cem min bûn. Nava her du salên derbazbûyîda min tu lîstikek bernedabû. Feqet, wî çaxî ez bi Îsa usa hijmekar bibûm, wekî min wedê lîstikên fûtbolê bona lêkolînkirina Încîlê da xebatê. Li cîhê jîyîna xorta edil bû, çimkî hemû kes diçûne lîstika. Wî çaxî mecaleke baş bû, bona ku min wedê duakirinê derbaz bikira. Wedê tevî Xwedê derbazkirî diha lezet bû, ne ku fûtbola amêrîkî.

Tu kesî minra negotibû: “Tu gerekê herî lîstikên fûtbola amêrîkî”. Qet fikira minra jî derbaz nebibû, wekî çûyîna temaşekirina lîstika şaş e. Bi rastî, wextê sala xwendinêye dawî ez çûbûme gelek lîstika.

Piştî serhevdaanîna zankoya “Pûrdyû”-ê ez cîguhastî bajarê ştata Têxasêyî Dallasê bûm, û piştî çend meha ez li civîna xwe derbazî ser xebatê bûm, li kîderê ez bibûme endamê wê. Bi saya civîna mezin û hukumdar, ji 4OO-î zêdetir xebatkarên me hebûn.

Wî çaxî koma fûtbolêye Kovboya, ya bajarê Dallasê, nava lîga miletîyêda koma here baş bû. Ez piştgirê Kovboyayî mezin nîbûm, çimkî ez li Mîçîganê mezin bibûm, lê her duşem min qisên xebatkarên meye derheqa Kovboyada dibhîstin. Wana bi êmosîyonalî lîstika roja yekşemê gotûbêj dikir, derheqa wanda, wedê lîstikêyî balkêşda û bêfitîya derheqa encamên lîstikaye pêşda xeber didan.

Bi saya wê yekê, li cem min hewaskarî pêşda hat, ku ez lîstikên Kovboya temaşe bikim. Pêşda min ji beşa lîstikêye ewlin, yan jî ya duda, temaşe dikir. Li min xweş dihat ku ez temaşe bikim, çimkî lîstika wan gelekî hewaskar bû. Wê yekê mecal dida min, ku min bikaribûya tevî xebatkarên ofîsêye mayîn lîstik gotûbêj bikirana.

Lê nava wededa hewaskarîya min, ya hindava Kovboyada zêde bû û min lîstikên wan bi temamî temaşe dikirin. Min destpê kir bi dengê bilind têlêvîzyonêra xeberdim, carina şa dibûm, lê carina jî li ser lîstikçîya min dikire qîrîn. Bi kutasî, gihîşte wê derecê, wekî min tu lîstikek bernedida, yan jî tu beşeke lîstika bernedida. Di navbera sêzonada jî min tevî xebatkarên mayîn dîsa derheqa sêzona bi sirêda gotûbêj dikirin û me pêşda digot, ku lîstikên bi sirê wê çi cûreyî derbaz bûna. Ez îdî bibûme piştgirekî tam.

Şabûna min gelekî mezin bû, wextê ku sêzona lîstikaye bi sirê destpê bû. Her yekşem, piştî qulixê, ez lez diçûme malê û min têlêvîzyon dişuxuland. Min qet kincên xwe jî nediguhartin. Ez ji têlêvîzyonê nediqetîyam, nenihêrî wê yekê, wekî kincên min bêfesal bûn, ez wanda aza nîbûm û serbara serda jî hewcetî hebû, ku min av li xwe bikira. Min nedixwest qet deqeke lîstikê jî berdim.

Wextê ku lîstik nîvî dibû, navbirî dihate dayînê, ez wî çaxî diçûme oda xwe û min kincên xwe diguhastin. Eger hewcetîya Lîzayêye bona alîkarîya min hebûya jî, ewê dikaribû derheqa wê yekêda bîr bikira: “Delalê min, Kovboy dilîzin”. Wextê navbirîya lîstikê me xwerin dixwer, yan jî peyî lîstikêra. Wextê lîstikê me tu cara xwerin nedixwer.

Wî çaxî min derheqa hesabên koma fûtbolêye sosyolocîda zanibû. Min bi guhdarî ew lêkolîn dikirin û her dem ez difikirîm, ku Kovboy dikaribûn diha baş bilîstana. Li cîhê xebatê min îdî hemû xeberdanên derheqa lîstikada derbaz diki-

rin. Civînêda hebûn meriv, bilêtên kîjanaye belaş hebûn û min bi hazirîke mezin hemû teglîfkirinên bona çûyîna stadîyonê û temaşekirina lîstika qebûl dikirin. Min tu cara *menîyên zeyîf* bona çûyîna li wir raber nedikirin.

Werin em derbazî sêzona lîstikaye bi sirê bibin. Pêşîya destpêbûna lîstika, hinek wede pêşda, min dua kir, û ew dua, bi fikira min, gelekî sade û ne girîng bû. Feqet, min texmîn nedikir, wekî ewê jîyana min bida guhartinê. Duayê min vî cûreyî bûn: "Xudan, ez hîvî dikim, dilê min paqij bike. Ez dixwezim bona Te pîroz û buhurtî bim: eger nava jîyana minda tiştekî usa heye, ku li te xweş nayê, yan jî ji Te girîngtir e, wê yekê eyan bike û alî bike, ku ew dûr bikeve!".

Sêzona lîstika nêzîkî dawîyê dibû. Wedekî kurt mabû, ku lîstikên fînalê ser hevda bihatana. Min lîstikeke biryarkir temaşe dikir: Kovboy dijî Teyrên Fîladêlfîyayê dilîstin. Kê ser biketa, ewê tevî lîstikên fînalê bibûya, lê yê binketa, wê der bima. Ez ji têlêvîzyonê nediqetîyam: ez rûniştî nîbûm, lê li ber êkrana têlêvîzyonê sekinîbûm. Beşa lîstikêye dawî bû, û heyşt deqe mabûn ku lîstik ser hevda bihata. Kovboy bi çar qalava bin diketin, wextê ku koma wan bi rêberîya lîstikçîyê wanî bi nav û deng êrîş kir. Wextê êrîşa ez pêşda û paşda diçûm û dihatim, û wextê ku xirab dilîstin min dikire qîrîn, û bi dil şa dibûm, wextê ku baş dilîstin. Dawîya lîstikêye nedîyar tê bêjî aktîvî pêşda dianî.

Nişkêva, bêyî tu eşaretîkê, Ruhê Xwedê ez şandime berbi duakirinê. Ewê yekê bi temamî ez tijî kirim: "Dua bike, dua bike, dua bike". Ew yek kûraya dilê minda barekî giran bû û texmînkirineke giran bû. Min zanibû, wekî wî cûreyî wî çaxî lazim bû, wextê ku Ruhê Xwedê dixwest, ku ez başqe bim û dua bikim.

Min bi dengê bilind got: "Xudan hetanî dawîya lîstikê heyşt deqe mane. Wextê ku lîstik ser hevda bê, ezê dua bikim".

Nenihêrî wê yekê, ew hal nesekinî û sist nebû.

Çend deqe jî derbaz bûn. Min xwest ku ez sivikayê bistînim û min kire gazî: "Xudan, ezê pênc seheta dua bikim, wextê ku lîstik ser hevda bê. Bi tomerî hildayî şeş deqe mane".

Top li cem Kovboya bû. Ez guman bûm, wekî nava wê lîstika girîngda ewê ser biketana. Feqet, ew defdana berbi duakirinê sist nedibû, lê serbara serda diha qewat dibû. Min gumanbirî texmîn kir. Min nedixwest lîstik bihişta, û min bi dengê bilind got: "Xudan, ezê hetanî dawîya rojê dua bikim, ezê temamîya şevê jî dua bikim, eger Tu dixwezî".

Min hetanî dawîyê lîstik temaşe kir. Kovboy ser ketin, lê çawa ku min soz dabû Xwedê, min têlêvîzyon temirand. Ez hilkişîyame qatê duda, li oda xweye xebatê, derî girt û min çok da, ku dua bikim. Feqet ew defdana berbi duakirinê derbaz bibû. Barê duakirinê îdî tune bû. Texmînkirina sivik jî tune bû: min tu tişt texmîn nedikir.

Min cêriband wê texmînkirinê gur bikim. Paşê min cêriband dua bikim, lê xeberên min hişk û mînanî hev bûn. Gelek wede lazim nehat ku min fem bikira ku çi qewimîbû: min lîstika fûtbolê ji hîvîkirina Xwedê girîngtir hesab kir.

Ez ta bûm, sifetê min gihîşte xwelîçê, û min kire axîn: "Xwedê, eger kesek ji min bipirsîya: "Nava jîyana teda kî ye diha girîng, Xwedê, yan Kovboyên Dallasê?", minê bêyî sekinandin bigota: "Bêguman, Xwedê". Feqet min hema hêja nîşan da, ku kî diha girîng e. Tu hewcê min bûyî, lê min lîstik diha girîng hesab kir. Hîvî dikim, min bibaxşîne".

Min carekêra dilê xweda bihîst: "Kurê min, Ez ji te qurbanîya duakirina pênc sehetê naxwezim. Ez dixwezim tu gura Min da bî".

## Her govekeke jîyanê

Pûtparistîya vî cûreyî dikare nava her govekeke jîyanêda cîhê xwe bigre. Qewimandinek tê bîra min, ya ku nêzîkî wî wedeyî qewimî, kengê ev serhatîya pêşin qewimî. Sibehekê, ez hazir dibûm xwerina xwe bikira derdanekê. Ez hiz dikim, wê xwerinê her sibeh bixum. Feqet wê rojê min dengê Xwedê bihîst: "Ez dixwezim ku tu ji dema taştê rojîyê bigrî".

Tê bîra min, wekî min li xwerina xwe dinihêrî û min awqas gelekî dixwest ew bixwera. Min gotê: "Xudan, hevtîya tê ezê sê roja rojî bigrim": ev jî *menîke sist* e bona gurênekirina hîvîkirina Wî. Xwedê nîşanî min da, wekî xwerin bona min pût bû. Min mecalên giranbihaye bona xeberdana tevî Xwedê têberdabûn, çimkî xwestina mine hindava xwerinê da diha zêde bû, ne ku cedandina berbi hazirîya Wî û Xebera Wî.

Hema wî cûreyî jî, wextê ku ez gelekî nava lîstika golfêda kûr bûm, wî çaxî Ruhê Pîroz gote min, ku ez tiştên bona lîstika golfê bi temamî pêşkêşî serwêrekî bikim /nava jîyana wîda golf cîhê şaşda nîbû/.

Sal nîvekê min golf nelîst û piştî wê yekê Xudan dilê lîstikçîkî golfêyî profêsyonalda danî, wekî ew berevoka tiştên lîstika golfê pêşkêşî min bike, qîmetê kîjanê dighîşte bi hezara dolara. Min nizanbû çi bikira. Çend meh pêşda serwêrekî gotibû min, wekî Xwedê kiribû dilê wî ku ewî berevoka tiştên golfê pêşkêşî min bikira. Ez bi rastî tevlîhev bûm.

Wextê ku ew çû, û ez tenê mam, min ji Xudan pirsî: "Ez vê berevokê çi bikim?".

"Golfê bilîze",- min dilê xweda bihîst.

Lê sal nîvekê pêşda Te temî da min ku ez wan hemû tişta pêşkêş bikim".

Min bihîst, ku Xwedê çawa gote min: "Bona te golf îdî cîhê şaşda nîne. Ew

bûye mecala hêsabûnê û derbazkirina wedê xweş”.

Peyî wê yekêra û hetanî roja îroyîn ez golfê dilîzim. Xwedê bi cûrekî baş ev lîstik da xebatê, ku hêsabûnê bide min. Ew yek usa jî bû dikeke bona rêberkirina merivên undabûyîye berbi xilazbûnê, usa jî bona heleqetîyên tevî kurên min, rêberên civînêye mayîn û hevalkarên qulixa me. Bi rastî, nava doranên çêmpîonata golfêye bi sernavê “Fîncana Mêsîncêr”-ê, bi saya lîstika golfêye tevî hevalên xwe û hevalkarên xwe, bona projeyên mizgîndarîyê, “Mêsêcînêr întêrnêyşinil”-ê berevkirinên peraye bahê pênc mîlîyon dolara stendîye. Eger ez bi temamî ji golfê paşda bisekinîyama, hetanî dawîya jîyana xwe, tiştê usa wê neqewimîya. Golf îdî bona min kevirê krîpton nîbû.

Awa bi vî cûreyî, em dikarin wî gunehî bikin, yê ku guneh nîne. Ew dikare nava hemû govekên jîyana meda, nava xebatê, qulixê, sportê, heleqetîyada, derbazkirina wedê xweşda jî cîhê xwe bibîne.

Xwedê dixweze, ku em ji vê jîyanê lezetê bibînin. Bi rastî, Pawlosê şandî tiştekî ecêb dibêje:

> “Xwedê, Yê ku her tiştî bi merdanî û bêyî sekinandin dide me, ku [em] miraz pê bikin” /A Tîmotêyo 6:17, AMPC/.

Ew dixweze ku em hemû duayên baş bibînin, yên ku Ewî dane me. Ew dixweze ku em miraz pê bikin. Ew tenê hîvî dike, ku nava navnîşa pirsên meye girîngda cîhê ewlinda be, çi jî dide kifşê, wekî Ew û xwestinên Wî gerekê nava hemû halada, li hemû cîha, her car cîhê ewlinda bin.

*Tu menîke zeyîft, û usa jî ya hîmdar gerekê tunebe.*

## Şîva mezin têbernedin

Em dawîya meteloka Îsa bixwînin. Me derheqa wan her sê merivada xwend, yên ku teglîfkirî bûn, lê wana menîyên cûre-cûre raber kirin.

> “Û ew xulam vegerîya hat, ev hemû axayê xwera gilî kir. Hingê axa hêrs ket, xulamê xwera got: “Zû here meydan û kûçên bajêr, feqîra, qopa, seqeta û kora top bike bîne vir”. Peyîra xulam gotê: “Axayê min, te çawa emir kir, min usa jî kir, lê dîsa cîh heye”. Û axê xulamra got: “Derkeve serê rê û dirba, zorê li her kesî bike, bîne vir, ku mala min tijî bibe. Ez wera dibêjim, ku ji wan merivên teglîfkirî tu kes ji şayîya min wê tiştekî tem neke”” /Lûqa 14:21-24/.

Bêyî şikberî, ev serhatî derheqa şîva şahîya Berx da ye, ya ku Bav Xwedê

wê dawîya demên bona Kurê Xwe teşkîl bike û em hemû jî teglîfkirî ne. Feqet, nava vê serpêhatîyêda prînsîbek heye, ya ku derheqa dema nihada ye. Wextê ku Xwedê gazî me dike bona berbi tiştekî, ya ku karên meye herroje, yan jî xwestinên me diteribîne, usa ye tiştekî hê mezin heye, ku Ewî bona me hazir kirîye. Ew yek çawa rasthatina xwedêtîyê tê navkirinê, ya ku wê bi şîva mezin ser hevda bê, û wextê wê şahîyê emê Xebera Wî, serwaxtî, hazirî, dayîna, şêwira, qewata û gelek duayên Wî yên başqe bistînin, kîjana tenê Ew dikare bide.

Wextê lîstika Kovboyên Dallasê Ewî bona min tiştek hazir kiribû. Rojekê ezê bizanibim, ku ew yek çi bû. Ez guman im, wekî Ewî li ser rêyekê, yan jî nava deştada kesek dît, yê ku ew dua stend, kîjan bona min têra hatibû dîtinê. Min ew yek berda.

Ez rûyê wê yekêda li ser xwe gunehkarîyê texmîn nakim, çimkî min ji Wî baxşandin hîvî kirîye, û rehma Wî gelekî mezin e. Feqet, ez ji şaşîyên xweye kirî hîn bûme. Ez îdî naxwezim rûyê kevirê krîptonda wî tiştî berdim, çi ku Ewî bona min hazir kirîye.

Wextê ku em teglîfkirinên vî cûreyîye bona qebûlkirina Xebera Xwedê, yan jî serwaxtîya Wî distînin û hemû menîya diatînin alîkî, wî çaxî em qewatê distînin. Bizanibin, wekî kevirê krîpton me tenê zeyîf dike.

Mixabin, hinek meriv dîsa menîya raber dikin. Ew dîsa cîhê ewlin nadine Wî, û diqewime ku ew şîva mezin berdin. Ez guman im, wekî wê usa nîbe, çimkî li mala Wî cîh heye û em hemû jî teglîfkirî ne.

Vî duayê sade dua bikin, yê ku min gelek sal pêşda kir: "*Bavo, ez bi navê Xudanê xwe Îsa Mesîh hîvî dikim, dilê min paqij bike. Ez dixwezim bona Te pîroz* û *buhurtî bim: usa be ku eger nava jîyana minda tiştekî usa heye, çi ku li Te xweş nayê, yan jî ji Te girîngtir e, eyanke û alî bike, ku ew yek dûr bikeve. Ez naxwezim tu şah*îke te berdim".

## gava praktîk

Ez guman im, wekî ev duayê li dawîya vî serê kitêbê we dua kir. Eger we ew yek kir, nava roj, hevtê û mehên peyîra Xwedêyê nava jîyana weda bişuxule, bona ku we diha nêzîkî Xwe bike, û nava wî wedeyîda wê wan tişta eyan bike, yên ku we ji Wî dûr xweyî dikin. Bi cûrê aktîv niha tevî vê yekê bibin, hîvî ji Xwedê bikin, ku Ew wera derheqa her tiştekî nava jîyana weda xeberde, yê ku bona cabnedayîna xeberên Wî bûye menî, xweafûkirin. Wan tişta binivîsin, kîjana Ew li we eyan dike, û çend deqa başqe bikin, bo ku bona wana

dua bikin. Ji Xwedê hîvî bikin, ku Ew fikira Xweye derheqa wan tiştada eyan bike û wê yekê binivîsin, çi ku Ew dibêje we.

Eger we duayê dawîya vî serê kitêbê dua nekirîye, hema niha wede başqe bikin, û duakî mayîn bikin. Ji Xwedê hîvî bikin, ku Ew dilekî razî û qewîn bide we, bona ku hûn bikaribin wî duayî bikin. Wê yekê binivîsin, çi ku Xwedê dilê weda nîşan dide, hetanî ku hûn dua dikin.

# 27

# DERGEHÊ ŞAHÎYÊ

Nava kitêba Eyantîda Îsa tiştekî gelekî balkêş gote civîneke mayîn. Xeberên Wî wê têmayêva girêdayî bûn, ya ku me serê kitêbêyî derbazbûyîda gotûbêj kir.

> "Va Ez li ber derî sekinîme û li dêrî dixim. Eger yek dengê Min bibhê û dêrî li Min veke, Ezê herime hundur, tevî wî nan bixum û ewê jî tevî Min" /Eyantî 3:2O/.

Şîva tevî Îsa…Eva şahîya hevdîtinê ye: hevdîtina tevî Xudan. Awa em li kîderê Xebera Wî, serwaxtîya, şêwira, qewata Wî û duayên mayîne ku ji hazirîya Wî dikişin, distînin. Ez gumanim, wekî ev şîva nava meda birçîbûna, hêvîdarîya û şabûna ku ji Wî gerekê bê qebûlkirinê, pêşda tîne. Evê qewatê bide me. Şîva ku Îsa hazir kirîye, jehra dijî kevirê krypton e. Vê gotinê em dikarin himberî wê yekê bikin, wekî Sûpêrmêrxas qewatên nû ji royê distîne. Îsa Xebera sax e, Nanê rastî ji ezmana ye, û hazirîya Wî qewatê dide me, ku em dijî her cûrekî kevirê krîpton der bikevin.

Pirs ev e: bo çi Ew dêrî dixe? Gelek qulixçîya ev xeber bona kirina banga bo xilazbûna meriva dane xebatê û ew yek baş e. Lê gerekê bîra meda bimîne, wekî Ew berbirî civînê, peyîhatîyên Xwe dibe, lê ne ku berbirî wana, yên ku tu cara Ew nas nekirine. Feqet, gotina Îsaye here girîng derî nîne, lê xeberên "Eger kesek guhdar bike".

Eger ez li malê miqamekî bi dengê bilind guhdar bikim, û mêvanekî girîng derê mala min bixe û bike gazî, ezê nebihêm. Mêvanê min wê bi mecbûrî dûrbikeve.

Dêmek, pirseke diha girîng heye: çi îzinê nade, ku em bibhên? Eger em nebi-

hên, emê şahîya tevî Wî berdin: usa ye werin em bersiva vê pirsêye bêhesab girîng bigerin.

## Pîrozî

Wextê ku hûn li civîna roja îroyîn xebera “pîrozî” didine xebatê, gelek cara meriv paşda vedikişin û têma xeberdanê lez diguhêrin. Bona bawarmendên wa gotî “pêşverû” ev xeber balkêş nîne, û ew tê bêjî jîyana wana dide sînorkirinê. Gelek cara pîrozî tê qebûlkirinê çawa sînonîma qazanckirina xilazbûnêye bi kirên wanva û tê hesabê çawa qanûnparêzî.

Feqet, nava peymana Nûda eva xebera tek-tenê ye, ya ku derheqa wê civînê-da ye, bona kîjanê Îsayê paşda vegere. Nivîsar nîne, wekî Ewê bona civîna bi rêberên baş, modêrn, heleqetîyên kîjanêye tevî civakê baş in, paşda vegere. Ev hemû cudatî bêhesab girîng in û alî pêşdaçûyîna civînê û açixîyê dikin, lê ji wana qet yek jî derheqa dergîstîya Mesîhda nîne.

Mixabin, rûyê dannasînkirina qanûnparêzîyêda gelek meriv ji xeberdana derheqa pîrozîyêda direvin. Tê texmînkirinê ku roja îroyîn, bona çêkirina civîna mezin gerekê vê têmayê hesab hilnedin. Bi vê yekêva tevayî, terîfkir zanin, wekî nava temamîya peymana Nûda derheqa pîrozîyêda nivîsar e, û ew jî dide kfişê, wekî lazim e ku derheqa wê yekêda dannasîn bikin. Dêmek, wana pîrozî daye milahîmkirinê û vî cûreyî hîn kirine: “Cabdarîya meye şexsîye bona pîrozîyê tune, çimkî pîrozîya me Îsa ye, û ew jî nava Mesîhda çareserkirî ye”. Ev serwêrî rast e, lê ne bi temamî, çimkî peymana Nûda derheqa her du alîyên pîrozîyêda nivîsar e. Piranîya hînkirinên wedê niha û terîfkira wan herdu alîya tevlîhev dike.

Derheqa alîyê pîrozîyêyî ewlinda nivîsar e:

> “Xwedê yekîtîya Mesîhda em hiz kirin û bijartin, wekî em li ber Wî pîroz û bêqisûr bin /Efesî 1:4, NLT/.

Pêşîya wê yekê ku meyê tiştekî bi qîmetê heta-hetayê bikira, Xwedê qirar qebûl kir. Ewî em bijartin û bi wê yekêva tevayî elam kir, ku em pîroz in. Em li ber Wî bêqisûr in. Gilî derheqa wê pîroziyêda ye, ya ku li gora tabîya me ya me ye. Ewê rojê, wextê ku me Îsa qebûl kir, em li ber Xwedê bûne pîroz û emê tu cara nikaribin diha zêde pîroztir bin. Ji nihada destpêkirî, piştî 25 mîlîyon sala, hûnê dîsa awqasî pîroz bin, çiqas hûn wê rojê bûn, wextê ku we Îsa qebûl kir.

Derheqa wê yekêda ez mînakekê bînim. Hezîrana sala 1981-ê, ez rastî Lîza Toskanoyê hatim. Piştî hinek wede, ez bengî bûm û min qirar kir, ku em bizewicin. Dudê cotmeha sala 1982-a ew bû kulfeta min. Îro, piştî 35 sala, ew diha

zêdetir kulfeta min nîne, ne ku wê rojê, wextê ku em zewicîn.7O-salîya zewaca meda jî ewê dîsa zêdetir kulfeta min nîbe. *Tabîya* wê ya kevanîya Con Bîvêr e. Ew mecbûr nîbûye ku wê yekê qazanc bike, bona wê yekê bixebite yan jî wê yekê bikire. Ew jina min e, çimkî min ew bijart.

Hinek serwêr derheqa wê pîrozîyêda hîn dikin: ya ku rast e, lê ya zêdetir heye. Îzinê bidin ku ez careke mayîn mesela zewaca xwe, bona nîşandayîna alîyê pîrozîyêyî mayîn, bidime xebatê.

Hetanî rasthatina tevî min, Lîza rastî wan xorta dihat, yên ku hewaskarîya wê pêşda dianîn. Ewê hejmara têlêfona xwe dida wana, tevî wan pev diket û rastî wana dihat. Piştî zewaca me ewê terka wan yeka da. Niha ew usa *di*şuxu*le*, ya ku li gora *tabîya* wê ye, çawa jina min.

Xeberên Petrûsê şandî bixwînin:

> "Dêmek, *hûn gerekê* çawa zarokên Xwedêye guhdar bin. Berbi rêyên jîyana xweye berê paşda venekişin, ku xwestinên xwe razî bikin. Wî çaxî hûn derheqa jîyana hê başda nizanin. Lê niha hûn *gerekê nava* hemû *kirên* xweda pîroz bin, çawa Xwedêyê ku hûn bijartin pîroz e" /A Petrûs 1:14, 15, NLT/.

Nava vê beşêda min çend xeber dane dîyarkirinê. Ya ewlin guhdarîyê bidine li ser xebera "gerekê". Ew qewilê derheqa kirên meda, yê ku Petrûs pêşniyar dike, tiştê bijartinê nîne. Ya duda, Petrûs derheqa *tabîya* meye nava Mesîhda nabêje, lê derheqa *kirên* meda dibêje. Tercima Încîlêye berfireh bi cûrekî bedew vê yekê dide kifşê: "Hûnê bi xwe jî bi temamîya *kirên* xwe û cûrê *jîyana xweva* pîroz bin". Ev pîrozî derheqa *kirên* meda ne, lê ne ku *tabîya me*. Ev yek mînanî guhartina kirên Lîzayêda ne, yên piştî zewacê: kirê me gerekê tabîya me bide kifşê.

Hema li vir şerkarîya me destpê dibe. Wextê êtapa jîyana mine mesîhîtîyêye ewlin, min her car dicêriband jîyana pîroz derbaz bikim û her car ew yek diteribî. Gelek cara gumana min unda dibû. Feqet min kerema Xwedê eyan kir. Min fem kir, wekî kerema Xwedê, ya ku bi cûrê nelayîq tê dayînê, qewat e, ya ku karebûnê dide me ku wan tişta bikin, ya ku bi qewatên merivatîyê nayê kirinê. Ez nikaribûm ji pornografîyaê û cudatîyên xeysetê xirabe mayîn azad bûma, lê min kerema Xwedê eyan kir, û min karibû nava azadiyêda bijîm, bawarîya xwe li wê yekê bînim û tevî wê yekê hevkarîyê bikim.

Tiştekî gelekî xirab heye. Çend sal pêşda, qulixdarîya me lêpirsînek derbaz kir. Em çûne li cêrge cîha û civîna. Tevî wê lêpirsînê bûn ji pênc hezara zêdetir mesîhîyên tezehatî, yên ku binelîyên Ştatên Amêrîkaêye Yekbûyî bûn. Me hîvî ji tevbûya kir, ku sê yan jî zêde şirovekirinên derheqa kerema Xwedêda bidin. En-

camên lêpirsînê dane kifşê, wekî her tevbûyek kerema Xwedê xilazbûnê, baxşandina guneha, pêşkêşa ku bi cûrê nelhêja tê dayînê, usa jî hizkirina Xwedêva dida girêdanê. Eva gelekî baş e. Tragêdîya ew bû, wekî tenê ji du selefa kêmtir bawarmenda zanibûn, wekî kerem *qewata* Xwedê ye. Xwedê bi Xwe dibêje: "*Kerema* Min besî te ye, çimkî *qewata Min* nava zeyîfîyêda mîyaser dibe" /B Korintî 12:9, NET/. Xwedê kerema Xwe çawa qewat nav dike.

Petrûs dinivîse: "De bila Xwedê diha zêde keremê bide we…bi qewata Xweye xwedêtîyê, Xwedê ew hemû tişt daye me, hewcê kîjanêne em, bona derbazkirina jîyana xwedêparêzîyê" /B Petrûs 1:2,3, NLT/. Petrûs kerema Xwedê çawa qewata Wî ya xwedêtîyê nav dike, ya ku karebûnê dide bona jîyana xwedêparêz û pîroz.

Bi rastî, bêyî bawarîyê, em nikarin ji Xwedê tu tiştî bistînin. Em nikarin bawarîya xwe li wê yekê bînin, derheqa çida em nizanin. Eger tenê du selefê mesîhîyên amêrîkî zanin, ku kerema Xwedê qewatê dide me, usa ye 98 selefên mesîhîyên amêrîkî dicêribînin bi karebûna xwe jîyana pîroz derbaz bikin, lê ew yek tiştê bûyînê nîne. Çimkî her dem wê gumanbirî, binketin, gunehkarî û texmînkirina gunehê hebin.

Bi vî cûreyî zelal dibe, ku bona çi terîfkir hemû alîyên pîrozîyê nava *tabîya* meye li ber Xwedê heyî dikin yek. Gelek mesîhî gumanbir bûne, çimkî ew bi qewatên xwe nikaribûne jîyana xwedêparêz derbazkin. Kerem tenê bersiva Xwedê nîne bi cûrê xilazbûnê, yan jî baxşandinê, lê usa jî qewata Wî, bona derbazkirina jîyana pîroz e. Xudanê kaxeza îbranîya dinivîse:

> "Bikin ku tevî hemûya edil bin û jîyana pîroz derbazkin. Bêyî pîrozîyê tu kes wê Xudan nebîne. Haj ji xwe hebin, nebe ku ji we yek destê xwe ji kerema Xwedê bike" /Îbranî 12:14, 15/.

Ev beşa awqas gelek tişta dibêje! Ya ewlin, xebera "bikin" yan jî "peyî herin" nava zimanê yûnanîda xebera "dîoko"-ye. Ew tê şirovekirinê çawa "peyî herin, yan jî bi cûrê kel û ced bikin, bicedînin, ku bistînin" /"*Ferhenga tam, ya lêkolînkirina xeberên peymana Nû"/. Ferhengeke mayînda nivîsar e: "Tiştekî bi* cedandina mezin û bi meremê zelal bikin" /"*Ferhenga Lûv-Naydayêye yûnanî-înglîzî*"/.

Piştî xwendina van herdu şirovekirina em gerekê pirsê bidin: ew pîrozî derheqa kîjanêda vê beşêda nivîsar e, derheqa *tabî* ya, *yan kirê meda ne*? Bersiva vê pirsê eyan e: ewê derheqa *kirê* meda be. Niha vî cûreyî vê pirsê binihêrin: hûn tînin ber çavê xwe, wekî kesekî bigota jina min? : "Lîza Bîvêr, hûn gerekê cedandina mezin bidine xebatê, bo ku tabîya jina Con Bîvêr dest bînin".

Ewê bikeniya û bigota: "Ez îdî jina wî me".

Çi ku derheqa *tabya* meda ne, em îdî pîroz in, û îdî hewce nîne, ku cedandina mezin bidine xebatê, bo ku bighîjine wê yekê. Bo wê yekê jî xudanê kaxeza îbranîya gerekê bi meremê *kirê* me binivîsîya.

Em gerekê bi kel û ced berbi kirê pîroz bicedînin. Eger na, wî çaxî emê "ji kerema Xwedê paşda bimînin". Em çawa dikarin ji wê keremê paşda bimînin, derheqa kîjanêda rojên meda tê terîfkirinê? Ev yek tiştê bûyînê nîne. Feqet wextê ku fem dikin, wekî kerem qewata Xwedêye nebînayî ye, bona cedandina berbi kirê pîroz, em dikarin fem bikin, ku çawa meriv dikare ji wê yekê paşda bimîne.

Xudanê kaxeza îbranîya vê beşê bi van xeberava ser hevda tîne: "Werin em bighîjine keremê, bi kîjanê em dikarin bi cûrê qebûlkirinê qulixî Xwedê bikin" /Îbranî 12:28, NKJV/. Kerem qewatê dide me, bona ku em bi cûrê qebûlkirina Xwedê qulix bikin û jîyana pîroz derbaz bikin.

Niha ya here sereke. Nivîsar e: "Bikin ku tevî hemûya edil bin û jîyana pîroz derbaz bikin. Bêyî pîrozîyê tu kes wê *Xudan nebîne*" /Îbranî 12:14/. Xudanê vê kitêbê derheqa çi da dinivîse? Gelo hemû kesê Îsa nebînin? Ne axir nivîsar e?: "Va ye ewirava Ew tê, û *her çavê Wî bibîne*, hetanî ewên ku nekisa Wî qulkin jî" /Eyantî 1:7/. Wî çaxî çawa dikare li vir nivîsar be?: "Bêyî pîrozîyê emê Xudan nebînin". Ev yek çi dide kifşê?

## Îsa bibînin

Îzinê bidin şirove bikim, ku ew sozê "dîtina Xudan", çi dide kifşê, kîjanê emê nava encamê çûyîna peyî pîrozîyê bistînin. Ez 55 sal in ku welatîyê Ştatên Amêrîkaêye Yekbûyî me û nava wî wedeyîda 12 serokên welatê me hebûne. Ez bin serokatîya her yekîda bûme û bin hukumê qirarên wanda bûme. Min gelek cara ew çawa "serokê xwe" nav kirine. Feqet, min tu cara ew ji nêzîkva nedîtine. Welatîyên Ştatên Yekbûyî hene, yên ku her dem serokê welêt dibînin, çimkî ew hevalên wî merivî ne yan jî tevî wî dixebitin. Ew meriv her dem serok dibînin, û gelek cara li wir in, li kîderê ew *hazir e*.

Wî cûreyî, bi sala ser hev ez derheqa serokên Ştatên Yekbûyîda gelek tişt pê hesîyame, derheqa fikirên wanda, qirar û jîyana wane şexsîda, usa jî înformasîyayên başqe, yên ku civakêra eyan bûne. Feqet, minra li hev nehatîye, ku bi şexsî rastî wan rêbera bêm. Bo wê yekê jî, ez derheqa jîyana wanda, derheqa tiştên şexsîda, yên ku civakêra eyan nînin, nizanim. Bêguman, minra li hev nehatîye, ku ez hevaltîyê wanra bikim.

Hema wî cûreyî jî hene mesîhî yên ku bin serwêrtîya Îsada nin. Îsa Rêberê wan e, qirarên Wî hukumî li ser jîyana wan dikin. Ew Îsa çawa "Xudan" nav dikin, lê Wî nabînin û nava hazirîya Wîda nînin. Diqewime hûnê vê yekêra qayîl

nebin, lê îzinê bidin ez mînakekê bînim ber çava, kîjanêda hema Îsa vê rastîyê îzbat dike.

> “Ewê ku temîyên Min qebûl dike û wana xweyî dike, ew e, yê ku [bi rastî] Min hiz dike, û ewê ku [bi rastî] Min hiz dike, ewê ji alîyê Bavê Minda bê hizkirinê, û Ezê [jî] wî hiz bikim û Xwe wîva eyan bikim. [*Ezê zelal Xwe* wîva *eyan bikim* û Xwe bona wî bikime rastî]” /Yûhenna 14:21, AMPC/.

Xeberên wî bixwînin: “Ezê Xwe zelal *eyan bikim*”. Qebûlkirina temîyên Îsa û xweykirina wana dide kifşê, wekî meriv berbi kirê pîroz dicedîne. Ew merivên ku vî cûreyî dikin, *Xudan dibînin*: Ew Xwe *eyan* dike. Ew îzinê dide wana, ku ew bikevine nava hazirîya Wî ya eyanbûyî. Bi saya vê eleqetê, em îdî tenê bin serwêrtîya Wîda nînin, û em bilind dibin, dighîjine dereca hevaltîya tevî Padişê xwe. Careke mayîn, Ew dibêje:

> “Hûn hevalên Min in, eger hûn her dem wan tişta dikin, bona kîjana Ez temîya didime we” /Yûhenna 15:14, AMPC/.

Nava gotina Wîda guhdarîyê bidine ser xebera “eger”. Em stirana distirên, kitêba dinivîsin, û banga derheqa wê yekêda terîf dikin, wekî Îsa Hevalê me ye. Lê xebera “eger” dide kifşê, wekî hevaltîya Wî ya bi *qewil e*. Hevaltîya tevî Îsa li ser pîrozîya me hatîye hîmdanînê, û ew merivên ku vê yekê çawa pirsa xweye sereke hesab dikin, ji dereca *xulam* bilind dibin, dibine *heval*. Îsa dibêje wan meriva, yên ku hindava Wî da amin û helal man: “Ez îdî we çawa *xulam* nav nakim” /Yûhenna 15:15, NKJV/. Ew ku Ew dibêje “îdî”, dide kifşê, wekî wextekê ew çawa xulam dihatine navkirinê, lê ne çawa heval.

Bi rastî, bûyîna xulamê Xwedê tabîke xirab nîne, û bêyî şikberî ew diha baştir e, ne ku tunebûna heleqetîya tevî Wî. Feqet, xulam derheqa menîyên şuxulên Wî da nizane, lê heval gelek cara zane.

Diqewime hûn qayîl nebin: “Lê em hemû kur û keçên Xwedê ne”. Belê, lê em gerekê wê rastîyê bîr bînin, derheqa kîjanêda Pawlos dibêje: “Warê ku xweyê her tiştî ye, lê heta ku xişîm e, ji *xulam* nayê firqîkirinê” /Galatî 4:1/. Nava zimanê yûnanîda hema ew xebera “xulam” tê xebitandinê, ya ku Îsa nava xebera jorgotîda da xebatê. Hetanî kur yan keç zarok e, ew çawa qanûn menîyên Xwedê nizane, lê şuxulên Wî dibîne.

Him bona dê û bava, him jî bona zaroka tiştekî baş e, wextê ku kur yan keç ji zarotîyê derdikeve û dibe heval. Ew yek usa jî nava malbeta Xwedêda rast e. Binyata heleqetîya tê guhartinê, çimkî Bavê me diha zêde tiştên surî li me amin

dibe, lê em jî wî cûreyî tên guhartinê. Niha em bi kel û ced dicedînin ne tenê gura Wîda bin, lê usa jî gumana Wî unda nekin. Bêyî şikberî, em dicedînin gura Wî da bin û emê her dem usa bikin, lê menîya dilê me îdî tenê gurêdabûn nîne, lê usa bikin ku gumana Wî unda nebe.

## Derî

Bi vî cûreyî pîrozî usa nîne, çawa ku merivên qanûnparêz wê yekê tînin ber çavê xwe. Ew rîya berbi nêzîkbûna raste tevî Îsa ye. Niha em fem dikin, ku ew derî çiqasî girîng e, derheqa kîjanîda Îsa dibêje: ew dilê bawarmend e. Bi hesabihilnedana pîrozîyê, em ji karebûna guhdarkirinê û cabdayînê miqûf dimînin. Em usa jî ji mecala tevbûna tevî şîva bi hazirîya Wî miqûf dimînin. Vê yekê meriv dikare himberî halekî usa bike, wextê ku li malê dengekî usa bilind e, wekî em nabihên ku şexsekî girîng derê me dixe. Bi lêxistina derî û hildana navê me, wextê ku cabdayîn tune, ew mêvan dûr dikeve, dihêle, diçe.

Wextê ku em ji hîvîkirina derheqa pîrozîyêda direvin, wî çaxî usa dertê, ku me rêya berbi nêzîkaya tevî padişê xwe girtîye, ya ku xwestina her bawarmendekî mezin e. Ew tabî, anegorî kîjanî me derheqa *kerema* ku *dinixême* hîn kirîye û me *kerema* ku *qewatê dide*, hesab hilnedaye, ew derî girtî ye, û ji hundurva dada ye. Me kerem bêqîmet kiriye, çimkî ew bi rastî him *dinixême* û him jî *qewatê* dide. Alîyê wêyî ku qewatê dide bêhesab girîng e, ku meriv layîqî heleqetîya tevî Xudan bibe.

Ji alîyê ştata Îndîyanayêda derheqa zewaca min û Lîzayêda nasname hatîye dayînê: dêmek, li gora qanûnê em zewicîne. Bînin ber çavê xwe, ku wê çi biqewime, eger ez nasnama zewacê li ber wê xweykim û elam bikim: “Delala min, em zewicîne: em bi qanûnê hevva girêdayî ne, lê heleqetîyên mine tevî jinên başqe hene”. Ez dikarim bi dokûmênta tevî Lîzayê zewicî bim, lê bêyî şikberî, ewê îdî bi xwestinên dilê xwe û surên dilê xweva tevî min pareve nebe. Nêzîkaya di navbera meda wê ser hevda bê. Emê îdî çawa heval nîbin, çimkî ezê wê mecalê unda bikim. Gelo wî cûreyî jîyana meye tevayî wê baş bibe? Gelo ew bû meremê zewaca me? Eger ez wî cûreyî berdewam bikim, ezê zewaca xwe unda bikim.

Diqewime me bi rêya hînkirinên civîna xwe piştgirî daye nêzîkbûna wî cûreyî? Gelo em çend beşên nivîsarên pîroz terîf dikin, yên ku ji parên peymana Nûye mayîn cuda-cuda ne, nîşan didin, wekî bêyî hesabhildana kirên me hemû tişt baş e? Gelo em dikarin tevî vê dinîyayê bikevine nava cîha û bi wê yekêva tevayî elamî Îsa bikin?: “*Me duayê gunehkar wekilandiye*, em *bi keremêva xilazbûyî ne* û *em yên Te ne*”. Gelo em dikarin bawar bikin, wekî Ewê îzinê bide me,

ku derheqa surên dilê Wî da bizanibin?

Ez dijî Lîzayê bêesilîyê nakim, çimkî ez naxwezim wî hemû tiştê mexsûs, nêzîk û baş unda bikim, wextê ku em serên xwe diatînin li ser belgîya, li hev dinihêrin, û ew tiştekî usa dibêje min, yê ku ewê tu cara negota kesekî mayîn. Ez naxwezim wan heleqetîyên başe tevî wê şexsê unda bikim, ya ku kulfeta min e.

Ew yek usa jî derheqa Îsada ye. Ez bêesilîyê dijî Wî nakim, çimkî ez naxwezim nêzîkaya me unda bikim û dawîya hevaltîya me bînim. Tiştekî usa mezin tune, nav, hebûk, xwestin, şuxulkarî, tabî yan jî guneh, yên ku ji nêzîkaya tevî Îsa zêdetirin.

Ez bêyî sozê Wî, jîyana xwe nikarim bînim li ber çavê xwe: “Ezê tera derheqa surên balkêşda gilî bikim, derheqa kîjanada tu nizanî” /Yêremîya 33:3, NLT/. Ez jîyana xwe nikarim bînim ber çavê xwe, bêyî wî tiştê ecêb, wekî Ew “tiştên kûr û veşartî eyan dike” /Danîyêl 2:22, NKJV/. Bêyî xeberên Îsa ez jîyana xwe nikarim bînim ber çavê xwe: “Ezê îdî… bi xeberên başqe nebêjim, lê Ezê zelal wera gilî bikim…” /Yûhenna 16:25, NKJV/. Û, bêguman, ez nikarim jîyana xwe bêyî wî sozî bînim ber çavê xwe, wekî Ruhê Wî wê tiştên ku wê bên nîşan bide /binihêre Yûhenna 16:13/.

Pîrozî tiştekî xirab nîne: ew serbara serda rastîke peymana Nûye here baş e. Wextê ku em bi rastî qewata pîrozîyê fem bikin, emê ji ser banên avaya bikine gazî.

## gava praktîk

Pîrozî xebera xirab nîne: ew xebera surî ye. Pîrozî ew derfet e, bi kîjanê hûn dikarin derê dilê xwe bona dengê Xwedê vekin. Bêyî pîrozîyê hûnê nebihên, wextê ku Ew xeberde. Pîrozî ne tiştekî usa ye, kîjanê Xwedê bona qurbanîya Îsa dide we, lê ew tiştekî usa ye, anegorî kîjanê hûn *gerekê* bi fikira xwe, xeber û kirên xwe, bijîn.

Feqet, Xwedê nahêle, wekî hûn tenê bona pîrozîyê şerkarîyê bikin. Bo wê yekê jî Ew keremê dide me. Kerema wî diha zêde dike, ne ku xilazkirina me ye, nenihêrî wê yekê, wekî ew îdî tiştekî ecêb e. Kerema Xwedê qewatê dide me, bona ku em jîyana pîroz derbaz bikin, ya ku ji dilê me dikişe û bi temamî Xwedê razî dike.

Hema niha Xwedê bigerin. Îdî nesekinin: hema niha gazî Xwedê bikin û kerema Wî hîvî bikin. Navê wê goveka nava jîyana xweda bidin, li kîderê hûn diha gelekî hewcê kerema Wî ne, û hîvî ji Wî bikin, ku Ew bi kerema Xwe we tijî bike, bona ku hûn wî hemû tiştî alt bikin, çi ku îzinê nade we ku dengê Wî bibhên.

# 28

# BILIND BİBIN

Menî çî ye, wekî fîlmên derheqa sûpêrmêrxasada fîlmên hemû dema yên here eyan in? Derheqa vê yekêda bifikirin. Ev serhatîyên Holîvûdê guhdarîya gelek meriva dikişînine li ser xwe, ne ku fîlmên derheqa şerada, kovboya û leşkerada û hela yên derheqa evîndarîyêda jî. Û ev yek tenê derheqa mêrada nîne, çimkî ez her dem rastî jina têm, yên ku bi xeberên xweva van fîlma hiz dikin. Menî çî ye? Em zanin, wekî em bona tiştên hê zêde çêbûne, û sûpêrmêrxas cedandinên meye hundure nedîyarbûyî dide kifşê.

Derheqa Sûpêrmêrxasda bifikirin. Wextê ku qewimandin dijwar dibin, tengavî bin nakeve, û tê bêjî gumana tu tiştî tune, Klark Kênt ji rêdaksîya rojnema “*Dêylî Planêt*”-ê derdikeve, xwe dighîne têlefonê, û piştî çend deqîqa alîkarî tê. Em wê yekê hiz dikin, wextê ku ew dijminên qewat alt dike. Beşera me xweş dibe, wextê ku dawîya neheqîyê tê, zyankêş aza tên berdanê, û civak vedigere li ser jîyana herroje.

Fikir ev e: em şa dibin, wextê ku sûpêrmêrxasên me hindava xirabîyêda ser dikevin, çimkî ew yek cedandinên meye hundur dide razîkirinê. Em zanin, wekî ji destpêkêda Xwedê meriv çê kiribû, mînanî “Dilqê Xwedêda, yê ku tebyeta Xwedê dide kifşê” /Destpêbûn 1:27, MSG/. Usa jî nivîsar e: “Xudan şerkar e” /Derketin 15:3/. Hûn qet derheqa wê yekêda fikirîne? Eva alîkî tebyeta Xwedê ye, yê ku hindik tê bîranînê. Fikireke usa pêşda tê ku em nizanin bona vê rastîyê çi bikin. Feqet, Îşaya dibêje:

> “Xudanê mîna hêzdarekî wê der bikeve, wê mîna merivekî şerkar kumreşîya Xwe bide gurkirinê, bike qîrîn, usa jî bi dengê bilind bike gazî û wê hindava dijminên Xwe ser bikeve” /Îşaya 42:13/.

Ew şerkarên ku dijî neheqîyê şerkarîyê dikin, mêrxas in. Îsa Sûpêrmêrxasê rast e. Ew Dagirkir û Altindar e.

Pêşîya nivîsara van xebera, gelek wede pêşda, Yêşû Ew dît. Destê Padişê meda berx nîbû, lê şûr bû, û Ewî Xwe çawa "Sereskerê Xudan" nav kir /Yêşû 5:14/. Piştî nivîsara van xebera, piştî epêce wext, Yûhennayê şandî jî Xudan dît û bi cûrê diha ecêb Ew anî ber çava: "Çavên Wî mîna alava êgir bûn", û "Ji devê wî şûrekî tûj derdiket" /Eyantî 19:12-15/.

Ew şerkar e! Gelek ji me zanin, wekî şerkar bi xeysetê milahîm, teslîmbûyî, yan jî mêlanxolîk nîne. Na xêr. Şerkar bi meremekî ye û hers e.

Niha em derheqa xweda xeberdin. Hûn qet derheqa wê yekêda fikirîne, wekî kitêba Eyantîda Îsa hemû hevt civînara vî cûreyî dibêje?: "Kî ku ser dikeve…". Em çawa dikarin ser bikevin, eger tiştekî meyî bona serkeftinê tune? Em çawa dikarin serbikevin, eger şerkarî tunebe?

Gelek meriv roja îroyîn vê bangê hesab hilnadin. Ew dibêjin, wekî heyîna meye nava Mesîhda me dike *altindar*. Bi cûrekî mayîn gotî, çawa ku Ew Altindar e, em jî nava Wîda dibine altindar. Ev yek rast e, wextê ku gilî derheqa tabîya meda ye, ya ku nava Wî da ye, lê eva rastîya tam nîne. Bona çi Îsa gote bawarmendên wan hevt civîna?: "Yê ku ser dikeve…", eger serkeftin bi xwe bona xilazbûna me zêde dibe.

Nava vî ezmanîda Lêks Lyûtorê rast heye /neyarê Sûrpêrmêrxas/, û navê wî mîrêcin e. Gelek eskerên wî hene, yên ku bêaqil nînin, û meremê wanî sereke sekinandina we, sînorkirin û kontrolkirina we ye. Mîrêcin rojê 24 seheta û nava hevtêda hevt roja bona vî meremî dixebite. Feqet sîlihên wî ji wî hatine stendinê. Ew ji serwêrtî û qewata xweye nava jîyana we û minda miqûf maye.

Hema bi wî cûreyî, Lêks Lyûtor himberî merivê hesin bêqewat e. Feqet, fikira wî bona stendina pêşkeftinê kevirê krîpton eşkere kir û da xebatê. Bi destî wî kevirî, ewî karibû sûpêrmêrxas bide sînorkirinê û kontrol bike. Bi wî cûreyî jî mîrêcin wê yekê dide xebatê, çi ku bû menîya undabûna wî, kevirê krîptonî ruhanî, bona ku qewatên şerkar bibine weke hev. Ewî ew yek çêkir, wextê ku li Ezmana milyaketê rûnkirî bû /binihêre Hezeqêl 28:14-16/. Ew zane çawa qewata padişatîya Xwedêye nava jîyana meda bide zeyîfkirinê û undakirinê.

Mîrêcin /Lêks Lyûtorê rast/ zane, wekî eger em hukumê kevirê krîptonî rast bibînin, emê çiqasî bikaribin ji wî dûr bimînin. Ew kevirê krîpton bi hostatî vedişêre. We texmîn kirîye, ku dilê weda çi diqewime, wextê ku hûn wê yekê texmîn dikin? Diqewime hûn razîbûna wedekurt dibînin, lê tevî zeyîfkirina we ew razîbûna rast nade. Hûn ji tebyeta serkeftî diqetin û dibine mînanî gîhê, ya bêyî ronahî û avê. Hûn destpê dikin hundurda biçilmisin.

## Nîşan

Zaroka Xwedêyê giranbiha, paşda vegerine ser heyîna xweye rast. Hûn nava nisileta meda bona bûyîna sûpêrmêrxasê rast hatine gazîkirinê. Nava weda ew hemû tişt heye, çi ku bona serkeftinê lazim e. Ez hatime duakirinê, ku li temamîya dinîyayê bigerim û temamîya bedena Mesîh bibînim. Min ew hemû nîşan dîtine, kîjan bona bawarmendên olên civînê û usa jî bawarmendên başqe tiştê bûyînê ye.

Min dikaribû gelek mînak bianîyana, lê îzinê bidin ez hewaskarîya we bi çend mînakava gur bikim. Ez li welatekî qesidîme, li kîderê binelîyên musulmane li dinîyayê, yên here zêde ne û çend cara min li civîneke mezin terîf kirîye, endamên kîjanê dighîjine 14O hezarî, û ji nîvî zêdetir endmên wê berê musulman bûne. Li avayê wê civînêyî serekeda 35 hezar meriv cîh û war dibin, lê ew mecbûr in çend berevbûnên roja yekşemê derbaz bikin. Eger ez li wir nîbûma û min bi çavê xwe nedîta, diqewime min bawar nekira. Ew civîn bi rastî rezdar e, û ew nava qewilên dijwarda pêşda diçe. Bawarmendên wê civînê yên şerkar, mêrxas û altindar in.

Kurê serwêrê wê civînêyî duda, wextê ji dayîkbûnê, zyana mejû stendibû û doxtira gotibûne wî, wekî ewê tu cara nikaribe xeberde û bigere. Pêşekzana gotibûne wî serwêrî û kulfeta wî, wekî kurê wana wê hema usa paldayî be, hetanî ku jîyana wîye kurt ser hevda bê.

Xwedê wî serwêrîra xeberda û gotê: “Ez li kîderê me?”.

“Li ser textê Xwe, li Ezmîn”,- serwêr besriv da.

> “Na, Ez dilê teda dijîm, -Xudan gotê. -Û dixwezim, ku tu li ser mejûyê kurê xwe xeberdî û mejûkî nû çê bikî, çawa ku min carekê xeberda û ew hemû tişt çê kir, çi ku tu dibînî”.

Wî serwêrî gura Xudan kir, û destpêkir her roj bi navê Îsa derheqa mejûyê kurê xweda bêje. Bi kutasî kurê wî destpêkir xeberde. Piştî wê yekê Xudan teslîmî wî kir, ku wê yekê usa jî bona nigên wî bike. Şeşsalîyêda ewî destpêkir bigere. Min tevî kurê wî golf lîstîye: niha ew zewicîye û sê zarokên wî hene.

Ew serwêr altindar e, û kevirê krîpton nikare wî bide sekinandinê.

Van axirîya min teglîfî welatekî kiribûn, ku min bona serwêr û rêberên hejeke civînekê dannasîn bikira. Wana rêberîya min kir hetanî cîhê berevbûnê, û min bi dijwarî hêsirên xwe zeft kirin, wextê ku min aûdîtorîya ji 12.5OO serwêra dît. Ew bona Xudan bi agirva tijîbûyî bûn, û cedandina wana ji yekî derbazî yê mayîn dibû.

Rojtira mayîn min tevî qulixçîyên sereke, yê wê heja civînê, xwerin dixwer. Ez pê hesîyam, wekî ji 3OO hezarî zêdetir meriv dikevine nava qulixa wana. Min pirsî, ku heja wana kengê destpê bibû, û pêra jî fikirîm, wekî diqewime nisletekê yan jî du nislet pêşda ew yek qewimî bû. Wana got, wekî ew yek ji alîyê merivekîda 16 sal pêşda destpê bibû.

Ez ecêbmayî bûm:

-Hûn li welatekî dinîya ewlin çawa gihîşine encamekî wî cûreyî? ,- min pirsî.

Ew qulixçîyê, ku ji hemûya baştir înglîzî xeber dida, bêyî sekinandin bersiva min da:

-Em cimeta xwe hîn dikin, ku bona heta-hetayê bijîn.

Xeberên min tunebûn, ku min tiştek bigota.

-Ez li gelek civînên amêrîkî bûme, - ewî xeberdana xwe berdewam kir, - û min texmîn kirîye, wekî gelek mesîhîyên amêrîkî bi pêrspêktîva 7O-8O sala dijîn. Merivên me bona heta-hetayê dijîn.

Bi saya vê qirara wana, ew diha zêde derheqa kevirê krîptonî ruhanîda zanin.

Min û Lîzayê li paytextê Ermenîstaê-Yêrêvanê bona 3.5OO serwêra û rêbera terîf dikir. Gelek rêber ji Îranê hatibûn. Piştî navbirîkê, jineke cahil minra got, wekî ew wedekî kurt welêtda nîbûye û polîsîya Îranê li ser têlefona mobaylê jêra têlefon kiribû, bo ku bizanibûna ew li kîderê ye.

Bêyî fikirmîşbûn, min jê pirsî:

-Hûn bona çi paşda vedigerin, eger bona jîyana we ew yek qezîya ye?

-Eger ez paşda venegerim, kî wê îranîyara derheqa Îsada gilîke?, - ewê lez bersiva min da.

Bersiva wê ez dame şermê. Ber çavaye, wekî ew ji kevirê krîpton dûr bû.

Çend sal pêşda, civînekê du meha ser hev, her roj, berevbûn derbaz dikirin, û her êvar çar hezar meriv tevî wan berevbûna dibûn. Bi hezara meriv xilaz dibûn, bi rastî qenc dibûn û aza dibûn. Êvarekê Îsa li wir eyan bû. Geleka Ew dîtin û kirine gazî. Ew yek tenê qasek bû, lê wextê unda bû, Ewî şedetîya hazirîya Xwe hişt. Sifetê wî li ser dîwarê wî avayî mabû, bi bilindaya 2.5 mêtra û beraya 1.8 mêtra. Ew şikil 18 meha li ser wî dîwarî ma. Ew bere-bere temirî, hetanî ku bi temamî unda bû.

Êvareke mayîn avtomaşîneke ambûlansê li ber dergehekî wî avayê civînê sekinî. Xebatkarê ambûlansê merivekî paldayî birine hundur. Doxtira gotibû, wekî ewê qet 24 seheta jî nejî. Qewata Xwedê awaqasî zor bû, wekî ew meriv bi temamî qenc bû û piştî berevbûnê bi xwe ji avayî derket.

Ez bi xwe şedê wî hemû tiştî bûme: ez ne tenê her êvar li wir bûm, lê usa jî alîkarê serwêrê wê civînê bûm.

Min dîtîye, ku çawa agirê ji bin kontrolê derketî bi cûrê ecêb temirî ye, yê ku nêzîkî avayê ofîsa qulixdarîya me dibû. Min dîtîye, ku çawa bager sekinîne, yan jî alîyê xwe guhartine, û bûme şedê ecêbên usa, kîjana meriv nikare şirove bike. Min dîtîye, ku çawa kera bihîstine, kora dîtine û seqet gerîyane. Hevalekî min heye, yê ku li Mêksîkayê û Amêrîka Navîn gelek meriv rakirine. Ez li cîhên usa jî bûme, li kîderê qewata Xwedê usa zor bûye, wekî ji heyşt hezara zêdetir merivên hazir nikaribûne rabine li ser pîya: wî çaxî ecêb diqewimîn, û jîyanên meriva heta-hetayê dihatine guhartinê.

Nenihêrî wê yekê, wekî min bi xwe nedîtîye, lê ez çend serhatîya zanim, wextê ku eşîretên tam, yan jî cîhên jîyînêye tam xilaz bûne û kûltûra wana bi temamî hatîye guhartinê. Nava rojên meda qewimandinên wî cûreyî gelekî hindik diqewimin, lê ez bawar im, wekî em lez nêzîkî wedekî usa dibin, wextê ku ewê bibine tiştên sade, mîna wan tişta, kîjan civîna Ewlinda diqewimîn, lê bi masştabên diha mezin.

## Tevî Îsa

Di navbera van hemû meriva û cêribandinên wanda tomerîbûnek heye, ya ku li civîna Ewlin hebû. Em wê yekê nava Mizgînîyada û kitêba Karên şandîyada dibînin, û ew yek dikare li cem me hemûya hebe. Vê yekê meriv dikare bi sê xebera bide tomerîkirinê: *serwêrtî*, *qewat* û *serxwebûn*.

Em dibînin, wekî Îsa gund û bajar diguhartin. Wextê ku ew diçû cîhekî, Ewî atmosifêra li wir bi temamî diguhart. Awa mînakek. Ew kete kinîştê, û “li ser hînkirina Wî meriv zendegirtî mabûn, çimkî Ewî bi *serwêrtîya rast* hîn dikir, himberî dersdarên qanûna dînî” /Marqos 1:22, NLT/.

Lê paşê, nişkêva “merivekî li kinîştê, yê ku ruhê heramva girtî bû, kire gazî: “Tu bona çi li ber me dijwarîya çê dikî, Îsayê Nisretê? Tu hatî qira me bînî?”” /Xeber 23,24, NLT/. Feqet Îsa lêhilat û got: “Ker be û jê derkeve!”. Hingê ruhê heram ew veçirikand û bi dengekî bilind kire qîrîn û jê derket. Hemû zendegirtî man, hevra ketine pirs-pirsîyara. Hemû bi qedirgirtinêva hindava serwêrtîya Wî, qewat û serxwebûna Wî da tijî bûn. Wê qewimandinê hukumekî usa mezin pêşda anî, wekî rojtira mayîn temamîya bajêr Îsa digerîya /binihêre xeberên 21-38/. Çawa ku hûn zanin, meriv ji Mizgînîyê gelek meselên wî cûreyî dikare bîne ber çava.

Tiştek heye, wekî dikare mêriv zendegirtî bihêle: dawîya qulixa Xweye li ser dinîyayê Îsa got: “Çawa ku Bavê Min Ez şandim, usa jî Ez we dişînim” /Yûhenna 2O:21/. Eger vê xeberê hûn zendegirtî nehiştin, Ewî zelal got: “Ez rast, bêxêlif wera dibêjim, ewê ku bawarîya xwe li Min bîne, ew kirên ku Ez dikim, ewê bi xwe jî bike, û ji van kira mestir jî wê bike” /Yûhenna 14:12/. Hema ew kir, û kirên hê

mestir! Gelo ev yek dikare biqewime? Eger Ewî usa got, usa ye bêyî şikberî dikare bibe. Civîna Ewlin ev yek dît. Serwêrtî, qewat û serxwebûna wane usa hebû, wekî nava çend rojada gund û bajarên tam Îsa qebûl dikirin. Ew yek nava rojên meda jî diqewime, kîjan min bi xwe dîtîye, yan jî derheqa wanda bihîstîye.

Çi ku derheqa civîna Ewlinda ye, eger em tenê Orşelîmê hesab hildin, nava temamîya bajêrda merivekî usa tunebû, yê ku hukumê wana nedîta. Nava çend rojada hemû binelîyên bajêr bersiva vê yekê dan: ew yan ji qewata nebînayî zendegirtî diman, yan rûyê wê yekêda hêrs diketin, wekî navê Îsa dihate elamkirinê, yan jî diketine nava padişatîya Xwedê. Civîn lez dighîşt, bi qewata mezin dişuxulî û dibû şeda cêrge ecêbên li ber çava. Ji wan qewimandina yek jî ew bû, wekî merivekî ji dayîka xwe seqet bûyî, û ew her roj dibirine cîhê berevbûna, qenc bû. Ewî carekêra destpê kir banzde û bike gazî, û gelek meriv, yên ku li wir berevbûyî bûn, zendegirtî man.

Serwêrtîya cîh Petrûs û Yûhenna girtin, cêribandin hukumê wê heja ku zêde dibû bidine sekinandnê. Ew anîne li ber endamên civîna gire-gira, yên ku hatine li ser vê fikirê:

> “Gava wana *mêrk*îmîya Petrûs û Yûhenna dîtin û pê hesîyan ku merivine nexwendî û nezan in, ecêbmayî man û nas kirin, ku evana *tevî Îsa bûne*” /Karên Şandîya 4:13/.

Mêrkîmîya wana guhdarîya gire-gira kişande ser wan. Wê diha hêsa bûya, eger Petrûs û Yûhenna bitirsîyana û bicêribandana li ber merivên bajêre here bi hukum, xwe dewsa merivên edil dianîyana. Diqewime wî çaxî ew ji pevçûyînê dûr bimana. Feqet, ew li ber qezîya mezin amin man.

Gelo mêrkîmîya wan û qewata wane çawa hebû, û ew ji kîderê bû? Bersiv ew e, wekî ew “tevî Îsa bûn”. Ew nava hazirîya Xudan da gerîyabûn û dîsa ew yek berdewam dikirin. Wana ew kir dikirin, yên ku Ewî dikirin, nava encamên kîjanada bajar hatine guhartinê. Wana jîyana pîroz derbaz dikir. Civîna Ewlin ji kevirê krîpton dûr dima: wana qirar kiribû ku nêzîkî Kur bûna û qewat ji Wî bistendana. Bo wê yekê jî mêrkîmîya wan, serwêrtî û qewata wan hebû.

Mixabin, serpêhatî dide kifşê, wekî civîna Korintîyê li ser bajarê xwe hukum nehişt, çawa ku şagirta li Orşelîmê û paşê li Samerîyayê, Hoppê, Lîdîyayê, Saronê, Antîokê û li cîhên başqe, li temamîya Cihûdistanê û Asîyayê ew yek kir. Civîna Korintîyê lap wekî mayîn bû. Ew zeyîf bûn û qewata wan tunebû, ya ku bona guhartina bajarê wan lazim bû. Tiştê ecêbmayînê ew bû, wekî civîna Korintîyê bawarîya xwe li pêşkêşên Ruhê Pîroz dianî, û nava wanda dişuxulî. Nenihêrî wê yekê, wekî di navbera wan bawarmendada hinek ecêb diqewimîn, lê ew tişt tunebûn, çi ku lazim bû, ku wana hukum li ser bajarê xwe bihişta.

Em bona nisileta xwe çi dixwezin? Gelo ew yek tiştê bûyînê ye, ku em careke mayîn bibînin, ku çawa bajarên tam tên guhartinê û hukumê Mizgînîyê li ser xwe dibînin? Bona terîfkirinê û dîtina gelek civînên mezin min teglîfî gelek bajara dikin, lê bi wê yekêva tevayî, ez bona wan bi mîlîyona meriva ber xwe dikevim, yên ku hukumê padişatîya Xwedê li ser xwe nedîtine. Bona çi hukumê me li ser gunda, bajara û herêma tune? Diqewime kevirê krîpton em alt kirine?

Xwedê şuxulkarîya meye niha bi destî jîyana hakimekî peymana Kevin nîşanî me daye. Navê wî Samson e. Ewî gurênekirinêra dilîst, hetanî ku ew yek bona wî bû tiştekî sade. Paşê Samson bihakî giran bona wê yekê da, çimkî kevirê krîpton qewata wî jê stend. Ewî îdî nikaribû ew qewata nebînayî bida xebatê, ya ku berê hebû. Feqet, piştî zêrandinên mezin, ewî tobe kir û qewata wî hate dasekinandinê. Dawîyê ewî mêrxasîke diha mezin kir, lê ne ku nava wan salada, wextê ku ewî hela hê qewata xwe unda nekiribû.

Danîyêl pêxember derheqa nisiletekêda dibêje, ya ku wê rojên dawîda bijî û wê rûyê tu dijwarîkêda paşda nesekine. Ew pêxembertîyê dike:

> "*Ew merivên ku Xwedêyê xwe nas dikin*, wê qewat bin, qewîn bisekinin û mêrxasîya bikin" /Danîyêl 11:32, AMPC/.

Kilîta vê zorayê û qewata vê elaletê ew e, wekî ew ji nêzîkva "Xwedêyê xwe nas dikin". Lê kilîta nêzîkbûnê jî cedandina berbi pîrozîya rast e.

## Xeberên tomerîkirinê

Awa ev e rastî. Hûn ji Xwedêra hatine gazîkirinê, ku hûn bibin mêrxas, çêmpîyon, yê usa, yê ku nava jîyanêda ser dikeve û guhartina tîne nava dorana heleqetîyên xwe. Qewat bin, serxwe bin û nêzîkî Padişê bin, çimkî Ew we hiz dike. Ew dixweze nêzîkî we be û qewatê bide we. Ew alîyê we ye. Ew we bawar dike. Û tiştê herî girîng bêjim, Ew we bi hizkirina heta-hetayê hiz dike.

Hûn mêrxasên vê dinîayêyî rast in. Alitindarê me diha mezin e, yê ku dilê weda ye, ne ku ew Lêks Lyûtora, yê ku li vê dinîyayê ye. Ji Wî qewatê bistînin, û jîyana geleka biguhêrin. Hûnê derheqa hukumê xweyî tomerîda hetanî wê rojê nizanibin, wextê ku hûn li ber textê Padişê bisekinin. Hin wê rojê, hin jî niha, hûnê gelekî şa bin, ku hûn teslîmî kevirê krîpton nebûn.

Bi vî cûreyî, kevirê krîpton bişkênin, wî tune bikin, hukumê wî unda bikin û nava jîyana xweda qet hindikî jî cîh nedine wî. Hûn bona rûmet û qewata mezin hatine çêkirinê. Zarokên Xwedêye qewat, navê we heye, û ev dinîya hîvîyê ye, ku hûn wê yekê bikin.

## gava praktîk

Xwedê şerkar e, û em mîna Wî xuliqîne. Ev e menî, wekî fîlmên derheqa sûpêrmêrxasada awqasî bi kûrayî nêzîkî me dibin. Em dilê xweda zanin, wekî em bona mezinayê hatine.

Xwedê hema bi vî meremî em çê kirine. Nava dîrokêda em şedetîya derheqa wan merivada dibînin, kîjana kirên ecêb bona Xwedê kirin, çimkî cîh nedane kevirê krîpton, gunehkirina bi zanebûn. Nava rojên jimartîda, bi qewata Xwedê û bi mêrkîmîya cimeta Wî, bajarên tam hatine guhartinê. Xwedê gazî we dike, ku hûn gava biavêjin, bibine parçekî şuxulê Wî û wan mêrxasîya biwekilînin.

Ji Xwedê bipirsin, ku Ew gazî we li şerkarîya çawa dike? Banga Wî bona kîjan bajarî, herêmê û welatî ye? Wî hemû tiştî binivîsin, çi ku we ji Xwedê bihîst û dua bikin, ku Ew kerema Xwe bide, bona ku hûn li wî cîhî meremê Wî biqedînin. Û berê xwe bidine wî heqê heta-hetayê, sozê derheqa wî hemû tiştîda, çi ku hûnê bistînin, eger bi helalî û bi altindarî nava vê jîyanêda qulix bikin, û pêşda bilivin. Xwedê gazî we kirîye ku hûn bibine mêrxas.

# PIRSÊN BONA GOTÛBÊJKIRINÊ

Eger hûn vê kitêbê çawa pareke dersa "*Kevirê Krîpton Bişkênin*" /ya ku fikireke baş e/ dixwînin, ez pêşniyar dikim, ku hûn her vîdêyoke vê dersê temaşe bikin, ya ku bi selika DVD tevî kitêbê ye, yan jî malpera www.CloudLibrary.org ye, û pirsên derheqa vîdêyokêda nava koma xweda gotûbêj bikin. Ev vîdêoyên hînkirinê wan têmayên sereke diweklînin û berfireh dikin, derheqa kîjanada kitêbêda nivîsar e: usa ye bona tevbûya cûrê herî baş ew e, ku vîdêoyên hînkirinê temaşe bikin, û kitêbê bixwînin.

Ev hemû tişt bo we ye.

## Ders 1. Qewata me

*Li ser hîmê serên kitêbêye 1-3*

1. Hûnê necedînin wê qewatê bidine xebatê, derheqa kîjanêda hûn haj pê tunene. Ev prînsîba we nava jîyana xweda dîtîye? We eşîyaên nûye çawa û dem û dezgehên çawa destpê kirîye bidine xebatê, û fikirên çawa we qebûl kirine, wextê ku hûn pê hesîyane ku zêdayên çawa hûn dikarin ji wê yekê bistînin? Ev prînsîba bi çiqasîva mîna wî hemû tiştî ye, çi ku hûn wextê vê dersê hîn bûn?
2. Qewata meye nava Xwedêda mecalên nebînayî dide. Gelo vê dersê hûn ruhdar kirin, bona ku hûn heyîna qewata xweye nava Mesîhda lêkolîn bikin? Navê govekên usa bidin, nava kîjanada fikirdarîya we gelekî sînor-kirî bû.
3. Bi fikira we, bona çi roja îroyîn civînada derheqa qewata meye nava

Mesîhda hîn nakin? Bi fikira we, civînê çi cûreyî bihata guhartinê, eger em hînkirana bawar bikin, wekî ev hemû tişt dikare bibe? Hûn tên guhartinê, wextê ku derheqa van mecalada difikirin?

4. Wextê ku em bi dil ne anegorî normên mesîhîtîyê ne, fikira vê dinîyayê derheqa mesîhîtîyêda, usa jî derheqa Xwedêda nerast e. Ev dinîya wê çi cûreyî nêzîkî mesîhîya bûya, eger em bi qewata xwe bijîtana? Ev dinîya wê çi cûreyî nêzîkî Xwedê bûya, eger em bi qewata xwe bijîtana?

## Ders 2. Qewata Yekî

*Li ser hîmê serên kitêbêye 4-7*

1. Pawlos dinivîse, wekî korintîya qedirê bedena Mesîh nedigirtin, û gelek nava wanda zeyîf bûn, nexweş bûn û pêra jî ji wede zûtir dimirin. Roja îroyîn ev xeber usa jî derheqa meda ne, û nivîsar e, wekî ew hukumî li ser geleka dikir. Gelo derheqa bedena Mesîhda li civînê cûrekî mayîn hûn hîn kiribûn? Bona çi girîng e, ku bawarmend îro vê rastîyê fem bikin?
2. Gelek nava bedena Mesîhda qewata xwe nadine xebatê, çimkî gunehê bi zanebûn kirî li civînê cîhê xwe girtîye. Feqet, eva menîya tek-tenê nîne, wekî mesîhî nexweş dikevin, ji wede zûtir dimirin, yan jî zeyîf in. Ev himberîhevkirin bona çi gelekî girîng e? Îdî bi menîyên çawa li civînê dikarin tengavî hebin?
3. Binelîyên Rojavayê xweyê fikirdarîya şexsîparêzîyê ne, lê em dibînin, wekî wextê Akar dijî Xwedê guneh kir, temamîya Îsrayêlê zyanê ket, çimkî temamîya cimetê bedenek bû. Gelo ev rastî wê yekê diguhêre ku hûn çawa rola xwe nava mesîhda dibînin?
4. Kevirê krîptonî bi ruhanî gunehê bi zanebûn kirî ye. Akar zanibû, wekî ewî gerekê ji wî talanê anî tu tişt hilneda, û korintîya zanibûn, wekî serxweşî, gelekxwerin û xwehizî çawa guneh dihatine hesabê. Ev herdu qewimandin jî nava jîyanên merivada zeyîfî û mirin pêşda anîn, yên ku nediketine nava van guneha. Bi fikira we, bona çi Xwedê nava bedena Xweda awqasî berk nêzîkî guneh dibe? Bi fikira we, bona çi Ew dixweze ku em ne tenê bawarmendên cuda-cuda qîmet bikin, lê usa jî bedena bawarmenda, çawa yekîtî.

## Ders 3. Kevirê krîpton

*Li ser hîmê serên kitêbêye 8-1O*

1. Hûn dikarin bînine ber çavê xwe, wekî serhatîya Castîn û Ancêlayê bi rastî biqewimîya? Bêguman, na. Feqet hûn dikarin nava wê yekêda tiştên mînanî hev bibînin, ku çi cûreyî hinek mesîhî nêzîkî heleqetîyên xwe û Xwedê dibin? Fikira weyê derheqa wî merivîda wê çawa be, yê ku himberî merivê li rex xwe vî cûreyî dike? Fikirê derheqa wî merivîda çi cûreyî be, yê ku vî cûreyî nêzîkî Xwedê dibe?
2. Gunehê bi zanebûn kirî kevirê krîptonî ruhanî ye, û kevirê krîptonî ruhanî pûtparistî ye. Ew yek çi dide kifşê, wekî gelek meriv, yên ku diçine civînê, lê ew bi rastî pûta dihebînin? Cûrê pûtparistîyêyî li welatekî çawa ye, li kîderê hebandina heykela û pûta tune?
3. Çawa qanûn, li civîna, bawar bikî, derheqa pûtparistîyêda hîn nakin. Nava vê dersêda çi li ser we hukum hişt, çi ku hema xût derheqa pûtparistîyêda ne? Menî çî ye, wekî wê yekê hukumî li ser we kir?
4. Nava temîya kitêba Pîrozda, Xwedê her dem nîşana wekehevtîyê diatîne di navbera pûtparistîyê û bêesilîyêda. Hûn dikarin şirove bikin, ku bi fikira we bona çi Xwedê wê yekê dike? Ew yek derheqa wê eleqetêda çi eyan dike, ya ku Ew pêşnîyarî me dike?
5. Pûtparistî wî çaxî destpê dibe, wextê ku tiştê çêkirî hebandinê distîne, lê ne ku yê çê dike. Xwedê çi cûreyî caba vê tabîyê dide? Bona çi Xwedê Xwe ji wan meriva dûr dixe, yên ku Wî nabijêrin? Bi fikira we, bona çi fikirdarîyên yekqismî derheqa wê yekêda reqemên rast in, wekî civak nava pûtparistîyêda ne?
6. Bona naskirina pûtparistîyê em gerekê fem bikin, ku hebandina rast çî ye. Hebandina rast dide kifşê, ku gura temîyên Xwedê bikin, lê ne ku stirana hêdî bistirên. Ev rastî fikirdarîya weye derheqa jîyana mesîhîtîyêda çi cûreyî diguhêre? Nava jîyana weda şexsekî usa hebûye, yê ku bûye mînak, yê ku Xwedê rast dihebîne?

## Ders 4. Pûtparistîya zemanê niha

*Li ser hîmê serên kitêbêye 11-14*

1. Serhatîya derheqa wê yekêda, wekî Şaûl gura Xwedê nekir, hinek amalekî nekuştin, hema koka pûtparistîya li civînê dide kifşê. Timakarîya Şaûl çi cûreyî wek pûtparistîyê ye?
2. Samûêl gote Şaûl, wekî serhişkî hema pûtparistî ye. Serhişkî wê yekê dide kifşê, wextê ku em xwestinên xweva tên girêdanê, û xwestina Xwedê hesab hilnadin. Û çawa me dît, nava jîyana Şaûlda wê yekê bona gunehên diha mezin derî vekir. Serhişkî çi cûreyî çawa pûtparistî tê hesabê? Ew yek bona çi berbi gunehên diha mezin dibe?
3. Timakarî me berbi pûtparistîyê dibe, û ew bi rastî pûparistî ye. Lê razîbûn berbi xwedêparêzîyê dibe. Wextê ku hûn meremên xwe, pirsên xweye sereke û xeysetên xwe dinihêrin, bi fikira we, çi diha qewat e, timakarî yan razîbûn? Hûn çi dikarin bikin, ku diha zêde razî bin?
4. Nenihêrî wê yekê, wekî nava jîyana her mesîhîkîda razîbûn lazim e, em gerekê wê yekê tevî jixwerazîbûnê şaş nekin. Bi xeberên xwe firqîya di navbera van herdu tabîyada şirove bikin. Hûn çawa dikarin bizanibin, wekî meriv razî ye, yan ji xwe razî ye?
5. Usa jî zelalkirineke girîng heye, ya ku gerekê bîra meda bimîne: pûtparistî ew yek nîne, wekî bawarmend dikeve nava gunehê, lê ew e, ku ewî xwe daye gunehê. Anegorî wî hemû tiştî, çi ku hûn hetanî niha ji van dersa hînbûn, hûn çawa dikarin firqîya di navbera van herduyada şirove bikin?
6. Bi femkirina wê yekê, wekî gunehê bi zanebûn kirî kevirê krîptonî ruhanî ye, em jî gerekê fem bikin, wekî Xwedê jîyaneke bi temamî nû, bi tebyeta nû, bi tebyeta Xwe, raberî me dike. Hûn fem dikin, wekî diqewime gunehêra qayîl nîbin, lê dewsa wê yekê heqîtîyêra qayîl bin? Gelo ev femdarî gîhanê derheqa wê yekêda dide we, wekî guhartina wî cûreyî diqewime û dikare nava jîyana weda bibe?

## Ders 5. Îsayê feşkirî

*Li ser hîmê serên kitêbêye 15-18*

1. Meremê Xwedêyî bona xilazkirina we, rêberkirina we, ya berbi Wî ye. Ew dixweze ji nêzîkva we nas bike. Ji we tê xwestinê, ku hûn ji hukumê vê dinîyayê paqij bin, çimkî Ew dixweze ku tevî we bikeve nava eleqetên bêqelp. Ev yek çi dide kifşê? Meriv çawa dikare bizanibe, wekî we ew yek kiriye?

2. Bînin ber çavê xwe wekî Xwedê çi cûreyî aciz dibe, wextê ku ew cimeta ku Ew dixweze rêberîyê lê bike, naxweze bê, serbara serda, peyî wê yekêra jî, wextê ku ew dibêjin ku Ewî ew xilaz kirine. Weyê çi texmîn bikira, eger hûn bizewicîyana û merivê li rex we nexwesta tevî we odekêda bima? Yan jî, eger nexwesta tevî we bi têlêfonê xeberda. Yan jî, eger ew bi destî merivekî mayîn tevî we biketa nava eleqeta. Eleqetên we wê çi cûreyî bûna?
3. Harûn li cîhê mayîna cimetê ma: dêmek, meriv dikare bêje, wekî ewî xwe tevî cimeta xwe çareserkirî texmîn dikir, ne ku nava hazirîya Xwedêda, li ser çîyê. Hinek meriv vî cûreyî ne: ew li civînê diha zêde xwe çareserkirî dibînin, ne ku nava hazirîya Xwedêda. Hûn çawa caba wê yekê didin, wextê ku hûn hazirîya Wî texmîn dikin?
4. Serekkahînê îsraêlîya hebû, wana jî elam kir, wekî *Yahvêh* ew ji Misirê aza kiribûn, û *Yahvêh* hebandin, bi dayîna qurbanîya nava temamîya wededa, guhdarîya xwe li ser golika zêrîn merkez kirin, çimkî meremê cimetê mîyaserkirina xwestinên wan bû. Eger Îsraêlê ev hemû tişt elam kir, navê rast da xebatê, lê pêra jî hebandina feş û xirab da kifşê, diqewime wekî roja îroyîn hema ew tişt li civînê dibe? Ew yek çawa dikare biqewime?
5. Îsraêlê gura çend temîyên Xwedê dikir, lê yên mayîn hesab hilnedida. Li temamîya dinîyayê hemû civîn wê yekê dikin: ew hinek beşên nivîsarên pîroz dibijêrin, û yên mayîn hesab hilnadin, yên ku bang dikin ku jîyana pîroz derbaz bikin, û xwe bi temamî pêşkêşî Xwedê bikin. Meriv çawa dikare bizanibe, ku em Îsayê rast dihebînin, lê ne ku Îsayê feşkirî?

## Ders 6. Xala destpêkê

*Li ser hîmê serên kitêbêye 19-21*

Li Îsraêlê fikira derheqa *Yahvêh*ê feşkirîda çawa pêşda hat û li civînê fikira derheqa Îsayê feşkirîda çawa pêşda tê? Nava van her du pirsada jî menî ev e: dilên meriva berk dibin, çimkî tobekirina rast tune.

1. Ev dersa derheqa tobekirinêda ne, derheqa lazimatîya wê, rola wêye nava Mizgînîyêda û kemala wêye rastda ne. Ev fikira bi çiqasîva ji wê yekê cuda dibe, çi ku pêşda derheqa tobekirinêda hîn kirine? Gelo ew yek fikira weye derheqa Mizgînîyêda diguhêre? Eger erê, wî çaxî çawa?
2. Hemû Mizgînî bi serhatîya derheqa Yûhennayê Nixumdarda destpê dibin, yê ku derheqa tobekirinêda terîf dikir. Ev yek dide kifşê, wekî Mizgînîya

Îsa her dem ji tobekirinê destpê dibe. Hûn derheqa vê gotinêda çi difikirin? Bo çi tobekirin bona Mizgînîyê awqasî girîng e?

3. Bêyî tobekirina ji gunehên ku bi zanebûn tên kirinê, bawarîya raste hindava Îsa Mesîh da tune. Eger em bi zanebûn guneha dikin û dihebînin wekî mesîhî ne, wî çaxî em xapîyayî ne. Bi fikira we, Xwedê bo cûrê jîyana we awqasî xemgîn e?
4. Serhatîya derheqa Castîn û Ancêlayêda bîr bînin. Ancêlayê nizanibû, wekî ewê gerekê piştî mêrkirinê hevalên xwe bihiştana. Mervên ku Îsa nas nakin, wê ji kîderê pê bihesin, wekî ew gerekê tobe bikin, eger em nebêjine wan? Çi dikare bê serê me, eger em bêjine meriva, wekî ew gerekê terka gunehkirinê bidin? Bona çi girîng e, ku bahê terîfkirina temamîya Mizgînîyê hesabkin?
5. Em bi kirên xweva tên kifşê, lê ne ku bi fikirên xweva. Tobekirin qewata Mizgînîyê eyan dike, wekî Mizgînî dikare me bi temamî biguhêre. Bi hesabhildana wê yekê, em dikarin bêjin, wekî tobekirin baş e û qenc e? Bi xeberên xwe wê fikirê şirove bikin, wekî ji alîyê Xwedêda dewa tobekirinê hema rehma Wî ya hindava meda ye.

## Ders 7. Rastî, qebûlkirin û hizkirin

*Li ser hîmê serên kitêbêye 22-24*

1. Cihûda dixwest derheqa xilazbûna meye ecêbda, yan jî tiştên xweşda binivîsîya, lê ew mecbûr bû eşaretî bida wan meriva, yên ku hîn dikirin, wekî kerema Xwedê îzinê dide guneha bikin. Usa qewimîye, wekî hûn îzinê bidine xwe, ku eşaretîyên Xwedê hesab hilnedin û tenê derheqa alîyên Xebera Xwedêye başda bêjin? Bona çi girîng e, ku hûn nava jîyana xwe û xeberdana xweda eşaretîyên Xebera Xwedê xweyîkin?
2. Civîn hindava gunehêda bêdeng bûye, çimkî fikirdarîya meye şaşe derheqa wê yekêda heye ku hizkirina rast kîjan e. Nava hizkirina rastda gerekê rastî hebe, lê pêra jî pêrspêktîva rastîyêye heta-hetayê hebe. Heyîna pêrspêktîva heta-hetayê çi cûreyî pirsên weye sereke diguhêre?
3. Hizkirina Xwedê kirina gura temîyên Wî dide kifşê. Ev e firqîya di navbera hizkirina mesîhîtîyê û hizkirina vê dinîyayêda. Eger em temîyên Xwedê hesab hilnedin, gelo firqî di navbera hizkirina Xwedê û hizkirina vê dinîyayêda hene?
4. Hizkirin bêyî rastîya Xwedê, ne hizkirin e: ew feşbûn e. Kûltûra me ji vê hizkirinê dûr dikeve, û hema ev e menî, wekî civîn Îsayê feşkirî dibi-

jêre. Gelo hûn dikarin rastîyê bi hizkirin bêjin? Bi fikira we, bona çi gelek meriv aciz dibin, wextê ku tevî rastîyê rû bi rû disekinin?

## Ders 8. Kevirê krîpton bişkênin

*Li ser hîmê serên kitêbêye 25-28*

1. Hinek bawarmend gunehê hesab hilnadin, çimkî ew nizanin, wekî gunehê wan dilê Xwedê diêşîne. Yên mayîn bawarîya xwe li wê bawarîyê tînin, wekî em bi tebyeta xweva gunehkar in, û wekî qewata xwîna Îsa bes e, ku me ji cezayê gunehê aza bike, lê ne ku ji xulamtîya gunehê. Van bawarmenda hukumê kevirê krîpton, gunehê bi zanebûn kirî û yê ku tê kirinê, li ser xwe dîtine. Gelo ji van fikira yekê hukumê xwe nava jîyana weda hiştîye? We hukumê wana nava jîyana merivên başqeda, yên ku dihebînin, ku mesîhîne, dîtîye?
2. Koma bawarmendaye sisîya mesîhîyên rast in, yên ku bi zanebûn guneha dikin, feqet bona wana ew yek şerkarîya herimî ye. Ew dixwezin ji wî halî azad bin, lê wana hela hê nava Xebera Xwedêda eyan nekirîye, ku çawa bi bawarîyê azabûna ji gunehê bidine xebatê. Ew şerma ku ew rûyê gunehêda texmîn dikin, wana nava wê gunehêda xweyî dike. Hûnê bi kîjan rastîyên ku nava vê dersêda tên gotûbêjkirinê, tevî wî bawarmendî pareve bûna, yê ku nava halekî wî cûreyîda ne?
3. Nava vê dersêda ez şedetîyê didim, ku çawa Xwedê ez ji xwestina min û pornografîyaê azad kirim. Nava vê şedetyîêda çi ji her tiştî zêdetir hûn ruhdar kirin û bona çi? Çi dijî we derket û bona çi?
4. Azabûna ji gunehê ji kedera bi cûrê ku Xwedê dixweze, dikişe, lê ne ku ji kedera vê dinîyayê. Kedera bi cûrê ku Xwedê dixweze, wê êşê fem dike, ya ku gunehê me dide Xwedê, lê kedera vê dinîyayê tenê bi wê yekêva xemgîn e, ku gunehê me wê çi cûreyî hukumî li ser jîyan û pêşeroja me bike. Bi fikira we, bona çi Xwedê kerema bona azabûna ji gunehê tenê wetxê kedera cûrekî dide, lê ne ku ya mayîn? Hûn çawa dikarin ev cûrên kederê nava jîyana xweda ji hev cuda bikin?
5. Serpêhatîyên derheqa sûpêrmêxasada xiyalên me gur dikin, çimkî ew nêzîkî wê xwestinê dibin, ya ku dilê her merivekîda heye. Bawarmendên civîna ewlin sûpêrmêrxasên wan roja bûn. Em çawa dikarin bibine sûpêrmêrxasên rojên me? Evê çi cûreyî fikira vê dinîyaêye derheqa Xwedêda biguhêre?
6. Xwedê şerkar e, û em hatine çêkirinê bo ku mîna Wî bin. Îsa banga bona

serkeftinê bo hevt civînên kitêba Eyantîyê belav kir, û ew yek dide kifşê, wekî em bona serkeftinê hatine gazîkirinê, û wekî heye dijmin, kîjanî em gerekê alt bikin. Xwedê bangî we dike, ku hûn altindar bin. Derheqa banga vê kitêbêye tomerîda bifikirin. Hûn dikarin bêjin, wekî vê kitêbê fikirdarîya weye derheqa wê yekêda guhart, ku nava vê jîyanêda hûn gerekê çi alt bikin? Wê yekê çi cûreyî fikira weye derheqa bawarmendên başqe, temamîya civînê û derheqa weda guhart?

# XILAZBÛN BO HEMÛYA

“Eger tu bi devê xwe îqrar bikî, ku Îsa Xudan e û dilê xwe-da bawar bikî, ku Xwedê Ew ji nava mirîya rakiriye, tê xilazbî. Çimkî bi dil yek bawar dike, rast tê hesabê û bi dev îqrar dike, xilaz dibe”
Romayî 1O:9, 1O

Xwedê dixweze, ku jîyana weye tam hebe. Ew bi dil bona we xemgîn e û dixweze ku hûn progirama Wî bona jîyana xwe mîyaser bikin. Feqet tenê rêyeke berbi Xwedê heye: hûn gerekê bi destî Kurê Xwedê, Îsa Mesîh, xilazbûnê qebûl bikin.

Bi saya mirina Îsa û rabûna Wî ya ji nava mirîya, Xwedê rê çêkir, ku hûn bikevine padişatîya Wî, çawa kur yan jî keça Wî ye hizkirî. Qurbanbûna Îsaye li ser xaç heta-hetayê belaş pêşkêşî we hatîye kirinê. Xilazbûn pêşkêşa Xwedêye bo we ye: hûn nikarin tu tiştî bikin, ku xilazbûnê qazanc bikin, yan jî layîqî wê bin.

Bona stendina vê pêşkêşa giranbiha, hûn berê ewlin gerekê gunehê jîyana xwe, ya ji Efirandar cuda, xwe mikur bên, çimkî eva koka hemû gunehên weye kirî ye. Tobekirin qewilekî girîng e bona stendina xilazbûnê. Petrûs kitêba Karên şandîyada, wê rojê ev yek zelal da kifşê, wextê ku pênc hezar meriva xilazbûn stendin: “Awa tobe bikin û berbi Xwedê vegerin, ku gunehên we bêne resîtkirinê” /Karên Şandîya 3:19/. Încîl eyan dike, wekî ji me her kes çawa xulamê gunehê hatîye dinîyayê. Ev

xulamtî ji gunehê Adem destpê bûye, yê ku cara ewlin bi zanebûn gura Xwedê nekir. Bi tobekirinê hûn qirarê qebûl dikin, ku hûnê îdî tu cara gura şexsê xwe û mîrêcin nekin, yê ku bavê derewê ye, lê hûn gerekê gura Xudanê xweyî nû, Îsa Mesîh, bikin, Yê ku emirê Xwe bona we daye.

Hûn gerekê serwêrtîya jîyana xwe teslîmî Îsa bikin. Qebûlkirina Îsa, ya çawa Xudan, dide kifşê, wekî hûn îzinê didine Wî, ku Ew serwêrtîyê li temamîya jîyana we /ruh, şexs û bedenê/ û wî hemû tiştî bike, çi ku yê we ye: Ew serwêrtîya tam nava jîyana weda distîne. Wî çaxî, wextê ku hûn wê yekê bikin, Xwedê wê we ji tarîstanê aza bike, û wê we cîguhastî nava padişatîya Xweye nava ronahîyê û rûmetêda bike. Bi gilîkî gotî, hûnê ji tarîstanê derbazî ronahîyê bin û bibine zaroka Wî.

Eger hûn dixwezin xilazbûnê bi destî Îsa bistînin, vî duayî biwekilînin:


*“Xwedêyê Ezmana, ez fem dikim, wekî ez gunehkar im û ji norma heqîtîya Te ketime. Ez bona gunehên xwe layîqî cezakirina heta-hetayê me. Spas, ku min nava vî halîda nahêlî, çimkî bawar dikim, wekî Te Kurê Xweyî tek-tenê, Îsa Mesîh şand, Yê ku ji Meyrema qîz hate dinîyayê, bona ku bo min bimira û cezayê min li ser xaç bidîta. Ez bawar dikim, wekî Ew roja sisîya ji nava mirîya rabû û niha jî alîyê Teyî rastê rûniştî ye, çawa Xudan û Xilazkirê min. Îro ez bona wê yekê tobe dikim, ku ji Te cihêbûyî bûm û jîyîna xwe heta-hetayê teslîmî serwêrtîya Îsa dikim.*

*Îsa, ez dihebînim, wekî Tu Xudan û Xilazkirê minî. Bi Ruhê Xweva were nava jîyana min, û min bike zarokê Xwedê. Ez şuxulên tarîstanê berdidim, nêzîkî kîjana bûm wextêda, û ji roja îroyînda ezê bona xwe nejîm. Ezê bi kerema Te, bona Te bijîm, çimkî Te emirê Xwe bona min daye, ku ez heta-hetayê bijîm. Spas Xudan! Niha emirê min bi temamî destên Te da ye, û anegorî Xebera Te, ezê tu cara bi navê Îsa şerm nekim. Amîn!”*

Hûn bi xêr hatine malbeta Xwedê. Ez piştgirîyê didime we, ku hûn derheqa vê behsa başda bawarmendekî mayînra gilî bikin. Ew yek jî girîng e, ku hûn bighîjine civîneke cîh, ya ku bawarîya xwe li Încîlê tîne û tevî merivên başqe nava heleqetîyada bin, yên ku wê nava

bawarîyêda piştgirîyê bidine we.

We hema hêja nigê xwe dianî li ser rîya here ecêb. Ez bo we gelek eyantîya, keremê û hevaltîya tevî Xwedê nava jîyana weda wera dixwezim.



Armanca qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêyşinil”-ê ew e ku alî şexsa, malbeta, civîna û mileta bike, ku ew qewata Xebera Xwedê fem bikin û li ser xwe texmîn bikin.

Bi saya vê femdarîyê, him meriv, him cîhên jîyanêye tam wê bêne guhartinê, û civakê bi aktîvî dijî vê neheqîya ku dinîyayê dizêrîne şerkarîyê bike

Sayta **CloudLibrary.org**-ê dikeke zindî ye, ya ku îzinê dide serwêr û rêberên li temamîya cîhanê, ku ew bi zimanên xwe matêrîyalên êlêktronîye belaş bistînin.

Herine sayta **CloudLibrary.org-**ê û cêrge matêrîyalên Con û Lîza Bîvêra bixwînin, yên ku bi ji 80-êyî zêdetir zimana wergerandî hene.

**Kitêbên êlêktronî, dersên aûdîo û vîdêyo, kitêbên aûdîo, Mizgînîya…**

CLOUD LIBRARY

**Hûn diha zêde dixwezin? Şikil pêlkin.**




***Jîyan, kemala kîjanê roja  îroyîn  û heta-hetayê heye.***

Ew yek ku em çawa vî emirî dijîn, wê ewê yekê biryar bike, ku emê emirê heta-hetayê çawa derbaz bikin. Kitêba pîroz li me eyan dike, wekî bona bawarmenda derecên heqdayînêye cûre-cûre hene: destanînên hineka wê bi temamî wextê dîwanê bişewitin, lê bona yên mayîn jî wê mecala serwêrîkirina tevî Mesîh bê dayînê.

Ji me gelek meriv we zendegirtî bimînin, wexte ku pê bihesin, wekî me piranîya wedê xwe li ser tiştên usa xerc kirîye, yên ku wê layîqî heqdayîna heta-hetayê nebin.

Wî çaxî emê çawa bikaribin nava emirê kardarda bijîn? Kitêba “Ewên ku bi heta-hetayêva dilivin” wê we hîn bike, ku hûn xwe eşkere bikin û wî hemû tiştî çendbare bikin çi ku Xwedê daye we. Eger hûn ji alîyê heta-hetayêda jîyanê binihêrin hûnê qewatê bistînin, bo ku hûn bona meremên qewîn bişuxulin.

Hûn dikarin vê dersê, usa jî xebatên Con û Lîza Bîvêraye mayîn bi hatina li sayta întêrnêtêye belaş, ya “Mêsîncêr întêrnêyşinil”-ê, temaşe bikin û ji întêrnêtê der bînin:

CloudLibrary.org

Hûn dikarin matêrîyalên zêde jî bi gelek zimana li saytên YouTube.com, Youku.com,  usa jî li saytên wî cûreyîye mayîn temaşe bikin û ji întêrnêtê der bînin.

**MÎNA SÛPÊRMÊNÊ** ku dikare ser hemû dijwarîyara banzde û hemû neyara alt bike, usa jî karebûna nebînayî, ya peyîhatîyên Mesîh heye, bona altkirina dijwarîyên jîyanê. Feqet, pirsgirêka him ya Sûpêrmên, û him jî ya me heye: kevirê krîpton heye, yê ku qewatên me ji me distîne.

Bêguman, Sûpêrmên û kevirê krîpton li ber xwe derxistîne, lê kevirê krîptonî ruhanî na.

Ev kitêb bersiva wê pirsê dide, ku bona çi ji me gelek meriv nikarin wê qewata xwedêtîyê bijîn, ya ku nava jîyana mesîhîyên sedsala ewlinda eşkere dihate kifşê.

Nava kitêba *“Kevirê krîpton bişkênin”*-da Con Bîvêr dide kifşê, ku kevirê krîpton çî ye, qezîya çawa ew bona olên me raber dike, û çawa ji grêfûtkên wan azad bibin.



Con Bîvêr û kulfeta wî Lîza hîmdarên qulixdarîya “Mêsîncêr întêrnêyşinilê”-ne. Con terîfkir e, û usa jî nivîskarekî bi nav û deng e. Bêyî berdaxustin, ew li ser xwe guman û bi cedandin rastîyê dannasîn dike. Ew dixweze piştgirîyê bide civînên cîh û rêberên mesîhî û bi matêrîyalên hînkirinêva bide çareserkirinê, bêyî hesabhildana cîhê jîyana wan, ziman yan jî halê wanî fînansî. Hetanî roja îroyîn matêrîyalên wîye hînkirinê bi ji sedî zêdetir zimana û bi mîlîyona mesela hatine tercimekirinê û belavkirinê, bona serwêr û rêberên temamîya dinîyayê.

Van matêryala û yên mayîn hûn dikarin li vê malperê dest bînin:
**CloudLibrary.org**

**MESSENGER** INTERNATIONAL
MessengerInternational.org

Ev kitêb ji alîyê xudanê wêda pêşkêş e û ne bona firotanê ye.

Diha zêde dixwezin? Şikil pêlkin.